

**Husein Muhammed**

**PEYVSAZÎ DI ZIMANÊ KURDÎ**

# 1. EV VEKOLÎN Û YÊN BERÎ WÊ

Di zimannasiyê de *peyvsazî* (bi inglîzî *word formation*) tê maneya çêkirina peyvan.<sup>1</sup> Ev ne yekem car e ku lêkolîn li ser peyvsaziya kurdî tê kirin. Di gelek kitêb û ferhengên kurdî de pêşpirtik (prefiks) û paşpirtik (sufiks) tîrên rîzkirin û – eger bi kurtî jî be – behsa erk û wezîfeyên wan hatiye kirin û hin nimûne ji wan hatine dan. Mirov dikare *Rêzimana kurdî*<sup>2</sup> ya Celadet Bedirxan û Roger Lescot (1971) ya bi fransî wek yekem rêzimannameyê bide ku bi rêjeyî bi berfirehî (bi qasî 10 rûpelan) behsa peyvsaziya kurmançî tê de hatiye kirin. Berfirehtirîn xebata çapkirî heta niha li ser peyvsaziya kurmançî hatî kirin, kitêboka Amed Tîgrîs *Pêşkît û parkît*<sup>3</sup> e. Giringtirîn berhema li ser vê mijarê bi soranî, kitêba Kamiran Rehîmî *Binemakanî wişesazî û wişeronan le zimanî kurdî da*<sup>4</sup>. Peyvsaziya kurdiya başûrî (feylî, kelhurî, kirmaşanî) bi nisbî bi berfirehî ji aliyê Ismaîl Kemendar Fettah ve di kitêba wî ya *rêzimana kurdiya başûrî* bi fransî de hatiye vekolîn.<sup>5</sup> Ne haydar im ku tixebateke berfireh li ser peyvsaziya zazakî hatibe kirin lê di gelek kitêbên rêzimanî yên zazakî de bi kurtî behsa peyvsaziyê tê kirin û xaseten paşpirtik û pêşpirtik tîrên rîzkirin û nimûne jê tîrên dan.<sup>6</sup> Dirêjtirîn lîsteya

---

<sup>1</sup> Di nivîsên kurdî de carinan *peyvsazî* bi xeletî bi maneya *morfolojî* hatiye bikaranîn. Bo nimûne, Samî Tan di kitêba xwe ya *Rêzimana kurmançî* de wiha dike û peyva *bêjesazî* bi wateya *word formation* dixebitîne. Bi dîtina min, *peyvsazî* û *bêjesazî* hev wate ne ji ber ku *peyv* û *bêje* hevmane ne. *Peyvsazî* bi maneya *morfolojî* şaş e ji ber ku *morfolojî* ne (tenê) çêkirina peyvan e lê hemû awayên çemandin û girêdanên peyvan û eyarkirina wan ya li gor dem û rewşên rêzimanî ye jî. Wek din jî *-lojî* ne *-sazî* (çêkirin) ye lê *-nasî* (nasîn, zanîn, zanist, ilm) ye. Herwiha *morf* jî ne tenê peyv in lê her *pirtika* rêzimanî ye ku peyv jî tenê yek ji wan in. Min heta niha di nivîsên xwe de *pirtiknasî* bi wê maneyê bi kar aniyê. Di soranî de jî *wişesazî* anku *peyvsazî/bêjesazî* (ji wişe = peyv, bêje) bi wateya *word formation* li kar e, ne bi maneya *morfolojî*. Bi heman awayî di farisî de *wajesazî* (waje = peyv, bêje, wişe) maneya *word formation* dide.

<sup>2</sup> Orijiñala fransî û wergera wê ya tirkî û ya erebî li vir tîrên xwandin: <https://zimannas.wordpress.com/2015/07/27/c-bedirxan-u-r-lescot-rezimana-kurdi-bi-fransi/>

<sup>3</sup> Mirov dikare naveroka vê kitêbê li vê derê bixwîne:

[https://ku.wikibooks.org/wiki/P%C3%AA%C5%9Fk%C3%AEt\\_%C3%BB\\_Park%C3%AEt:%C3%87end\\_gotin](https://ku.wikibooks.org/wiki/P%C3%AA%C5%9Fk%C3%AEt_%C3%BB_Park%C3%AEt:%C3%87end_gotin)

<sup>4</sup> Ev kitêb li ser vê girêdanê berdest e: [http://www.ku.shafaag.com/pdf/books/binemaka-gotar\\_1388.pdf](http://www.ku.shafaag.com/pdf/books/binemaka-gotar_1388.pdf)

<sup>5</sup> Ismail Fattah Kamandar: *Les Dialectes kurdes méridionaux* (devokên kurdî yên başûrî) 2001:

<http://www.amazon.ca/Les-Dialectes-Kurdes-Meridionaux-Dialectologique/dp/9042909188>

<sup>6</sup> Nimûneyek ji rîzkirina paşpirtikên zazakî: <http://www.kirmancki.com/index.php/dersen-kirmancki/item/148-k-rmancca-da-yap-m-ekleri-qertafen-virastene>

paşpirtik (nêzîkî 200 lib) û pêşpirtikên (zêdeyî 70 pêşpirtik) kurdî di Wîkîferhengê de hatine rêzkirin û ji aliyê nivîserê vê vekolînê ve hatine berhevkirin.<sup>7</sup>

---

<sup>7</sup> Paşpirtik: [https://ku.wiktionary.org/wiki/Kategor%C3%AE:Pa%C5%9Fbendik\\_\(Kurd%C3%AE\)](https://ku.wiktionary.org/wiki/Kategor%C3%AE:Pa%C5%9Fbendik_(Kurd%C3%AE)) û [https://ku.wiktionary.org/wiki/Kategor%C3%AE:P%C3%AA%C5%9Fbendik\\_\(Kurd%C3%AE\)](https://ku.wiktionary.org/wiki/Kategor%C3%AE:P%C3%AA%C5%9Fbendik_(Kurd%C3%AE)).

Ev xebatên hêja ne û di vê vekolînê de jî me sûd û feydeyekî mezin ji wan wergirtiye. Lê çendîn kêşe û pirsgirêkên cidî di van berhemên behskirî de hene:

- 1) Gelek ji wan (bo nimûne ya Amed Tîgrîs) bi qasî ku jê tê hewl didin hejmareke mezin ya paş- û pêşpirtikan didin lê erk û wateya wan yan qet nayê dan yan jî bi awayekî zêde giştî tê diyarkirin. Bo nimûne, Tîgrîs li ber hejmareke pir mezin ya "parkît"ên (paşpirtikên) xwe dibêje "rewş û taybetiyê dide diyarkirin". Lê ji xwe her tişt rewş yan taybetiyekê dide diyarkirin!
- 2) Bi piranî pirtikên dariştinê (yên ku peyvên serbixwe çêdikin, *derivational*) û yên çemandin û girêdanê (*inflectional*) ji hev nayên cudakirin.
- 3) Di piraniya xebatên heyî de sinorê paşpirtik û pêşpirtikan nayên diyarkirin anku nayê gotin ka ev paşpirtik li gel çi birrên peyvan tên bikaranîn û bi kîjan re bikaranîna wan ne mimkin e, ka tesîra dengnasî (fonolojî) yan dengrêzî (fonotaksî) li ser guherîna wan çi ye, bi wan paşpirtikan peyv ji kîjan birrên peyvan diçin kîjan yên din û hwd.
- 4) Gelek ji vekolerên peyvsaziya kurdî hewl daye ku heta jê bê hejmara pêş- û paşpirtikan zêde bikin û wisa "kurdî dewlemendtir" bikin. Hin ji wan kesan ev yek rasterast gotiye, hinan jî ev yek ji dizîkî ve kiriye. Lê zêdekirina pirtikan yan giştîkirina hin ji wan ne illeh tenê dikare zimanê kurdî zengîn bike lê dikare wî tevlihev jî bike, bo nimûne bi afirandina çendîn formên cuda bi heman maneyê, wek *nivîskar, nivîser, nivîsevan, nivîsende, nûser, nûskar, nûsevan...*
- 5) Di piraniya berheman de, rehên lêkeran jî wek "paşpirtik" hatine hesabandin. Bo nimûne, ji 138 "parkît"ên (paşpirtikên) xwe hejmareke pir mezin di rastiye de lêker in, wek "-bêj, -gir, -zan". Di zimannasiyê de peyvên wiha adeten ne wek paşpirtik lê wek lêker (yan rehê lêkeran) tên hejmartin û peyvên ji wan çêkirî (bo nimûne *stranbêj, masîgir, kurdîzan*) ne wek peyvên dariştî (bi paşpirtikan yan pêşpirtikan çêkirî) lê wek peyvên pêkhatî (hevedudanî, *compound* anku peyvên ji du peyvan *navdêr+lêker* çêkirî) tên hesabandin.
- 6) Berhemên heyî bi piranî tenê behsa pirtikên "kurdiya resen" dikin. Bo nimûne, Tîgrîs di kitêba xwe de rexneyeke dijwar li hin kesên din dike ku paşpirtika "-çî" ya esil-tirkî di berhemên xwe de daye. Tîgrîs çend pirtikên ji zimanên ewropî wergirti

di kitêba xwe de rêz dike lê behsa yek pirtikên esil-erebî yê di kurdî de berbelav jî nake. Bo nimûne, pêşpirtikên *-ayetî, -et, -iyet* yan pêşpirtikên *me-, mi-, mu-, xêr-/xeyr-*. Li aliyekî din, piraniya van berheman gelek ji pirtikên bi zelalî farisî (û di kurdî de ne di nav xelkê de ne peyda) bê dudilî wek "kurdiya resen" bi şanazî rêz dikin.

- 7) Gelek ji nivîsînên li ser peyvsaziyê ne li ser hindê radiwestin ka di zimanê de çi heye lê dixwazin wê bidin pêş ka li gor wan nivîseran divê mirov peyvan çawa çêke yan jî çawa çêneke. Anku ew ne li ser peyvsaziya heyî lê li ser awayên "meqbûl" yan "nemeqbûl" yê peyvsaziyê ne. Mixabin Rehîmî, ku berhema wî ya li jor behskirî berfirehtirîn û piralîtirîn vekolîna li ser peyvsaziya kurdî ye, ji vekolîna zimanê heyî zêdetir serê xwe bi rexnekirina neolojîzman anku peyvên nûçêkirî ve diêşîne û wan bi dijwarî rexne dike – gelek caran bi temamî bê heq.
- 8) Ji berhemên behskirî tenê kitêba Ismaîl Kemendar Fettahî ya rêzimana kurdiya başûrî bi fransî hewl dide ku bi awayekî objektîv nêzîkî meseleyê bibe û peyvsaziya kurdî wek heyî pêşkêş bike, ne wek "divê wiha bibe". Kêşeyeke serekî ya vê berhemê ew e ku ew bi zimanekî hatiye nivîsîn ku piraniya kurdan nikarin jê sûdê wergirin: eger ew bi kurdî, erebî, farisî yan inglîzî bûya, rewşa dê baştir bûya. Pirsgirêka wê ya din jî sinordariya wê ye: ew behsa herdu zaravayên kurdî yê serekî û yê xwedî zimanên nivîskî yê standard (kurmançî û soranî) nake lê mijara wê tenê kurdiya başûrî ye ku heta niha ne xwedî zimanekî nivîskî yê gihiştî ye.

Tevî kêmasiyên behskirî jî, vekolînên berî niha kereste û materyalên bihagiran in bo vekolîna me ya di destê we de. Lê em ê bi vê vekolînê hewl bidin sentezekê di navbera wan de û lêkolînên peyvsazî yê navneteweyî de pêk bînin. Çavkaniyên me yê navneteweyî yê serekî *Word-Formation in the World's Languages*<sup>8</sup> (Peyvsazî di zimanên dinyayê de) ya P. Štauker, S. Valera û L. Körtvélyessy û herwiha *Word-formation* (Peyvsazî) ya P. Müller, I. Ohnheiser, S. Olsen û R. Rainer e.<sup>9</sup> Di Peyvsazî di zimanên dinyayê de behsa kurdî û zimanên nêzîk (ji aliyê binemalî ve anku farisî û zimanên din yê îranî yan jî ji aliyê cografî ve anku erebî û tirkî) nayê kirin<sup>10</sup> lê nimûneyên ji zimanên cuda-cuda rê û rêbazên giştî yê peyvsaziya kurdî û zimanên cîran (lê ne peyv û pirtikên wan) jî diyar dikin.

<sup>8</sup> <http://www.degruyter.com/view/j/lity.2013.17.issue-00003/lity-2013-0022/lity-2013-0022.xml>

<sup>9</sup> <http://www.amazon.com/Word-formation-International-Handbook-Languages-Europe/dp/3110375664>

<sup>10</sup> Tenê du nimûne ji erebî û yek jî ji tirkî û yek ji farisî hatine dan. Ji aliyê cografî ve nêzîktirîn zimanên bi berfirehî nimûne jê dayî îbrî / îbranî û gurcî ne.

Ji aliyê peyvsazî ve kurdî û farisî di gelek nuqteyan de wek hev in tevî ku hin nuqte hene ku di yekê ji wan de hene û di yê din de peyda nabin û di hin xalan de jî ji hev vediqetin. Berevajî kurdî, vekolînên berfireh li ser peyvsaziya farisî hatine kirin. Ev hem bi farisî<sup>11</sup> û hem jî bi çend zimanên ewropî hatine nivîsîn.<sup>12</sup> Ji ber ku gelek ji rê û rêbazên peyvsaziyê di kurdî û farisî de hevpar in, me sûd ji wan berhemana jî wergirtiye lê tenê bi şertê ku ew rê û rêbaz bi rastî di zimanê kurdî de (bi devkî yan nivîskî) hebin.

Ev lêkolîn dê hewl bide ku dîmenekî berfireh û piralî yê peyvsaziya kurdî bixe ber çavên xwandevanan. Armanca ew e ku em ji gelek hêlan ve li peyvên aloz anku kompleks (pêkhatî, dariştî, veguhastî û hwd.) binêrin. Armanca vê vekolînê ne ew e ku diyar bike ka "divê kurdî çawa be" lê aşkere bike ka "kurdî çawa ye". Ev ne dîtîna vî vekolerî ne bo ku bibêje filan peyv yan awayê peyvê rast e û bêvan jî xelet e lê bi piranî diyar bike ka peyvên kurdî bi çi rê û rêbazan çêbûne û çawa çêdibin.

Ev vekolîn û vekolerê wê herwiha xwe ji idia û armancên "petîperistî" û "paqijkirina zimanî" didin alî û ne alîgirên wan in. Em ê behsa hemû rêbazên peyvsaziyê yên di kurdî de heyî û pirtikên wê bikin bêyî ku hin pirtikan tercîh bikin ji ber "reseniya" wan û hinan jî paşguh bikin ji ber eslê wan (bo nimûne -çî ya ji tirkî yan me- ya ji erebî). Di heman demê, wek yekem carê, ev vekolîn dê hewl bide ku etîmolojiya pirtikên peyvsaz (pêşpirtik û paşpirtik) pêşkêşî xwandevanan bike û hevrehên (*cognate*) wan anku "xizmên wan" di zimanên lêzim û peywendîdar de jî bide.

## 2. PEYVÊN SADE Û YÊN ALOZ

Peyv (bêje, kelîme, wişe, bi inglîzî *word*) di zimannasiyê de ew şiklên gotinê ne ku ji yek yan zêdetir dengan (herfan) pêk tên û dikarin bi tenê bînin yan bînin nivîsîn. Peyv dikarin watedar û binaverok

---

<sup>11</sup> Çavkaniya me ya serekî ya farisîziman *Iştîqaqê pesvendî der zibanê farisîyê êmrûz* (Dariştina paşbendî / paşpirtikî di zimanê farisîya îro de, Tehran 1992) ya Xosrow Kişanî ye.

<sup>12</sup> Berfirehtirîn vekolîn li ser dîroka peyvsaziya zimanê farisî bi zimanên ewropî bawernameya doktorayê ya Sedîqe Elîzade Lemcîrî (Sedigheh Alizadeh Lemjiri) ya bi almanî *Historische und vergleichende Untersuchung der Wortbildung im Persischen* (Lêkolîna dîrokî û berhevder ya peyvsaziya farisî) ye. Herwiha kitêba Gilbert Lazard *Grammaire persane contemporaine*, ku wek *A Grammar of Contemporary Persian* jî hatiye inglîzîkirin, bi berfirehî behsa peyvsaziya farisî dike. Ji bilî van herdu vekolînên serekî, me herwiha çav li çend rêzimanameyên bi inglîzî û farisî gerandiye.

bin, wek *agir, hinar, muzîk*. Lê ew dikarin bênaveroke lê wezîfedar bin: hin erk û wezîfeyên rêzimanî pêk bînin, wek *bi, ji, na*.

Di kurdî û zimanên din de jî peyv adeten ji çend dangan (herfan) pêk tên lê çend peyvên kurdî yê yekdengî jî hene:<sup>13</sup>

- a: wek di gotina "a min" anku "ya min" de
- e: wek di gotina "e" anku "erê" de yan di hevoka "ew kurd e" de
- ê: wek di gotina "ê te" anku "yê te" de
- î: wek di gotina "tu kurd î" de
- û: wek di gotina "ez û tu" de

Peyv dikarin sade yan jî aloz bin. *Peyvên sade* (yan xwerû, bi inglîzî *simple*) peyvên wisan in ku ti beşên wê nikarin jê bîn avêtin bêyî ku ew bibe peyveke bêmane.

- mezin, gul, ji, zû...

Adeten peyvên sade di kurdî de ji 2 – 5 dangan yan herfan pêk tên. Lê, wek ku li jor hat gotin, hin yê yekdengî jî hene. Herwiha yê 6-dengî jî peyda dibin, bo nimûne:

- derman, mercan, ceyran...

*Peyvên aloz* (pêkhatî, dariştî, çêkirî, hevedudanî, bi inglîzî *complex*) dikare ji du yan zêdetir peyvên sade pêk hatibe. Ew herwiha dikare ji peyveke sade û yek yan çend paşpirtik yan pêşpirtikan ava bibe. Çend nimûne ji peyvên aloz:

- nîvro (ji du peyvên sade: nîv + ro[j])
- mezinahî (ji peyveke sade û paşpirtikekê: mezin+ahî)
- bêhêvî (ji pêşpirtikekê û peyveke sade: bê+hêvî)
- bêhêvîtî (pêşpirtik + peyveke sade + paşpirtik)
- birîndarî (peyveke sade + 2 paşpirtik: birîn+dar+î)
- bernedan (du pêşpirtik + peyveke sade: ber+ne+dan)

---

<sup>13</sup> Bo lîsteyeke peyên kurt di kurdî de, binêrin:

[https://ku.wiktionary.org/wiki/P%C3%AAvek:Peyv%C3%AAAn\\_kurd%C3%AE\\_%C3%AAAn\\_kurt](https://ku.wiktionary.org/wiki/P%C3%AAvek:Peyv%C3%AAAn_kurd%C3%AE_%C3%AAAn_kurt)

Mijara vê vekolîna me li ser peyvsaziyê ye anku çêkirina peyvên aloz ji peyvên sade ye. Wek prensîp, peyvên aloz *parvebar* in anku beşên wan dikarin ji hev bîr cudakirin yan jî yek yan çend beş jê bîr avêtin û dîsa beşa mayî watedar be.

- mezinahî → mezin
- birîndarî → birîndar → birîn
- bêhêvî → bêhêvî → hêvî

Wek ku tê dîtin, piştî parvekirinê jî peyvên mayî bîrane û beraqil in. Loma mirov dibêje ku peyvên aloz *parvebar* in anku dikarin bîr parvekirin.

Peyvên sade *parvenebar* in anku mirov nikare tişteki ji wan bixe yan biavêje bêyî ku ew peyv xirab bibin û bêwate bibin. Bo nimûne, mirov nikare peyva *mezin* bike *mezi/mez/ezin/zin* ji ber ku ew peyv di kurdî de bêwate ne.

Carinan peyvên sade jî wek prensîp dikarin bîr parvekirin û dîsa jî wek peyvên xwerû û serbixwe kar bikin. Bo nimûne:

- hêvî → hê (hê jî, hêşta, heta niha)
- hêvî → vî (evî, ev)
- derman → der (cih) + man (mayîn, sekinîn, rawestîn)
- dar → da

Lê peyvên wiha dîsa jî *parvenebar* in ji ber ku ew imkana parvekirinê tenê tesadîfî ye: peyva “hêvî” ji aliyê etîmolojî û dîrokî ve ti têkilî bi peyvên “hê” û “vî” ve nîne, peyva “derman” jî tarîxiyên ne ji peyvên “der” û “man” peyda bûye.<sup>14</sup>

Carinan du peyvên pîr şîbî hev jî yek jê aloz û *parvebar* e û ya din jî wek prensîp *parvebar* e lê dîrokiyên peyveke xwerû û sade ye û nikare were parvekirin:

- gulav (ji gul+av anku ava gulan)
- kulav (ne ji kul+av anku “ava kulan”)<sup>15</sup>

Berevajî nimûneyên li jor, hin peyv hebûn ku tarîxiyên aloz û *parvebar* bûn lê niha êdî bûne peyvên peyvên sade û *parvenebar*. Bo nimûne, baş tê zanîn ku paşpirtikeke bi şîklê *-van* di kurdî de heye ku

<sup>14</sup> Bo etîmolojîya van peyvan, binêrin: <https://ku.wiktionary.org/wiki/h%C3%AAv%C3%AE> û <https://ku.wiktionary.org/wiki/derman>.

<sup>15</sup> Bo etîmolojîya *kulav*, binêrin: <https://ku.wiktionary.org/wiki/kulav>.



*navdêrên biker* (agent nouns) çêdike anku navdêrên bi maneya "kesa/ê ku tiştêkî dike" dide. Ew paşpirtik xwedî gelek maneyan e lê ji hemûyan zêdetir wateya "nobedar, parêzvan, çavdêr" dide, wek di van peyvên de:

- gavan, pasevan, şivan...

Niha em bi hêsanî dikarin bibêjin ku *gavan* peyveke aloz û parvebar e: ga+van anku parêzvanên gayan (û heywanên din yê garanê: manga, golik). Ji vê, em bi hêsanî dikarin bibînin ku *-van* ya di peyva *şivan* de jî heman paşpirtik e. Madem wisa ye, *şivan* di rastiye de peyveke aloz e. Lê gelo ew dikare were parvekirin?

Tarîxiyên *şivan* peyveke parvebar bû. Bo nimûne, di avestayî de ew bi şiklê *pşupane* bû ku ji peyvên *pşu-* (pez) û *pane-* (-parêz) anku *pezparêz* pêk dihat û bi zelalî peyveke aloz û parvebar bû.<sup>16</sup> Lê di kurdî de ti peyveke serbixwe bi şiklê *şî* nîne û ti maneyê nade. Paşpirtika "-van" jî nikare bi tenê wek peyveke serbixwe be<sup>17</sup> loma peyva *şivan* di kurdî de êdî peyveke sade û parvenebar e.

Şiklê aloz ji hin peyvên din jî diyar e lê mirov parvekirina wan dijwar e. Bo nimûne:

- **hêlîn**: Bi hêsanî mirov dikare bibêje ku têkilî peyva *hêk* e. Eger ne wisa hêsan be jî, dîsa bi lêhûrbûneke zêdetir mirov dikare pê bihese ku *lîn* ya wê hevrehê peyva *lan*, *lane* ya bi maneya *kunc*, *qunc*, *cih*, *war* e.<sup>18</sup> Lê parvekirina wê wek hê+lîn ne mimkin e: *hê* bi tenê wek peyveke serbixwe ti maneyên têkilî peyva *hêk* nade.<sup>19</sup> Em peyva *lîn* jî ne wek peyveke serbixwe û ji bilî di peyva *hêlîn* de wek paşpirtik jî nas nakin.
- **golik, goşt, guhan**: Ji aliyê dîrokî ve ev hemû têkilî peyva *ga* ne, bi farisî *gav*, berê *gaw*, bi îraniya kevn *gew-*.<sup>20</sup> Berevajî kurdiya niha, di îraniya kevn de û heta niha jî di gelek zimanên îranî de, *ga* ne tenê maneya çêlekên nêr lê ya hemû wî cinsê heywanan (nêr û mê) dide, wek ku ji peyvên kurdî *gar(r)an* û *manga/mange* (gayên mê) jî diyar e. Paşpirtika *-han* di peyva *guhan* de bi eslê xwe *-dan(k)* e wek di peyvên *guldank*, *şekirdank* de. Lê di peyvên kevnar de *d* ji nava vokalan de ji kurdî ketiye (bo nimûne kurdî *ba*, *bû*, *za* û farisî *bad*, *bûd*, *zad*) yan jî

<sup>16</sup> Berevajî ku bi gelemperî tê bawer kirin, ne têkilî peyva "şiv" e anku "şivan" ne sivik kirina "şiv+van" e. Bi heman awayî forma farisî "çûban" jî bi ser ve wisa dixuye wek ku ji "çû" (şiv, çiv, şivtan, ço, çov, dardest) be lê tarîxiyên ne wisa ye.

<sup>17</sup> Helbet peyveke bi şiklê "van" (pirhemariya çemandî ji cînavê "ev") di kurdî de heye lê ji aliyê etîmolojî ve ti têkilî ya wê li gel "-van" ya di peyva şivan de nîne.

<sup>18</sup> Bo guherîna "a" bi "î", bide ber *kadîn* ji ka+dan (cihê danîna kayê), hevrehê *agirdan(k)*, *şekirdan(k)*, *guldank(k)*...

<sup>19</sup> Tarîxiyên peyva *hêk* ji \**hê* (hêk) û paşpirtika *diminutîv* (biçûkkirinê) *-k* peyda bûye lê êdî *hê* wek peyveke biçûknekirî bi maneya *hêk* nemaye. Li jêrtir li nimûneyên *kûçik*, *kitik*, *pisîk/pişîk* binêrin.

<sup>20</sup> Bo guherîna "-ew-" bi "-o-", bidin ber *xox*, *dor* ji erebî *xewx*, *dewr*.

bûye *h* (meselen kurdî *bahîv/behîv/be'îv* û farisî *badam*)<sup>21</sup>. Lê dîsa jî *golik, goşt, guhan* di kurdiya niha de bûne peyvên sade û parvenebar.<sup>22</sup>

Mirov dikare lîsteyeke dirêj ya peyvên niha sade û parvenebar lê tarîxiyen aloz û parvebar bide.<sup>23</sup> Bo nimûne:

- **mirov, mêr**: ji rehê mir- anku “mirin”, bi gotineke din = kesên mirbar, dimirin, ne nemir, ne xweda
- **stûn**: ji rehê st- bi maneya “sekinîn, li ser piyan/lingan bûn, neketî” ku di peyva *ra-we-stîn, ra-we-standin* yên kurdî de jî maye
- **bext**: avestayî *bexte*-ji beg+te ji beg- = parve kirin, dabeş kirin, lêk vekirin
- **ferman**: fre- = pêş, ma- = pîvan, wek di peyva “peyman” de, paşî di kurmancî de “ey” bûye “ê”, wek soranî “pêwan” û taliyê bûye “î” û “m” jî bûye “v” û wisa “pîvan” ji “peyman” peyda bûye
- **embar**: ji hem+bar anku “[cihê] birin ber hev”

Hin peyv ji zimanên din ketine kurdî ku di wan zimanan de aloz û parvebar in lê di kurdî de peyvên sade û parvenebar in:

- **rewş**: ji farisî *revîş* ji *rev-* ku rehê peyva *reften* = *çûn, meşîn, bi rê ve çûn* e û –ş jî di farisî de paşpirtikek e.<sup>24</sup>
- **birnût**: ji tirkî *burunotu* yan *burun otu* anku *giyayê pozê/difinê/kepiyê* ku ji *burun* = *poz* û *ot* = *giya*)
- **mekteb**: ji erebî *me+k-t-b*. Pêşpirtika *me-* cihan diyar dike, wek “-geh” ya îranî û bo heman pêşpirtik di peyvên wek *mekan, mesken, mehel, medrese* de jî heye. “-kteb” ji rehê *k-t-b* yê maneya *nivîsîn* e ku di peyvên wek *kitab, katib* de jî heye.
- **demokrasi**: ji yûnanî *demos* (gel, xelk, millet) û *kratos* (hêz, qiwet) anku *demokrasi* = hêza gel, hukimraniya xelkê.

<sup>21</sup> Bo guherîna “a” bi “î”, bide ber nimûneyên me yên li jortin: *hêlîn* ji *hêk+lan* û *kadîn* ji *ka+dan(k)*. Herwiha bidin ber guherîna “a” bi “î” di rehên lêkeran de: *çand* → *di-çîn-im*, *man* → *di-mîn-im*.

<sup>22</sup> Helbet di kurdî de wek prensîp mimkin e ku mirov *golik* û *goşt* parve bike û *go* (*gog, gilovir, gurovir*) jê bihêle lê ti têkiliya wan bi vê peyvê ve nîne. Herwiha *guhan* jî dikare wek prensîp bi hêsanî bibe *guh+an* lê ti peywendiya peyva *guhan* bi peyva *guh* re nîne û ew ne peyveke pirhejmara çemandî (paşpirtika -an) e jî.

<sup>23</sup> Xwandevanên hêja dikarin zêdetir agahiyan li ser etîmolojiya van peyvên di Wîkîferhengê de bibînin: <https://ku.wiktionary.org>

<sup>24</sup> Heman rehê farisî –rev- bi rêya soranî wek –rew- di peyvên *tundrew, peyrew* de jî ketiye kurmancî.

Hin peyvên xwemalî jî hene ku wek peyvên aloz û parvebar dixuyin lê di rastiyê de nikarin bête parvekirin anku divê wek peyvên sade bête hejmartin. Di van nimûneyên me de xetika - ya nav peyvê diyar dike ku wek prensîp parvekirin dikare wiha be lê di pratîkê de ne mimkin e:

- kûçik (\*kûç-ik), kitik (\*kit-ik), pisîk / pisîk (\*pisî-k), pişîk (pişî-k)

Carinan peyv dikare li gor hin devokan were parvekirin ji ber ku forma sade di wan devokan de heye lê li gor hin devokên din ew ne mimkin e. Bo nimûne, di kurmanciya navendî de jî û di ya rojhilatî de jî peyva *çêtir* heye. Ew li gor kurmanciya navendî peyveke aloz û parvebar e ji ber ku mirov dikare wê bike *çê+tir*. Di kurmanciya rojhilatî de jî paşpirtika –tir heye lê ti peyveke serbixwe ya bi şiklê *çê* di kurmanciya rojhilatî de nîne yan nemaye. Loma peyva *çêtir* di van devokan de bûye peyveke parvenebar.<sup>25</sup> Bi heman awayî di hemû kurmancî de peyvên bi maneya *zêdetir*, *zehftir* yê bi şiklê *bêhtir*, *bêtir*, *bihtir*, *pêhtir*, *pêtir*, *pitir* êdî parvenebar in ji ber ku ti peyvên têkilî wan yê serbixwe (\*bê, \*bêh, \*pê, \*pêh, \*pi) nînin tevî ku mirov bi hêsaniyê dikare bibêje ku –tir ya dawîya wan paşpirtik e.

Peyva *mezintir* aloz û parvebar e (mezin+tir) lê hevwateriya wê ya devokî *mestir* êdî nikare were parvekirin. Tarîxiyên *mestir* parvebar bû ji ber ku *mes-/mez-* bi xwe peyveke sade bû derengtir –in lê hatiye zêdekirin.<sup>26</sup> Anku di dîrokê de peyva *mezin* jî aloz û parvebar bû (mez+in). Lê ji ber ku forma *mez-/mes-* wek peyveke serbixwe nemaye, hem *mezin* û hem jî *mestir* êdî peyvên sade û parvenebar in.

### 3. NASANDINA MIJARÊ Û PEYVNASIYA WÊ

Di zimannasiyê de *peyvsazî* (bi inglîzî *word formation*) tê maneya çêkirina peyvan. Çendîn rê û rêbazên çêkirina peyvan anku peyvsaziyê di kurdî û zimanên din de jî hene. Li vê derê em ê tê bikoşin wan bi awayekî tedarikî û sistematîk peyvsaziya kurdî bidin nasîn. Piraniya van rê û rêbazan di peyvsaziyê de gerdûnî ne anku di gelek zimanên din de jî – lê ne hemû di her zimanî de – hene.

Em ê pêşî van awayên cuda bi kurtî bidin nasîn û paşî bi kûrahî herin nav her yekê ji wan û bi hûrî behsa bikaranîna wan rê û rêbazan di peyvsaziya kurdî de bikin. Rêbazên peyvsaziyê li gor giringiya

<sup>25</sup> Di kurmanciya rojhilatî de jî peyva “çê” di peyvên “çêbûn, çêkirin” de heye lê tenê wek pêşlêkerekê (preverb), ne wek peyveke serbixwe.

<sup>26</sup> Bo etîmolojia peyva *mezin*, binêrin: <https://ku.wiktionary.org/wiki/mezin>

wan di kurdî de hatine rêzkirin: yê destpêkê di peyvsaziya kurdî de (û gelek zimanên din de jî) pir giring in, yê dawiyê roleke kême heye yan hema-hema tine ye. Lê bila hejmarkirina van rêbazan ne wek tiştê mutleq û absolut were hesabandin. Dibe ku, bo nimûne, di kurdî de niha *wergirtin* ji *guhastinê* giringtir be.

1. **Pêkanîn** (bi inglîzî *compounding*) di peyvsaziyê de tê maneya çêkirina peyvan ji peyvên heyî bi girêdana du yan zêdetir peyvên serbixwe bi hev ve, bo nimûne *serok+wezîr* → *serokwezîr*, *dest+pê+kirin* → *destpêkirin*. Ji peyvên wiha re di kurdî de *pêkhatî* tê gotin (carinan *hevedudanî/hevdanî/lêkdayî*).
2. **Dariştin** (*derivation*) çêkirina peyvan e ji peyveke serbixwe bi pêvekirina yek yan çend pirtikên (morfemên) girêdayî (neserbixwe) bi peyveke serbixwe ve, bo nimûne: *kurd+î* → *kurdî* yan *bê+hêvî+tî* → *bêhêvî*.

Pêkanîn û dariştin di kurdî û piraniya zimanan de gelek giring in. Di rastiyê de, gava ku behsa peyvsaziyê tê kirin, piranî caran zimannas û xaseten jî rêzimannas, tenê li ser pêkanîn û dariştinê radiwestin û behsa awayên din yê peyvsaziyê nakin. Lê çendîn awayên din jî yê peyvsaziyê hene ku rola wan jî di çêkirina peyvan de di kurdî û zimanên din de ne biçûk e.

3. **Guhastin** (bi inglîzî *conversion*) neqilkirina peyvan ji birrekî peyvan (*word class, part of speech*) bo bikaranînê wek endamên birreke din ya peyvan e. Peyv wek xwe dimîne lê bergeha bikaranîna wê tê berfirehkirin yan jî guherandin.

Bo nimûne, peyva *mezin* di kurmancî de rengdêr e (sifet e, bi inglîzî *adjective*), wek *Kurik mezin bûye*. Lê bi guhastinê peyva *mezin* dikare bibe navdêr jî (bi inglîzî *noun*): *Ew mezinê malê ye*. Peyva *gotin* di eslê xwe de lêker e (fiil, bi inglîzî *verb*), wek *Te çi got?* Lê bi guhastinê mirov dikare peyva *gotin* bike navdêr jî. Bo nimûne, *Ez gotinekê jî bi çînî nizamim*. Di vê hevokê de *gotin* maneya *peyv*, *kelîme* dide anku dibe navdêr.

4. **Dubarekirin** (*reduplication*) di peyvsaziyê de tê maneya çêkirina hin peyvan bi dubarekirina peyvekê bi temamî yan bi peyveke nêzikî wê bi awayekî ku encama wê dubarekirinê peyveke yan gotineke bi maneyeke xweser bide. Bo nimûne, *car-car* bi maneya “hin caran, carinan”,

zû-zû bi wateya “pir zû”, *heta-heta* yan *herûher* (bi edebî, bê dawî), *tiştûmişt* bi armanca “tişt û yên wek wan” ji hin awayên dubarekirinê ne. Dubarekirinê di kurdî de roleke giring heye.

5. **Zarvekirin** (*onomatopoeia*) di peyvsaziyê de tê maneya çêkirina hin peyvan li ber dengên. Bo nimûne: *teqe-req*, *dinge-ding*, *nale-nal*, *xuşîn*, *gurmîn*, *qîrrîn*, *qîjîn* hin ji nimûneyên peyvsaziya bi zarvekirinê ne.
6. **Wergirtin** (*borrowing*) yan *deynkirin* di peyvnasiyê de tê maneya neqilkirina peyvekê ji zimanekî din bo nav zimanê xwe. Bo nimûne, kurdî vê dawiyê peyvên wek *televizyon*, *Internet*,  *radyo* ji hin zimanên ewropî wergirtine (yekser yan jî bi rêya tirkî, erebî yan farisî). Peyvên wergirtî dibe ku li gor rastnivîsîn, rêziman û dengnasiya kurdî bîrên eyarkirin (bo nimûne *televizyon* ji farisî *télévision* yan inglîzî *television*) yan jî wek orijînalên wan bîrên hiştin, bo nimûne *out*.<sup>27</sup>
7. **Wergerandin yekser** (*calque*, *loan translation*) çêkirina peyvan li gor hevwateriyên wan yên bi zimanekî din e. Anku peyva nû ji peyvên heyî yên xwemalî tê çêkirin lê li gor hevwateriya wê peyvê ya bi zimanekî din tê avakirin. Bo nimûne, peyva *çande*, *çand* ya bi maneya *kultûr* ji peyva heyî ya xwemalî ya *çandin* hatiye çêkirin lê ew wergerandina peyva *culture* ya zimanên ewropî ye ku ji peyva *cultūra* ya latînî ya bi maneya *çandin* e.<sup>28</sup> Peyva *pêvajo* (prose, proses) ya vê dawiyê di medyaya kurmancî de berbelav, wergerandina peyva *süreç* ya tirkî ye ku ji peyva *sür-mek* (ajotin) ya tirkî hatiye çêkirin. Peyva *zanîngeh* (unîversîte) wergerandina peyva farisî *danişgah* e, hevwateriya wê ya soranî *zanko* wergerandina *camî'e* ya erebî ye...
8. **Wergirtina wateriyê** (*semantic loan*) tê maneya berfirehkirina (yan guherandina) maneya peyvên xwemalî li ber modela zimanên din. Bo nimûne, di kurmancî de *lê gerîn* tê maneya *hatin û çûn û nêrîn bi armanca peyda kirina tiştêkî*, bi inglîzî *to search, to look for*, bi tirkî *aramak*. Lê di tirkî de *aramak* herwiha maneya *bi telefonê axivîn* jî dide. Di inglîzî de ev herdu

---

<sup>27</sup> <https://ku.wiktionary.org/wiki/out>

<sup>28</sup> Ya kurdî ihtimalen ne yekser ji zimanên ewropî ye lê bi rêya tirkî *ekin* (kultûr, çande) ji *ekmek* (çandin) e ku ew bi xwe jî wergerandina peyva ewropî ye.

peyv maneya axivîna bi telefonê nadin. Di nav kurdên ne ji Bakurê Kurdistanê de, mirov bi mexseda axivîna bi telefonê, bi gotina *lê gerîn* bi kar naîne. Adeten mirov dibêje *telefon kirin*, bi soranî jî *telefon kirdin*, bi farisî *têlêfûn kerden*. Lê kurdên Bakurê Kurdistanê adeten li gor modela tirkî bi vê maneyê dibêjin *lê gerîn*. Ev nimûneyeke ji *wergirtina wateyê* ye.

**9. Lihevanîna dengî-wateyî** (*phono-semantic matching*) tê maneya wergirtina hin peyvên biyanî û eyarkirina wan li ber peyvên xwemalî heçku ew peyvên xwemalî bin. Bo nimûne, peyva *bombebaran* û hevwatera wê *bombedûman*<sup>29</sup> di kurdî de tînen xebitandin heçku ew ji peyvên “bombe+baran” yan “bombe+dûman” bin. Lê di rastiyê de ev peyv ji fransî *bombardement* (bixwîne: bombardman) hatiye wergirtin lê li gor peyvên xwemalî hatiye eyarkirin. Ji vê diyarde û fenomenê re *lihevanîna dengî-wateyî* tê gotin.

**10. Qusandin** (*clipping*) yan *kurtkirin* tê nameya avêtina yek yan çend dangan/herfan ji peyvekê. Qusandin dikare li destpêkê, navê yan dawiyê peyda bibe yan jî aloz be. Bo nimûne *Miho* ji *Mihemed* (kurtkirin li dawiyê), *Aqûb* ji *Yaqûb* (kurtkirin li destpêkê), *bên* ji *bêhn* (kurtkirin li navê) û *Mem* ji *Mihemed* (kurtkirina aloz).<sup>30</sup>

**11. Paşvesazî** (*backformation*) çêkirina peyveke nû bi kurtkirina peyveke heyî. Bo nimûne, *nivîs* ji peyva *nivîsîn* yan *ajo*<sup>31</sup> ji *ajotin*. Peyvên *ajotin* û *nivîsîn* ji mêj ve di nav gel de hebûne lê peyvên *nivîs* û *ajo* vê dawiyê ji wan hatine çêkirin.

**12. Têkilkirin** (*blending*) tê maneya çêkirina peyvên nû ji hin beşên lê ne hemû beşên du yan çend peyvan. Di peyvsaziya kurdî û zimanên din de jî ev metod kêr li kar e yan qet peyda nabe. Lê vê dawiyê çend nimûneyên balkêş yê têkil di kurdî de hatine çêkirin. Ji wan yê herî navdar *tirkmancî* (têkilkirina *tirkî* û *kurmancî*) û *sormancî* (têkilkirina *soranî* û *kurmancî*) ne. Mirov dikare herwiha peyva inglîzî *brunch* (taştê dereng yan firavîna zû) wek nimûne bide ku ji têkilkirina *breakfast* (taşt) û *lunch* (firavîn) hatiye çêkirin. Belkî di kurdî de mirov bikare peyva *paşîv* wek têkilkirineke peyva *paş* û *şîv* hesab bike lê dikare wê wek sivikkirina du

<sup>29</sup> Bo bikaranîn peyve bi forma *bombedûman*, binêrin bo nimûne: <http://ku.hawarnews.com/36778/>

<sup>30</sup> Bo guherîna hejmara dangan di peyvan de, binêrin nivîsareke me ya xas:

<https://zimannas.wordpress.com/2015/07/09/guherina-hejmara-dengan-di-peyve-de/>

<sup>31</sup> <https://ku.wiktionary.org/wiki/ajo>

dengên Ş bi Ş-yekê jî rave bike. Herwiha peyva devokî *nîro* dikare wek têkilkirina *nîv+ro(j)* were hejmartin. Lê têkilkirin adeten wek peyvsaziyeke bi zanîn tê hesibandin loma hejmartina van peyvên kurdî wek nimûne ji têkilkirinê hinekî biguman e.

**13. Sernavî** (*acronym*) di peyvsaziyê de peyvên wisan in ku ji serherfên navê dezgehekê yan tişteki pêk tê lê ne herf bi herf lê wek peyvekê tên gotin. Bo nimûne, *radar* ku kurtkirina peyvên inglîzî *radio detection and ranging* yan *Hadep* ku kurtkirina peyvên tirkî *Halkın Demokrasi Partisi* ye. Di kurdî de hin sernaviyên di zimanên din de çêkirî tên bikaranîn lê sernaviyên xwemalî hema-hema peyda nabin.

**14. Saznavî** (*eponym*) di peyvsaziyê de ew peyv in ku ji navê kesekî yan dezgehekî hatine çêkirin. Adeten hin keşf û îcadên nû bi navê wan kesan yan şirketan tên nasîn ku wan ew tişt afirandiye yan vedîtiye. Bo nimûne, *aspîrîn* peyveke saznavî ye ji ber ku şirketeke almanî ya bi navê Aspirin *aspîrîn* yekem car saz kiriye. Ev awayê peyvsaziyê jî di kurdî de kême li kar e yan qet peyda nabe.

## 4. CUDAHİYÊN PEYVSAZIYÊ Û ÇEMANDINÊ

Di zimannasiyê de du beşên serekî yê nêzîkî hev peyvsazî (*word-formation*) û çemandin/tewandin (*inflection*) in. Di herduyan de peyv û şiklê wê diguhere (ji bilî peyvsaziya bi awayê guhastinê). Lê encamên peyvsaziyê û çemandinê ne wek hev in:

Di peyvsaziyê de peyvên nû yê bi maneyên nû ji peyva serekî cuda tên afirandin. Bi çemandinê mirov peyvên nû yê bi maneya ji peyva bingehîn cuda çênake lê bo nimûne cinsê peyvê (mê yan nêr), hejmara wê (yek yan gelek), dema wê (niha yan berê), erênî yan neyînî (dike/nake, kir/nekir, bûye/nebûye...) diyar dike.

Bi çemandinê birrê peyva bingehîn naguhere. Bo nimûne, “hat, nehat, hatiye, hatibû” bi çemandinê demên cuda diyar dikin lê dîsa jî ew hemû wek rehê bingehîn “hat” lêker in. Lê bi peyvsaziyê gelek caran (lê ne herdem) birrê peyva bingehîn jî diguhere. Bo nimûne, “azad” rengdêr e lê “azadî” navdêr

e anku bi zêdekirina “î” li peyva bingehîn, peyveke ser bi birreke din yan peyvan peyda dibe. Ji heman peyvê mirov dikare “azadî-xwaz” jî çêke ku mebest jê ew kes in ku azadiyê dixwazin. Anku maneya peyvê diguhere, “azadî” tiştê e lê “azadîxwaz” mirov in. Anku maneya peyvê guheriyê lê vê carê birrê peyvê her eynî dimîne.

## 5. GUHASTIN

*Guhastin (conversion)* yek ji awayên serekî yê peyvsaziya kurdî û hin zimanên din e. Mebest ji guhastinê bikaranîna peyvên bi eslê xwe endamên birreke peyvan wek endamên yek yan hin birrên din yê peyvan e.

Di guhastinê de di rastiye de ti peyvên nû ji peyva heyî nayên çêkirin. Tenê maneya peyvê û bergeha bikaranîna wê tê berfirehkirin yan jî guherandin.

Di kurdî de, bi guhastinê her lêkera bi forma ferhengî (rader, infinitîv) dikare bibe navdêr. Gelek navdêr dikarin bibin rengdêr. Rengdêr bi berfirehî dibin hoker lê gelek rengdêr dibin navdêr jî.

### 5.1. Navdêr ji lêkeran

Hemû lêkerên (*fiil, verb*) kurdî bi forma xwe ya ferhengî/rader (*infinitîv, mesder*) dikarin yekser bêyî ti guherînan wek navdêr (*ism, noun, substantîv*) bên bikaranîn. Gava ku ew wek navdêr tên bikaranîn, ew dikarin hemû taybetmendiyan navdêrên kurdî bigirin ser xwe (yekhejmar/pirhejmar, cins<sup>32</sup>, diyarîti/nediyarîti, çemandina wek navdêrên din, girêdan/qertaf/izafe).

Bo nimûne, *gotin* (wek *min got*) bi eslê xwe lêker e lê di van nimûneyan de ew wek navdêr û bi taybetiyên çemandina navdêran li kar e:

- Gotin xweş in lê kirin xweştir e.
- Bi gotinê û bi kirinê.

---

<sup>32</sup> Hemû navdêrên bi guhastinê ji lêkeran çêkirî di kurmançî de mê ne.



- Gotina wî xweş bûn lê kirinên wan qirêj bûn.
- Çend gotinên xweş
- Gotineke bêwate.

Eger lêker pêkhatî (hevedudanî, compound) be, hingê wek lêker beşên wê ji hev cuda tên nivîsîn lê wek navdêr bi hev re.

Bo nimûne:

- **lêker**: kar kirin, dest pê kirin, ji bîr bûn, wêne girtin
- **navdêr**: karkirin, destpêkirin, jibîrbûn, wênegirtin.

Ev diyarde di zimannasiyê de bi navê *navdêrkirin* (*substantivization, nominalization*) tê nasîn.

Ji bilî lêkerên bi forma ferhengî, herwiha carinan rehê dema niha yan rehê dema borî jî yê lêkeran dikare wek navdêr bê bikaranîn:

- rehê dema niha: *ger(r)* ji *gerrîn*, *veger* ji *vegerîn*, *rev* ji *revîn*, *nivîs* ji *nivîsîn*: *Di nivîs-a wî de*.
- rehê dema borî: *destkeft*, *hilkeft*, *kir* (ji *bi dest keftin*, *hilkeftin*, *kirin*): *kir û kiryar* (kirin, tiştê ku hatiye kirin yan tê kirin, bi inglîzî *deed, act, action*)

## 5.2. Navdêr ji rengdêran

Gelek rengdêrên (*sifet, hevalnav, adjective*) kurdî jî dikarin bi guhastinê anku bêyî ti pirtikên rêzimanî, ji rengdêriyê veguhezin navdêriyê. Gava ku ew wek navdêr tên bikaranîn, ew dikarin hemû taybetmendiyên navdêrên kurdî bigirin ser xwe (yekhejmar/pirhejmar, cins<sup>33</sup>, diyarîti/nediyarîti, çemandina wek navdêrên din, girêdan/qertaf/izafe).

Bo nimûne, *biçûk* û *mezin* (wek *fil ji mişkan mezintir in*) bi eslê xwe rengdêr in lê di van nimûneyan de ew wek navdêr û bi taybetiyên çemandina navdêran li kar e:

- Biçûk şîrîn in. (= Zarok şîrîn in.)
- mezina wan dehsalî ye.
- mezinê malê

<sup>33</sup> Hemû navdêrên bi guhastinê ji lêkeran çêkirî di kurmançî de mê ne.

- bilêtên biçûkan bi 10 ewro ne, bilêtên mezinan bi 20 ewroyan
- Tenê mezinek û du biçûk li malê bûn.

Ev diyarde jî di zimannasiyê de bi navê *navdêrkirin (substantivization, nominalization)* tê nasîn.

### 5.3. Rengdêr ji navdêran

Gelek navdêr jî dikarin wek rengdêran bînin bikaranîn. Hingê ew jî dikarin xusûsiyetên rengdêran bigirin ser xwe. *Ker* heywanek e lê gelek caran bi maneya *bêaqil, bêhiş* wek rengdêr tê bikaranîn.

- Filan kes ker e. (bêaqil e)
- Bêvan kes ji filan kesî kertir e. (hê jî bêaqiltir e.)
- Ew kertirîn mirov e. (ji hemû mirovan bêaqiltir e.)

Navê gelek heywanên din jî wek rengdêr di kurdî û hin zimanên din de li kar e:

- şêr: wêrek
- rovî/rûvî: 1) tirsok, tirsonek, newêrek 2) hîlebaz, xapîner

Gelek peyvên hewayî yê navdêr jî bêyî ti guherînan bi guhastinê wek rengdêr di hevokan de cih digirin. Bo zelalkirina cudahiya erkê wan, em ê maneyên wan yê bi inglîzî jî li gel wan bidin:

- ewr (navdêr - *cloud*) → bikaranîna wek rengdêr: Îro ewr e. (*It's a cloudy day.*)

Ev diyarde di zimannasiyê de bi navê *rengdêrkirin (adjectivization)* tê nasîn.

### 5.4. Rengdêr ji lêkeran

Lêkerên partîsîpî (rehê demên borî + -î/-yî) dikarin wek rengdêr û navdêran jî bînin bikaranîn

- ew girtî ye (girtî = rengdêr)
- yê girtî hat berdan (girtî = navdêr)

Adeten formên din yê lêkeran bi guhastinê nabin rengdêr. Lê bo nimûne peyva *saz* ya rengdêr (çêkirî, eyarkirî, tamîrkirî, dirist, likar, ava, tişt/a/ê ku baş kar dike, ne xirab, ne xirabe) bi eslê xwe lêker e, ew di farisî de rehê dema niha yê lêkera *saxten* (çêkirin, saz kirin) e lê wek peyveke serbixwe bi veguhastinê bûye rengdêr.

### 5.5. Hoker ji rengdêran

Gelek ji rengdêrên kurdî bêyî ti guherandinê, bi guhastinê dibin *hoker* (*zerf, adverb*):

- Dengê wê xweş e. (xweş = rengdêr)
- Ew xweş stranan dibêje. (xweş = hoker)
- Karê te baş bû. (baş = rengdêr)
- Te baş kar kir. (baş = hoker)

Ev diyarde di zimannasiyê de bi navê *hokerkirin* (*adverbialization*) tê nasîn.

### 5.6. Daçek ji navdêran

Gelek ji daçekên (*adposition, preposition*) kurdî yekser ji nav navdêran hatine guhastin.

- Serê wî reş e. (ser = navdêr)
- Kitêb danî ser maseyê. (ser = daçek)
- Binê xanî riziye. (bin = navdêr)
- Av ketiye bin. (bin = daçek)

Navdêrên daçekkirî dikarin li gor qeyd û bendên navdêran bi çemandin yan jî – bi piranî – neçemin:

- nava malê / gundî (nav = navdêr)
- li nav / nava gundî (nav / nava = daçek)

Ev diyarde di zimannasiyê de dikare bi navê *daçekkirin* (*prepositionalization, adpositionalization*) were nasandin.

## 6. PÊKANÎN

Pêkanîna tê maneya hevgihandina du yan zêdetir peyvên serbixwe û çêkirina peyveke pêkhatî ji wan. Maneya peyva pêkhatî dikare pêşbînîkirî be yan jî tişteki bi temamî jê cuda be yan jî tişteki di navbera wan de be.

Bo nimûne:

- pêşbînîkirî: por-zer (mirov yekser jê fehm dike ku mebest jê “por” e û rengê wî porî zer e.)
- nepayî: destpêkirin (tenê bi hînbûnê mirov dizane ku maneya wê çi ye – ji peyvên pêkhatî ne yekser diyar e – ji peyvên wiha re îdyom/biwêj tê gotin)

### 6.1. Navdêr û navdêr

Peyvên pêkhatî dikarin ji du navdêran pêk bên. Me li jor peyva *serokwezîr* daye ku ji du peyvên navdêrî (serok û wezîr) pêk hatiye. Ji heman mijarê mirov dikare peyvên wek *serokdewlet*, *serokkomar*, *serokeşîr* bide.

Di kurmancî de bi giştî peyvên pêkhatî yên du-navdêrî bi qalibê *raveber + raveker* pêk tên. Anku peyva yekem peyva bingehîn e ku peyva duyem peyva yekem şirove dike. Bo nimûne: *jimbab/jinbav* jinek e anku peyva yekem peyva bingehîn e û *bab/bav* jî tenê wê şirove dike anku diyar dike ku ew jin ya babê/bavê kesekî ye.

Ev qeydeke giştî ya formûlaya *raveber + raveker* ya peyvrêziya zimanê kurdî ye: *jina bab(ê filan kesî)*. Anku di peyvên pêkhatî de tenê girêdek (jin-a) û tewang (bab-ê) hatine avêtin û tenê *jimbab* maye.

Mirov dikare hin peyvên din jî yên malbatî yên bi vî qalibî bide:

- jinmam/jinap, pismam/kurap, dotmam/keçap...

Lê ev qeydeya giştî ne bêawarte ye. Di hin peyvên pêkhatî de peyvrêzî berevajî ye:

- *kitêb-xane* ne kitêba xaniyan e lê xaniyê kitêban e anku raveker berî raveberê ye
- *kar-geh* ne karê cihekî ye lê cihê karekî ye anku raveker berî raveberê ye
- *Kurd-istan* ne kurdên welatekî (“stanekê”) ne lê welatê (“stana”) kurdan e anku raveker berî raveberê ye
- *xwarza/xwarzî* ne xweha/xuşka zarokekî ye lê zarokê xuşkê ye anku raveker berî raveberê ye

Çend sebebên dîrokî yên vê berojavîtiyê hene:

- Beşên duyem yên van peyvan (-xane, -geh, -istan, -za) **rêzimanî bûne** (*grammaticalized*) anku êdî ne wek peyvên serbixwe lê wek paşpirtikan tên hejmartin loma em wek qeyda giştî

nabêjin *\*xanekitêb*, *\*Stankurd*. Hêjayî gotinê ye ku bi kêmî *\*(i)stan* û *\*xane* di kurmançî de wek peyvên serbixwe di zimanê rojane de ne li kar in.

- Ev dikare ji tesîra zimanên din, xaseten tesîra farisî be. Di gelek zimanên din de peyvrêziya komika navdêrî berevajî kurdî ye. Bo nimûne:
  - o kurmançî: karta telefonan
  - o tirkî: telefon kartı
  - o inglîzî: telephone card

Wek ku tê dîtîn, di van zimanan de peyvrêzî berevajî kurdî ye. Di farisî de peyvrêzî carinan wek ku rdî lê hin caran jî wek van zimanên din e. Tesîra vê carinan li ser kurmançî heye lê hê jî zêdetir li ser soranî heye. Bo nimûne, peyva kurmançî *jimbira* (jina birayî) li gor qeyda giştî ya kurdî ya raveber + raveker e. Lê hevwatera wê ya soranî tam berevajî wê ye:

- o kurmançî: jimbira (jina birayî)
- o soranî: birajin (jinbira, jina birayî)

Li gor mentîqa giştî ya peyvrêziya kurdî, “birajin” a soranî dê maneya “birayê jinê” bidaya lê di rastiyê de watera “jina birayî” dide.

Vê dawiyê gelek peyvên li gor vî qalibî hatine çêkirin wek wergerên yekser yê ji zimanên din:

- *malper* (li ber inglîzî homepage ji *home* = mal, *page* = pel, perr, rûpel)
- *serleşker*, *serfermandar* (ji tirkî *başkomutan* ji *baş* = ser, *komutan* = fermandar)
- *makezagon*<sup>34</sup> (bi maneya *qanûna bingehîn* li ber tirkî *anayasa* ji *ana* = mak, dayik, *yasa* = qanûn)

Wek ku tê dîtîn, carinan du navdêr dikarin bi alîkariya navpirtika *e* jî bigihin hev. Mirov dikare wê herwiha bo nimûne di *dest-e-bira* de jî bibîne. Navpirtikên din yê ku dikarin du navdêran bigihînin hev ev in (li gor giringiya xwe di peyvsaziya kurmançî de):

- 1) û:** karûbar, serûçav, devûlêv (rû, bi inglîzî *face*), dêûbab/dêûbav (*parents*), avûhewa (*climate*)...
- 2) bi:** karbidest, darbidest, destbikar, destbişol, xwelîser...

---

<sup>34</sup> Zagon ya li gor texmîna hinan “kurdî” di rastiyê de ji rûsî “zakon” yan zimanekî din yê slavî “zagon/zakon” e.

3) **an/a**: sera(n)ser, bera(m)ber<sup>35</sup>, şahinşah/şahînşah<sup>36</sup>...

4) **o**: serobin, taromar...

5) **aw**: rengawreng (rengîn, pirrengî), corawcor (ji pir coran/cûnan/çeştan)...

Ya yekem nimûneyek ji formûlaya *navdêr + girêder + navdêr* e. Ya duyem mîsalek ji forma *navdêr + daçek + navdêr* e. Ya sêyem mînakek ji qalibê *navdêr + pirhejmar + navdêr* e. Ya çarem varyanteke ji ya yekem e (û → o) û ya pêncem jî varyanteke ya duyem e (ji farisî *ba* → *va* → soranî *wa/aw* → kurmancî *-aw-* (tenê di herdu nimûneyên dayî de).

Adeten di kurdî de di peyvên pêkhatî de tenê du navdêr li pey hev hene. Lê zêdetir navdêr li pey hev jî mimkin in. Bo nimûne

- gulberoj (gul+ber+roj anku “gula berê wê li rojê”, bi inglîzî *sunflower*)

## 6.2. Navdêr û rengdêr

Di kurdî de di çêkirina peyvên pêkhatî de herwiha qalibê *navdêr + rengdêr* jî bi berfirehî li kar e. Adeten ji wan *rengdêrên nû tîr çêkirin*:

- ser-bilind, mêt-xas, ser-reş, kezî-zer, rû-geş...

Wek ku tê dîtin, ev peyv bi maneya we ya bingehîn *rengdêr* in. Lê ew herwiha dikarin bi hukmê guhastinê wek *navdêr* jî bîr bikaranîn:

- mêt-xas-ên kurd, kezîzer-eke swêdî...

Peyvrêziya komika “*navdêr + rengdêr*” jî wek peyvrêziya giştî ya kurdî adeten raveber berî raveker tê anku peyva serekî (bo nimûner “*ser*”) pêşî tê û peyva diyarkirina çawaniya peyva serekî (bo nimûne “*reş*”) li dûv peyva serekî ye. Dîsa ev jî ji ber wê ye ku peyva sereke di kurdî de di komikên girêdanê de jî yekem e û çawaniya wê li pey wê tê:

- serê reş (ne “*reş ser*”)

Bi hin zimanên din dîsa berevajî kurdî ye. Bo nimûne:

---

<sup>35</sup> “an” di peyva “beramber” de ji ber tesîra B bûye “-am-“

<sup>36</sup> Bi eslê xwe “şahan-şah” bû.

- kurdî: por-reş / ser\_reş
- tirkî: siyah saçlı (peyv bi peyv “reş por-î”)
- inglîzî: dark-hair-ed (“tarî-por-î”)

Di kurdî de jî di çend peyvan de peyvrêzî wek inglîzî û tirkî ye anku rengdêr berî navdêrê tê. Ev rengdêr dikevin berî navdêran:

- xweş: xweşmirov, xweşheval, xweşmêr, xweşxeber...
- têr: têrxwê, têrmû, têrşekir...
- kêr: kêrxwê, kêrşekir...
- pirr/pir: pir-rengî, piralî, pir\_kultûrî...<sup>37</sup>

Mirov peyva *bihagiran* gelek caran bi forma *giranbiha/giranbuha* ya bi qalibê rengdêr + navdêr jî dibîne. Herwiha vê dawiyê peyva *bedbext* jî ya dîsa rengdêr + navêr di kurmancî de dibîne. Ji ber ku *bed* (xirab, nebaş) ji xwe di kurdî de di zimanê de ne li kar e û wergirtineke ji farisî ye, divê formên *giranbiha* û *bedbext* jî wek neqilkirinên ji farisî bîn hejmartin. Ji xwe berevajî *bedbextê*, hevwatera *wê bextreş* li gor qeyda giştî ya navdêr + rengdêr e.

Herwiha hejmareke biçûk ya rengdêran heye ku bi alîkariya navpirtika “-e-” dikeve berî navdêran. Wiha ne rengdêr lê navdêr tîr çêkirin:

- pîrejin, pîremêr, \*pîrebûk → pîrebok → pîrevok → pîrhevok
- kurteçîrok (kurt-e-çîrok)
- kevnepêşmerge (kevn-e-pêşmerge: pêşmergeyên berê yan kesên ji mêj ve pêşmerge)

Lê çend rengdêr jî wiha hatine saz kirin:

- dûredest (dûr-e-dest: ne berdest)

### 6.3. Navdêr û hoker

---

<sup>37</sup> Herwiha hevwaterayên *wê fire-*, *heme-*, *gele-*. *Heme-* cînav e.

Me li jor diyar kiriye ku peyvên wek *têr, kêr, pir(r)* dikevin berî rengdêran. Di rastiyê de ew dikarin ne rengdêr lê hoker jî bin. Ji xwe *pir, kêr* adeten zêdetir wek hoker li kar in, tevî ku wek rengdêr jî mimkin in.

Herçi hoker in, ew peyvsaziya pêkhatinê de dikevin berî navdêran, ne pey wan.

#### 6.4. Navdêr û cînav

Peyvên pêkhatî yên bi qalibê *navdêr + cînav* di kurdî de peyda nabin. Lê yên bi qalibê *cînav + navdêr* hene. Xaseten cînavên *hev-* (û varyantên wê *hem-, him-*) û *xwe*<sup>38</sup> di pêkanîna peyvan de tîn xebitandin:

- hevkar, hember, hevpeyman, heval (yên li aliyê hev)
- xwehez

Lê bi parawêzî û marjinalî herwiha hin cînavên din jî di pêkanîna

- ezperistî (xwepersistî, li ber *egoîzmê* ku ji latînî *ego* = ez hatiye daritin)
- bêtuyî, bêtuyîtî (bê hebûna te, dûrîtiya/xerîbiya ji te)

#### 6.5. Navdêr û nîşanker

Di nav nîşankeran (*determiners*) de xaseten *her, ev, ew* dikarin li gel navdêran peyvên pêkhatî çêkin:

- herdem, hergav, hero (her roj), herkes (her kes), hertişt (her tişt)
- evqas (hinde), evro (îro)
- ewqas (hind), ewende (bi soranî, ji “ew hende” bi maneya “ewqas, hind”)

#### 6.6. Navdêr û lêker

Giringtirîn qalibê çêkirina peyvên pêkhatî di kurdî û zimanên din yê îranî de bi formûlaya *navdêr + lêker* e. Di van qaliban de navdêr neçemandî anku xwerû ye lê lêker dikare bi forma *xwe* ya *ferhengî*

---

<sup>38</sup> Li gel varyantên devokî *xo, xu, xwa, xa*.



(rader, mesder, *infinitive*), bi rehê xwe yê dema niha yan jî – kêman – bi rehê xwe yê dema borî be.

### 6.6.1. Navdêr û lêkera bi forma ferhengî

Piraniya lêkerên ku di hin zimanên din de bi peyvekê ne, di kurdî û zimanên din yên îranî de adeten bi navdêrekê û yek ji van lêkeran in (li gor mişetiya peydabûna xwe hatine rêzkirin):

- kirin
- bûn
- dan
- girtin
- ketin
- xistin

Bo nimûne:

kurmancî	soranî	inglîzî	erebî	tirkî
kar kirin	kar kirdin	work	'emele	çalışmak
nîşan dan	nîşan dan	show	'eredhe	göstermek

Wek ku tê dîtin, di kurdî (kurmancî û soranî) de, ev lêkerên bi zimanên din yekpeyvî ji peyvên pêkhatî ne. Peyvên pêkhatî yê wiha dikarin ji navdêrên xwemalî yan jî biyanî bin:

- 6) stran gotin (*stran* ji kurdî)
- 7) fehm kirin (*fehm* ji erebî)

Ji hin lêkeran hem peyveke xwerû û hem jî peyveke pêkhatî heye:

pêkhatî	xwerû
nas kirin	nasîn
şuxil kirin	şuxilîn

Carinan maneya wan hinekî ji hev cuda ye:

- xebat kirin – xebitîn

Hin caran maneya peyva xwerû û ya pêkhatî teqrîben bi tamamî ji hev dûr ketiye:<sup>39</sup>

- helîn (bo nimûne berf/befr)
- hel bûn (kêşe, pirsgirêk)

Li gor rastnivîsîna kurmancî, gava ku peyvên pêkhatî yên navdêr + lêker ji hev cuda tên nivîsîn, encama wan lêker in. Bo dîtina cudahiya maneya wan, em ê nimûneyên xwe li inglîzî û tirkî jî wergerînin:

- fehm kirin (*to understand, anlamak*)

Lê gava ku ew bi hev ve bên nivîsîn, hingê ew dibin navdêr:

- fehmkirin (*understanding, anlama/anlayış*)

Herwiha cînavê pêvekirî (-ê) jî dikare li qalibê navdêr + lêker were barkirin anku bibe *navdêr + lêker + cînav*:

- agir berdanê (agir + berdan + -ê)

Qalibê navdêr + lêker herwiha dikare bibe *navdêr + daçek + lêker*:

- temaşe-yî [televizyonê] kirin (temaşe = navdêr, -yî = daçek, kirin = lêker)

Daçek û cînav dikarin di heman demê de jî li navdêr û lêkerê bên zêdekirin anku peyva pêkhatî ji qalibê *navdêr + daçek + cînav + lêker* were saz kirin:

- dest pê kirin (dest = navdêr, pê = bi wê = daçek-cînav, kirin = lêker)
- agir vêketin (agir = nd, vê = pê = bi wê = dç cn, ketin = lk)

### **6.6.2. Navdêr û lêkera bi rehê dema niha**

Ji bilî forma ferhengî/raderî, herwiha forma dema niha di kurdî û zimanên din yên îranî de bi berfirehî bo çêkirina peyvên pêkhatî tê bikaranîn:

- gulfiroş (ji gul = navdêr û firoş = rehê dema niha ji lêkera firotin)

---

<sup>39</sup> Herdu ji heman eslê erebî ne.

- stranbêj (ji stran = navdêr û bêj = rehê dema niha ji lêkera gotin)
- welatparêz (ji welat = navdêr û parêz = rehê dema niha ji lêkera parastin)

Wiha adeten *navdêrên biker* (agent nouns) tên çêkirin anku navên pîşeyan û bikerên wan. Lê carinan navê amûr yan makîneyan yan cihê kirina tiştekî jî ji wan tê çêkirin:

- serşo (dûş, hemam) ji ser = navdêr û şo = rehê dema niha ji lêkera şûştin
- guldan (vazo, amana gul tê de ji gul = navdêr û dan = rehê dema niha ji lêkera danîn)

Lê di kurmancî de adeten paşpirtika “-k” jî li peyvên wiha tê zêdekirin gava ku mebest jê ne mirov lê amûr yan aman bin:

- guldank
- serşok

Wiha mirov dikare maneya mirovan ji ya amûran yan amana jî cuda bike:

- cilşo (kesa/ê ku cilan dişo)
- cilşok (makîneya ku cilan dişo, makîneya cilşûştinê)

Wek prensîp, hemû lêkerên gerguhêz (têperr, transitîv) yê kurdî dikarin bi rehê xwe yê dema niha bikevin dûv navdêran û peyvên pêkhatîyên bi merema pîşe\_ yan biker (kesa/ê ku tiştekî dike) çêkin. Lê çend lêkerên giştî ji bilî rehê dema niha herwiha hewceyî paşpirtika “-er” in jî daku bikarin navdêrên biker pêk bînin:

- karker (ji kar-k-er ji kar = navdêr, -k- = rehê dema niha ji lêkera kirin û -er = paşpirtik)
- peyamber (ji peyam-b-er ji peyam = nd, -b- = rehê dema niha ji birin û -er = paşpirtik)
- nander (ji nan = nd, -d- = rehê dema niha ji birin û -er = paşpirtik)
- mirovxwer (ji mirov = nd, -xw- = rehê dema niha ji birin û -er = paşpirtik)

Tarîxiyên ev “-er” ne paşpirtikek e ku dikeve pey van lêkeran lê beşek ji rehê lêkerê ye. Di kurmanciya rojhilatî û di soranî de “-e-” jî di rehê van lêkeran de maye (-ke<sup>40</sup>, -be-, -de-) û di zazakî de di rehê raweya bilanî (subjunktîv) de “-er-” bi temamî hatiye parastin (-ker-, -ber-, -der-, -wer-). Di farisî de jî “-er-” li gel lêkera *x(w)arden* (xwarin) hatiye lê “-we-” bûye “o”: -xor- (ji -xwer-).

Carinan ev “-er” bi zêdehî li rehê hin lêkerên din jî yê sazkerên peyvên pêkhatî tê siwarkirin:

<sup>40</sup> Rehê “-ke-” tenê di kurdî de hatiye parastin, ne di farisî de. Di farisî rehê dema niha yê lêkera *kerden* (kirin) –kon- e.

- “roman-nivîs-er” ku forma wê ya rasttir “romannivîs” e

Lê rehê dema niha yê gelek lêkerên gerguhêz (yên ku formên wan yên raderî/ferhengî bi –andin / -endin bi dawî tên) hevşiklên forma lêkerî ya heman lêkera gerguhêz (têneperr, intransîtîv) in:

- hejîn: rehê dema niha ji lêkera “hejandin” (bo nimûne: di-hejîn-im, na-hejîn-î, di-hejîn-e, bi-hejîn-in...)
- hejîn: hevwatera lêkera “hejandin” lê gerguhêz

Ji ber vê sebebê, bo nimûne peyva “darhejîn” dikare bi du awayan were fehmkirin:

- kesa/ê (yan tişt/a/ê) ku daran/darekê dihejîne
- hejîna daran/darekê

Bi heman awayî “bombeteqîn”

- kesa/ê (yan tişt/a/ê) ku bombeyan/bombeyekê diteqîne yan teqandine/teqandiye
- teqîna bombeyan/bombeyekê

Bo rêgirtina li ber şaşfehmkirinê, mirov dikare “-er” li van peyvan zêde bike bi merema çêkirina navdêrên biker. Wiha mirov maneyên cuda bi peyvên cuda ifade dike:

- darhejîner: kesa/ê (yan tişt/a/ê) ku daran/darekê dihejîne
- darhejîn: hejîna daran/darekê
- bombeteqîner: kesa/ê (yan tişt/a/ê) ku bombeyan/bombeyekê diteqîne
- bombeteqîn: teqîna bombeyan/bombeyekê

Wek din jî bikaranîna “-er” vê dawiyê di kurdî de çalak bûye û bi berfirehî bo çêkirina navdêrên biker tê bikaranîn. Bo vê, li beşa *darîştinê* binêrin.

Herwiha cînavên pêvekirî (yan daçek û cînavên pevheliyayî) jî dikarin bikevin navbera bikevin navbera navdêr û lêkera bi rehê dema niha:

- destpêker (ji dest = navdêr, pê = daçek-cînav, k = rehê dema niha, -er = paşpirtik)

### **6.6.3. Navdêr û lêkera rengdêrkirî**

Di kurdî de herwiha bi berfirehî navdêr li gel lêkerên rengdêrkirî jî bo pêkanîna peyvên nû tên bikaranîn. Hem lêkerên gerguhêz û hem jî yên gerguhêz dikarin vê erkê bigirin:

- hezkiî (ji hez = navdêr, kirî = lêkera gerguhêz ya rengdêrkiî)
- ziyaniêbûyî (ziyan = navdêr, bûyî gerguhêz ya rengdêrkiî)

Di nimûneya duyem de herwiha daçek-cînava “lê” (li wê/wî/wan) jî heye anku mirov dikare wê wiha rave bike:

- ziyani-lê-bûyî (ziyan = navdêr, lê = daçek-cînava, bûyî = lêkera gerguhêz ya rengdêrkiî)

#### **6.6.4. Navdêr û lêkera bi rehê dema borî**

Ji bilî forma ferhengî ya lêkeran, rehê wan yê dema niha û lêkerên rengdêr kirî (rehê dema borî + -î/-yî, wek “kir-î, bû-yî”), herwiha bi parawêzî anku marinalî rehê dema borî yê xwerû jî yê çend lêkeran bo çêkirina peyvên pêkhatî yên bi qalibê *navdêr + lêker* tên bikaranîn:

- bira-za (bira = navdêr, -za = rehê dema borî ji lêkera zan/zayîn)<sup>41</sup>
- agirperist / agirperest (agir = navdêr, perist = rehê dema borî ji lêkera peristin)

Wek din, rehê xwerû yê dema borî yê lêkeran di çêkirina peyvên bi qalibê *navdêr + lêker* ne li kar in. Formên wek *karkir*, [*bi*]rêvebir tenê varyantên xerabkiî yên peyvên *karker*, *birêveber* in.

#### **6.6.5. Lêker berî navdêran**

Adeten di peyvên pêkhatî yên ji navdêr û lêkeran wisan in ku navdêr berî lêkerê ye. Lê bi taybetî vê dawiyê hin peyv hatine çêkirin ku lêker dikeve berî navdêrî (axlebe peyva “kar”)

- firoşkar, nivîskar
- nivîsgeh
- xwandingeh / xwandegeh

Statuya “nivîsgehê” hinekî biguman e. Gelo ew ji rehê lêkerê –nivîs- yan jî ji peyva xwerû “nivîs” hatiye çêkirin? Herwiha gelo “geh” li vir navdêreke serbixwe ye yan jî tenê paşpirtik e? Lê nimûneyên me yên din, “firoşkar, nivîskar” bê guman diyar dikin ku çêkirin pêkanîna peyvên bi qalibê *lêker +*

<sup>41</sup> Di hin devokan de “birazî” ku “-zî” yaw ê kurtkirina “zayî” ye.

navdêr jî mimkin e tevî ku mirov “-kar” ya li vir ne wek navdêrekî serbixwe lê mîna paşpirtikekê jî fehm bike.

Ji nimûneya “xwandingeh / xwandegeh” yan jî varyantên wan “xwendingeh / xwendegeh” aşkera dibe ku lêker dikare ne tenê bi rehê xwe yê dema niha (di nimûneyên me de “-firoş-, -nivîs-) lê herwiha formên xwe yên din jî beşdarî vê peyvsaziyê bibe:

- xwandingeh / xwendingeh ( xwandin/xwendin = lêker bi forma raderî/ferhengî, -geh = navdêr yan paşpirtik)
- xwandegeh / xwendegeh (xwand / xwend = lêker bi forma dema borî, -e- = navpirtik anku infiks, -geh = navdêr yan paşpirtik)

### **6.7. Navdêr û hejmarnav**

Navdêr û çend hejmar jî dikarin peyvên nû pêk bînin. Bi taybetî jî hejmara “du” di van peyvên de cih digire. Endam dikare rengdêr yan jî navdêr be. Bo nimûne:

- dudil (ji du = hejmar, dil = navdêr) anku kesa/ê bêbiryar, kesa/ê ku nikare yan newêre biryara xwe li ser tiştekî bide
- ducan / dugiyan: bihemle, girane, bizarr, zarok di zikê de
- çarriyan / duriyan (çar / du + rê + yan): cihê ku du rê di ser hev re derbaz dibin anku mirov dikare bi çar aliyan ve biçê
- dupê (bo nimûne mirov), çarpê (gelek heywan), sêpê (maseya / mêzeya agir li bin hilkirî)

### **6.8. Daçek di pêkanîna peyvên de**

Daçek jî bi çend awayên ji hev cuda beşdarî pêkanîna peyvên dibin. Ew dikarin li gel cînavan, lêkeran, navdêran, rengdêran û hejmarnavan peyvên pêk tînin.

#### **6.8.1. Daçek û cînav**

Daçek û cînav hin daçek-cînavên pêkhatî çêdikin. Ji cînavan *hev* û cînavê pêvekirî –ê (wê, wî, wan) û hejmara yek bi forma xwe ya pêvekirî –êk (di kurmanciya rojhilatî û di soranî de bi maneya “hev” ya kurmanciya navendî) dikarin beşdar bibin:

- 1) jê (ji wê/wî/wan)
- 2) lê (li wê/wî/wan)
- 3) pê (bi wê/wî/wan)
- 4) tê de (di wê/wî/wan)
  
- 5) jêk (ji yek = ji hev)
- 6) pêk (bi yek = bi hev)
- 7) lêk (li yek = li hev)
- 8) têk (di yek = di hev)
- 9) vêk (varyanteke devokî ya “pêk”ê)
  
- 10) jev (ji hev)
- 11) lev (li hev)
- 12) pev (bi hev)
- 13) tev (di hev)

Mirov carinan hin peyvên pêkhatî yên ji daçek + cînav yên wek *jixwe* (ji xwe) û *bixwe* (bi xwe) jî dibîne. Lê piraniya nivîskaran wan wek *ji xwe* û xaseten *bi xwe* anku wek du peyvên serbixwe dinivîsin.

### **6.8.2. Daçek-cînav + lêker**

Daçek-cînav dikarin li gel lêkeran beşdarî sazkirina peyvan bibin.

- 14) jê kirin / jêkirin<sup>42</sup>
- 15) lê dan /
- 16) pêk anîn / pêkanîn

---

<sup>42</sup> Li gor rastnivîsîna kurmancî, formên ji hev cuda nivîsandî (jê kirin, lê dan...) lêker in, formên pêkvenîsandî (jêkirin, lêdan...) lêkerên navdêrkirî ne.

17) pev çûn / pevçûn

Ji bilî formên raderî, lêker dikarin herwiha bi rehê xwe yê dema niha (+ -er ya mihtemel) û herwiha bi forma xwe ya rengdêkirî (rehê demên borî + -î/-yî) peyvan pêk bînin:

18) jêker / jêkirî

19) lêder / lêdayî

20) pêkîner / pêkînayî

21) pevçûyî

Nimûneyên aliyê çepê (jêker, lêder, pêkîner) biker û aktîv in anku ew tiştekî dikin lê mînakên aliyê rastiyê berkirî pasîv in anku tiştek li wan hatiye kirin yan tê kirin.

Ji nimûneya dawiyê diyar dibe ku lêkerên gerneguhêz (“çûn”) tenê dikarin bibin berkirî anku a rmanc û endama kirinê, ne biker anku armançgir û encamderên kirinê. Loma forma “pevçûyî” heye lê forma “\*pevçer” peyda nabe.

### **6.8.3. Daçek + cînav + lêker**

Ji bilî daçek-cînavan (cînavên pêvekirî wek *jê, lê, pê, tê*) herwiha hin cînavên serbixwe jî dikarin bikevin navbera daçek û lêkeran:

22) li hev kirin / lihevkirin

23) ji hev veqetandin / jihevveqetandin

24) bi hev ketin / bihevketin

25) ji xwe çûn / jixweçûn (ji hal çûn)

Herwiha paşdaçek jî dikare lê were zêdekirin:

26) bi xwe ve mîstin, bi xwe ve rîtin / bixwevemîstin, bixweverîtin

### **6.8.4. Daçek + navdêr + lêker**

Daçek dikarin li gel navdêran û di heman demê de bi lêkeran re jî peyvan pêk bînin:



27) bi cih hiştin / bicihhiştin<sup>43</sup>

28) ji nav birin / jinavbirin

29) ji kar ketin / jikarketin

Adeten navdêr di peyvên wiha pêkhatî de di dema çemandina lêkeran de jî neçemandî dimînin:

30) Makîneya me ji kar ketiye (êdî kar nake, naxebite...)

31) Ew hatin jinavbirin (qirrkirin, nehiştin, birandin, qedandin, hilweşandin...)

Lê di hin biwêjan de navdêr dikare çemandî be:

32) ji holê rakirin / jiholêrakirin

#### **6.8.5. Pêşdaçek + navdêr + daçek + lêker**

Ne tenê pêşdaçek (daçekên berî peyva serekî, *preposition*) lê herwiha paşdaçek (daçekên li pey peyva serekî, *posposition*) jî beşdarî avakirina peyvên nû dibin. Paşdaçek adeten hevdem li gel pêşdaçekan li kar in:

33) bi rê ve birin (meşandin - lêker), birêvebirin (karê meşandinê – navdêr), birêveber (meşîner, kesa/ê ku tiştêkî bi rê ve dibe, dimeşîne – navdêrê biker, *agent noun*), birêveberî (karê birêveberan), birêvebirî (meşandî, hatî birêvebirin – lêkera rengdêrî, *past participle*)

Di axiftinê de û carinan di nivîsînê de jî pêşpirtik dikeve:

34) rê ve birin, rêvebirin, rêveber, rêvebirî

Pêşdaçekên bê paşdaçek jî carinan dikevin:

35) serke(f)tin (< biserke(f)tin)

Di hin gotinan de ne di zimanê devkî de û ne jî yê nivîskî de pêşdaçek nemaye:

36) berxwedan (ji \*liberxwedan ji lêkera “li ber xwe dan”, micadele kirin, tê koşîn)

---

<sup>43</sup> formên ji hev cuda nivîsandî (bi cih hiştin, ji kar ketin...) lêker in, formên pêkvenîsandî (bicihhiştin, jikarketin...) lêkerên navdêrî ne.

#### **6.8.6. Daçek-cînav + navdêr**

Adeten daçek yan daçek-cînav li gel navdêran lê bêyî lêkeran peyvan pêk naînin. Lê bi kêmi peyva nûçêkirî *jêder* (çavkanî, serekanî, bi inglîzî *source, resource*) bi qalibê *daçek-cînav + navdêr* e. Di rastiyê de ew kurtkirinek e, bo nimûne ji *jêderketin, jêderxistin, jêderhatin* –û hwd.

#### **6.8.7. Daçek + cînav + rengdêr**

Di kurdî de çend peyv hene ku ji qalibê *daçek + cînav + rengdêr* pêk hatine. Ji aliyê watenasî ve jî ew pir nêzîkî hev in:

37) jixweraî (ji + xwe + razî)

38) bixwebawer (bi + xwe + bawer)

Herwiha qalibê *navdêr + daçek-cînav-rengdêr* bi kêmi di peyvekê de peyda dibe:

39) xwedêjêrazî

#### **6.8.8. Daçek bi pey lêkeran ve**

Daçek -e (li cihê “bo, ji bo, ji re, jê re, ber bi ... ve, heta) dikare dikeve pey lêkeran. Lêker di demên cuda de be:

40) wî got → wî got-e min (ji wî min re got, wî bo min got)

41) ez dibêjim → ez dibêjim-e wî (ji wî re dibêjim, bo wî dibêjim)

42) ew hat → ew hat-e malê

Daçeka pêvekirî “e” di vê rewşê de ne zerûrî ye anku mirov dikare wiha jî bibêje:

43) wî got min

44) ez dibêjim wî

45) ew hat malê

Eger ji xwe “e” li dawiya lêkerê hebe, ew êdî nayê dubarekirin:

46) ew diçe → ew diçe malê (ne \*diçe-ye malê)

Carinan bikaranîna “e” dikare dema borî ya sade û dema borî ya dûdar bike yek:

47) dema borî ya sade: ez hatim → ez hatime malê

48) dema borî ya dûdar: ez hatime → ez hatime malê

Bo rêgirtina li ber xeletfehmkirinê, mirov dikare daçeka “e” ya nezerûrî di dema borî ya sade de bi kar neîne:

49) ez hatim malê

### **6.8.9. Daçek bi pey navdêran ve**

Daçeka –î (-yî) dikeve pey hin navdêrên beşa yekem lêkerên pêkhatî yên bi qalibê navdêr + lêker:

50) temaşe-yî televiyonê dikir

51) zar-î / zehr-î xelkê (ve) nekin

52) lêvên wê maç-î dike

Wek ku ji nimûneya yekem diyar e, ev daçek liv û hereketa ber bi tiştêkî ve diyar dike. Lê wek ku ji herdu mînakên din tê dîtîn, ev wate ne herdem berçav û zelal e.

Di hevoka yekem de “yî” dikare bi daçeka serbixwe “li” were veguhastin. Di heman demê de jinûverêzkirina peyvan di hevokê de pêwîst e:

53) li televizyonê temaşe dikir

Di hevoka duyem de daçeka pêvekirî “î” di heman demê de li gel paşdaçeka “ve” hatiye bikaranîn.

Di hin devokan de ev ne zerûrî ye anku mirov dikare wiha jî bibêje:

54) zarî xelkê nekin

Di hevoka sêyem de li gor hin devokan girêdana “maç”ê bi daçeka “î” ve zerûrî ye. Di hin devokên din de ev “î” nayê bikaranîn û mirov dibêje:

55) lêvên wê maç dike

### **6.8.10. Daçek-cînavê “ê” bi pey lêkeran ve**

Daçek-cînavê pêvekirî -ê (-yê) dikare bikeve pey lêkerên liv û hereketê:

56) got-ê (ji wê/wî/wan/wir re got)

- 57) biçim-ê (biçim wê/wî/wan/wir)
- 58) hatibûn-ê (hatin wê/wî/wan/wir)
- 59) nedin-ê (nedin wê/wî/wan/wir)

Wek ku tê dîtîn, “ê” wek cînav cihê “wê/wî/wan” digire. Lê ew herwiha dikare cihê “wir, wê derê” jî bigire:

- 60) nehatin-ê: bo nimûne 1) nehatin bûkê (= wê) 2) nehatin malê (= wê derê)

Di heman demê de “ê” daçek e jî ji ber ku liv û hereketa ber bi cihekî yan tiştêkî yan kesekî ve diyar dîke:

- 61) hat → hat-e malê → hat-ê

Mirov dikare bibêje ku “e” ya daçek bi cînava pêvekirî “ê” ve heliyaye.

Eger ji bilî “e” ya daçek, “e”-yeke din bi lêkerê ve hebe, hingê “e” di zimanê nivîskî de nahele lê “e” + “ê” dibin “-iyê”:

- 62) dibe + ê → dibiyê (dibe wir)
- 63) daye + ê → dayiyê (daye wî)
- 64) hatine + ê → hatiniyê

Lê di zimanê devkî de “e” bi “ê” ve dihele û “iyê” nayê bikaranîn:

- 65) daye + ê → dayê
- 66) hatine + ê → hatinê

Parastina “iyê” di zimanê nivîskî de giring e çunkî di zimanê devkî de du demên cuda dibin ye:

têxistin	encam bi nivîskî	encam bi devkî
da + ê	dayê	da(y)ê
daye + ê	dayiyê	da(y)ê
hatin + ê	hatinê	hatinê
hatine + ê	hatiniyê	hatinê

## 6.9. Rengdêr û rengdêr

Di kurdî de du rengdêr dikarin peyvên pêkhatî çêkin. Adeten ew du rengdêrên dijawate anku antonîm in. Ew axlebe bi alîkariya navpirtika “-û-” yan jî “-e-” bi hev ve tên girêdan:

67) reşûspî: *televizyoneke reşûspî* (ne rengîn)

68) reşûşîn: şopa lêdanê li ser leşî

69) têtûtesel

70) kevnênû: hinekî kevn, hinekê nû

### 6.10. Rengdêr û navdêr

Li jortir, di beşa *navdêr û rengdêr* de behsa peyvên bi qalibê *rengdêr + navdêr* jî hatiye kirin. Ji qenciya xwe, li wê beşê binêrin.

### 6.11. Rengdêr û lêker

Di peyvsaziya bi pêkanîna de, li gel qalibê *navdêr + lêker*, şiklê *rengdêr + lêker* girîngtirîn awayê çêkirina peyvên pêkhatî ye. Hem lêkera gerguhêz *kirin* û hem jî lêkera gerguhêz *bûn* di vê peyvsaziyê de çalak in:

71) xweş bûn

72) xweş kirin

Maneya van peyvan di zimanên din de carinan bi lêkereke xwerû û carinan jî bi qalibekî wek kurdî *rengdêr + lêker* tê ifadekirin. Bo nimûne:

kurdî	inglîzî bi lêkereke xwerû	inglîzî bi rengdêr + lêker
mezin bûn	grow	become bigger
mezin kirin	grow	make bigger

Di rastnivîsîna kurmancî, eger peyvên pêkhatî yê rengdêr + lêker ji hev cuda bînin nivîsîn, encama wan lêker e. Bo têgihiştina meremê, em ê nimûneyên xwe li inglîzî û tirkî jî wergerînin:

73) tercime kirin (to interpret, tercüme etmek)

Lê eger ew bi hev re bête nivîsîn, encam dibe navdêr (yan lêkerên navdêr):

74) tercimekirin (interpretation, tercüme etme, tercüme)

Ne tenê forma ferhengî ya lêkeran, lê herwiha rehê dema niha û forma lêkeran ya rengdêrkinê jî dikarin li gel rengdêran peyvên pêkhatî çêkin:

75) ji rehê dema niha: xweşbêj, mezinker, hînber, pirrxwer<sup>44</sup>

76) ji lêkerên rengdêrkirî (rehê dema borî + -î/-yî): xweşgotî, mezinkirî, hînbûyî

Rehê demên borî yê xwerû li gel rengdêran ne li kar e. Lêkera “-go” di peyvên wek “rastgo, bilindgo” de ne forma devokî ya rehê dema berê ya lêkera “gotin” (bi giştî “got”) ye lê forma farisî ya rehê dema niha ji lêkera “goften” (gotin) e.

Carinan mirov peyvên wek *amadebûyên / tevlîbûyên civînê* di nivîsên medyayê de dibîne. Li gor vê mentiqê, divê ev peyv di haletê girêneyayî wek *amadebû / tevlîbû* bûna anku ji rengdêr + rehê dema borî yê xwerû pêk hatibin. Lê di rastiyê de peyvên wiha çêkirî nînin, eslê wan *amadebûyî / tevlîbûyî* ne anku di dema girêneyayî de divê *amadebûyiyên / tevlîbûyiyên civînê* bûya lê ew hatine “sivikkirin”.<sup>45</sup>

## 6.12. Rengdêr û hoker

Rengdêr dikarin li gel çend hokeran jî peyvên nû pêk bînin:

77) pirçandî / pirkultûrî / pîrzimanî (pir[r] = hoker, beşên duyem jî rengdêr in)

Li cihê “pir(r)” ya kurmancî, mirov carinan “fire” jî dibîne ku bi rêya soranî ji kurdiya başûrî yan jî ji hewramî hatiye:

78) firekultûrî

## 6.13. Hoker û lêker

---

<sup>44</sup> Li gel lêkerên “birin, dan, kirin, xwarin”, rehê kevnar yê bi forma rehê dema niha ya nû + “-er” li pey rengdêran li kar in.

<sup>45</sup> Yan jî helbet dikarin wek “amadeyên civînê” hê jî siviktir bibe. Xistina kîteya “yi” ji berî kîteya “yê” ya şibî wê, di zimannasiyê de wek diyardeyeke bi navê haplolojî tê nasîn.

Peyvên nû dikarin ji girêdana hoker û lêkeran bi hev ve jî bîn pêkanîn. Ew bi qalibê *hoker + lêker* in anku hoker berî lêkerê tê. Lêker dikare bi forma *xwe* ya ferhengî, ya rehê dema niha yan jî ya rengdêrkirî be:

79) zûmeşîn (meşa bilez)

80) hêdîliv (ya/yê ku hêdîka dilive)

81) zûçûyî (ya/yê ku hê ji zû/mêj ve çûye)

#### 6.14. Nîşander û hejmarnav

Nîşander û hejmarnav jî dikarin bi hev re peyvan pêk bînin. Ji nîşanderan axlebe peyva “her” beşdar dibe:

82) heryek, herdu, hersê, herçar...

#### 6.15. Cînav û lêker

Cînav nemaze li gel lêkeran peyvan pêk tînin. Ji cînavan axlebe *xwe* yan *hev* beşdar dibin. Bo destnîşankirin guherîna maneyê bi pêkanînê, em ê nimûneyên *xwe* li inglîzî û tirkî wergerînin:

83) kuştin (kill, ölmek) > xwekuştin (suicide, intihar)

84) dîtin (see, görmek) > hev dîtin (meet, görüşmek)

Ji bilî forma *xwe* ya ferhengî, lêker dikare herwiha bi rehê dema niha yan jî ya rengdêrkirî be.

85) xwefiroş (xaîn yan bênamûs)

86) hev girtî (kesên yan hêzên ku bûne yek yan piştê hev girtiye)

#### 6.16. Lêker û lêker

Behsa beşdarbûna lêkeran di pêkanîna peyvan de li gel birrên din yê peyvan li jortir hatiye kirin. Du lêker bi hev re jî dikarin peyveke nû çêkin ku maneyeke taybet dide. Ev pêkanîna adeten bi rêya girêdana bi navpirtika “û” tê çêkirin. Ew axlebe lêkerên di jwate ne:

87) danûstandin (dan-û-standin: muamele, mizakere, têkilî...)

88) hatinûçûn (hatin-û-çûn: liv, tevger, trafik...)

89) rabûnûrûniştin (rabûn-û-rûniştin: reftar, irf û edet...)

Carinan peyva yekem ne bi forma xwe ya ferhengî lê bi rehê xwe yê dema borî tê bikaranîn:

90) hatûçûn

Heta herdu lêker jî dikarin bi rehê dema borî bin:

91) hatûçûya tirimpêlan (= trafik)

Awayê rastnivîsîna van peyvan – nivîsîna bi hev re yan ji hev cuda – hê cihê xwe negirtiye. Ew bi tamamî ji hev cuda, bi alîkariya xetika girêder û hem jî bi tamamî bi hev re jî tên dîtin:

92) hatin û çûn

93) hatin-û-çûn

94) hatinûçûn

Peyva *gotûbêj* (suhbet, hevpeyivîn) ji rehê dema borî + rehê dema niha yê heman lêkerê (gotin) hatiye çêkirin. Ew navdêr e tevî ku herdu peyvên ew jê çêbûyî rehên lêkerê ne. Heman peyv bi awayên *guftûgo* û *giftûgo* jî heye. Ev form ji farisî hatine wergirtin: *guft/gift* ji farisî *goft* (rehê demên borî ji lêkera *goften* = gotin) û *-gû-* (rehê demên niha û bîna ji heman lêkerê, hevberî *-bêj-* ya kurmancî). Ev diyarde di farisî de di çend peyvên din de jî heye, bo nimûne *xerîdfiroş* (“kîrîfiroş” anku kîrîn û firotin, “danûstandin”<sup>46</sup>) û *poxt-pez* (“pehtpêj” anku karê pehtinê, xwarinçêkirinê). Di rastiye de *gotûbêj* bi xwe jî kurmancîkirina forma *goftûgû* ya farisî ye, yekser yan jî bi rêya *witubêj/wituwêj* yên soranî yên bi heman awayî li ber modela farisî pêkhatî.

---

<sup>46</sup> Li aliyekî din, “danûstandin” jî li ber modela tirkî *alışveriş* hatiye pêkanîn.



# PEYVSAZÎ BI DARÎŞTINÊ

Di peyvsaziyê de mebest ji **darîştinê** (*derivation*) çêkirina peyvan ji peyvên xwerû/sade bi alîkariya **gireyan** (afîks, qertaf, *affix*) e.

Gireyên darîştinê dikarin **pêşpirtik** (pêşgir, pêşqertaf, pêşbendik, prefîks, *prefix*) bin ku dikevin pêşiya peyva bingehîn:

- hêvî → **bihêvî**
- hêvî → **bêhêvî**
- rehet → **nerehet**

Gireyên darîştinê herwiha dikarin **paşpirtik** (paşgir, paşqertaf, paşbendik, sufîks, *suffix*) bin ku dikevin dawiya peyva bingehîn:

- hêvî → hêvî**dar**
- rehet → rehet**î**

Pêşpirtik û paşpirtik dikarin bikevin gel peyvên serbixwe (wek “hêvî” yan “rehet” li jor) yan jî rehên neserbixwe yê lêkeran:

- -zan- → **nezan**
- -zan- → **zana**

Du paşpirtik dikarin bikevin dûv hev jî:

- birîn → birîn-**dar** → hêvî-**dar-î**

Herwiha pêşpirtik û paşpirtik dikarin di heman demê de li gel eynî peyvê peyda bibin:

- hêvî → **bê**-hêvî-**tî**
- ket → **der**-ket-**î**

Gire herwiha dikarin **navpirtik** (navgir, navqertaf, navbendik, infîks/interfîks, *infix/interfix*) bin ku dikevin nava peyva bingehîn:

- vekirî → **ven**ekirî
- veşartî → **vene**şartî

- derketî → **derneketî**

Di kurdî de tenê **-ne-** wek navpirtika peyvsaz heye lê navpirtikên çemandinê / tewandinê zêdetir in jî lê ew peyvên nû çênakin, tenê karê çemandinê dikin:

- derkevin → **derdikevin / dernakevin / dernekevin / derbikevin**

Navpirtik dikarin herwiha wek cûreyeke pêşpirtikan jî bînin hejmartin:

- ketî → **ne-ketî → der-ne-ketî**

Lê di hin peyvan de forma xwerû peyda nabe. Bo nimûne, em dizanin ku peyva *ve-şart* ji *ve-şart-in* pêk hatiye (bidin ber forma devokî *ber-şartin* û hevwateriya wê ya soranî *şardin-ewe*) lê peyva *\*şartin* wek peyveke serbixwe di kurdî de peyda nabe. Loma em neçar in ku *ve-* beşek bingehîn ji peyva *veşartin* hesab bikin. Loma gava ku em gireya *-ne-* li wê zêde dikin û dixin navbera *ve-* û *-şartin*, hingê *-ne-* bi zerûrî navpirtike, ne pêşpirtike. Lê li gel gelek peyvên din, ew dikarin wek pêşpirtika duyem bînin hejmartin:

- **wer-ne-girtin**

## CUDAHIYÊN GIREYAN JI HEV

Gire dikarin bi kêmî bi van awayan ji hev cuda bin:

- Gire dikarin li gor cihê xwe ji hev cuda bin: Hin gire dikevin berî peyva bingehîn (pêşpirtik), hin dikevin dûv peyva bingehîn (paşpirtik) û hin jî dikevin navbera du beşên peyveke pêkhatî (navpirtik).
- Gire dikarin li gor maneya xwe ji hev cuda bin: Bo nimûne, pêşpirtika “bi-” maneya hebûna tiştekî dide lê “bê-” diwateriya wê ye anku maneya nebûna tiştekî dide.
- Gire dikarin li gor “birrgiriya” xwe ji hev cuda bin: hin gire tenê li gel rengdêran li kar in, hin li gel navdêran, hin li gel lêkeran û hwd. Bo nimûne “bê-” li pêşiya navdêran li kar e (wek “bêav, bêxwê, bêkes”) lê li gel rengdêran nayê bikaranîn (ji bilî hingê gava ku rengdêr bi guhastinê hatibin navdêrkirin anku wek navdêran bînin bikaranîn).

# 1. RENG DÊRSAZÎ

Mebest ji **rengdêrkirinê** (*adjectivization*) çêkirina rengdêran (sifet, *adjective*) ji birrên din yên peyvan e. Di kurdî de rengdêr dikarin bi alîkariya gireyan ji navdêran (ism, substantîv, *noun*), lêkeran (fiil, verb), hejmarnavan (*numeral*), hokeran (zerf, *adverb*) û cînavan (zemîr, *pronoun*) bèn dariştin. Bo nimûne:

- rengdêr ji navdêran: av → avî, xwê → bêxwê
- rengdêr ji lêkeran: kuşt → kuştî, zan-în → nezan
- rengdêr ji hejmarnavan: yek → yekem
- rengdêr ji hokeran: paş → paşîn, → îro → îroyî
- rengdêr ji cînavan: xwe → xweyî, ez → ezî
- rengdêr ji rengdêran: rast → rastîn, kevn → kevnar

## 1.2. RENG DÊRKIRINA NAVDÊRAN

Navdêr dikarin hem bi alîkariya pêşpirtikan û hem jî paşpirtikan bibin. Berbelavtirîn pêşpirtikên kurdî yên rengdêrsaz (rengdêran çêdikin) *bê-* û *bi-* ne. Mişetirîn paşpirtika rengdêrsaz *-î* ye lê herwiha *-dar* û *-în* jî berbelav in. Ji bilî wan, çendîn paşpirtikên din jî dikarin navdêran bikin rengdêr.

### 1.2.1. BI PÊŞPIRTIKAN

#### **BÊ-**

- Wate: ya/yê ku tiştekan nîne, tiştekan tine ye, ji tiştekanê mehrûm e
- Hevreh: soranî, kurdiya başûrî û zazakî *bê-*, farisî *bî-*
- Hevber: inglîzî *-less*, tirkî *-siz*<sup>47</sup>, erebî *bila*<sup>48</sup>

<sup>47</sup> Di peyva *namûssiz* (bênamûs) li hin deverên derveyê Bakurê Kurdistanê de jî ketiye kurdî.

<sup>48</sup> Di peyva *bilasebeb* / *bilasebeb* (bêsebeb, bê ti sebeb) de ketiye kurdî jî.

- Nimûne: bêav, bêheval, bêhêvî, bêkes, bêmal, bêxêr

## BI-

- Wate: ya/yê ku tişteke heye, xwedî tişteki ye, tişteke pê re ye, tişteke li gel e
- Hevreh: zazakî *bi-*, soranî *be-*, kurdiya başûrî *we-*, farisî *ba-*
- Hevber: inglîzî *-ful*, tirkî *-li*, erebî *zû-*, *-î*
- Nimûne: bihêvî, bimal, bikar, bixêr, bişeref

## NE-

- Maneya “neyînî, menfî, negatîv” dide peyvê
- Hevreh: soranî, kurdiya başûrî, farisî *na-*, *ne-*
- Hevber: inglîzî *un-*, *in-*, tirkî *olmayan*, erebî *la*
- Nimûne: nemêr, nemirov, nemerde, neyar<sup>49</sup>

## PÊŞPIRTIKÊN DIN

Ji bilî bê- û bi- jî çendîn pêşpirtikên kêmtir berbelav hene ku mirov dikare navdêran pê bike rengdêr:

- berguman, berdest
- hev: hevbend, hevpar, hevxem
- dij: dijber, dijwar
- bin: binerd
- ser: sererd

Lê peyvên wiha di zimannasiyê de adeten ne wek pêşpirtik lê wek peyvên serbixwe tînin hesibandin û peyvên wiha çêkirî jî ne wek peyvên dariştî (bi pêşpirtikan yan paşpirtikan çêkirî) lê wek peyvên

---

<sup>49</sup> Di rastiyê de pêşî ev nimûne (mêr, mirov, merd, yar) bi guhastinê ji navdêran bûne rengdêr û paşî jî bûne rengdêrên dijawate.

pêkhatî (bi hev girtina du yan zêdetir peyvane peyda bûyî) tên hejmartin. Bo nimûne, peyva *hevpar* ne wek *pêşpirtik + navdêr* lê wek *cînav + navdêr* tê analîzekirin.

Di farisî de carinan *na-* dikeve berî navdêran û wisa rengdêran çêdike. Ev diyarde ji tesîra farisî carinan di soranî de jî tê dîtin. Lê ji bilî çend nimûneyên farismancî yê wek *naumêd* (bêhêvî, bêumêd), di kurmancî de bi pêşpirtikên *na-*, *ne-* mirov nikare navdêran bike rengdêr.

### Hev- - pêşpirtik yan ne?

Di kurmanciya navendî û ya nivîskî de cînavê *hev* (each other, birbirini, yekdîger, be'dha be'den) wek peyveke serbixwe heye<sup>50</sup>. Loma mirov dikare bibêje ku gotinên wek *hevkar*, *hevling*, *hevbîr* ne bi pêşpirtika *hev-* lê ji du peyvên serbixwe pêk hatiye. Lê *hev* wek peyveke serbixwe di kurmanciya rojhilatî de ne li kar e. Li cihê wê û varyantên wê *hevdu*, *hevdin*, *hevûdu*, *hevûdin* di kurmanciya rojhilatî peyvên wek *yekûdu*, *êkûdu*, *yekdu*, *êkdu* hene. Lê *hev-* dîsa jî wek pêşpirtik di kurmanciya rojhilatî de jî heye: *heval*, *hevling*, *hevrê*, *hevrik*. Di soranî de jî hevrehê *hev* ya kurmancî *haw-* e lê wek peyveke serbixwe peyda nabe. Di farisî de hevrehê *hev* ya kurmancî *hem* e ku wek *hem*, *him* di kurdî de jî cih digire. *Hem* di farisî de wek peyveke serbixwe jî li kar e lê ji hevrehê xwe ya kurmancî zêdetir maneya *jî*, *herwiha* dide.

Ji ber sebebên diyarkirî statuya paşpirtikiya *hev-* û varyantên wê *hem-*, *him-* di kurdî de ne bi temamî zelal e. Di kurmanciya rojhilatî de *hev-* û di soranî de *haw-* bê şik paşpirtik in ji ber ku ew wek peyvên serbixwe di wan lehceyan de peyda nabin. Lê di kurmanciya navendî de û di farisî de rola *hev-*, *hem-*, *him-* wek ya paşpirtikan e lê di rastiyê de ew peyvên serbixwe ne.

## 1.2.2. BI PAŞPIRTIKAN

-î

Navdêr dikarin bi çendîn paşpirtikan bibin rengdêr. Mişetirîn paşpirtika rengdêrsaz *-î*<sup>51</sup> ye:

<sup>50</sup> Di hin devokan de tenê bi formên “*hevdu*, *hevudu*, *hevdin*, *hevûdin*”.

<sup>51</sup> Heman paşpirtik di soranî û farisî û herwiha di erebî de jî rengdêran ji navdêran çêdike. Hevdema wê *-y* di inglîzî de jî navdêran ji rengdêran ava dike: *water* (av) → *watery* (avî, têrav, şil). Di kurdiya başûrî de ew adeten bi forma *-ig* e ku di pehlewî de jî wisa bû.

- Wate: ji tişteki, xelkê deverekê, têkilî, tişteki, tişteki di nav de heyî, ji tişteki çêkirî
- Hevreh: soranî û farisî -î, kurdiya başûrî -ig û -î, zazakî -î û -ij, pehlewî -eg, avestayî û hexamenişî ye-êke-

- av → avî
- evîn → evînî
- zivistan → zivistanî
- şev → şevî
- pirteqal → pirteqalî

Ev paşpirtik di erebî de jî heye û erk û wezîfeya wê jî çêkirina rengdêran ji navdêran e. Paşpirtika erebî û ya îranî têkilî hev bûne û di kurdî de êdî ne herdem diyar e ka ew ji îranî yan jî ji erebî ye. Di peyvên ji erebî wergirtî yan bi rêya erebî wergirtî de, peyva xwerû hatiye kurtkirin

- Fransa → fransî
- Îtalya → îtalî (herwiha îtalyayî)
- Almanya → almanî (herwiha almanyayî – lê ev nadir e)
- Kanada / → kanadî / kenedî (herwiha kanadayî / kenedayî)

Di peyvên ji erebî wergirtî de *-et* yan *-iyet* / *-iyat* tê avêtin gava ku *-î* lê tê zêdekirin:

- siyaset → siyas-et → siyasî
- hikûmet → hikûm-et → hikûmî
- cîmhûriyet → cîmhûr-iyet → cîmhûrî
- edebiyat → edeb-iyat → edebî

Di herdu nimûne dawiyê de di rastiyê de formên navdêr (cîmhûriyet, edebiyat) ji formên rengdêr (cîmhûrî, edebî) hatine çêkirin û formên rengdêr ji formên din yê navdêr (cîmhûr, edeb) hatine çêkirin.

## -YÎ

Eger navdêr bi vokalekê (a, e, ê, o, u, û) bi dawî bê, hingê Y dikeve navbera wê û paşpirtika Î

- çiya → çiya-y-î

- qehwe → qehwe-y-î → qehweyî
- Zaxo → zaxo-y-î → zaxoyî (têkilî Zaxoyê, girêdayî Zaxoyê)
- mû → mûyî

Eger ji xwe peyv bi Î bi dawî bê, hingê Î-yeke din lê zêde nabe:

- du+alî → dualî (ne \*dualiyî / \*dualîyî)

## **-DAR**

- Wate: ya/yê ku tiştek heye, xwedî tiştekî ye, tiştek pê re ye, tiştek li gel e
- Hevreh: soranî *-dar*, kurdiya başûrî *-dar*, farisî *-dar*, pehlewî *-dar*, hexamenişi *dare-*
- Hevber: inglîzî *-ful*, tirkî *-li*, erebî *zû-*, *-î*
- Nimûne: dikandar, deyndar, birîndar, hêvîdar

Ev paşpirtik bi eslê xwe ji rehê dema niha *-dar-* (heye) ya lêkera farisî maneya *daştan* (hebûn, xwedî bûn) ketiye kurdî û maneya wê ya bingehîn "ya/yê ku tiştek heye, xwedî tiştekî ye, tiştek pê re ye, tiştek li gel e" dide.

Ew bi eslê xwe hevwateriya pêşpirtika "bi-" ye lê di hin peyvên de ji maneya bingehîn dûr ketiye:

- guhdar (itaetker, kesa/ê ku guh dide gotinên xelkê, kesa/ê ku bi gotina xelkê dike – ne "kesa/ê ku guh hene")
- xwîndar ("kesa/ê ku dixwaze tola kuştina mirovekî xwe hilîne" – ne "kesa/ê ku xwîn heye")

Wek ku nimûneyên li jor yê wek *dikandar*, *deyndar*, *birîndar* diyar dikin, ev paşpirtik ji mêj ve di kurdî de heye. Lê ew vê dawiyê di nûpeyvên (neolojîzman) de jî pir tê bikaranîn:

- dengdar
- rayedar
- femandar
- mijdar

Di peyva "kirdar" (pratîk, kirin) de "-dar" ne ji vê "-dar"ê ye lê di rastiyê de ji soranî "kird-ar" e anku "kir-ar" lê di kurmancî de beramberî wê "kiryar" (emel, kirin, kar, herwiha "tawan, xirabî, guneh") ji zû ve li kar e.

## **-ANE**

Ev niha yek ji çalaktirîn paşpirtikên dariştinê yê kurdiya nivîskî ye. Lê ew vê dawiyê bi rêya soranî ji farisî hatiye wergirtin û ji kurmançî derbazî zazakî jî bûye. Di hemû lehceyên kurdî de ew bi forma –ane ye, di farisiya klasîk de jî –ane bû lê êdî bi farisiya tehranî bûye –anê wek ku E di peyvên din jî li dawiya peyvên di wî zimanî de bûye Ê. Bi pehlewî –aneg bû lê G ji vê paşpirtikê wek ji paşpirtikên din jî di zimanên nû yê îranî ketiye.

Ev paşpirtik xaseten hokerên demî (temporal adverbs) ji navdêrên demî çêdike lê ew bi hoker bi guhastinê (conversion) wek rengdêr jî tên bikaranîn:

- roj → rojane (her roj, her roj carekê) → rojnameya rojane
- meh → mehane (her mehê, her mehê carekê) → destheqê mehane
- sal → salane (her sal, her salê carekê) → teftîşa salane

## **-YAR, -IYAR**

Paşpirtika –yar bi eslê xwe varyanteke paşpirtika –dar e û maneya “ya/yê ku tiştek heye, ya/yê ku xwedî tiştekî ye” dide:

- hişyar (bihiş, hişmend, aqildar, aqilmend, bîaqil, kesa/ê ku aqil heye)
- bextiyar (kesa/ê ku bext û şansê baş heye)

Paşpirtika –yar herwiha li gel çend lêkeran jî li kar e û pê navdêran çêdike (li jêrtir binêrin).

## **-ÎN**

Hevreha wê di soranî de jî –în e, di farisî –gîn, bi pehlewî –gên. Di soranî û zazakî de ew herwiha bi forma –in (ne –în) jî heye. Ew çendîn navdêran dike rengdêr, xaseten madenan:

- zêr(r) → zêr(r)în



- zîv → zîvîn

Gelek carinan forma bi *-în* tenê varyanteke forma bi *-î* ye:

- bingehîn – bingehî
- agirîn – agirî

Carinan forma bi *-în* tek alternatîve:

- şermîn
- rengîn
- zengîn

Lê hin caran maneya forma bi *-în* ji ya bi *-î* cuda ye:

- şîrîn: têrşekir, ne tehl
- şîrî: ji şîr(î) çêbûyî / hatî çêkirin

## **-GÎN**

Ev paşpirtik ji farisî hatiye wergirtin û di farisî de hevrehê *-în* ya kurdî ye (li jortir binêrin). Ev paşpirtik di çend peyvên de heye:

- xemgîn
- lezgîn
- mizgîn

Ji bilî van peyvên, wisa diyar e ku di kurdî de peyvên din yê bi paşpirtika *-gîn* peyda nabin. Peyvên wek *rengîn*, *zengîn*, *bengîn* ne bi paşpirtika *-gîn* in lê ji *reng-în*, *zeng-în*, *beng-în* in.

## **-WÎ, -EWÎ, -AWÎ**

Ev paşpirtik bi forma xwe ya *-wî* ji erebî hatiye wergirtin lê êdî li hin peyvên kurdî jî tê barkirin. Di kurdî de ew li gel çend peyvên rengdêran ji navdêran saz dibe û bi yek ji van her sê formên xwe berpê

dibe. Bi piranî maneyeke negatîv û neyînî dide û maneya wê ji ya "-yî" tengtir û taybettir e anku ew ne hemû maneya xwe ya peyva bingehîn dide:

- **bawî** (romatîzmî) – bidin ber "bayî" (her tiştê têkilî "ba")
- **kîmyawî**<sup>52</sup>
- **rêwî**<sup>53</sup>
- **jehrewî**
- **xwînawî**<sup>54</sup>

Lê eger vokala dawiyê Ê, herfa kelijandinê dikare –W be:

- **rê** → **rêwî**

Eger herfa dawiyê Î be û –Wî bikeve pey wê, Î dikare bibe E:

- **Elî** → **elewî**

Herwiha –A ya dawiyê jî dikare bibe E yan jî wek xwe bimîne:

- **Îsa** → **îsawî / îsewî** (file, xiristiyan, mesîhî)
- **Mûsa** → **mûsawî / mûsewî** (cihû, yehûdî)

## **-OK, -OKE**

Paşpirtika –ok berbelav e lê kêr rengdêr pê ji navdêran tên çêirin, ew jî zêdetir bi forma –oke ne:

- **şerok, şeroke**

## **-EKE, -EKÎ**

Ev paşpirtik nadir e, pê tenê ev peyva berbelav tê çêkirin:

- **sereke, serekî** (bi inglîzî *main*)

---

<sup>52</sup> Peyva *kîmyawî* bi taybetî bi maneya *çekên kîmyayî* di kurdî de li kar e. Ew herwiha bi forma xwe *kîmyasal* e. Paşpirtika –sal/ -sel bi/ji tirkî ye.

<sup>53</sup> "Rêwî" bi eslê xwe maneya "têkilî rê, aîdî rê" dide lê niha êdî zêdetir wek navdêr bi maneya "kesa/ê bi rê ve" (rêving, misafir, *passenger*) li kar e.

<sup>54</sup> Herwiha bi forma "xwînewî" jî tê dîtin.

## **-NAK**

Vê dawiyê bi rêya soranî yan jî yekser ji farisî hatiye wergirtin, di wan de jî bi heman forma –nak e.

Çend rengdêrên negatîv/neyînî jê tên çêkirin:

- xeternak
- tirsnak
- xemnak

## **-BAR**

“Bar” wek peyveke serbixwe û watedar heye. Lê hin hene ku –bar li dawiya wan e û mirov bi temamî nikare bibêje ka ew bi rastî ji “bar” ya bi maneya “tiştên hilgirtinê/rakirin”ê ye yan jî paşpirtikeke serbixwe ye. Ev –bar di kurdiya nivîskî ya nû de pir li gel lêkeran (rehê niha) li kar e (li beşa “Rengdêrkirina lêkeran” binêrin). Di rengdêrkirina navdêran de ew nadir e:

- xembar (xemgîn)

Ihtimalen ev ji peyva “bar” ya bi wateya “tiştên hilgirtinê/rakirin”ê hatiye çêkirin bi armanca “kesa/ê ku barê xeman hildigire, kesa/ê ku xem li ser wê/wî bar in” yan wek baran giran in.

## **1.2. RENGDÊRKIRINA LÊKERAN**

Di kurdî de rengdêr dikarin li ser her sê rehên demên niha û bîn (R1), demên borî (R2) û forma ferhengî yên lêkeran (fiil, *verb*) bîn çêkirin. Di çêkirina rengdêran ji lêkeran hem pêşpirtik û hem jî paşpirtik dikarin bîn bikaranîn.

### **1.2.1. RENGDÊR JI R2**

Di kurdî de rengdêrên ji lêkeran xaseten li ser rehê demên borî tên çêkirin. Di çêkirina rengdêran ji rehê demên borî de bi gelemperî paşpirtika –î li kar e (hevreha zazakî “-e”, farisî “-e / -ê”, pehlewî “-

eg”, avestayî û hexamenişî “e-ke”). Di çend nimûneyan de “-e” ya bi eslê xwe ji farisî li kar e. Hem lêkerên gerguhêz (transîtîv) û hem jî yêrn gerguhêz (intransîtîv) wiha dibin rengdêr.

- girt+î → girtî (gerguhêz)
- keland+î → kelandî (gerguhêz)
- hat+î → hatî (gerneguhêz)

Eger rehê dema borî bi vokalekê bi dawî were, hingê paşpirtik **-yî** ye:

- bû → bûyî
- ma → mayî
- çû → çûyî
- jiya → jiyayî

Eger rehê demên borî yê lêkerê bi -î bi dawî bibe, hingê rengdêr li ser bingehê forma dirêjtir ya rehê demên borî (“-iya” li cihê “-î”) tê avakirin

- vegerr-î / veger-*iya* → veger-*iya*-yî (ne \*vegeriyî)
- ken-î / ken-*iya* → ken-*iya*-yî (ne \*keniyî)

Adeten rengdêr ji lêkera “anîn” bi rehê wê yê demên borî “anî” nayê çêkirin. Lê rengdêr dikare ji forma wê ya kurmanciya rojhilatî “îna” (rehê demên borî “-îna-”) yan jî ji forma wê ya soranî “hênan” (-hêna-) bê avakirin:

- înayî
- hênayî

Herwiha lêkerên pêkhatî jî bi heman awayî dibin rengdêr:

- amade bû → amadebûyî
- hez kir → hezkirî
- dest pê kir → destpêkirî

Hêjayî bibîranînê ye ku hemû beşên rengdêrên wiha çêkirî bi hev ve tên nivîsîn

- hezkirî (ne \*hez kirî)
- destpêkirî (ne \*dest pê kirî)

Wek prensîp, hemû lêkerên kurdî dikarin wiha bibin rengdêr.

## PAŞPIRTIKA –E

Di çend peyvên de li cihê “-î”, paşpirtika “-e” heye:

- bijare, bijarte, bijarde
- xwende, xwande

Ev paşpirtik bi eslê xwe ji farisî ye û hevrehê “-î” ya kurmancî ye. Di farisiya klasîk de ew bi forma “-e” lê di farisiya niha ya tehranî de bûye “-ê”. Lê van çend peyvên wiha di kurdî de hin maneyên taybet û tengtir ji maneya hevrehên xwe yê kurdî yê bi wateyên giştî wergirtiye û çêtir e ku ev peyv wek xwe bî bikaranîn û neyên “kurdîkirin”.

## NEYÎNÎKIRINA RENG DÊRÊN JI R2

Rengdêrên ji rehê demên borî yê lêkeran çêkirî bi pêşpirtika “ne-” dikarin bî neyînîkirin anku negatîvkirin:

- çûyî → neçûyî
- gotî → negotî

Eger lêker pêkhatî be, “ne-” di zimanê nivîskî de yekser dikeve gel beşa lêkera bingehîn:

- hezkirî → hez nekirî
- jikarketî → jikar neketî

Hin caran di axiftinê de û kêman caran di nivîsinê de jî “ne-” dikeve destpêka hemû peyva pêkhatî:

- nehezkirî
- nejikarketî

## MANEYA RENG DÊRÊN JI R2

Rengdêrên ji R2 (rehê demên borî) yê lêkerên gîrgehêz (intransîtîv) aktîv e û diyar dike ku kesekî bi xwe tiştek kiriye yan tiştek bûye:

- çûyî (bi xwe çû)
- mayî (bi xwe ma)

Ev rengdêr diyar dikin ku di demên borî de tiştêk bûye lê encama wê dikare bigihe dema niha jî:

- mayî (berî niha biryara manê da lê niha jî hê li vir e)
- amadebûyî (hat lê belkî niha jî hê li vir e)

Rengdêrên li ser R2 yên lêkerên gerguhêz avakirî tebatî anku pasîv in. Ne wan bi xwe tiştêk kiriye lê tiştêk li wan hatiye kirin. Ew dikarin behsa demên borî bikin lê dikarin behsa niha jî bikin:

- kuştî (hatiye kuştin – kiryar di demên borî de bûye û êdî nayê kirin)
- hezkirî (hatiye hezkirin yan jî tê hezkirin – kiryar di demên borî de bûye lê dikare di dema niha de jî be yan jî di herdu deman de)

## 1.2.2. RENG DÊR JI R1

Di kurdî de rengdêr dikarin herwiha ji R1 (rehê demên niha û bîn) yên lêkeran jî bîn çêkirin. Berevajî çêkirina rengdêran ji rehê demên borî yên lêkeran (R2), li gel R1 çendîn paşpirtikên ji hev cuda li kar in:

### **PÊŞPIRTIKA BI-**

Ev pêşpirtik di çêkirina rengdêr an navdêran ji rehê demên niha û bîn yên lêkeran de kêmdîtî ye û tenê çend peyvên ava dike:

- bi+wêr-în → biwêr (wêrek, bisteh, bicuret, bicesaret)

Ew herwiha hin navdêran ji R1 ava dike, wek: bikuj (kujer, qatil, mirovkuj) û bikirr (kirryar, xerîdar, mişterî) – bo van li beşa navdêrsaziyê binêrin.

### **PÊŞPIRTIKA NE-**

Ev pêşpirtik rengdêrên neyînî çêdike lê di pratîkê de di avakirina rengdêran ji R1 de pîrr nadir e:

- nemir

- nezan

Di soranî û farisî de di vî haletî de zêdetir paşpirtika *na-* li kar e, ne wek kurmancî *ne-*:

- farisî: nadan (nezan)

### **PAŞPIRTIKA -A / -E**

Paşpirtika “-a” nadir e anku tenê çend peyv li ser R1 jê tên çêkirin:

- zan-a (kesa/ê ku pîrr dizane)
- bez-a (kesa/ê ku bo bezînê zîrek e)
- rew-a (biheq, legîtîm, mafdar)
- reh-a (rizgar, azad, filitî, serbest)
- dar-a (kesa/ê ku tiştêk heye, zengîn e, maldar û hwd.)
- tiwan-a, kar-a (bişiyar, bitaqet, kesa/ê ku dikare / dişê tiştan bike, jêhatî)

Ji van peyvan tenê “zana” di kurmancî de berbelav e. “Beza” kêr li kar e, “dara, rew, reha, tiwana” bi rêya soranî ji farisî hatine wergirtin û di farisî de ew ji “dar-, rew-, reh-, tiwan-“ hatine çêkirin ku rehê van lêkeran in: “daştên” (hebûn, xwedî bûn), “reften” (çûn, meşîn), “ristên” (filitîn, revîn, xwe xilas kirin), “tiwanisten” (karîn, şiyar, taqet hebûn). Peyva “kara” ya nadir jî wergera yekser ji “tiwana” ya farisî / soranî ye.

Peyva “zana” di hin devokan de sivik bûye û bûye “zane”. Heman pêşpirtika “-a” peyva “xwenda / xwende” ji rehê demên borî yê lêkera “xwendin / xwandin” çêdike.

### **PAŞPIRTIKA -EK**

Paşpirtika –ek çend rengdêran ji R1 yê lêkerên gerguhêz (transîtîv) ava dike:

- -wêr- (wêrîn, wêriyan) → wêr-ek
- -kuj- (kuştin) → kuj-ek

Lê hevkarîya R1 û paşpirtika –ek nadir e û tenê di hejmareke pirr kêr ya peyvan de tê dîtin.

### **PAŞPIRTIKA -OK**

Paşpirtika –ok li gel rehê demên niha û bîna yê lêkerên gernerguhêz (intransîtîv) dikare rengdêran çêke. Ev diyarde bi piranî çalak û berhemdar e anku peydabûna qalibê R1 (gernerguhêz) + -ok têra xwe berbelav e û peyvên nû jî dikarin li ser wî bingehê bîna sazkin:

- -gerr- (gerrîn) → gerrok
- -rev- (revîn) → revok
- -hej- (hejîn) → hejok
- -hejhej- (hejhejîn) → hejhejok
- -recif- (reficîn) → recifok
- -leriz- (lerizîn) → lerizok
- -biriq- (biriqîn) → biriqok
- -tirs- (tirsîn) → tirsok

### **PAŞPIRTIKA -ONEK**

Paşpirtika –onek varyanteke paşpirtika –ok e û li gel du-sê R1 yê lêkerên gernerguhêz rengdêran çêdike:

- -tirs- (tirsîn) → tirsonek
- -bizd- (bizdîn) → bizdonek

Wek ku ji nimûneyên me (tirsonek, bizdonek) jî dixuye, ev paşpirtik bi awayekî negatîv û heqaretî tê bikaranîn. Bikaranîna –onek di kurdî de gelekî bisinor e û wisa diyar e ku tenê ev peyv bi vî awayî ne.

### **PAŞPIRTIKA –INDE, -ENDE**



Ev paşpirtik di farisî de bi forma *-ende / -endê* bi berfirehî li kar e, di pehlewî de jî wek *-endeg* hebû. Bi heman awayî di zimanên ewropî de jî paşpirtika *-ent, -ant* roleke wek vê paşpirtikê heye, bo nimûne inglîzî *student* (xwandekar, ya/yê ku dixwîne) û *assistant* (alîkar, ya/yê ku alîkariyê dike/dide). Ev paşpirtik bi dengê xwe yê fransî wek *-an* ketiye kurdî jî: *asîstan, faşîzan*.

Di kurdî de ev paşpirtik di çend peyvan de peyda dibe û bi zelalî vê dawiyê bi rêya soranî ji farisî ketiye kurmançî. Ew dikare rehê demên niha û bîna yê hem lêkerên gerguhêz û hem jî yê gerguhêz bigire:

- firrinde (ya/yê ku difirre → teyr)
- bexşinde (ya/yê ku dibexşe, efûker, dilovan, dilnerm, birehm)
- dirrinde (ya/yê ku didirrîne, hov, wehşî)
- mayinde (ya/yê ku dimîne, ya/yê ku naguhere yan naqede)<sup>55</sup>

## PAŞPIRTIKA -BAR

Paşpirtika *-bar* li gel rehê demên niha û bîna (R1) yê lêkerên gerguhêz dikare rengdêran çêke. Paşpirtika *-bar* li gel navdêran û hin tiştên din jî li kar e û di wan e maneya “bar, li bin barê” dide, bo nimûne *xembar, gumabar*. Lê bi R1 yê lêkerên gerguhêz ve ew di kurdî de nû ye û bi piranî tenê aidî zimanê nivîskî ye. Texmînen Celadet Bedirxan ew ji almanî neqil kiriye kurdî. Di almanî de jî ew dikeve pey rehê lêkeran û maneya “ya/yê ku dikare bibe tiştêk” yan “ya/yê ku dikare tiştêk lê bê kirin” dide. Di inglîzî de hevbera wê *-able* yan *-ing* e.

Tevî ku ev qalibê R1 + *-bar* di kurdî de nû ye jî lê di zimanê nivîskî de hatiye çalakkirin û bi rêjeyî pir tê bikaranîn:

- guherbar (ya/yê ku diguhere yan dikare biguhere): *rewşa guherbar*
- mirbar (ya/yê ku dimire yan dê bimire, ne nemir, be ebedî): *mirov mirbar in*
- şkêbar (ya/yê ku bi hêsanî dişkê, dikare bişkê): *amanên şkêbar*
- xwer-bar<sup>56</sup> (tiştên ku tên xwarinê yan dikarin bîna xwarinê, tiştên bo xwarinê bikêrhatî): *nebatên xwerbar*

<sup>55</sup> Li ser rehê demên borî (-ma-) yê lêkera “man” hatiye avakirin, ne li ser rehê demên niha û bîna (-mîn-). Bo nimûneyekê ji bikaranîna vê peyvê, binêrin:

<http://www.dergush.com/modules.php?name=News&file=article&sid=4149>

<sup>56</sup> Peyva “xwer” bar li ser R1 yê kevnar (-xwer-) yê lêkera “xwarin” hatiye avakirin, ne li ser R1 yê niha li kar (-xw-).

Peyvên *dîtbar* (bi inglîzî *visual*) û bihîstbar (*audial, audio-*) li ser rehê demên borî (R2) hatine avakirin.

Formên wan yên li ser R1 çêkirî jî hene:

- bînbar
- bihîzbar

### **“PAŞPIRTIKA” -BER**

“Paşpirtika” –ber wek di peyvên wek *dilber, peyamber/pêxember, nameber* de yan jî di peyvên wek *nûber, pîrber, mezinber* yên nûçêkirî de di rastiyê de bi maneya teng ne paşpirtikek e. Di nimûneyên pêşîn de ew R1 yê kevnar ji lêkera *birin* e:

- peyamber (ya/yê ku peyamekê dibe)
- dilber (ya/yê ku dilê mirovî dibe, dilê mirovî jê distîne)

Di nûpeyvên wek *nûber, mezinber, kevnber* de ew ji rehê lêkera *bûnê* –b- ye û paşpirtika –er ya bikersaz (avakera navdêrên biker, bi inglîzî *agent noun*) e.

### **PAŞPIRTIKA -ER**

Paşpirtika –er vê dawiyê pir bo çêkirina navdêrên biker (agent noun – *bo çêkirina wan û herwiha etîmolojiya vê paşpirtikê ya pîrr-rehî li jêrtir li beşa Navdêrsazî binêrin*) tê bikaranîn. Lê di heman demê de gelek ji wan peyvan wek rengdêr jî li kar in. Paşpirtika –er dikeve gel rehê demên niha û bên yên lêkerên gerguhêz:

- -kuj- (kuştin) → kujer: *jehra kujer* (jehra ku dibe sebaba mirina kesan an heywanan yan nebatan)
- -recifîn- (recifandin) → recifîner: *taya recifîner* (taya ku mirovî direcifîne)
- -cemidîn- (cemidandin) → cemidîner: *ava cemidîner*
- -şewitîn- (şewitandin) → şewitîner: *agirê şewitîner*
- -soj- / -sojîn- (sotin / sojandin) → sojer: *agirê sojer / sojîner*

Bi taybetî li gel lêkerên bi paşpirtika *-andin / -andin*, paşpirtika *-er* çalak û berhemder e. Li gel gelek lêkerên din jî yê gerguhêz dikare bê bikaranîn lê bi hinan re ne mimkin e:

- *-gir-* (girtin) → \*girer (bi maneya “ya/yê ku tiştêkî” digire lê ti gotineke wiha di kurdî de peyda nabe).

Gava ku lêker bi berkara (biresera, *object*) xwe vet ê girêdan, hingê tenê rehê lêkerê li kar e, *-er* lê nayê zêdekirin:

- “jehra kujer” lê “jehra mirovkuj”
- “agirê sojer” lê “agirê leşsoj”

### 1.2.3. RENG DÊR JI FORMÊN FERHENGÎ YÊN LÊKERAN

Rengdêr ne tenê li ser rehên demên niha û bî (R1) û rehên demên borî (R2) lê li ser forma ferhengî ya lêkeran jî dikarin bî çêkirin. Mebest ji forma ew şiklê lêkeran e ku di ferhengan de wek peyvên serekî tên dîtin û li gor deman û kesan nehatine çemandin anku tewandin. Di kurmancî de ew ji R2 + *-n* yan R2 + *-in* pêk tên:

- çû-n, ma-n, vegerî-n...
- hat-in, keland-in, bir-in...

Di kurmancî, soranî û farisî de paşpirtika *-î* dikare bikeve pey hin lêkerên wiha û rengdêrên bi maneya “têkilî filan karî/kirinê” jê çêke:

- çandin (ziraet, bi inglîzî *to cultivate, agriculture*) → çandinî (ziraî, *agricultural*)

- ragihandin (medya, pres, çapemenî) → ragihandinî<sup>57</sup>

Wek prensîp ev awayê çêkirina rengdêran dikare çalak û berhemder be lê di pratîkê de heta niha di kurdî de kêm hatiye bikaranîn.

Di heman demê de, di hin devokan de û carinan di zimanê nivîskî de jî “çandinî” ne wek rengdêr (ziraî, *agricultural*) lê wek navdêr bi maneya “ziraet” (*agriculture*) tê bikaranîn.<sup>58</sup>

Wek ku ji peyva wergera li vir ya peyva “çandinî”ê diyar e (ziraet, *agriculture*), ew peyv li vir ne wek lêker lê bi guhastinê (*li pêştir li beşa Guhastin binêrin*) wek navdêr (ism, *noun*) hatiye bikaranîn. Anku di rastiye de ev qalib ne çêkirina rengdêran ji lêkeran lê çêkirina rengdêran ji navdêran e.

Çêkirina rengdêran ji formên ferhengî yên lêkeran di kurdî de bi rêjeyî tiştêkî nû ye û heta niha kêman hatiye bikaranîn lê hêdî-hêdî ber bi zêdebûnê ve ye. Li şûna vê bikaranîn, bikaranîna qalibê xwedîtîyê zêdetir serdest e:

- berhemên çandinê (li cihê “berhemên çandinî” ya nû)
- dezgehên ragihandinê (li cihê “dezgehên ragihandinî” ya nû)

### 1.3. RENG DÊRKIRINA HEJMARNAVAN

Hejmarnav anku navên hejmaran (*numeral*) bi çend paşpirtikên ji hev cuda ji hejmarên sade yan bingehîn (*cardinal*) dibin hejmarên rêzî (*ordinal*). Di heman demê de ev hejmarên rêzî dibin rengdêr jî.

#### PAŞPIRTIKÊN –EM Û –EMÎN

Ev paşpirtik di kurmanciya nivîskî de hejmarên bingehî dikin hejmarên rêzî:

- yek → yekem(în)
- deh → dehem(în)
- sed → sedem(în)

<sup>57</sup> Bikaranîna heman peyvên wek rengdêr di komika “propagandayên ragihandinî” de <http://rudaw.net/kurmanci/kurdistan/3105201514> û wek navdêr: <http://argun.org/2009/02/18/ragihandini-bi-revebiriya-amatori-pes-nakeve-gabar-ciyan/>

<sup>58</sup> Nimûneyek ji bikaranîna peyva “çandinî” wek navdêr: <http://ku.hawarnews.com/li-kobane-candini-te-kirin/> û mînakê jî ji bikaranîna heman peyvê wek rengdêr: <http://www.kurdistantv.tv/kurk/Kurdistan/Berhem%C3%AAand%C3%A7and%C3%AE-li-Kurdistan%C3%AA-z%C3%AAde-b%C3%BBne>

Eger hejmara bingehîn bi vokalekê bi dawî bê, hingê Y-yek dikeve navbera wê û paşpirtikê:

- du-y-em(în)
- sê-y-em(în)

Peyva “duyem” herwiha varyantên wek “duwem(în), diwem(în), duhem(în)” jî hene.

Wek prensîp formên bi “-em” hejmarên rêzî yê li cihê navdêran in û formên bi “-emîn” jî li şiklên wan yê rengdêrî ne. Lê di pratîkê de herdu form wek hev wate û hevwezîfe tî bikaranîn.

Bikranîna paşpirtika –em(în) di kurmançî de niha belav e lê tarîxiyên ew nû ye. Ew vê dawiyê ji soranî yan jî bi rêya soranî ji farisî hatiye wergirtin. Di soranî ew jî wek kurmançî –em(în) û di farisî de jî bi forma “-om(în)” li kar e. Herwiha bidin ber fransî –*ième* û latînî –*imus* yê heverk (hevwezîfe).

### PAŞPIRTIKA –AN

Di kurmançiya navendî de bo çêkirina hejmarên rêzî tarîxiyên paşpirtika –an (kurtkirî –a) hatiye bikaranîn û niha jî çalak e tevî ku di zimanê nivîskî de êdî li cihê wê gelek caran –em(în) ya li jor behskirî tê xebitandin.

- roja çara(n) = roja çarem(în)
- cara sisiya(n) / diduya(n) = cara sêyem(în)
- sala 2015an

Wek ku ji nimûneyan dawiyê diyar dibe, hejmara salan jî wisa tê diyarkirin wek ku rengdêr be, berevajî hin zimanên din, bo nimûne inglîzî *the year 2015* (ne *2015th*) an tirkî *2015 yılı* (ne *2015:nci yılı*).

### PAŞPIRTIKA –Î

Hejmarên sade herwiha bi alîkariya paşpirtika –î dibin hejmarên rêzî û di heman demê de rengdêr jî. Ev forma hejmarên rêzî li gel navê mehan tê bikaranîn:

- yekî gulanê (roja karkerên cîhanê)
- bîstûyekî adarê (roja newrozê)
- 16î tebaxê (roja damezrandina Partiya Demokrat a Kurdistanê)

Wek din ev forma hejmarên rêzî ne li kar e, bo nimûne mirov li cihê "yê çarem/çaran" nikare bibêje "\*yê çarî".

## PAŞPIRTIKA –Ê

Di kurmanciya rojhilatî hejmarên rêzî û hejmarên rengdêrkirî bi paşpirtika –ê tên çêkirin:

- cara yekê / êkê (cara yekem)
- roja çarê (roja çarem, roja çaran)

Anku "ê" di kurmanciya rojhilatî de cihê "-em" ya soranî û kurmanciya nivîskî û herwiha "-an" ya kurmanciya navendî ya rengdêrsaz digire. Lê di kurmanciya rojhilatî de heman "ê" dikare herwiha rola "-î" ya kurmanciya navendî ya rengdêrsaza ji hejmaran jî bigire:

- yekê gulanê = yekî gulanê
- bîstûyekê adarê = bîstûyekî adarê

Lê di kurmanciya rojhilatî de forma "-î" li kar e:

- pazdeyî tebaxê (roja damezrandina Partiya Karkerên Kurdistanê), ne "\*pazdeyê tebaxê"

## 1.4. RENGDEŔKIRINA HOKERAN

Hoker jî dikarin bi alîkariya çend paşpirtikan bibin rengdêr. Di kurmancî de hokerên cihî xaseten bi paşpirtika –în dibin rengdêr:

- jêr → jêrîn
- jor → jorîn
- paş → paşîn
- pêş → pêşîn

Herwiha varyanta bi paşpirtika –î jî heye:

- jêr → jêrî (wek "kurmanciya jêrî")
- jor → jorî (bo nimûne "kurdiya jorî" anku kurmancî)

Lê forma bi-î di heman demê de wek navdêr jî li kar e:

- pêş → pêşî (pêşiya wan)

Hokerên demî adeten bi-î yan -în dibin rengdêr. Eger hoker bi vokalekê bi dawî were, hingê Y dikeve navbera wê û paşpirtika -î:

- îro → îroyî / îroyîn

## 1.5. ÇÊKIRINA RENGDÊRAN JI RENGDÊRAN

Rengdêr ne tenê ji birrên din yên peyvan (navdêr, lêker, hoker) çêdibin lê dikarin herwiha ji rengdêran bi xwe jî bîn avakirin. Sazkirina rengdêrên nû ji yên heyî hem bi alîkariya pêşpirtikan û hem jî paşpirtikan mimkin e.

### 1.5.1. RENGDÊR JI RENGDÊRAN BI PÊŞPIRTIKAN

Di kurmancî de mirov dikare bi pêşpirtika ne- rengdêrên dijawate ji rengdêrên heyî çêke:

- baş → nebaş (xirab)

- xweş → nexweş (êşewî, bîvêr, xeste, nesax, bîmar, merîz, ne saxlem, biêş, elemdar)
- nas → nenas
- rehet → nerehet

Berevajî kurmancî, di soranî û farisî de bi piranî paşpirtika “na-“ di vê rewşê de tê bikaranîn, ne wek kurmancî “ne-“. Li gel peyva “xoş” (xweş) di soranî de maneya peyva bi na- ji ya bi ne- cuda ye:

- naxoş (ne xweş, ne bi dilê mirovî)
- nexoş (nexweş, xeste, bîvêr, biêş)

## 1.5.2. RENG DÊR JI RENG DÊRAN BI PÊŞPIRTIKAN

Çend rengdêrên nû bi alîkariya paşpirtikan ji rengdêrên heyî peyda dibin. Hin caran maneya peyvan eynî ye, carinan jî piçekê ji hev cuda ye, hin caran jî yên ji hev cuda jî di pratîkê de gelek caran li şûna hev tên bikaranîn. Li vê derê em ê bo zelalkirina wan maneyên wan yên ji hev cuda bi inglîzî bidin. Ev nayê wê maneyê ku ev tek wateyên wan in:

- rast (right) → rastîn<sup>59</sup> (real, true, actual)
- rast → rasteqîn<sup>60</sup> / rasteqîne<sup>61</sup> (real, true, actual)
- kevn (old) → kevnar / kevnare (antique, ancient)
- nû (new) → nûjen (modern)
- pîroz (holy) → pîrozwer<sup>62</sup> (sacred)

Ti ji van paşpirtikan di çêkirina rengdêran ji rengdêran ne berdare anku gelek rengdêr pê ji rengdêran nayên çêkirin. Di rastiyê de ev paşpirtik di çêkirina rengdêran ji rengdêran de yekane ne anku tenê li gel peyvekê peyda dibin. Bo nimûne, paşpirtika “-eqîn / -eqîne” tenê di peyva “rasteqîn

<sup>59</sup> Tarîxiyên “rasteqîn” ihtimalen ji “rast+yeqîn” anku “rast-bawer” e lê niha ne bi wê maneyê li kar e. Forma “rasteqîne” ji “rast+yeqîn+e” ye. Nimûneyek ji bikaranîna peyva “rastîn”:

<http://zinarexamo.blogspot.fi/2009/06/dewleta-tirk-ruye-xwe-ye-rastin-nisani.html>

<sup>60</sup> Nimûneyek ji bikaranîna peyva “rasteqîn”:

<http://www.diclehaber.com/news/content/view/431970?from=3708794062>

<sup>61</sup> Nimûneyek ji bikaranîna peyva “rasteqîne”: <http://www.feminkurd.net/content.php?newsid=1474>

<sup>62</sup> Nimûneyek ji bikaranîna peyva “pîrozwer”: <http://www.yuksekovahaber.com/yazi/gula-pirozwer-2-2410.htm>



/rasteqîne” de heye. Paşpirtika “-în” ji bilî “rast → rastîn” herwiha wek prensîp di “nerm → nermîn” de jî heye. Lê “nermîn” di pratîkê de wek rengdêr nayê bikaranîn. Ew tenê wek navê jinan Nermîn li kar e lê hingê ew ne rengdêr lê navdêr e.

Tek paşpirtikên piçekê berdar di çêkirina rengdêran ji rengdêran de “-ok” û “-ik” yên biçûkkirinê (diminutîv) in:

- hûr → hûrik
- biçûk → biçkok

Herdu paşpirtik dikarin di li gel hev jî bên bikaranîn anku dubare diminutîv bin:

- hûr → hûrik → hûrkok

Tarîxiyên peyva “biçkok” jî diminutîva dubare ye “biç-k-ok” lê forma “\*biç” wek peyveke serbixwe (êdî) peyda nabe.

## 2. NAVDÊRSAZÎ

Di kurdî de navdêr dikarin bi dariştinê ji rengdêran û hokeran û ji navdêrên heyî bên çêkirin. Bi marjinalî herwiha navdêr dikarin ji hejmarnavan, cînavan û daçekan jî bên dariştin. Dariştina navdêran di kurdî de tenê bi paşpirtikan mimkin e anku mirov nikare bi pêşpirtikan navdêran darêje.<sup>63</sup>

### 2.1. ÇÊKIRINA NAVDÊRAN JI RENGDÊRAN

Wek prensîp, hemû rengdêrên kurdî dikarin bi yek yan çend paşpirtikan bibin navdêr. Di pratîkê de jî çêkirina navdêran ji rengdêran di kurdî de diyardeyê berbelav û çalak e. Paşpirtika herî biber

---

<sup>63</sup> Helbet rengdêrên bi pêşpirtikan dariştî jî dikarin bi *guhastinê* wek navdêr bên bikaranîn lê hingê mesele ne dariştina navdêran e. Bo guhastinê li beşa yekem ya vê vekolîna li ser Peyvsaziyê binêrin (Kovara Kanîzar, hejmar 1).

anku produktîv di çêkirina navdêran ji rengdêran de *-î* ye.<sup>64</sup> Wek prensîp, hemû rengdêr dikarin bi *-î* bibin navdêr. Lê di pratîkê de hejmareke paşpirtikên din jî heye ku her yek ji wan li gel hin rengdêran tê bikaranîn bo çêkirina navdêran.

### PAŞPIRTIKA *-î*

Ev paşpirtik ji bilî kurmancî di lehceyên din yê kurdî de jî heye. Ew herwiha di farisî û hin zimanên din jî yê îranî de bi heman awayî ye. Di pehlewî û partî de ew bi awayê *-îh* bû, di avestayî û hexamenişî de *-ye-vehye-*.<sup>65</sup>

Wek prensîp ev paşpirtik dikare her rengdêrî bike navdêr:

- rast → rastî
- pak → pakî
- pîs → pîsî
- hejar → hejarî

Rengdêrên bingeh dikarin xwemalî yan jî biyanî bin:

- feqîr → feqîrî (ji erebî)
- şaş → şaşî (ji tirkî)
- dilawer → dilawerî (ji farisî)
- gernas → gernasî (ji ermenî)
- notir → notirî (ji fransî)

Ne tenê rengdêrên ji peyvên sade (ne pêkhatî) lê herwiha rengdêrên pêkhatî yan dariştî jî dikarin dikarin bi *-î* bibin navdêr:

- ser-firaz → serfirazî
- birîn-dar → birîndarî
- bê-kes → bêkesî

---

<sup>64</sup> Paşpirtika *-î* di heman demê de bibertirîn paşpirtika çêkirina rengdêran ji navdêran e jî (li beşa 1. Rengdêrsazî binêrin). Niha ew herdu paşpirtik hevdeng in lê tarîxîyên ew ne hevreh in anku ne herdem wek hev bûne û ne ji eynî rehî ne. Bo etîmolojîyên wan yê ji hev cuda, li beşên nivîsarê yê li ser wan binêrin.

<sup>65</sup> Di inglîzî de jî paşpirtika *-y* (bixwîne: *-î*) heman erk heye (honest = rastgo → honesty, modest = nefsbîçûk → modesty = nefsbîçûkî) lê tarîxîyên ew ne hevreh *-î* ya kurdî ye. Ya inglîzî bi rêya *-ia* ya latînî ji *-ia* ya yûnanî ye.

Lê di çêkirina navdêran ji rengdêran de di kurdî de çendîn paşpirtikên din jî hene. Hin ji wan wek alternatîvên paşpirtika –î ne lê bi hin rengdêran re ew ji –î zêdetir li kar in. Carinan heta –î li gel wan peyvên pirr nadir e yan heta mirov dikare bibêje nayê bikaranîn jî. Li jêr em ê hewl bidin paşpirtikên din yê ku li navdêran ji rengdêran saz dikin li gor berdariya wan (çend biber in anku mişe ne) rêz bikin.

### **PAŞPIRTIKÊN –YÎ Û –HÎ**

Eger rengdêr bi vokalekê bi dawî were, hingê li cihê paşpirtika –î, paşpirtika –hî yan jî –yî dikare were bikaranîn:

- amade (hazir) → amadehî / amadeyî (hazirî)

Ev herdu paşpirtik jî bi eslê xwe ji paşpirtika –î ne, tenê bo rêgirtina du vokalan li pey hev, Y yan jî H dikeve navbera wan. Lê gelek caran jî ne –hî / –yî lê paşpirtika –tî dikeve pey vokala rehî (li jêrtir binêrin).

### **PAŞPIRTIKA –AHÎ / –AYÎ**

Paşpirtika –ahî di hin devokên kurmançî de û herwiha di soranî bi awayê –ayî peyda dibe. Ew paşpirtikeke îranî ye û di pehlewî de jî bi forma –ay hebû lê di farisiya niha de peyda nabe. Ev paşpirtik di kurdî de li gel çend rengdêrên kevnar li kar e bo navdêrkirina wan:

- bilind → bilindahî / bilindayî
- dûr → dûrahî / dûrayî
- kûr → kûrahî / kûrayî
- mezin → mezinahî
- ron → ronahî

Paşpirtika –ahî / –ayî êdî di kurdî de ne çalak e anku mirov nikare navdêrên nû ji hin rengdêrên din jî çêke. Tenê hejmareke bisinor ya rengdêran vê paşpirtikê bi kar tîne û mirov nikare ji bilî wan vê paşpirtikê bide gel hin rengdêrên din. Lê mirov dikare li cihê vê paşpirtikê carinan yek yan çend paşpirtikên din yê navdêrsaz bi kar bîne:

- ron → ronî

- bilind → bilindî
- mezin → mezinatî / mezintî / mezinî

Bi taybetî jî gava ku ev rengdêr beşek ji peyveke pêkhatî bin, hingê paşpirtika –î ya giştî tê tercîhkirin:

- ser-bilind → serbilindî (ne \*serbilindahî)

### **PAŞPIRTIKÊN -TÎ, -ÎTÎ, -ATÎ, -YATÎ, -AYETÎ, -YETÎ, -ETÎ, -ITÎ**

Tarîxiyên ev hemû eynî paşpirtik in. Ew ji du rehên cuda peyda bûne. Î-ya dawîya wan hevrehî –î ya kurdî-îranî ye ku me li jor behs kiriye. T û herfên din yê berî wê ji paşpirtika –ye(t) ya erebî ne. Anku di van paşpirtikan de du reh gihiştine hev û paşpirtikek (bi çend varyantan) jê peyda bûye.

Paşpirtika –îtî di kurmanciya navendî de xaseten li gel hin rengdêrên kurdî tê bikaranîn bo çêkirina navdêran:

- şaş → şaşîtî
- hov → hovîtî

Li cihê van, herwiha varyantên bi paşpirtika –î jî mimkin in: *şaşî*.

Varyanta –tî xaseten hingê li kar e gava ku rengdêrê bingeh bi vokalekê bi dawî tê:

- zana / zane → zanatî / zanetî
- bajarî → bajarîtî
- mişe → mişetî

Paşpirtika –atî hin caran wek varyanteke paşpirtika –ahî / -ayî (li jortir binêrin) tê gotin:

- mezinahî / mezinatî
- dûrahî / dûratî

Lê ne herdem:

- ronahî / \*ronatî<sup>66</sup>

<sup>66</sup> Stêrka \* li berî peyvê diyar dike ku ew form peyda nabe yan şaş e.

Varyantên -ayetî, -yetî, -etî, -itî zêdetir di çêkirina hin navdêran ji hin navdêrên heyî de cih digire – li jêrtir binêrin.

### PAŞPIRTIKA -ANÎ

Bi paşpirtika –anî di du-sê peyvên navdêr tîr çêkirin:

- dost → dostanî
- mêr → mêranî
- xort → xortanî

Bi eslê xwe "dost" û "mêr" ne rengdêr lê navdêr in. Lê ew herwiha wek rengdêr jî li kar in, xaseten *mêr* bi maneya *wêrek*, *bicesaret*, *bicuret*. Loma mirov dikare bibêje ku –anî jî paşpirtikeke çêkirina navdêran ji rengdêran e. Lê mirov dikare herwiha wê wek paşpirtikeke çêkirina navdêran ji navdêran jî bihesibîne. Lê çawa be jî, ew paşpirtikeke nadir û kêmpêyda ye. Herwiha bide ber –înî ya çêkirina navdêran ji navdêran li jêrtir.

### PAŞPIRTIKA –VAN

Di nûpeyva (neolojîzma) *çalakvan*<sup>67</sup> de paşpirtika –van bo çêkirina navdêrekî ji rengdêrekî hatiye bikaranîn. Ew hevwateriya peyva navneteweyî *aktîvîst* e. *Çalakvan* li ber modela inglîzî *activist* hatiye çêkirin ku ew jî ji rengdêr *active* (çalak, aktîv) û paşpirtika –ist hatiye avakirin.

Ti nimûneyên din yê çêkirina navdêran ji rengdêran bi rêya paşpirtika –van peyda nabin.

## 2.2. ÇÊKIRINA NAVDÊRAN JI HOKERAN

---

<sup>67</sup> Nimûneyek ji bikaranîna peyva *çalakvan*: <https://www.rojavanews.com/kurdish/index.php/kurdistan/item/2272-rojava-news>

Çend hokerên (*adverb*) cihê di kurdî de bi dariştinê dibin navdêr. Di dariştina wan de paşpirtika **-îtê** bikaranîn:

- paş → paşî: *paşiya tirimpêlê*
- pêş → pêşî: *pêşiya malê*
- ber → berî: *beriya xwe nedidît*
- daw → dawî: *dawiya çîrokê*
- jor → jorî: *joriya gundî*
- jêr → jêrî: *jêriya çiyayî*
- der → derî: *deriyê xanî*

Ev formên dariştî bi xwe di heman demê de wek hoker jî li kar in. Ew carinan wek rengdêr jî tên bikaranîn lê wek rengêr formên bi **-în** (*paşîn, pêşîn, dawîn, jêrîn, jorîn...*) zêdetir serdest in.

Ji bilî paşpirtika **-î**, herwiha çend peyvên bi paşpirtika **-ahî(k) / -ayî(k)** jî hene, bi taybetî di kurmanciya rojhilatî de:

- ber → berahî(k) (pêşî): *berahiya xwe nedidît*
- \*dûm (dûv) → dûmahî(k) (dawî, xilasî): *dûmahiya çîrokê*
- pêş → pêşahî

## 2.3. ÇÊKIRINA NAVDÊRAN JI LÊKERAN

Lêker dikarin bi rehê xwe yê dema niha, bi rehê demên borî û herwiha bi forma ferhengî (rader, mesder, infinitîv) bi dariştinê bibin navdêr. Dariştina navdêran ji lêkeran bi piranî bi alîkariya paşpirtikan çêdibe lê herwiha pêşpirtika bi- jî hin peyvên wiha saz dike.

### 2.3.1. Ji rehê dema niha

Rehê dema niha piraniya lêkerên gerguhêz (transitîv) û hin lêkerên gerneguhêz (intransitîv) dikare bo çêkirina navdêran were bikaranîn. Bi piranî peyvên wiha çêkirî dibin navdêrên biker (*agent nouns*) anku kesên yan aletên ku tiştêkî dikin. Bo nimûne:

- bêjer (ya/yê ku tiştêkî dibêje, spîker) ji bêj-er (-bêj- rehê dema niha yê lêkera “gotin” e)
- gerrok (ya/ê ku digere, aware, derbider) ji gerr-ok (-gerr- rehê dema niha yê lêkera “gerrîn” e)
- wêr-ek (ya/yê ku diwêre, bicesaret, cesûr) ji wêr-ek (-wêr- rehê dema niha yê lêkera “wêrîn” e)
- bikuj (qatil, mirovkuj, ya/yê ku kesekî yan heywanekî dikuje) ji bi-kuj (-kuj- rehê dema niha yê lêkera “kuştin” e)

### PAŞPIRTIKA –ER

Paşpirtika –er bo çêkirina navdêrên biker ji rehê dema niha yê lêkeran vê dawiyê di kurdî (xaseten kurmançî û soranî) de pirr çalak bûye. Tarîxiyên ev diyardeyeke nû ye û têkilkirina çend paşpirtikên xwemalî û biyanî ye:

–er di paşpirtikên kevnar yê xwe malî de –ker (wek “karker”), –ber (wek “pêxember, peyamber”) û “-der” (wek “avder = ya/yê ku avê dide kesekî yan tiştêkî”) de heye. Lê di rastiyê de ev her sê paşpirtik rehê dema niha yê lêkerên “kirin, birin, dan” bûn û –er tarîxiyên di wan de ne paşpirtik bû lê beşeke wan ya bingehîn bû. Lê di kurmançiya navendî de “–er” ji rehê van lêkeran ketiye û tenê –d-, –k-, –b- mane (di-d-im, na-d-î, di-k-im, na-k-î, di-b-im, na-b-î). Di kurmançiya rojhilatî de û herwiha di soranî de –E- maye lê ji wan jî R ketiye (bi kurmançiya rojhilatî: -di-de-m, na-de-y, di-ke-m, na-ke-y, di-be-m, na-be-y).

Lê di çêkirina bikerên ji *navdêr/rengdêr + rehê dema niha* de van peyvên “kirin, dan, birin” (û hewiha “xwarin”) rehê xwe yê dema niha yê kevnar parastiye:

- kar-k-er, peyam-b-er, av-d-er, nan-xw-er (ne \*kark, \*peyamb, \*avd, \*nanxw) lê bide ber “stran-bêj, av-rêj, mirov-kuj...” (ne \*stran-bêj-er, \*av-rêj-er, \*mirov-kuj-er...)

Ev paşpirtik herwiha li gel rehê dema niha yê lêkera “anîn” (bi devokî “hanîn, înan, hîna n, înadîn, hînadîn”) anku –în- (bi soranî “-hên-” ji “hênan”) jî tê bikaranîn tevî ku tarîxiyên di wî rehî de –er ne beşeke bingehîn ji wî rehî ye:

- der-în-er / der-hên-er
- bi-kar-în-er / bi-kar-hên-er

Heman paşpirtika –er di inglîzî û hin zimanên din yê ewropî de jî navdêrên biker çêdike. Bo nimûne:

- kill (kuştin, -kuj-) → killer (kuj-er, bikuj, qatil)
- sing (strîn, stran gotin) → singer (stranbêj)

Di tirkî de jî paşpirtika –er heye û bi maneyeke nêzîkî lê ne tam wekî inglîzî heye. Di rastiyê de peyva kurmancî *koçer* ji tirkiya kevn *köçer* e ku bi tirkiya niha bûye *göçer* û maneya “koçker, barker” dide.

Paşpirtika –er ya niha bi çalakî li rehê dema niha yê lêkeran tê barkirin û pê navdêrên biker tên çêkirin, dikare wek encama hevghandina van her sê rehên îranî, inglîzî û tirkî bîn dîtin.

Bergeha bikaranîna vê paşpirtika –er li gel rehê dema niha yê lêkerên gerguhêz wek prensîp bêsinor e tevî ku gelek ji van peyvan heta niha kêm hatine bikaranîn yan qet nehatine bikaranîn jî lê bikaranîna wan mimkin e:

- avêj-er (< avêtin)
- bêj-er (< gotin)
- çemîn-er (< çemandin)
- dirrîn-er (< dirrandin)
- hejîn-er (< hejandin)
- jenîn-er (< jenandin)
- kelîn-er (< kelandin)
- livîn-er (< livandin)
- mirin-er (< mirandin)
- nivîs-er (< nivîsîn)
- perçiqîn-er (< perçiqînandin)
- revîn-er (< revandin)
- sekinîn-er (< selixandin)
- şidîner (< şidandin)
- tewizîn-er (tewizandin)
- zivirîn-er (< zivirandin)

Lê –er li gel lêkerên gerguhêz nayê bikaranîn. Bo nimûne, bikaranîna van peyvan di kurmancî de ne li kar e û nikare bê bikaranîn jî:

- \*ç-er (< çûn)
- \*gerr-er (< gerrîn)
- \*rev-er (< revîn)



- \*sekin-er (< sekinîn)

### PAŞPIRTIKA -OK

Paşpirtika –ok rehê dema niha yê lêkerên gerneguhêz (intransîtîv) dike navdêrên biker (yên ku tiştêkî dikin):

- rev-ok (< rev-în)
- gerr-ok (< gerr-în)
- hej-ok (< hej-în)
- kenok (< ken-în)

Lê hin lêkerên gerneguhêz yê sade nikarin wiha bibin navdêrên biker û peyvên wiha di kurdî de peyda nabin:

- \*ç-ok (< ç-ûn) anku “ya/yê ku diçe”<sup>68</sup>
- \*ê-y-ok /hê-y-ok (< hatin)

### PAŞPIRTIKA –KAR

Paşpirtika –kar li gel rehê dema niha yê çend lêkeran navdêrên biker çêdike:

- nivîskar (nivîsevan, nivîser, edîb)
- ajokar<sup>69</sup> (ajovan, şofêr)

### PAŞPIRTIKA –VAN

Çend nûpeyv bi paşpirtika –(e)van li gel rehê dema niha hatine çêkirin:

- parêz-van<sup>70</sup> (parêzer, parêzgar, mihafiz)
- nivîs-e-van<sup>71</sup> (nivîskar, edîb, kitêbnivîs)

<sup>68</sup> Helbest “çok” (bi inglîzî *knee*) wek beşeke ji lingî di kurdî de heye lê ne ji lêkera “çûn” e û maneya “ya/yê ku diçe” jî nade.

<sup>69</sup> Nimûneyeke ji bikaranîna peyva “ajokar”: <http://www.trtnuce.com/haber/jiyan/ajokare-tankere-re-li-ber-bobelate-girt-24239.html>

<sup>70</sup> Nimûneyek ji bikaranîna peyva “parêzvan”: <http://www.yeniozgurpolitika.org/index.php?rupel=nuce&id=39331>

<sup>71</sup> Nimûneyek ji bikaranîna peyva “nivîsevan” bi wateya “nivîskar, edîb”: <http://www.saradistribution.com/qedexeWejeZiman.htm>

- ajo-van<sup>72</sup> (ajokar, şofêr)

Paşpirtika –(e)van herwiha li gel rehê demên borî jî hin peyvan çêdike (li jêrtir binêrin).

### **PAŞPIRTIKA –GAR**

Paşpirtika –gar peyva *parêzgar* ji rehê dema niha –parêz- yê lêkera “parastin” çêkiriye.

Paşpirtika –gar herwiha di peyva *rizgar* de ye. Ew wek rehê dema niha ji lêkera “risten” (revîn, filitîn, xwe xilas kirin, xwe rizgar kirin) ya farisî dixuye lê di rastiye de rehê wê lêkerê bi farisî –reh- e. Di rastiye de *rizgar* forma sivikîrî ji *ristgar* ya farisî ye ku ji rehê dema niha –rist- + -gar peyda bûye. Bo guherîne -STG- bi –ZG- bidin ber *dest+geh* → *dezgeh*.

### **PÊŞPIRTIKA BI-**

Pêşpirtika bi- çend navdêrên biker ji rehê dema niha yê çend lêkeran çêdike:

- bikuj (< -kuj-, kuştin) anku “qatil, kujer, ya/yê ku kesekî dikuje yan kesek kuştiye)
- bikirr (< -kirr-, kirrîn) anku “kirrya, mişterî, bayî, ya/yê ku tiştekî dikirre yan tiştek kirriye)
- bi-k-er (< -k- < -ker-, kirin) anku “fail, aktor, kesa/ê ku tiştekî dike yan tiştek kiriye)

Bikaranîna vê pêşpirtikê li gel rehê dema niha yê lêkeran bo çêkirina navdêrên biker diyardeyek nadir û neçalak e.

### **PAŞPIRTIKA -YAR**

Bi kêmî peyva *kirryar* ji rehê dema niha yê lêkera *kirr-în* û paşpirtika –yar pêk hatiye. Wek din bikaranîna vê paşpirtikê li gel rehê dema niha yê lêkeran bo çêkirina navdêrên biker diyardeyek nadir û neçalak e.

<sup>72</sup> Nimûneyek ji bikaranîna peyva “ajovan”: <http://www.peyamner.com/Kurdi/PNAnews.aspx?ID=301512>

### 2.3.2. Ji rehê demên borî

Hejmareke kê m ya navdêran ji rehê demên borî + paşpirtikekê dibin navdêr. Paşpirtikên li kar lê -ar, -er, -ok, -ox, -(e)van in lê ti ji wan ne zêde çalak in. Hema-hema di nav gel de li gel rehê demên borî ne li kar in jî û çend peyvên bi wan çêkirî jî zêdetir nûpeyv anku neolojîzm in, vê dawiyê di zimanê nivîskî de hatine çêkirin. Belkî tek awarte û istisna peyva *mirar* ya berbelav û gelêrî ye.

#### PAŞPIRTIKA -AR

Çend rehê demên borî yê lêkeran bi alîkariya paşpirtika -ar dibin navdêr:

- got → gotar
- kuşt → kuştar (qetliam, qeleço, komkujî)
- mir → mirar

Ji bilî van rehê di kurdî de heyî, herwiha peyva “reftar” (tevger, miamele, *behavior/behavior*) heye ku ji lêkera farisî “reft-en” hatiye çêkirin. Ev peyv ne di kurdî de hatiye çêkirin lê yekser ji farisî hatiye neqilkirin. Wek din jî peyvên wiha – ji bilî “mirar” – di kurdî de (bi kê mî di kurmancî de) nû ne û tenê aidî zimanê nivîskî ne.

Peyva *nivîsar* (meqale, *article*) ji rehê dema niha yê lêkera “nivîsîn” (-nivîs-) û paşpirtika -ar hatiye çêkirin. Cudahiya vê peyvê ji peyvên wek “got-ar, reft-ar, kuşt-ar” ew e ku “nivîsar” ne li ser rehê demên borî ya peyva “nivîsîn” (-nivîsî-) lê li ser rehê dema niha (-nivîs-) hatiye avakirin.

Herwiha peyva “mir-ar” jî wek prensîp dikare ji rehê dema niha yan jî ji rehê demên borî be ji ber ku di kurmancî de herdu reh “-mir-” (ew di-mir-e, ew mir). Lê gava ku mirov li hevrehên wê di zaravayên

din yê kurdî û zimanên din yê îranî de dinêre, mirov dibîne ku ew bi rastî ne li ser rehê dema niha lê li ser rehê demên borî ye. Di soranî, farişî û gelek ziman û zaravayên din de ew bi şiklê “mirdar, mordar, murdar...” e anku D di wan de heye. Ev D tenê di rehê demên borî de di van ziman û zaravayan de heye, ne di rehê dema niha de. Lê ji ber ku D ji kurmançî ketiye, mirov dikare bibêje ku “mirar” ji rehê dema niha yan jî ji rehê demên borî ye lê tarîxiyên ew bêguman ji rehê demên borî ye.

Peyva “nivîsar” nûpeyveke (*neologism*, peyveke nûçêkirî) û mirov dikare wê tenê wek istisna bibîne û bibêje ku paşpirtika –ar ji bilî wê navdêran ji rehê dema niha yê lêkeran pêk naîne.

### **PAŞPIRTIKA –OK**

Di nav gel de û di zimanê nivîskî de jî paşpirtika –ok li gel rehê dema niha li kar e (li jortir binêrin). Lê –ok bi rehê demên borî re di nav gel de peyda nabe. Çend hewlên peyvsazî bo çêkirina hin peyvan ji rehê demên borî + -ok hatine dan lê bi ser neketine:

- bihîst-ok (telefon yan berguhk)

### **PAŞPIRTIKA -OX**

Paşpirtika –ox li gel rehê demên borî di zazakî de hin peyvan çêdike:

- wendox (xwandevean), vatox (bêjer), rotox (firoşer, firoşkar)<sup>73</sup>...

Ne diyar e ka çend ji peyvên wiha di zazakî de bi rastî bi çalakî di nav xelkê de li kar in û çend jî tenê çêkiryên rêzimannivîsan in.

Di kurmançî de jî hewl hatiye ku ev paşpirtik bê nasandin û aktîvkin. Li gor Amed Tîgrîs “ajotox, çêkirox, firotax, gotox, kirox, kuştax, şîretkirox, vegirtax... Ji zaravayê dimilî derbasî kurmançî bûye. Mirov him di kovara Hawar û him jî di berhemên Cigerxwîn de rastî vê parkîtê tê. Li herêma Licê kurmançî di axaftina xwe ya rojane de bi kar tînin.”<sup>74</sup>

<sup>73</sup> <http://www.kirmancki.com/index.php/dersen-kirmancki/item/148-k-rmancca-da-yap-m-ekleri-qertafen-virastene>

<sup>74</sup> [https://ku.wikibooks.org/wiki/P%C3%AA%C5%9Fk%C3%AET\\_%C3%BB\\_Park%C3%AET: 2. Park%C3%AET\\_\(nuqtaya\\_110\)](https://ku.wikibooks.org/wiki/P%C3%AA%C5%9Fk%C3%AET_%C3%BB_Park%C3%AET: 2. Park%C3%AET_(nuqtaya_110)).

Ji nimûneyên zazakî jî û yê kurmancî jî diyar dibe ku ew li gel rehê demên borî yê lêkerên gerguhêz li kar e. Ne diyar e ka ew dikare herwiha bi lêkerên gerguhêz re jî bê bikaranîn yan na. Lê heta niha ev paşpirtik di pratîkê de di kurmanciya nivîskî de pir kêr hatîye bikaranîn û di nav gel de jî li piraniya beşên Kurdistanê nenas e.

Ji aliyê etîmolojî ve ev paşpirtik dikare ji ermenî be. Lê li aliyekî din, di belûçî – ku zimanekî îranî – de jî peyda dibe. Loma mimkin e ku ew paşpirtikeke îranî be û mimkin e ku hevrehê paşpirtika –ok ya kurmancî be.

### **PAŞPIRTIKA -YAR**

Di peyvên *kiryar* (emel, *deed*) û *biryar* (qerar, *decision*) de rehê lêkerên “kirin, birin” û paşpirtika “-yar” hene. Di peyva “kiryar” de –kir- rehê dema niha ji lêkera “kirin” e lê di peyva “biryar / birryar” de –birr- wek rehê dema niha ji lêkera “birrîn” dixuye. Di rastiyê de “biryar” ji “birrî+ar” e anku anku ew jî ji rehê dema borî ya lêkera “birrîn” (birrî) ye.

### **PAŞPIRTIKA -ER**

Wek ku li jor hat behskirin, paşpirtika –er li gel rehê dema niha yê lêkerên gerguhêz çalak e yan hatîye çalakkirin. Li gel rehê demên borî ew adeten ne li kar e.

Lê nûpeyva *bûyer* (rûdan, rûdaw, miqeder, qewimîn) de –er- li gel rehê dema borî yê lêkera “bûn” hatîye xebitandin: *bû-y-er* (Y herfa kelijandinê ye, tenê bo rêgirtina li ber hevghiştina du vokalan hatîye bikaranîn).

Peyva “bûyer” bi çend awayan ji peyvên bi rehê dema niha + -er cuda ye:

- ew ji rehê demên borî hatîye çêkirin (peyvên din ji rehê dema niha)
- ew ji lêkerekê gerguhêz hatîye dariştin (peyvên din ji lêkerên gerguhêz)
- ew maneya “ya/yê ku tiştêkî dike” nade anku ne navdêrek biker e (peyvên din navdêrên biker in anku tiştêkî dikin)

### **PAŞPIRTIKA –VAN**

Li jortir me behs kiriye ku paşpirtika –*van* hin peyvan ji rehê dema niha çêdike. Lê di peyva *xwand-e-van / xwend-e-van* de ew vê peyvê ji rehê demên borî yê lêkera “*xwandin / xwendin*” çêkiriye. Navpirtika –*e*- bo sivikkirina *xwandinê* ye daku sê konsonant ND+V nekevin pey hev.

Peyva *xwandevan / xwendevan* di kurmançî de berbelav e lê wek din dijwar e ku mirov peyvên ji rehê demên borî û paşpirtika –*van* çêkirî peyda bike. Hin caran peyva *ajotvan*<sup>75</sup> (şofêr, ajokar) dibîne ku ji rehê demên borî yê lêkera “*ajot-in*” + “*-van*” hatiye çêkirin. Lê wek ku li jor hatiye diyarkirin, peyva “*ajovan*” jî heye ku ji rehê dema niha ye.

### PAŞPIRTIKA –*WAR*

Di peyva *xwandewar / xwendewar* (kesa/ê ku dizane bixwîne) de navdêrê biker ji rehê demên borî –*xwand-* / –*xwend-* yê lêkera *xwandin / xwendin* + paşpirtika –*war* hatiye çêkirin. Navpirtika –*e*- bo sivikkirina *xwandinê* ye daku sê konsonant ND+V nekevin pey hev.

## 2.3.2. Ji forma ferhengî

Lêkerên bi forma ferhengî (rader, mesder, infinitîv) dikarin bi paşpirtika –î bibin navdêr:

- çandin (*to cultivate*) → çandinî (ziraet, *agriculture*)

Lê gelek caran lêker bêyî zêdekirina paşpirtikan bi guhastinê (*li beşa yekem ya vê vekolînê binêrin*) dibin navdêr jî:

- çandin (*to cultivate*) → çandin (ziraet, *agriculture*)

Li aliyekî din, formên bi –î dikarin wek rengdêr jî bên bikaranîn:

- çandin (*to cultivate; agriculture*) → çandinî (*agricultural*)

---

<sup>75</sup> Bo nimûne li vê derê: <http://www.trtnuce.com/haber/turkiye/ajotvan-di-bin-tirimbela-xwe-de-ma-7202.html>

## 2.4. ÇÊKIRINA NAVDÊRAN JI HEJMARAN

Çend hejmar dikarin bi çend paşpirtikên ji hev cuda bibin navdêr. Ev paşpirtik di çêkirina navdêran ji hejmaran de li kar in lê ti ji wan ne pir biber in: *-e, -ik, -îtî, -yîtî*

**Paşpirtika –e** maneyan deman (rojan yan salan) dide hejmaran:

- hefte (heft roj)
- çile (40 roj)

Ji bilî van herdu nimûneyên kevnar, paşpirtika “-e” di hin peyvên nûçêkirî yan ji farisî wergirtî de paşpirtika –e ne maneya “roj”ê lê wateya “sal”ê dide:

- dehe (dehsal, *decade*)
- sede (sedsal, *century*)
- hezare (hezarsal, *millenium*)

Ev peyvên bi maneya “sal” di kurmancî de kêm tîr bikaranîn, li cihê wan peyvên pêkhatî (hejmarek + sal) di zimanê nivîskî de li kar in: *dehsal, sedsal, hezarsal* lê formên *dehe, sede, hezare* jî carinan tîr dîtin, bi taybetî di bin tesîra soranî yan farisî de.

Di peyva *yeke (unit)* de paşpirtika –e maneya demê nade lê wateya komekê dide. Ev peyv jî zêdetir di soraniya nivîskî de li kar e. Di kurmancî de li cihê wê di zimanê nivîskî de peyda *yekîne* anku *yek + paşpirtika –îne* serdest e, wek nimûne di navê hêzên çekdarî yên Rojavayê Kurdistanê *Yekîneyên Parastin Gel (YPG)* de.

**Paşpirtika –î** di kurmanciya rojhilatî de peyva *heftî* çê dibe ku hevwatera peyva *hefte* ya devok û zaravayên din e. Heman paşpirtika peyva *çilî / çelî* de heye ku maneya “rewşa dayikê û/yan zarokê di 40 rojên pêşîn yê welidînê / welidandinê de”.

**Paşpirtika –ik** çendîn peyvên bi maneya “ewqas roj” çêdibe. Yek ji van peyvan *çilik / çelik* e ku hevwatera peyva *çilî / çelî* ya li jortir behskirî ye. Heman paşpirtik çend peyvên din jî çêdibe:

- şeşik (şeş roj, bi taybetî 6 rojên rojîgirtina dilxwazî di meha şewalê ya salnameya îslamî de)
- nehik / dehk (9/10 roj, xaseten rojên rojîgirtina dilxwazî di meha zulhecê ya salnameya îslamî de)

Di lîstika bi navê *pêncokanê* de navdêr ji **paşpirtika –ok** ji hejmarê hatiye avakirin. Lê peyva *\*pêncok* tenê peyda nabe. Herwiha paşpirtika *–anê* ya bi maneya ”yarî, lîstik, –bazî” heye (bidin ber *goganê, holanê, topanê, şûranê, gilçanê* û hwd.)

## 2.5. ÇÊKIRINA NAVDÊRAN JI NAVDÊRAN

Di çêkirina navdêran ji navdêran de bi alîkariya paşpirtikan, mirov dikare bibîne ku navên hin tiştan dikarin bibin navên hin bikeran (kesên ku wan tiştan dikin). Herwiha mirov dikare ji navê bikeran jî karên wan bikeran çêke. Li aliyekî din, navê tişt û kirinan jî ji bikerên wan mimkin e.

### 2.5.1. ÇÊKIRINA BIKERAN JI TIŞTAN

Piraniya navdêrên biker (agent nouns) anku navên bikeran (kesên ku tiştêkî dikin yan xwedî tiştêkî ne) bi alîkariya paşpirtikan di kurdî de ji navên wan tiştan tên çêkirin:

- ga → gavan
- hiş → hişyar
- asin / hesin → asinger / hesinger
- nal → nalbend
- huner → hunermend
- çay → çayçî
- dikan → dikandar
- hîle → hîlebaz
- siyaset → siyasetmedar
- komun → komunîst
- çav → çavdêr



Wek ku ji paşpirtikên van peyvan diyar e, ne paşpirtikek lê çendîn paşpirtik di çêkirina bikeran ji tiştan de hene. Ev tenê hin nimûne ne, lîste bi ti awayî ne temam e.

Hin ji wan pir nadir in, bo nimûne “-medar” di peyva “siyasetmedar” de ku tenê formek e ji peyva “siyasetvan” ya giştîtir. Lê paşpirtikên din bi piranî hemû çalak û biber in, bo nimûne “-van, -mend, -dar, -baz, -îst”. Hin ji van bi zelalî biyanî ne, bo nimûne “-îst” ji zimanên ewropî ye, “-çî” ji tirkî ye û “-mend” jî ji farisî ye û tenê vê dawiyê bi rêya soranî ketiye kurmancî. Di rastiyê de “-dar” jî ji farisî ye û rehê dema niha ji lêkera “daştên” (hebûn, xwedî bûn) e anku “dikandar = ya/yê ku dikan heye” lê ji mêj ve ketiye kurdî.

Ji bilî paşpirtikan, herwiha navdêrên biker gelek caran ji navdêr + rehê dema niha yê hin lêkeran tî çêkirin:

- stran-bêj
- kar-ker
- peyam-ber
- şîr-mêj

Lê “paşpirtikên” wiha di rastiyê de ne paşpirtik in, ew rehên lêkeran in (carinan + -er) loma em wan li vê derê wek paşpirtikên çêkirina navdêran ji navdêran nahesibînin. Di mijara peyvên pêkhatî de me behsa wan kiriye.

## **PAŞPIRTIKA -Î**

Ev paşpirtik navê xelk û miletan ji navên welatan û herwiha jî navê rûniştvanên deran ji navên wan deran çêdike:

- Kurdistan → kurdistanî
- Dihok → dihokî
- bajar → bajarî
- gund → gundî
- welat → welatî

Eger navê welatî yan bajarî bi vokala –a bi dawî bibe, adeten paşpirtik dikare –yî be yan jî –a dikare bikeve û cih bide –î:

- Ewropa → ewropayî / ewropî
- Amerîka → amerîkayî / amerîkî

Eger nav bi xwe bi –î bi dawî were, hingê –î dubare nabe û –iyî jî

- Silêmanî (bajar) → silêmanî (xelk)
- Amêdî (bajar) → amêdî (xelk)

Peyvên wiha çêkirî bi eslê xwe rengdêr in û maneya "ji / têkilî filan cihî" didin lê bi berfirehî bi maneya "rûniştvana/ê filan cihî" yan "kesa/ê ji filan derê" jî didin.

### PAŞPIRTIKA -VAN

Hevrehên paşpirtika –van di zaravayên kurdî û zimanên din jî yên îranî de peyda dibê: soranî û kurdiya başûrî –(e)wan, farisî –ban, pehlewî –pan, avestayî û hexameniştî –pane, hemû ji proto-hindûewropî \*peh- (parastin) ku herwiha serekaniya lêkeran *payîn / pan* (li bendê bûn, li hêviyê bûn) ya kurmancî, *payîden* ya farisî û *pawtene* ya zazakî ye jî.

Maneya eslî ya vê peyvê paşpirtikê "çavdêr, nobedar, parêzvan" e, wek di gotinên *şivan*, *gavan* de. Lê êdî maneya vê paşpirtikê berfireh bûye û ne tenê bi çavdêriya pasîv ve maye lê herwiha li şûna bikerên aktîv jî tê xebitandin:

- nêçîrvan (kesa/ê ku nêçîrê dike, heywanan dikuje)
- helbestvan (kesa/ê ku helbestan dinivîse)<sup>76</sup>

Hin kes berfirehbûna paşpirtika –van rexne dikin û dibêjin ku bo nimûne peyvên wek *helbestvan* şaş in. Ew li cihê vê peyvê bo nimûne peyva *helbestkar* pêşniyaz dikin. Lê berfirehbûna mane û bikaranîna hin paşpirtikan diyardeyeke zimannasî ya giştî ye loma peyvên heyî û berbelav di cihê xwe de ne. Herwiha peyvên çêkirî yên wek *helbestkar* xelet in ji ber ku mirov dikare helbestvan be anku helbestan binivîse bêyî ku ew "karê" mirovî bin – mirov belkî di jiyana rojane de karekî qet ne têkilî helbestvaniyê bike lê dîsa jî di nivîsîna helbestan de biserketî be.

<sup>76</sup> Xaseten li Behdînan mirov peyva *hozanvan* jî dibihîze ku ji encama şaşfêhmkirina peyva *hozan* bi maneya *şair*, *helbest* hatiye çêkirin. Di rastiyê de *hozan* bi xwe *helbestvan*, *şair* e loma *hozanvan* totolojî ye anku paşpirtika –van dubare û zêde ye.

Paşpirtika –van di hin peyv an de bi hin varyantên ji vê forma serekî cuda ye. Di soranî de ew adeten ne “-wan” lê “-ewan” e: *şax-ewan* (çiyavan). Tesîra vê formê li hin peyvên kurmançî, xaseten behdînî jî heye:

- pişt-ewan (piştgir, alîgir)
- nivîs-ewan (nivîskar, nivîser, edîb, katib)
- zêr-ewan (çavdêr, ji \*zêr = seyr anku temaşe [kirin])

Ji bilî forma *kevanî* (bermalî, jin, pîrek, kulfet), herwiha varyantên *kabanî*, *kebanî* jî di kurmançî de peyda dibin. Di wan de tesîra forma –*ban* ya farisî heye tevî ku *kabanî*, *kebanî* li derveyî Rojhilata Kurdistanê jî di kurdî de peyda dibin. Heman form di peyva *şabanî* / *şabanû* (melike, kralîçe) de jî peyda dibe lê ji xwe ev peyv vê dawiyê ji farisî hatiye wergirtin. Paşpirtika –î ya li pey van peyvên *kebanî* / *şabanî* baş nayê nasîn. Mimkin e ku ew nîşana mêtîtiyê be ji ber ku heman paşpirtik di peyvên din jî yê bi heman maneyê de heye: *bermalî*, *berdilî*, *delalî* yê bi maneya “jin, yar”.

### PAŞPIRTIKÊN –DAR, –DÊR, –DE

Gava ku paşpirtika –*dar* rengdêran çêdike, ew bi bi zelalî van maneyan dide: “xwedîya/ê tiştêkî”, “bi tiştêkî”, “kesa/ê yan tiştê/ê ku tiştêkî heye”. Lê gava ku ew navdêran ji navdêran çêdike, maneya wê berfirehtir e:

- dikandar (xwedîya/ê dikanekê → birêvebera/ê dikanekê, *shopkeeper*)
- birîndar (kesa/ê ku birîn hen → kesa/ ku birîn lê bûne, *wounded*)
- guhdar (kesa/ê ku guhê xwe dide gotinên kesên din, *obedient*)
- fermandar (kesa/ê ku xwedî ferman e yan fermanan dide, *commander*)

Ji van nimûneyan herduyê dawiyê (guhdar, fermandar) dikarin bi şaşî li cihê “guhder, fermander” hatibin çêkirin jî lê guman jê nîne ku ew bi şiklê xwe yê “guhdar, fermandar” serdest in.

Heman paşpirtika –*dar* di soranî û farisî de jî heye. Di rastiyê de di farisî de ew rehê dema niha ji lêkera *daştên* (hebûn, xwedî bûn) û maneya “heye” dide. Di kurdî de bi vê maneyê ew wek peyveke serbiwe peyda nabe<sup>77</sup> û –*dar* bi zelalî paşpirtik e. Lê di farisî de ew rehê lêkerekî ye û di farisî de

---

<sup>77</sup> Ji aliyê etîmolojî ve ti tîkiliya paşpirtika –*dar* bi peyva “dar” (qurmê ku çeq û çilû pê ve şên dibin) ve nîne û ew ne eynî peyv in.

peyvên “-dar”ê çêkirî dikarin wek peyvên pêkhatî bên hejmartin. Di zimanên îraniya navîn (pehlewî, partî) û îraniya kevn (avestayî û hexamenişî) de jî “dar-“ wateya “hebûn”ê dida.

Di kurdî de di peyva *çavdêr* (lênêr, kontrolker, *observer*) de paşpirtik ne *-dar* lê *-dêr* e lê bi mantiqa xwe ew jî her wek *guhdar* e. Di kurmanciya nivîskî de, xaseten di rêzimanê de çend peyvên din jî bi paşpirtika *-dêr* hatine çêkirin lê di rastiyê de maneya wan jî “-dêr /-dar” ya bingehîn gelek dûr e yan qet tine ye:

- deng (*voice, sound, phoneme*) → dengdêr (*consonant*)
- nav (*name*) → navdêr (*noun*)
- reng (*colour*) → rengdêr (*adjective*)

Di van peyvên de, bi taybetî di *navdêr* û *rengdêr* de *-dêr* ji *-dar* zêdetir dişibe *-der* anku dide. Bo nimûne “*rengdêr*: peyvên ku rengan / awayan didin peyvên din”. Lê peyva *dengdêr* nayê zanîn ne ewqas jî biserketî ye ji ber ku consonant adeten wek herfên “bêdeng” tên hesibandin, ne wek yê “bideng”. Helbet her herf “bideng” e anku dengê heye lê eger em “dengdêr” bi maneya “herfên ku deng hene” qebûl bikin jî, ma çawa vokalan deng nînin heta ku em ji dijberên wan re bibêjin “dengdêr”?!

Paşpirtika *-de* bo nimûne di peyvên *fermande* û *qûnde* de heye. Ew di rastiyê de ne paşpirtikek e lê formeke rehê dema niha ji lêkera “dan, dayîn” e ku formên din *-d-* (bi-d-in, ne-d-î) û *-der-* (forma kevn ya paşgir) in.

## PAŞPIRTIK -YAR

Paşpirtika *-yar* bo nimûne di peyvên wek *hiş-yar* û *bext-i-yar* de heye.

Berevajî ku hin caran tê idiakirin, ew ne ji peyva “yar” ya bi maneya “dost, evîndar, aşiq, maşûq” e. *-yar* formeke “nermbûyî” ji paşpirtika *-dar* e. Bo nimûne *hişyar* anku kesa/ê hiş û aqil heyî, wek *aqil-dar* ya hevwatera wê. Bo guherîna D bi Y, bidin ber kurmancî *sed* û zazakî *sey*.

Peyva *cotkar* xaseten di kurmanciya rojhilatî de bi awayê *cotyar* e, bi soranî *cutyar*. Mimkin e ku ev *-yar* jî ji *-dar* be lê herwiha dibe ew jî *-kar* jî be û pêşî bûbe *-gar* û taliyê jî bûbe *-yar*.

## PAŞPIRTIKA –GER

Paşpirtika –ger ji mêj ve di kurdî de di peyvên wek *asin-ger / hesin-ger* û *zêr-in-ger* de heye. Vê dawiyê hin nûpeyv jî pê hatine çêkirin, wek “rojnameger, weşanger, dozger, mêtînger (kolonyalîst)”. Lê dîsa jî bikaranîna vê paşpirtikê bisinor e û wisa dixuye ku dê bisinor bimîner.

Heman paşpirtik di soranî û farisî de jî li kar e, di farisî de piçekê ji kurdî çalaktir e. Ev paşpirtik bi eslê xwe ji paşpirtika –ker e lê bi nermkirinê K bûye G.

Hêjayî bibîranînê ye ku ev paşpirtik li gel rehên lêkeran –gerr (ji “gerrîn”) û “-gêrr” (ji “gêrran” anku “gerrandin”) neyê tevlihevkin:

- esmangerr (astronot, kesa/ê ku li esmanan / fezayê digere)
- aştgêrr (kesa/ê ku aşt digerrîne, dilivîne, diçerixîne)

Bo guherîna –ger û –gêrr van peyvên bidin ber hev:

- rojnameger (rojnamevan, rojnamenivîs, jornameger)
- rojnamegêrr (kesa/ê ku rojnameyan digerrîne daku bifiroşe yan bigihîne mala xelkê)

## PAŞPIRTIKA –MEND

Ev paşpirtik bo nimûne peyvên wek *hunermend, karmend, şêwirmend* yê navdêran biker ji navdêran çêdike. Maneya bingehîn ya paşpirtik –mend jî wek ya –dar e anku “kesa/ê ku tiştê heye”. Ew mane baş di rengdêran wek “dewlemend, behremend” de diyar dibe. Di navdêran bi vê paşpirtikê de wateya paşpirtikê êdî ne zelal e lê erka wê berçav e: navdêran ku ew çêdike biker in: “kesa/ê ku tiştê dîke yan mijûlî tiştê ye”.

Ev paşpirtik vê dawiyê bi rêya soranî ji farisî ketiye kurmançî. Ew di peyvên nav gel de belav di kurmançî de peyda nabe. Heman paşpirtik di pehlewî de wek –(o)mend û di avestayî û hexamenîşî de jî wek –ment hebû. Di soranî de û xaseten jî di kurdiya başûrî de D-ya dawiya peyvê dikeve û paşpirtik dibe –men.

## PAŞPIRTIKA –ÇÎ / -CÎ

Ev paşpirtik bi eslê xwe ji tirkî ye. Di tirkî de ew li gor peyva bingehîn çendîn formên ji hev cuda werdigire: konsont dikare Ç yan jî C be, vokal jî dibe ku I, İ, U, Ü. Di kurdî de ev hemû varyantên tirkî adeten dibin –çî:

- tirkî: bekçi → kurdî: bekçî (nobedar, zêrevan, çavdêr)
- T: çaycı → K: çayçî (çaygêrr)
- T: topcu → K: topçî (topavêj, bombeavêj)
- T: Apocu (PKKyî) → K: apoçî

Ji vê nimûneya dawiyê mirov roj bi roj zêdetir herwiha forma “apocî” jî dibîne anku C-ya peyva tirkî di kurdî de wek C tê parastin.

Dijberên apociyan bi tirkî bi bernavê “korucu” (parêzvan) tên nasîn ku kurtkirina “köy korucu” (gundparêz, parêzvanên gunda) e. Ev peyv di kurdî de bi piranî bi forma “qoricî” li Bakurê Kurdistanê li kar e û beramberî “cehş, caş” (kurdên alîkarên hikûmetê) berê li Başûrê Kurdistanê ye. “Qoricî” yek ji wan kêm peyvan e ku tê de di kurdî de C-ya paşpirtika –CU ya tirkî wek C hatiye parastin û nebûye Ç.

Bikaranîna paşpirtika –çî ne tenê ketiye kurmanciya li ber tesîra tirkî. Ew herwiha di soranî, farisî û erebiya devkî de jî cih digire. Bikaranîna vê paşpirtikê di kurmanciya nivîskî de heta ji farisî û soranî jî zêdetir bisinor e – ihtimalen ji ber ku piraniya kurmancînivîsan dizanin ku ew ji tirkî ye û loma naxwazin wê bi kar bînin.

### **PAŞPIRTIKA -BAZ**

Ev paşpirtik bo nimûne di peyvên wek *hîlebaz*, *fêlbaz*, *sihirbaz*, *cambaz* / *canbaz* de heye. Ew bi eslê xwe ji farisî ketiye kurdî û di farisî de rehê dema niha ji lêkera *baxten* (lîstin, yarî kirin) e.

Bikaranîna vê paşpirtikê di kurdî de bi piranî bi meremeke neyînî û negatîv tê bikaranîn, wek ku ji peyvên *fêlbaz* û *hîlebaz* diyar e. Ev peyv di heman demê de navdêr û rengdêr in jî, navdêrî yan rengdêriya wan ji hevokê diyar e.

### **PAŞPIRTIKA –ÎST / -IST**

Ev paşpirtik di sedsala 20em de ji zimanên ewropî ketiye kurdî. Ew bi piranî navdêrên biker yê bi maneya biker û aktorên siyasî û civakî li kar e, bo nimûne:

- komun-îst
- sosyal-îst
- radîkal-îst
- faşîst
- rasîst

Lê carinan peyvên nesiyasî jî wê paşpirtikê werdigirin:

- piyanîst (piyanolêder)
- kolumnîst
- panelist

Adeten bikaranîna vê paşpirtikê tenê li gel peyvên ji zimanên ewropî mimkin e, ew bi hêsanî nakeve gel peyvên xwemalî yan wek din rojhilatî.

### **PAŞPIRTIKA –BEND**

Paşpirtika –*bend* ji mêj ve di peyva *nalbend* de di kurdî de cih girtiye. Vê dawiyê ew di peyvên wek *pêbend / pabend* (dilsoz, wefadar, sadiq, *loyal*) û *sazbend* (hunermenê sazê, muzîkvan) de jî tê dîtin. Wek di rola vê paşpirtikê di çêkirina navdêrên biker ji navdêrên din de kême.

Ev paşpirtik yekser yan bi rêya soranî ketiye kurmançî. Di farisî de ew rehê dema niha yê lêkera “bestin” (girê dan) e (bidin ber kurdî *ben, benik*). Ew herwiha navê tiştan jî ji tiştên din çêdike wek “gulbend, şûşebend”.

Varyanta din ya vê peyvê “-wend” e ku di peyvên wek *zema-wend* û *pê-wend-î / pey-wend-î* de heye.

### **PAŞPIRTIKA -MEDAR**

Ev paşpirtik tenê di peyva *siyasetmedar* (siyasetvan, polîtisyen) de navdêrek biker ji navê tiştê çêdike. Ev peyv vê dawiyê ji farisî hatiye wergirtin. Bi eslê xwe ji du peyvên erebî yê serbixwe *siyaset + medar* pêk hatiye.

## 2.3.2. ÇÊKIRINA NAVÊN KARAN JI BIKERÊN WAN

Bi alîkariya çendîn paşpirtikên ji hev cuda mirov dikare ji navdêrên biker (agent nouns) anku navên kesên ku tiştêkî dikin yan tiştêk in, karê wan kesan çêke:

- diz → dizî (karê dizan)
- serok → serokatî (karê serokan)
- pêşmerge → pêşmergetî (karê pêşmergeyan)

Mimkin e ku navdêrên biker ji xwe jî paşpirtikeke peyvsaz hebûbe û paşî ev paşpirtika çêkirina nave karan ji bikeran jî wergire:

### PAŞPIRTIKA –Î

Piraniya navên karan dikarin bi paşpirtika –î ji navên bikeran anku kesên ku wan karan dikin bîn çêkirin:

- doktor → doktorî
- diz → dizî
- hunermend → hunermendî

Wek ku diyar e, paşpirtika –î dikare bikeve hem gel peyvên xwemalî (li vir “diz”) û hem jî yên bi eslê xwe biyanî (di nimûneyên me de “doktor”). Ew herwiha dikare bikeve gel peyvekê ku ji xwe paşpirtikeke din heye:

- huner → huner-mend → huner-mend-î

### PAŞPIRTIKÊN DIN

Eger navdêrê biker bi vokalekê bi dawî bibe, hingê li cihê –î paşpirtika –tî, -yî yan –hî heye:

- hosta / hoste → hostatî / hostahî / hostayî, hostetî / hostehî / hosteyî
- pale → paletî / palehî / paleyî



Bi taybetî di kurmanciya navendî de, paşpirtika –tî yan –îtî dikare herwiha bikeve gel navdêrên biker yê konsonant li dawiya wan jî:

- doktor → doktorîtî / dokortî

Di hin peyvan de çend paşpirtikên ji van jî cuda karan ji bikeran çêdikin:

- serok → serok-atî / serok-ayetî
- endam → endam-etî
- dost → dost-anî
- heval → heval-înî

Paşpirtika –î ya “karsaz” bi eslê xwe îranî ye, di soranî û farisî de her –î ye, di pehlewî û partî de –îh bû, di hexamenişî û avestayî de –ye-vehye bû. Paşpirtika –(a)yetî encameke têkilkirina –î ya îranî û paşpirtika –yet ya ji erebî ye. Paşpirtikên –atî, –etî-, –îtî-, –itî, –tî jî kurtkirinên –(a)yetî ne.

### 2.3.3. ÇÊKIRINA NAVÊN TIŞTAN JI NAVÊN ENDAMÊN LEŞÎ

Ji navên hin endamên leşî, bi çend paşpirtikên cuda navên hin tiştan tên çêkirin:

- serik → serik
- dest → deste
- bazin → bazine / bazink
- çeng → çengil / çengal
- gerden → gerdenîk
- ser → serok, serek
- (soranî:) milwane (anku “ristik, gerdenîk” ji “mil” ku di soranî de maneya “sto” dide + -wane wek di peyva *sîwane* de)
- çav → berçavk

Paşpirtika herî çalak di vî warî de –ik e:

- dest → destik
- çav → çavik
- ser → serik

- pê → pêpik (bi dubarekirina P)
- sermil → sermilk (ritbe, stêrk)
- pişt+sto → pistok (bi kurtkirinê)

Herwiha paşpirtika –e jî di çend peyvan de rol heye:

- dest → deste

Herwiha paşpirtika –il jî bi kêmî peyvekê ji endamên leşî çêdike:

- çeng → çengil

Hem –ik û hem jî –il bi eslê xwe paşpirtikên biçûkkirinê ne. Lê li vê derê ew ne peyvan biçûk dikin lê tiştan dişibînin endamên leşî:

- “serik” anku tiştên wek seran in: “serikekî pîvazê, serikekê kelemî”
- “serok” anku kesê di nav komeke mirovan de li serî

Ji bilî paşpirtikan, mirov dikare bibêje ku *dorpiirtik* (circumfix) jî navên tiştan ji navên endamên leşî çêdikin. Dorpiirtik ji du pirtikan yan beşan pêk tên ku yek jê li berî peyva serekî ye û ya din jî li dû wê ye. Di kurdî de dorpiirtika **ber...k** di vî warî de li kar e:

- çav → ber-çav-k (eynik, *eyeglasses*)<sup>78</sup>
- guh → ber-guh-k (mîkrofonên ku mirov dide ber guhên xwe, *earphones, headphone*)
- pê → ber-pê-k (parçeya ku pê lingtên parastin, *foot cover*)

Lê ev nimûne herwiha dikarin wek peyvên pêkhatî (*compound*) jî bîn hesabandin.

## 2.3.4. ÇÊKIRINA NAVÊN CIHAN

Di zimanê me de navên cihan bi çendîn paşpirtikên ji hev cuda dikarin bîn çêkirin, bo nimûne: *-geh*, *-istan* û *-xane* ku vê dawiyê xaseten di zimanê nivîskî de gelek çalak in û peyvên nû jê tên çêkirin: *pirtûkxane, mêvanxane, çayxane, meyxane, bîrexane, qehbexane; kargeh, girtîgeh, xwandingeh, fêrgeh; gulistan, Kurdistan, bûstan, daristan...*

<sup>78</sup> Herwiha li ber *berçavkê* mirov dikare peyva *berroj*k (ji ber+roj+) bi maneya *berçavkên rojê* (sunglasses) jî bi kar bîne.

Mirov dikare lîsteyên pir dirêj ji peyvên bi van paşpirtikan bide. Ev her sê paşpirtik îranî ne, ew bi heman awayî yan jî bi şêweyekî nêzîkî wan di zaravayên din yê kurdî û zimanên din yê îranî de jî hene:

- **-geh:** bi kurmancî herwiha *-gih, -ge, soranî -ge û -ga, farisî -gah, pehlewî -gah, hexamenişi gəşu, avestayî gatu, sanskrîtî gatú.*
- **-xane:** hevrehê kurmancî *xanî, soranî xanû, farisî xane / xanê, pehlewî xanek, îraniya kevn \*hanek-*
- **-(i)stan:** hevrehê soranî *-(i)tan, -farisî -(i)stan, pehlewî -(i)stan, hexamenişi -stane-, sanskrîtî -tane-, hemû ji proto-hindûewropî \*steh (sekinîn, rawestîn) ku herwiha di peyvên kurdî yê wek *stûn, rawestîn / rawestandin* de heye.*

Ev paşpirtik bi piranî dikevin pey navdêran anku bi wan navdêr ji navdêran tên çêkirin. Lê di çend peyvên de paşpirtik ji rehên cuda yê lêkeran tên avakirin:

- *firoş-geh* (ji rehê dema niha yê lêkera “firotin”)
- *xwandin-geh / xwendengeh* (ji forma ferhengî ya lêkera “xwandin / xwendin”)
- *xwand-e-geh / xwendegeh* (ji rehê demên borî yê lêkera “xwandin / xwendin” li gel navpirtika -e-)

Ji bilî van paşpirtikên çalاک, herwiha hin gireyên din jî hene ku navên cihan çêdikin yan jî bi kêmî di dîrokê de çêdikin:

- **-an:** *Behdînan, Botan, Soran, Erdelan...* Vê paşpirtikê di dîrokê de nave hin deveran çêdikin. Di heman demê de wê navê eşîran saz dikir: *Milan, Kîkan, Hesenan, Heyderan...* Di rastiye de ev paşpirtika pirhejmariyê ye, wek *kitêb* → *kitêban*. Heta vê dawiyê ew di hin devokên kurmancî de di navê *Tirkan* ya bi maneya *Tirkiye* de jî li kar bû.
- **-iye, -ya, -iya, -î:** *Tirkiye, Sûriye, Almanya, Romanya...* Ev paşpirtik ji zimanên ewropî hatiye wergirtin (inglîzî, latînî, yûnanî *-ia*, fransî *-ie*). Ew di çendî navên welatan de heye lê wek din di kurdî de ne çalاک e anku di kurdî bi xwe de peyvên nû çênake. Formeke wê ya kurtkirî *-î* ye ku di navên hin bajarên Kurdistanê de jî heye: *Amêdî, Silêmani, Urmî...*
- **-ava, -awa, -abad:** Paşpirtika kurmancî *-ava* ya bi maneya “avakirî, ne kavil, ne wêran, ne xopan, ne hilweşandî, ne ruxandî, ne herrifandî” di navê çendî cihan de heye. *Zorava* navê çendî gundan li çend deverên cuda yê welatê me ye. Formê heman peyvê ya soranî *-awa* bo nimûne di nave bajarokê *Şeqlawa* û taxa *Rehîmawa* ya Kerkûkê de peyda dibe. Forma

farisî—*abad* bo nimûne di navê bajarên Mehabad de heye û herwiha li derveyî Kurdistanê jî pir peyda dibe: bo nimûne Îslamabad li Pakistanê û Heyderabad li Hindistanê. Heman pêşpirtika kurmançî bi forma xwe ya devokî—*ova* ketiye tirkî jî, wek di navê bajarokê Geverê li Hekariyan ku bi tirkî *Yüksekova* ye yan jî Deşta *Çukurova*.

- **-lenda, -landa, -landiya, -land:** Ev varyantên paşpirtikekê ne ku bi inglîzî û zimanên din yê nermanî maneya “welat, -stan” didin û di navê çend welatên ewropî de heye: *Holenda, Îrlenda, Fînlenda...* Ev paşpirtik jî di kurdî bi xwe de ne çalak e anku di kurdî de peyv jê nayên çêkirin, tenê di hin peyvên ji zimanên din de wergirtî de li kar e.
- **-dax:** *Qerejdax, Kurdax, Qeredax, Girîdax / Gilîdax.* Paşpirtika *-dax* ji peyva tirkî *dağ* (çiya) ye. Heman peyv di navê Kurdax ("Çiyayê Kurdan/Kurdî" = Çiyayê Kurmênc), Qerejdax ("çiyayê qereçan", Li nêzîkî Diyarbekirê), Qeredax ("çiyayê reş", bi tirkî niha dê "Karadağ" bûya, li Başûrê Kurdistanê ye) de heye. Lê peyva "gilî-" di Gilîdax de ne ji "gilî=gazin, itiraz, şikayet" tê. Ew guherîna peyva "girî-" ye anku berê "Girîdax" bû. Lê li vir "girî" jî ne bi maneya "girîn, rondik barandin, hêsir barandin" e. Lê ew kurtkirina "Agirîdax" e anku "Çiyayê Agirî".
- **-dizê:** *Qeladizê, Şêladizê, Dizê.* Paşpirtika *-dizê* bi eslê xwe maneya “keleh” dide û hevrehê peyva “dîwar” e. Ev paşpirtik di navê çend bajarokên Kurdistanê de heye: Qeladizê bajarokê wilayeta Silêmaniyê ye û Şêladizê jî li devera Behdînan e. Dizê navê berê yê bajarokê Geverê yê herêma Hekariyan e. *Qeladizê* di rastiyê de totolojî (bi inglîzî *tautology*) ye anku di heman peyvê de du peyvên bi heman maneyê hatine dubarekirin: *qela* (keleh) + *dizê* (keleh).
- **-tepe:** *Qeretepe* (li Başûrê Kurdistanê) û *Qiziltepe* (li Mêrdînê), *Seyrantepe* (li Diyarbekirê). Ev paşpirtika ji tirkî maneya *gir* (çiyayên biçûk) dide û di navên çend deverên Kurdistanê de hene ku li serdema osmaniyan hatine binavkirin.

Ji bilî paşpirtikan, herwiha çend pêşpirtik jî navên cihan çêdikin:

- **me-:** *medrese, mekteb, mesken, mekan...* Ev pêşpirtik ji erebî ye û di erebî de pêşpirtikeke berbelav û biber ya sazkirina navên cihan e. Di kurdî de peyvên ku ev pêşpirtik tê de heyî jî yekser ji erebî hatine wergirtin anku ne di kurdî de hatine çêkirin. Tevî ku ev pêşpirtik di kurdî bi xwe de di peyvsaziyê de ne çalak e jî, lê hejmareke mezin ya peyvên bi vê pêşpirtikê di zimanê me de niha li kar in.
- **dêr-:** *Dêrsim, Dêrelok, Dêrezor...* Ev pêşpirtika bi maneya “dêr” di nava çend deveran de li hemû beşên welatê me hene.

- **qere-**: *Qeredax* (li devera Silêmaniyê), *Qeretepe* (li wilayeta Mûsilê). Ev paşpirtika ji tirkî (bi tirkiya niha *kara*) maneya *bejahî*, *reşahî*, *ax*, *erd* dide û di navê çend deveran de peyda dibe, hem li Bakur û hem jî li Başûrê Kurdistanê.

### 3. LÊKERSAZÎ

Lêker di kurdî û gelek zimanên din yên îranî de herî zêde bi pêkanîna du yan çend peyvan çêdibin. Yek ji beşên wê lêker e (herî zêde “bûn” yan “kirin” û beşên din jî dikarin navdêr, rengdêr, hoker yan daçek-cînav bin yan jî du-sê ji van bi hev re bin. Li jor di beşa “Pêkanîn” de me bi dirêjahî behsa lêkersaziya bi pêkanîna kiriye.

Li vê derê mijara me lêkersaziya bi dariştinê ye anku bi alîkariya gireyan e. Di kurdî de lêkersaziya bi dariştinê dikare bi alîkariya pêşpirtikan (pêşgiran) yan paşgiran be. Bo nimûne (pirtik hatine qelewkirin):

- **bi pêşpirtikan**: **ber**-dan, **da**-ketin, **hil**-girtin, **ra**-kirin, **ve**-xwarin, **wer**-gerandin...
- **bi paşpirtikan**: diz → dizîn, rev → revandin / revîn, xebat → xebitîn / xebitandin

Pêşpirtik û paşpirtik dikarin di heman demê de jî bikevin dor peyvê:

- diz → **ve**-diz-în
- rev → **ve**-rev-andin

Pêşlêker û paşlêker hin pêşpirtik yan paşpirtik in ku li gel lêkerên xwerû tên bikaranîn daku maneyeke piçekê ji peyva xwerû cudatir yan deqîqtir bide peyvê. Ew pêşlêker û paşlêker bi piranî bi eslê xwe hoker in. Bo nimûne, pêşpirtikên “ber-, hil-, ve-” di peyvên “ber-dan, hil-girtin, ve-kirin” de pêşlêker in.

#### 3.1. Lêkersazî bi paşpirtikan

Di kurdî de hin lêker ji navdêran tên çêkirin. Ew dikarin bi paşpirtika –în yan jî paşpirtika –andin bên avakirin.

Paşpirtika –andin herdem lêkerên gerguhêz anku transitîv çêdike:

- rev → revandin
- şewat → şewitandin
- cemed → cemidandin

Paşpirtika –în bi piranî lêkerên gerneguhêz anku intransîtîv saz dike:

- rev → revîn
- şewat → şewitîn
- cemed → cemidîn

Wek ku tê dîtîn, ji eynî peyvan (di nimûneyên me de “rev, şewat, cemed”) bi paşpirtika –andin lêkerên gerguhêz û bi paşpirtika –în jî lêkerên gerneguhêz peyda dibin. Lê herdem herdu awayên lêkerên ne mimkin e ku ji eynî peyvê bîn çêkirin:

- nirx → nirxandin
- nirx → \*nirxîn (stêrka \* li ber peyvê diyar dike ku ew peyv peyda nabe yan jî şaş e)

Carinan jî paşpirtika –în ne lêkera gerneguhêz lê forma lêkerê ya gerguhêz çêdike:

- diz → dizîn
- diz → \*dizandin (peyveke wiha nîne)

Wek encam, mirov dikare bibêje ku formên gerguhêz yê lêkerên wiha çêkirî herdem hene lê forma gerneguhêz ya heman lêkerê hin caran peyda nabe.

Herwiha tê dîtîn ku hin peyv îranî ne (diz, rev, nirx) û hin jî ji erebî ne (cemed, şewat). Bi marjînalî rehê lêkerê dikare ji derveyî îranî yan jî samî hatibe. Bo nimûne:

- xapandin / xapîn (ji ermenî: xap-êl)

Peyva “xapandin, xapîn” ji bilî kurmanciya navendî û belkî rojavayî, di ziman û zaravayên din yê kurdî û îranî de peyda nabe. Ew heta di kurmanciya rojhilatî de jî nedîtî ye.

### 3.1.1. Lêkersaziya bi dariştinê ji peyvên xwemalî

Çêkirina lêkeran bi vî awayî ji navdêrên xwemalî (îranî) ne diyardeyeke berfireh û çalak e. Mirov dikare bi hêsanî peyvên wiha di lîsteyê kurt de rêz bike:

- bez → bezîn / bezandin
- diz → dizîn
- êş → êşîn / êşandin
- rev → revîn, revandin

Herwiha çend nimûneyên nadir yên bi paşpirtika **-tin** jî hene:

- mîz → mîstin (li gel guherîna Z-ya bilerz bi S-ya bêlerz di bin tesîra T-ya bilerz de)
- rîx → rîtin (tarîxiyên *rîxten*)
- \*do- (wek di peyvên “dew/do” û “do[t]mam” de) → dotin

Niha wisa dixuye ku ev lêker (bo nimûne “bezîn, dizîn, revandin, mîstin, rîtin”) ji van navdêran (bo nimûne “bez, diz, rev, mîz, rîx”) peyda bûbin. Lê tarîxiyên ne wiha bûye: di rastiyê de “bez, rev, diz, mîs...” jî rehên dema niha yên lêkerên behskirî ne û bi guhastinê herwiha bûne navdêr jî. Anku tarîxiyên ne ev lêker bi dariştinê ji van navdêran çêbûne lê ev navdêr bi guhastinê ji rehên dema niha yên lêkeran peyda bûne.

Piraniya van navdêran kar yan encamên kirinekê ne:

- kar: *bez, rev*
- encamp: *mîz, rîx*

Lê hin caran jî biker in anku ew kes in ku tiştêkî dikin:

- biker: *diz*

Çêkirina karan yan encaman bi guhastina rehê lêkerê ji lêkeriyê bo navdêriyê niha diyardeyeke neçalak yan jî nadir e. Lê bo nimûne vê dawiyê ev peyv hatiye çêkirin:

- nivîs (ji rehê –nivîs- yê lêkera “nivîsîn”)

Lê çêkirina bikeran ji rehê lêkeran di rastiyê de di kurdî de diyardeyeke berbelav e:

- stran-bêj (ji rehê –bêj- yê lêkera “gotin”)
- kitêb-firoş (ji rehê –firoş- yê lêkera “firotin”)
- teşî-rêş (ji rehê –rêş- yê lêkera “ristin”)

Lê cudahiya van bikerên ji rehê lêkeran çêkirî li gel peyva “diz” ew e ku “diz” peyveke serbixwe ye lê “-bêj, -fir\_os, -rêş” tenê bi hin peyvan ve erkê bikeriyê werdigirin û li kar in.

### 3.1.2. Lêkersaziya bi dariştinê ji rehên samî

Paşpirtikên *-andin*<sup>79</sup> û *-în* xwemalî (îranî) ne, hevrehên wan di zaravayên dinyên kurdî de û herwiha di zimanên din jî yên îranî de hene: soranî *-andin* û *-în* / *-an*, kurdiya başûrî *-anin* û *-în* / *-an*, farisî *-anden* û *-îden*, zazakî *-yene* û *-nayene*, pehlewî *-ent-* û *-îden*, hexamenişi û avestayî *-ent-* û *-eyiteney...*

Berevajî çêkirina lêkeran ji peyvên xwemalî, dariştina lêkeran ji rehên samî di kurdî de gelek çalak e:

- şewat → şewitîn / şewitandin
- emel → emilîn / emilandin
- sekn → sekinîn / sekinandin

Ev rehên samî bi piranî ji erebî ketine kurdî lê hin jê ne ji erebî lê ji aramî ne:

- xebat (ji aramî ye û di erebî de peyda nabe) → xebitîn / xebitandin

Piraniya van rehan jî sê konsonantan û du vokalan pêk tên. Gelek caran ew bi vê formûlayê ne: CVCVC (C= consonant, V= vokal). Konsonant dikarin jî bîst û çend konsonantên heyî bin. Vokala yekem adeten E ye, vokala duyem dikare E, A yan I be. Carinan tenê vokalek heye anku reh bo formûlaya CVCC ye:

- sekn, şuxl

Carinan hin vokalên din jî mimkin in:

- şux(i)l → şuxilîn / şux\_ilandin
- ilm → elimîn<sup>80</sup> / elimandin

Hin caran jî konsonanta yekem “eyn” (ع) e lê ji ber ku ew di kurdî-latînî de nayê nivîsîn, şiklê rehî bi awayê VC--- tê nivîsîn lê di rastiyê bi awayê CVC--- tê gotin:

- emel [‘emel] → emilandin [‘emilandin]

<sup>79</sup> Di çend peyvên de li gor hin devokan *-andin* (xwendin, stendin).

<sup>80</sup> Di hin devokan de herwiha bi forma “elimtin” heye ku bi paşpirtika *-tin* hatiye çêkirin. Me ev heman paşpirtik di peyva “mîstin” jî “mîz”ê de jî li jortir dît. Lê wek din çêkirina lêkeran ji navdêrên xwemalî yan ji rehên samî bi vê paşpirtikê diyardeyeke nadir e.



Carinan rehê lêkerê tenê ji du konsonantan pêk hatiye:

- hel- → helîn, helandin
- şid- → şidîn, şidandin
- tew- → tewîn / tewandin

Di van peyvên de jî bi eslê xwe sê consonant hebûne ku herduyên dawiyê wek hev bûn: h-l-l û ş-d-d- lê di kurdî de ew sîvîk bûne û tenê yek jê maye loma niha wisa diyar e ku ew tenê ji du konsonantan pêk tên.

Vokala kîteya duyem, eger ne ji xwe l be, dibe l:

- cemed → cemidîn / cemidandin
- xebat → xebitîn / xebitandin

Hêjayî gotinê ye ku hin ji van rehê samî wek navdêr jî di kurdî de hene lê ji hinan jî tenê lêker hene û wek navdêr beramberên wan di kurdî de peyda nabin yan jî peydabûna wan biguman yan nadir e:

- **wek navdêr di kurdî de heyî:** emel, ilm, cemed, şewat, şuxl<sup>81</sup>...
- **wek navdêr di kurdî de neyî:** şid(?), tew(?), sekn...

Lêkersaziya li ser rehên samî (bi pîranî erebî) di kurdî de çalak e û sîstematîkî ye jî: hem forma gerguhêz û hem jî ya gerguhêz ji her rehî tê çêkirin: gerguhêz bi paşpirtika –andin û gerguhêz jî bi –în. Ji peyvên îranî lêkersaziya wiha hem ne çalak e û hem jî ne sîstematîk e: tenê çend navdêr wiha dibin lêker û ji wan jî tenê ji hinekan hem forma bi –andin û hem jî ya bi –în tê saz kirin.

Herwiha carinan –în ne lêkerên gerguhêz lê yê gerguhêz çêdike:

- nirx → nirxandin (lê ne \*nirxîn)
- diz → dizîn (lê ne \*dizandin)

Ji çend rehên samî di kurdî de hem bi pêkanî bi alîkariya lêkerên sîvîk (*light verbs*) “bûn, kirin” û hem jî bi paşpirtik “-andin, -în” lêkerên nû tînin çêkirin. Maneya wan bi pîranî ne tam wek hev e.

Carinan ew nêzîkî hev e lê hin caran pir jî hev dûr ketiye:

- qebûl bûn / kirin – qebilîn, qebilandin (xaseten dua ji aliyê Xwedê ve)
- hel bûn (çareser bûn) – helîn / helandin (bûn av yan ron)

---

<sup>81</sup> Di hin devokan de (xaseten li Behdînan) bi forma “şol” e bi guherîna: şuxl → şuhl → şol.

- xetim kirin (Qur'an heta dawiyê xwandin) – xetimandin / xetimîn (asê kirin / bûn, sereder nekirin / nebûn, jê dernexistin / derneketin)

### 3.1.3. Neolojîzm bi paşpirtikên –andin û -în

Vê dawiyê çendîn peyvên bi paşpirtika –andin û hin yên bi paşpirtika –în jî di zimanê nivîskî de ji navdêr û heta carinan j rengdêran jî hatine çêkirin:

- çap → çapandin<sup>82</sup> (çap kirin)
- tirk → tirkandin<sup>83</sup> (kirin tirk yan tirkî)
- fehm → fehimîn<sup>84</sup> / fehimandin (fehm kirin yan dan fehmkirin)

Wek ku tê dîtin, ev peyv hem ji peyvên heyî yê xwemalî û hem jî yê biyanî tên çêkirin. Ev sazkirina peyvên hê diyardeyeke nû û rûnenîştî ye. Herwiha peyvên wiha heta niha bi piranî tenê bi formên xwe yê ferhengî yan herî zêde bi formên ferhengî û rehê demên borî (çapand, kurdan, fehimî / fehimand). Lê çêkerên wan peyvên jî heta niha baş newêriyaye xwe li çemandina van peyvên li gor demên niha û bînan û bilanî û fermanî biceribînin. Niha hê zû ye em pêşbîniyê bikin ka ev peyv dê bimînin û bijîn yan jî wek pelîtankên rojê bimirin.

## 3.2. Lêkersazî bi pêşpirtikan

Pêşlêker (preverb) ji wan pirtikan re tê gotin ku dikevin pêş hin lêkeran in. Şertê hesabandina pêşpirtikekê wek pêşlêker ew e ku ew pêşpirtik ne tenê carekê dikeve pêşiya lêkerê lê li gel hejmareke berçav ya lêkeran dubare dibe û kêzêde heman maneyê yan yan ji çend maneyên dubarebar dide lêkerê.

<sup>82</sup> Nimûneyek ji bikaranîna vê peyvê: "Mewlûda ku Melayê Bateyî nivîsandîye, ji aliyê wesaxaneya "Firat"ê ve, di sala 1992'yan de, li Stenbolê hatiye çapandin." <http://www.saradistribution.com/qahirbateyi.htm>

<sup>83</sup> "Ji bo bihêzkirina nîjadê tirk, bedêl û bihayê wê çî dibe bila bibe divê kurd bîne tirkandin".

[http://www.amidakurd.net/qunciknivis/hefteya\\_maf%C3%AA\\_mirovan\\_4](http://www.amidakurd.net/qunciknivis/hefteya_maf%C3%AA_mirovan_4)

<sup>84</sup> "Hawa tu dibînin ku, her saet mîna wê tebdîla diyar ku eqlê te qebûl nake pîrî inqilaban û tebdîlan dibin. Ji vê berhevbûn, belawbûn û ji van halan tê fehimîn (fehmkirin) ku, di nav van ictima'an, belawbûnan, teşkîlan, texrîban ên bi sur'et ku xuyan dikin meqsedekî din heye." <http://kurdinur.blogspot.fi/>

### 3.2.1. Pêşlêker

Di kurmancî de hebûna van pêşlêkeran bêguman e:

- **ber**<sup>-85</sup>:
  - o ber-dan, ber-bûn, ber-ketin ...
- **da**<sup>-86</sup>:
  - o da-girtin, da-hatin, da-xistin, da-ketin...
- **der**<sup>-87</sup>:
  - o der-ketin, der-xistin, der-anîn, der-kirin...
- **hil-**, **hel-**<sup>-88</sup>:
  - o hil-girtin, hil-ketin, hil-kişandin, hil-weşandin, hil-avêtin, hil-dan, hil-anîn...
- **ra**<sup>-89</sup>:
  - o ra-bûn, ra-kirin, ra-ketin, ra-xistin, ra-girtin, ra-dan, ra-hiştin...
- **ve**<sup>-90</sup>:
  - o ve-bûn, ve-kirin, ve-dan, ve-gerîn, ve-gerandin, ve-girtin, ve-xwarin, ve-şartin...
- **wer**<sup>-91</sup>:
  - o wer-girtin, (tê) wer-dan, wer-bûn, wer-gerîn, wer-gerandin...

### 3.2.2. Pêşlêker?

---

<sup>85</sup> Di soranî û kurdiya başûrî (feylî, kelhurî, kirmaşanî) de jî wek "ber-" heye. Ji bilî "ber-" ya pêşlêker, "ber-" eke din heye ku maneya "berhem, tov, zarok, têjik" dide ku ne pêşlêker e lê navdêrek e ku li gel hin lêkeran lêkerên pêkve (hevedanî, compound) pêk tîne, wek "ber avêtin, ber anîn". Ji aliyê etîmolojî ve "ber-" di peyvên bo nimûne "ber-dan" û "ber-avêtin" de ne eynî ye. Lê di nivîsînê de ew jî wek "ber-" a pêşlêker bi lêkera xwerû ve tê nivîsîn. Di vê nivîsarê de, ku mijara me ne etîmolojî lê bikaranîna peyvê ye, reftar û tevgera wan eynî ye anku wek hev diçemin û pêşpirtik, navpirtik û paşpirtikan werdigirin.

<sup>86</sup> Di soranî û kurdiya başûrî de jî wek "da-" heye. Eslê wê ji paşdaçeka "da, de" ye, wek "ber bi jêr de/da".

<sup>87</sup> Di soranî û kurdiya başûrî de jî wek "der-" heye. Di hin devokên kurdiya başûrî de (bo nimûne li Beyreyê / Bedreyê anku bi devoka beyreyî bûye "er-". Eslê wê ji daçeka yan hokera "der, derve, derê" (ne li hindir/ tê de) ye.

<sup>88</sup> Forma "hel-" di kurmanciya rojhilatî de heye (bo nimûne li Dihokê). Di soranî û kurdiya başûrî de jî wek "hel-" heye lê di hin devokên başûrî de bi forma "et-" e. Di zazakî de "er-" e. Di farisî de peyda nabe lê di pehlewî de "ul-", di avestayî de ærəδβa, di sanskrîtî ūrdhvā, latînî arduus... hemû bi maneya "bilind, bilindahî" ji proto-hindûewropî \* h<sub>2</sub>erHd<sup>h</sup>- ne.

<sup>89</sup> Di soranî û kurdiya başûrî de heye.

<sup>90</sup> Di piraniya devokên soranî û kurdiya başûrî de wek pêşpirtik peyda nabe lê wek paşpirtik bi forma "-ewe" (ya formeke nêzîkî wê) heye. Bo nimûne, "ve-warin" ya kurmancî bi soranî "xwardin-ewe" ye û "ve\_sartin" jî "şardin-ewe" ye.

<sup>91</sup> Di soranî û kurdiya bas:ûrî de jî wek "wer-" heye.

Herwiha hin pêşpirtik hene ku dikarin wek pêşlêker bîn hejmartin lê guman li ser pêşlêkeriya wan heye ji ber ku ew tenê li gel yek yan du-sê lêkerên xwerû tên bikaranîn:

- ba-:
  - o ba-dan
- çê-:
  - o çêbûn, çêkirin
- girê-:
  - o girêdan / girê dan
- rû-:
  - o rû-niştin
- we-:
  - o we-şandin, we-şîn<sup>92</sup>, we-standin, we-stîn

"ba-, çê, girê-, rû-" ne pêşlêker bin jî, ew wek pêşlêkeran diçemin. Bo nimûne, pirtika neyînî "ne, na" û pirtika demî "di" dikarin bîn navbera pêşlêkerê û lêkera xwerû:

- rû-niştin → rû-di-niştin, rû-ne-niştin, rû-ne-di-niştin
- ba-dan → ba-di-dan, ba-ne-di-dan

### 3.2.3. Pêşlêkerên dîrokî

Tarîxiyên di kurdî de hin pêşlêkerên din jî hebûn. Ji wan pêşlêkeran ya ji hemûyan berbelavtir mayî "ni-" ye ku maneya wê ya bingehîn liva ber jêr ve ye: "nivistin, nivîsîn, niştin, niximandin/nixamtin..." Bo nimûne, "niştin" ji "ni-" (jêr) + "\*sed-" ya proto-hindûewropî ya bi maneya "rûniştin" tê ku di gelek zimanên hindûewropî de niha jî bi wê wateyê ye: sanskrîtî "sîdati", inglîzî "sit, latînî "sido", lîtwanî "sedeti"...

Ji bilî "ni-", herwiha "we-" û "zi-" di çend lêkeran de tarîxiyên pêşlêker in. Bo nimûne, "we-" di lêkerên "westandin/westîn" û "ra-we-standin/rawestîn" de pêşlêkerekê dîrokî ye. "st-" ya di wê de

---

<sup>92</sup> Pêşpirtika "we-" di peyva "we-şandin" de ji pêşpirtikên din yê berî wê rêzkirî cuda ye. Erê peyva "şandin" di kurmançî de heye (tevî ku ew di kurmançiya rojhilatî de peyda nabe) lê di rastiyê de peyva "we-şandin" ne ji wê ye, ew peyveke serbixwe ye, ne ji "we+şandin" hatiye çêkirin.

ji proto-hindûewropî "steh-" ya bi maneya "rawestîn, sekinîn" e di gelek zimanên hindûewropî de heye: farisî "istaden", ermenî "stanal", rûsî "stat", inglîzî "stand", latînî "stare", lîtwanî "stoti"...

Pêşlêkera tarîxî "zi-/zî-" di lêkerên "zivirandin/zîvirandin, zivirîn/zîvirîn" de heye. Ew teqrîben maneya "ber-" yan "der-" dide. "-vir-" ya di "zivir-" de hevrehê "ger-"a di "gerandin, gerîn" de ye.

Lê "ni-, we-, zi-" ji pêşlêkerên niha yê wêk "ber-, da-, der-, hil-, ra-, ve-, wer-" di bikaranîna xwe de cuda ne. Ew bi temamî bi lêkera xwerû ve zeliqîne û pirtikên neyînî yan demî tîn berî wan, ne navbera wan û lêkera xwerû. Bo nimûne, "di-zivirin, na-nivîsim, ne-di-westand" rast in, ne "\*zi-di-virin, \*ni-navîsim, \*we-ne-di-stand".

### 3.2.4. Çi ne pêşlêker in?

Navdêr yan rengdêrên ku li gel lêkerên xwerû hin lêkerên pêkve (hevedudanî, compound) pêk tînin, ne pêşlêker in. Bo nimûne, "kar kirin" yan "nîşan dan" yan "mezin bûn/kirin" ne lêkerên bi pêşlêker in, lê lêkerên pêkve ne.

Herwiha lêkerên daçekdar (prepositional) jî ne pêşlêker in. Bo nimûne, "lê dan, pê kirin, jê kirin" ne pêşlêker yan lêkerên bipêşlêker in. Lêkerên bi daçekên cînavî jî, wêk "pêk hatin, pev çûn, li hev kirin" ne lêkerên bipêşlêker in.

### 3.2.5. Ji yekê zêdetir pêşlêker li pey hev?

Du yan zêdetir pêşlêker li gel hev li lêkerekê xwerû zêde nabin. Lê peyva "veberanîn, veberînan" yan jî forma wan ya sormancî "veberhênan" wisa ye wêk ku ji du pêşlêkeran (ve-ber-) pêk hatibe. Lê di rastiye de "ber-"a wê ne pêşlêker e lê navdêrekî bi maneya "berhem, deramet" e.

Herwiha peyvên "daweşandin, veweşandin" wisa dixuyin wêk ku ji "da-we-şandin, ve-we-şandin" pêk hatibin anku di wan de du pêşlêker pêk hatibin. Lê di rastiye de "we-" ne pêşlêker e û peyva xwerû "weşandin" e, ne "şandin" e.<sup>93</sup>

---

<sup>93</sup> Lê wisa diyar e ku "weşandin"ê maneya xwe ya neolojîzm anku wateya "çap kirin, belav kirin" jî tesîra "şandin"ê de û bi texmîna ku ji wê be wergirtiye.

Lê pêşlêkerên niha dikarin di heman de li gel pêşlêkerên tarîxî peyda bibin:

- ra-we-standin
- rû-ni-ştin
- ve-ni-vîsîn

Di wan de pirtikên neyînî û demî dikarin bikevin navbera pêşlêkerên niha û beşên din yê lêkerê:

- ra-di-we-standin
- ra-ne-we-standin
- ra-ne-di-we-standin

### 3.2.6. Çemandina lêkerên bi pêşlêker

Di kurmançî de û di kurdî bi giştî de lêker diçemin anku ditewin. Ew pêşpirtikan û paşpirtikan werdigirin. Pêşpirtika dikarin demê, fermanê, mercê yan neyîniyê diyar bikin.

Lêker dikarin pêşpirtikên demî wergirin, wek "di-bêjim" ("di-" wek nîşana dema niha) yan "di-got" ("di-" wek nîşana berdewamiyê), "na-bêjim, ne-got" ("na-, ne-" wek nîşana neyîniyê) yan "bi-ke!" ("bi-" wek nîşana fermanê) yan "(heke) bi-kim" ("bi-" wek nîşana mercê anku şertî).

Herwiha bi pêşpirtikan kes li lêkerê tê zêdekirin, wek "di-k-im, na-k-im" ("-im" wek nîşana kesê yekem yê yekhejmar anku "ez") yan "di-k-î, na-k-î" ("-î" wek nîşana kesê duyem yê yekhejmar anku "tu") yan jî "di-k-in, na-k-in" ("-in" wek nîşana kesên pirhejmar "em, hûn, ew"). Herwiha bi paşpirtikan dem tê diyarkirin, wek "kir-i-ye" ("-ye" wek dema borî ya dûdar) û "kir-i-bû" ("-bû" wek nîşana dema borî ya çîrokî).

Wek ku tê dît, pêşpirtik yekser anku dîrekt û rasterast bi lêkera xwerû ve tîr girêdan û nivîsîn. Lê me li jor dît ku pêşlêker jî yekser bi lêkera xwerû ve tîr girêdan.

Madem ku hem pêşpirtik û hem jî pêşlêker yekser bi lêkera xwerû ve tîr girêdan, gelo heke ew di eynî demê de hebin, mesele dê çawa hel bibe? Kîjan ji wan dê yekem be û kîjan jî bikeve nava wê û lêkera xwerû?

Di piraniya devokan de û di hê jî zêdetir di nivîsînê de, lêkerên bi pêşlêker tên keliştin û pêşpirtikên demî û neyînî dikevin navbera pêşlêkerê û lêkera xwerû. Peyrêzî di zimanê nivîskî de bi piraniyeke gelek mezin wiha ye:

**pêşlêker + neyînî + pirtika demî + lêkera xwerû**

Bo nimûne, lêkera "vekirin" dibe:

- ve-ne-di-kir

ku tê de:

- ve-: pêşlêker
- ne-: pirtika neyînî
- di-: pirtika demî
- kir: lêkera xwerû

Lê bi devkî du formên din jî mimkin in:

- nevedikir
- nedivekir

Lê pirtika neyînî divê herdem berî pirtika demî be, loma formên wiha ne mimkin in:

- \*dinevekir
- \*vedinekir

Herçi pêşpirtika fermanî yan mercî "bi-" ye, wek "bike, bikim", ew hema-hema di zimanê devkî de qet nayê bikaranîn:

- rûne (ne \*rûbine)
- vexwe (ne \*vebixwe)
- (ez) rûnim (ne \*rûbinim)
- (tu) vexwî (ne \*vebiwî)

Hin caran mirov bikaranîna "bi" di hin nivîsan de dibîne. Bo nimûne, li cihê "wergire, wergirim", formên wek "werbigire, werbigirim" tê nivîsîn. Lê wek ku me di nivîseke din de diyar kiriye, ev awayê

bikaranînê hîperkorektî ye anku "zêde-rastî" ye ku bi xwe yek ji awayên xelet yên bikaranîna zimanî ye.

### 3.2.7. Wateyên pêşlêkeran

Wek ku me li destpêkê gotiye, pêşlêker wateya lêkera xwerû piçekê diguherînin. Lê gelo mirov dikare bibêje ku her pêşlêkerê bi xwe wateyek heye ku her cara tê pêşiya lêkereke xwerû, eynî maneyê dide lêkerê? Yan jî gelo maneya ku pêşlêker dide lêkerê her carê cuda û nepayî anku pêşbînînekirî ye?

Bi kurtî, mirov dikare bibêje ku bersiva herdu pirsan neyînî ye. Anku ne her pêşlêkerê maneyeke neguhor ya herdemî heye û ne jî maneya wê bi temamî nepayî ye.

Lê maneya hin pêşlêkeran ji ya pêşlêkerên din zelaltir û kêmtir-guhor e.

Bo nimûne, pêşlêkera "der-" herdem maneya livîn yan livandina ji hindir ber bi derve diyar dike:

- derketin
- derxistin
- derçûn
- deranîn

Herwiha maneya pêşlêkera "hil-, hel-" (hilgirtin, hildan, hilanîn, hilhatin...) jî teqrîben herdem liva ber bi jor ve ye. Dîsa pêşlêkera "da-" (daketin) bi piranî wateya liva ber bi jêr ve dide.

Lê mirov dikare gelek lêkerên bi van pêşlêkeran bide ku van maneyên bingehîn nade. Bo nimûne, zehmet e ku mirov bibîne ka "dagirtin" bi maneya "tijî kirin" yan "damezrandin" bi wateya "ava kirin" çi têkilî bi liva ber bi jêr de heye. Mirov dikare heman tiştî bo peyvên "hilbûn, hilkirin" yên bi maneya "agir vêketin/vêxistin" jî bibêje: çawa maneya liva ber bi jor ve dide?

"Wer-" bi maneya xwe ya bingehîn "qulipîn, serberjêr bûn" e, wek di peyvên "wergerrîn, wergerrandin" anku "qulipîn / qulipandin, serberjêr bûn / kirin". Lê dîsa jî mirov dikare bipirse, gelo çi têkiliya peyva "wergirtin" (bi dest xistin, bi dest ve anîn, standin) bi "qulipabdin / qulipîn"ê re heye.



Gelek caran tê gotin ku pêşlêkera "ve-" wateya dîsa û dubarebûnê dide. Bo nimûne, "vegerîn" dikare maneya "dîsa gerîn/hatin" dide. Lê mirov divê bipirse, gelo çi peywendiya peyvên "vebûn, vekirin" li gel dubarebûnê yan dubarekirinê re heye.

Pêşlêkera "ber-" bi piranî maneya "belav bûn, belav kirin" yan "rê lê vekirin"ê li lêkera xwerû zêde dike. Bo nimûne, "berdan" bi maneya "êdî negirtin, rizgar kirin". Lê heman peyva "berdan" wateya "agir vexistin, agir avêtin"ê dide. Têkiliya di navbera "belavbûn"ê û "agrvexistin"ê de hebe jî, ew maneyeke firehkirî ye ku bi dîtina yan bihîstina yekem ne zelal e.

Pêşpirtika "ra-" dikare wek dijawateya "ber-"ê bêt hesabandin. Bo nimûne, "ragirtin" (rê li ber girtin). Lê hin caran jî maneya wê ne wisa zelal e. Bo nimûne, "rabûn, rakirin".

### 3.2.8. Heman wate bi pêşlêkerekê din

Li jor, di bin sernavê "wateyên pêşlêkeran" de, hatiye diyarkirin ku her pêşlêkerê ne tenê wateyê zelal û neguhor heye lê belkî çend mane hene yan jî hin caran bikaranîna pêşlêkerekê li derekê bi maneyê nediyar e. Di heman demê de, mirov dikare bipirse: gelo heman wate herdem bi eynî pêşlêkerê tê diyarkirin?

Wek ku hatiye gotin, wateya pêşlêkera "hil-" liva ber bi jor ve ye. Lê gelo liva wisa herdem bi pêşlêkera "hil-" tê diyarkirin. Bersiva vê pirsê neyînî ye: heman wate ne herdem bi eynî pêşlêkerê tê diyarkirin.

Bo nimûne, di lêkerên "rabûn, rakirin"ê mebest bê guman livîna yan livandina ber bi jor ve ye. Lê dîsa jî em dibêjin, "rabûn, rakirin", ne "hilbûn, hilkirin". Bi heman awayî, "da-" nîşana liva ber bi jêr ve ye. Lê dîsa jî "rûniştin" – ku bê guman livîna ber bi jêr ve ye – ne bi "da-" lê bi "rû-" ye.<sup>94</sup>

### 3.2.9. Lêkersazî bi paşlêkeran

---

<sup>94</sup> Di soranî de bi "da-" ye, "daniştin".

Wek ku li jor diyar bûye, pêşlêkeran di kurmançî de û di kurdî bi giştî de jî roleke gelek giring heye. Lê rola paşlêkeran di kurmançiya nivîskî ya bi alfabeya latînî de heta niha kêr e yan heta mirov dikare bibêje ku nîne.

Sebebê kêmiya rola paşlêkeran di kurmançiya nivîskî de ew e ku di kurmançiya navendî<sup>95</sup> de – ku di bingehê kurmançiya nivîskî ya bi alfabeya kurdî-latînî ye – paşlêker qet peyda nabin. Lê di kurmançiya rojhilatî de û herwiha di kurdiya navendî (soranî) û kurdiya başûrî de (feylî, klehurî, kirmaşanî) bi kêrî paşlêkerê heye.

Di kurmançiya rojhilatî de ew paşlêker ”-eve” yan ”-ve” ye. Di soranî de ew ”-ewe-” ye. Di devokên kurdiya başûrî de li gor devokan ew ”-ew, -aw, -ow, -ev, -eve, -ewe, -ewa, -a, -we, -wa” ye.<sup>96</sup>

Di soranî û başûrî de ew paşlêker hem maneya pêşlêkera ”ve-” ya kurmançî dide (bo nimûne bi soranî ”kirdin-ewe, gerran-ewe” bi kurmançî ”ve-kirin, ve-gerrîn” in) û hem jî wateya dubarekirinê didin. Bo nimûne, ”hat-ewe = dîsa hat, vegerrî”.

Di kurmançiya rojhilatî de hem pêşlêkera ”ve-” heye (wek ”vekirin, vegehandin”) û hem jî paşlêkera ”-eve, -ve” heye, wek ”hat-eve, hat-ve” anku ”dîsa hat” yan ”vegerrî”. Berevajî ”ve-” ya pêşlêker – ku gelek caran lê ne herdem maneya ”dîsa” û ”dubare” dide – ”-eve, -ve” herdem wateya ”dîsa, dubare” didin.

### 3.2.10. Pirsgirêk

Vê dawiyê bikaranîna ”ve-” ya pêşlêker bi maneya ”dîsa, dubare” li ber pêşlêkera ”re-” ya inglîzî û hin zimanên din hatiye zêdekirin. Mirov dikare wê bi hêsanî li lêkerên xwerû zêde bike: ”vedîtin, vedizîn, vegotin, venivîsîn”.

Lê di kurdî de gelek lêkerên pêkve yan pêkhatî hene ku ji navdêrekê yan rengdêrekê û lêkereke xwerû pêk tên, wek ”ava kirin, nîşan dan”. Yan jî heta lêker dikare ji daçekê, navdêrekê û lêkereke xwerû pêk bê, wek ”bi kar anîn, ji bîr kirin”.

<sup>95</sup> Bo parvekirina devokên kurmançî li ser sê pişkan (rojhilatî, navendî û rojavayî) li gor rêzimana wan, binêre: <http://kurdigeh.com/details.aspx?an=501>

<sup>96</sup> Bo bikaranîna pêşlêker û paşlêkeran di kurdiya başûrî de binêre: Ismail KamandÂr Fattah: Les Dialectes kurdes méridionaux: étude linguistique et dialectologique. Louvain, Peeters, 2000, rûpel 456 – 464.

Gelo em ê çawa bikarin "ve-" li gel wê bi kar bînin. Em dizanin ku mirov lêkera xwerû ya inglîzî "build" (ava kirin) dikare bi hêsanî bike "rebuild" (dîsa ava kirin, ji nû ve ava kirin). Lê gelo em ê çawa "ava kirin"ê bi "ve-"yê bikin dubare?

Dema ku lêker navdêrkirî be, anku mirov "avakirin"ê wek navdêr bi kar bîne (bo nimûne "avakirina xaniyan"), hingê zêdekirina "ve-" li wê ne dijwar e: "veavakirina xaniyan". Lê heke peyv wek lêker bê bikaranîn, hingê em ê "ve-" li kû zêde bikin? "Em xaniyan veava dikin" yan "em xaniyan ava vedikin"?

Heke zêdekirina "ve" li rengdêra "ava" hêsan be, gelo em ê çawa wê li gel daçekên we "bi, ji, li" bi kar bînin: "ve ji bîr kirin, ve bi kar anîn" yan "ji bîr vekirin, bi kar veanîn" yan çî?

Herçî bikaranîna paşlêkera "-eve, -ve" ya kurmanciya rojhilatî ye, ew wek li gel lêkerên pêkhatî ji "ve-" ya pêşlêker hêsanî e: "ava kirin-(e)ve, bi kar anîn-(e)ve" anku "dîsa ava kirin, ji nû ve ava kirin; dîsa/dubare bi kar anîn".

Lê pirsgirêka "-eve, -ve" ya paşlêkera îcar li gel bikaranîna lêkerên navdêrkirî heye. Mirov dê çawa bibêje "dîsa avakirina xaniyan"? Awayê "\*avakirin(e)veya xaniyan" yan "bikaranîn(e)veya kompûterê" ne di ti devokên kurmancî de heye û ne jî normal dixuye.

Çareseriyek bo vê pirsgirêkê bikaranîna hem pêşlêkera "ve-" û hem jî paşlêkera "(e)ve" ye. Mirov dikare "ve-"yê li gel lêkerên pêkhatî yên navdêrkirî de bi kar bîne, wek:

- veavakirina xaniyan, vebikaranîna kompûteran

Lê paşlêkera "(e)ve" jî di haletê lêkerên pêkhatî wek lêker de di kar bîne:

- xanî ava kir(e)ve, kompûter bi kar anîve

Wek din jî, paşlêkera "-(e)ve" ya kurmanciya rojhilatî hêja ye ku neqlî nav kurmanciya nivîskî ya bingeha wê kurmanciya navendî were

### 3.3. Lêker ji birrên din ên peyvnan?

Heta niha me behsa çêkirina lêkeran ji navdêran yan jî ji rehên samî kiriye. Gelo lêker dikarin bi paş- yan pêşpirtikan ji birrên din jî yê peyvan peyda bibin.

Vê dawiyê hin hewl hatiye dan ku çend lêker ji rengdêran (hevalnav, sifet, *adjective*) jî bên çêkirin:

- rast → rastandin<sup>97</sup> (bi maneya “rast kirin” yan “izbat kirin ku rast e”, gotin ku rast e”, bidin ber “derewandin”)
- aram → arimîn (aram bûn, rehet bûn, hedirîn, hedîn, vehesîn)<sup>98</sup>

Lê çêkirina lêkeran ji rengdêran heta niha diyardeyeke pir bisinor û nû ye. Çend peyvên ji wan çêkirî jî heta niha berbelav nebûne. Ew bi piranî di tekstên werger de hatine bikaranîn û bi piranî jî nehatine çemandin anku tenê bi forma xwe ya ferhengî mane.

Lêkersaziya ji daçek û hokeran jî pir bisinor e. Mirov dikare du -sê nimûneyan bide:

- der → derandin<sup>99</sup> (derxistin, anîn derê/derve, nîşan dan, *to take out, to show*)
- hindir (hindur, hundir) → hindirandin<sup>100</sup> (tê de hebûn, hewandin, şamil bûn; kirin tê de, *to include*)
- ji nişkê ve → nişxivîn<sup>101</sup> (mat kirin, ecêbgirtî kirin, surprîz kirin, bûn surprîz ji kesekî re, *to surprise*)

## 4. HOKERSAZÎ

Hoker (zerf, *adverb*) dikarin di kurdî de bi alîkariya pêşpirtik û paşpirtikan bên çêkirin:

- pêşpirtik:

<sup>97</sup> Nimûneyek ji bikaranîna peyva “rastandin”: <http://www.felsefevan.org/wesfen-zanayiya-zanisti.html>

<sup>98</sup> Nimûneyek ji bikaranîna vê peyvê:

[https://m.facebook.com/permalink.php?story\\_fbid=916301631750815&id=839485579432421&substory\\_index=0](https://m.facebook.com/permalink.php?story_fbid=916301631750815&id=839485579432421&substory_index=0)

<sup>99</sup> Nimûneyek ji bikaranîna peyva “derandin”: “Rewşa nû, li herêma di navbera hêzên alîgirê guherînê û hêzên statukoparêz de, têkoşîneke berfireh û sift derandiye holê.”

[https://wikisource.org/wiki/Bernameya\\_Kongreya\\_Gel%C3%AA\\_Kurdistan%C3%AA\\_2003](https://wikisource.org/wiki/Bernameya_Kongreya_Gel%C3%AA_Kurdistan%C3%AA_2003)

<sup>100</sup> Nimûneyek ji bikaranîna peyva “hindirandin / hundirandin”: “Khaled Khayati, bi xebata xwe ya ku xusûsiyetên lêgerîna cih û waran jî dihundurîna ya bi navê “Diasporic Narratives of Serhedî Kurds in France – Memory of Homeland, Refugee-hood and Social Exclusion”ê mexdûriyeta kurdên Serhedê yê li Fransa dijîn a ku li Kurdistanê dîtine, trawma û êşên xwe berdane bin hişmendiya wan bandoreke çawa li jiyana wan kiriye û ev êş û trawma bi çî awayî veguherîne mînakên girîng ên gilî û gazinên vegotina mexdûriyeta diyasporayê. Khayatî bi vê xebata xwe di warê civakî de nimûneyeke xweser a lêgerînê pêşkêş dike.” <http://nubiharakademi.com/ji-editor-2.html>

<sup>101</sup> Nimûneyek ji bikaranîna peyva “nişxivîn”: “Ev babetên han, nişxivîn, gumanî û matbûnê hemiyê dixin di bizavekê de, bi hev ra dikevin livînê û divê mirov vêra biçe û li ser bifikire.” <http://da.netlog.com/kovansindi/blog>

- zor → bi zor: *Min bi zor karî wî karî bikim.* (bi zhemetî)
- çek → bê çek: *Dijmin revî û pêşmerge karî bê çek wî bajarî bigirin.* (bêyî ku çekan bi kar bînin.)
- paşpirtik:
  - roj → rojane (her roj): *Ew rojane kar dike.*
  - hêdî → hêdîka: *Ev pîrejin hêdîka dimeşe.*

## 4.1. Hoker ji navdêran

### Pirtika *bi*

Awayê herî berbelav ê çêkirina hokeran di kurdî de bi alîkariya navdêran li gel peyvika “bi” ye:

- bi roj (*daily*), bi şev (*at night*), bi xweşî (*joyfully*), bi şadî (*happily*), bi rehetî (*calmly, in a calm manner*), bi xirabî (*badly*), mêranî (*bravely*)...

Wek ku tê dîtîn, hin ji van peyvên bingehîn di eslê xwe de pêşî ji rengdêriyê bûne navdêr û paşî jî bi alîkariya “bi” bûne hoker:

rengdêr →	navdêr →	hoker
xweş	xweşî	bi xweşî
şad	şadî	bi şadî
rehet <sup>102</sup>	rehetî	bi rehetî
xirab <sup>103</sup>	xirabî	bi xirabî
mêr <sup>104</sup>	mêranî	bi mêranî

Cudahiya peyvika “bi” di çêkirina hokeran de ji “bi” ya daçek ew e ku peyva serekî li pey daçekê diçeme lê di hokersaziyê de naçeme:

- “bi” wek daçek: bi + hêz → bi hêz-ê (*by force, with power*)

<sup>102</sup> “Rehet” û “xirab” a li dûv wê ji erebî ne û bi eslê xwe di erebî de navdêr in lê di kurdî de ew wek rengdêr tên bikaranîn. Formên wan ên navdêr “rehetî, xirabî” ne.

<sup>103</sup> Binêrin têbîniya pêştir.

<sup>104</sup> Bi eslê xwe peyva “mêr” navdêr e lê li vê derê bi guhastinê bi maneya “wêrek, bicesaret, bisteh” wek rengdêr hatiye bikaranîn û forma wê ya navdêr wek “mêranî” hatiye çêkirin.

- “bi” di hokersaziyê de: bi + hêz → bi hêz (*forcibly, powerfully*)

Carinan herdu form jî mimkin in:

- bi zor (hemû komik / fraz bi hev re = hoker)
- bi zorê (bi = daçek, zor = navdêr)

Cuhdahiya “bi” di hokersaziyê de ji “bi” di rengdêrsaziyê de ew e ku di hokersaziyê de ew ji peyva serekî cuda tê nivîsîn lê di rengdêrsaziyê de ew bi peyva pey xwe ve dizeliqe:

- rengdêr: bi + hêz → bihêz: *Ew kesekî bihêz e.* (ew xurt e, ew qewî ye)
- hoker: bi + hêz → bi hêz: *Ew bi hêz şer dike.* (bi xurtî)

### **Pirtika bê**

Dijberên hokerên bi “bi”, bi alîkariya “bê” tên çêkirin:

- bê xweşî (*joylessly*), bê şadî (*unhappily*), bê rehetî (*uneasily*)...

Pirtika “bi” herwiha bi ketina nav peyveke dubarekirî jî hokeran çêdike:

- roj bi roj
- sal bi sal
- cih bi cih
- ser bi ser

Em ê paşî di beşa li ser peyvsaziya bi dubarekirinê zêdetir li ser vê rawestin.

Navdêr ne tenê bi alîkariya peyvikên “bi” û “bê” lê herwiha bi hin paşpirtikan jî dibin hoker:

### **Paşpirtika –ane**

Vê dawiyê paşpirtika –ane bi rêya soranî ji farisî ketiye kurmancî jî û xaseten di zimanê nivîskî de pir tê bikaranîn bo çêkirina hin peyvan ji navdêran. Gelek ji wan peyvan hem wek hoker, hem wek hoker û hem navdêr tên bikaranîn:

- mehane:
  - rengdêr: *kovara mehane* (ya ku her mehê carekê derdikeve, *monthly*)

- navdêr: mehaneya wî 3 000 dolar e (meaş, muçe, pareyê ku her mehê ji ber karkirina xwe werdigire, *monthly salary*)
- hoker: em mehane hev dibînin (her mehê, her mehê carekê, di mehê de carekê, *every month*)

Tevî ku ev paşpirtik heta van dehsalên dawiyê di kurmancî de tine bû jî, ew niha di zimanê nivîskî de bi awayekî pir aktîv tê bikaranîn û bikaranîna wî roj bi roj zêdetir dibe.

### **Paşpirtika -kî**

Paşpirtika –kî hin hokeran bi taybetî ji navên gel an deveran çêdike:

- erebkî (wek ereban, mîna ereban)
- ermenkî (wek ermenan, mîna ermenan)

Paşpirtika –kî herwiha dikeve pey peyveke dubarekirî jî û wisa hokeran çêdike:

- paşpaşkî, pêşpêşkî

## **4.2. Hoker ji rengdêran**

Piraniya rengdêran yekser bi guhastinê bêyî ti pêşpirtik û paşpirtikan wek hoker tînin bikaranîn (*li beşa li ser guhastinê li pêştir binêrin*). Lê çêkirina hokeran ji rengdêran bi alîkariya paşpirtikan jî mimkin e tevî ku ne pir berbelav e jî.

### **Bi paşpirtikên –î û -ê**

Hin rengdêr di kurmanciya navendî de dikarin bi paşpirtika –î bibin hoker. Di kurmanciya rojhilatî de li cihê wê paşpirtika –ê tê bikaranîn. Di herdu komdevokan de jî mimkin e ku ew heman rengdêr bêyî ti paşpirtikê bi guhastinê wek hoker bînin bikaranîn:

rengdêr →	hoker bi -î	hoker bi -ê	hoker bi guhastinê
gelek	gel(e)kî	gelekê	gelek
hin(d)ek	hin(e)kî	hindekê	hin(d)ek
piçek	piç(e)kî	piçekê	piçek

Paşpirtikên -î û -ê di çêkirina hokeran ji rengdêran de êdî ne berhemdar û çalak in. Mirov nikare ji bilî van nimûneyên li jor (û belkî du-sê libên din) zêdetir hokeran pê ji rengdêran çêke.

### Paşpirtika -ka

Çend rengdêr bi alîkariya paşpirtika -ka dibin hoker:

- dûr → dûrka
- hêdî → hêdîka
- zû → zûka

Bikaranîna vê paşpirtikê jî di hokersaziyê de nadir e û zehmet e ku mirov çend nimûneyên ji bilî bibîne.

### Paşpirtika -en

Ev paşpirtika bi eslê xwe erebî ye û bi piranî tenê li gel peyvên ji erebî wergirtî heye. Ew hokeran hem ji rengdêran û hem jî ji navdêran saz dike:

- heqîqet → heqîqeten
- ihtimal → ihtimalen
- qetî, qet'î → qetiyen
- waqî' → waqî'en, waqiyen
- tarîxî → tarîxiyen

Carinan rengdêr bi xwe di kurdî de cih negirtiye yan pir kêm li kar e lê hokera jêçêkirî peyda dibe û berbelav e. Bo nimûne:

- teqrîb-en



Hin caran ev hem paşpirtik li peyvên ne-esil-erebî jî tê barkirin:

- dîrokî → dîrokiyen<sup>105</sup> (wek wergera “tarîxiyen”)

### III PEYVSAZÎ BI DUBAREKIRINÊ<sup>106</sup>

---

<sup>105</sup> Nimûneyek ji bikaranîn peyva “dîrokiyen”: “Lê ermenî jî hin peyv dane zimanên îranî, bi taybetî kurmancî û zazakî ku dîrokiyen bi ermeniyan re û di nav ermeniyan de hebûne.” <https://zimannas.wordpress.com/2015/11/19/peyven-me-ji-ku-ten-2/>

<sup>106</sup> Mijara peyvsaziye bi kurdî baş nehatiye vekolîn. Ez ne haydar im ku heta niha ti lêkolîneke zimannasî li ser peyvsaziya bi dubarekirinê di kurmancî yan zazakî de hatibe kirin. Yek ji kêma lêkolînên di vî warî de nivîsareke Mihemed Mehend û Mesûd Mihemedradî ya bi farisî *بررسی صوری و معنایی تکرار در کردی سورانی (Vekolîna dirûvî û wateyî ya dubarekirinê di kurdiya soranî de)* ye ku di hejmarê 3 ya kovara *زبان‌ها و گویش‌های ایرانی (Ziman û Zaravayên Îranî)* ya saziya ziman û edebiyata farisî Ferhengistanê de hatiye belavkirin. Li ser peyvsaziya bi dubarekirinê di kurdiya başûrî (feylî, kelhurî, kirmaşanî) de jî Ismaîl Kemendar Fettah çend rûpelên kitêba xwe ya bi fransî *Les Dialectes Méridionaux Kurdes* dide mijarê. Me ev lêkolîn jî li ber çavan girtine lê hêjayî gotinê ye ku ji ber zimanên pê nivîsandî (farisî û fransî) piraniya kurdan nikarin sûde ji wan wergerin. Herwiha hem wan cih nedaye zaravayên din ên kurdî (xaseten zaravaya serekî kurmancî) û hem jî wan jî gelek ji tiştên bingehîn ên peyvsaziya bi dubarekirinê ya di zaravayên mijara wan jî nivîsandî hiştine. Loma em vê vekolîna niha li ber destê we wek zerûriyekê dibînin. Ji bilî lêkolînên behskirî, çavkaniya me ya serekî ya navneteweyî kitêba *Reduplication: Doubling Morphology* Sharon Inkelas û Cheryl Zoll e. Ji ber nêzîkiya gelek mijaran di kurdî û farisî de, me ji çendîn vekolînên li ser peyvsaziya bi dubarekirinê di farisî de jî wergirtiye. Lê dîsa jî di hin mijaran de dubarekirina peyvan di farisî û kurdî de ji hev cuda ye, herwiha gelek ji nimûneyên di kurdî de di farisî de peyda nabin û berevajî. Herçi nimûneyên di vê vekolînê de pêşkêşkirî ne, min bi xwe ew ji xwandinên berhemên kurdî bijartine. Eger nimûne peyveke naskirî û berbelav be, çavkaniya wê nehatiye dan ji ber ku mirov dikare di gelek ferheng û berheman de bibîne. Eger peyva nimûne nadir an kêmnaskirî be, hingê çavkaniyeke bikaranîna wê hatiye dan.

Di kurdî û gelek zimanên din de jî hin peyvên nû bi alîkariya dubarekirina peyvên heyî tên çêkirin. Em ê ji vî awayê çêkirina peyvan re bibêjin **dubarekirin** (bi inglîzî *reduplication*).

Dubarekirin dikare temam anku kamil be (*full reduplication*) yan jî pişkî anku beşî be (*partial reduplication*). Di dubarekirina temam de peyva serekî bi temamî tê dubarekirin lê di dubarekirina pişkî de tenê beşek ji peyva bingehîn tê dubarekirin.

## 1. Dubarekirina temam

Di dubarekirina temam anku kamil (*full reduplication*) de peyva serekî bi temamî tê dubarekirin:

Di kurdî de dubarekirina temam dikare xwerû be (*pure*), binavber be (*medial*) yan jî bidûvik be (*final*).

### 1.1. Dubarekirina temam a xwerû

Di dubarekirina temam a xwerû (*pure full reduplication*) de peyva bingehîn tê dubarekirin lê ti tiştêkî din lê zêde nabe. Loma peyv xwerû ye û xwerû dimîne. Di nimûneyên me de wate û maneya peyvê di nav kevanan de ye. Li peyv wê peyv di hevokên mînak de hatiye bikaranîn):

- parçe → parçe-parçe (parçekirî, kirî çend parçe): *Kurdistan hatiye parçe-parçekirin.*
- hêdî → hêdî-hêdî (gelek hêdîka): *Ew hêdî-hêdî bi rê ve diçû.*
- yek → yek-yek (her yek bi çarekê, her yek bi tenê, yek li pey ê din): *Mêvan yek-yek hatin.*
- car → car-car (hin caran, carinan): Em car-car hev dibînin.
- cuda → cuda-cuda (ji hev cuda, ne wek hev, ji gelek cûnan/coran): *kitêbên cuda-cuda*
- bere (berre) → bere-bere (berre-berre): *Em kar dikin û bere-bere bêhna xwe vedidin.*

Hin peyvên dubarekirî tenê wek dubarekirî hene û peyva dubarekirî bi tenê peyda nabe. Stêrka \* li ber peyvê diyar dike ku formeke wisa ya serbixwe di zimanî de peyda nabe:

- \*piço → piço-piço (piçek, hinek, hindik, her hinek bi carekê

Anku peyva “piço” bi tenê di kurmançî de peyda nabe, herdem tenê wek “piço-piço” mimkin e.

## 1.2. Dubarekirina tamam a binavbir

Di dubarekirina tamam a binavbir / binavbirr (*medial full reduplication*) de peyva bingehîn tê dubarekirin lê herwiha tiştê dikeve navbera peyva dubarekirî jî. Ev “navbirk” (navbirrk) dikare pirtikeke girêdayî yan jî peyvikeke serbixwe be:

- pirtikeke girêdayî: nalenal
- pirtikeke serbixwe: roj *bi* roj

Çendîn navbirkên ji hev cuda di kurdî de beşdarî peyvsaziya bi dubarekirinê dibin. Li vê derê em wan li gor berhemdarî û çalakiya wan rêz bikin: yên destpêkê pir tîn bikaranîn, ên dawiyê kêmtir yan pirr kêr.

### 1) **bi** (soranî: be)

Ev peyvik di peyvsaziya bi dubarekirinê de pir aktîv e û mirov dikare bibêje ku bikaranîna wê di vî warî de hema-hema bêsinor e:

- roj bi roj (her roj): *Roj bi roj lêkolînên li ser zimanê kurdî zêdetir dibin.*
- ser bi ser (beramberî hev, wek bedelên hev): *Me tirimpêlên xwe ser bi ser dan.* (Min a xwe da wî, wî ya xwe da min.)
- bajar bi bajar: *Ew bajar bi bajar çûn heta ku Diyarbekirê gihîştin Dihokê.*
- yek bi yek (her yek bi carekê, yek li pey a din): *Em ê rêbazên peyvsaziya bi dubarekirinê yek bi yek bidin nasîn.*

Piraniya gotinên wiha dubarekirî maneyeke diyar ya pêşbînîkirî didin. Lê hin peyvên wiha çêkirî bûne xwedî wateyên taybet:

- derbider ji “der(î) bi der(î)” anku ji ber deriyekî çûn ber deriyê din. Ew maneya “aware, penaber, bêmal, bêwar” û hem jî wateya “jar, hejar, perîşan, belingaz, şerpeze” dide (kesa/ê ku li ber deriyên xelkê digere û daxwaza alîkariyê jê dike).

Di soranî û zazakî de ev navbirk bi awayê *be* ye, di kurdiya başûrî de (feylî, kelhurî, kirmaşanî) li gor devokan *be* yan *we* ye. Di n peyvên ji soranî wergirtî de mirov carinan formên bi *be* jî li rex formên bi *bi* dibîne:

- corbecor, cor be cor

- corbîcor, cor bi cor

## 2) -e-

Ev navbirk bi taybetî di dubarekirina dengên (*onomatopoetîk*) de tê bikaranîn:

- xişexiş (dengê xişîna dubare yan berdewam)
- dîngeding
- xîrexîr / xîrrexîr
- gûrmegûrm
- mîremîr / mîrremîr
- xuşexuş
- nalênal

Piraniya van dengên jî di kurmancî de yan tenê dubarekirî tên bikaranîn an bi paşpirtika –în yan –andin wek lêker tên xebitandin:

- wek lêkerên gerguhêz (intransîtîv): xuşîn, nalîn, xişîn...
- wek lêkerên gerguhêz (transîtîv): xuşandin, nalandin, xişandin...

Heman deng hin caran bênavbir jî tên bikaranîn anku bi dubarekirina temam a xwerû:

- xîr-xîr (xîr-xîr), nal-nal, mîr-mîr (mîr-mîr)...

Di soranî de ev deng dikarin bi alîkariya paşpirtika –e lê bêyî dubarekirinê jî bên bikaranîn:

- nafe<sup>107</sup> (nalênal, nalîn)

Lê wek din ev peyvên dengî bi tenê kêman caran tên bikaranîn.

Bi marjinalî -e- hin peyvên din jî dubare dîke:

---

<sup>107</sup> Ev peyv bo nimûneyê di helbesta navdar a şair Hêmin Mukriyanî *Nafey cudayî* (Nalîna ji ber cudahiyê / xerîbiyê) de heye: <https://rojpress.wordpress.com/2011/06/04/mamosta-hemin-saqiya/>

- gir (girs, gird, mezin, zexm) → giregir<sup>108</sup> (mirovên mezin)

Ji aliyê etîmolojî ve navbirka –e- jî kurtkirina peyva *be* ye ku niha di kurmançî de bi awayê *bi* ye lê di soranî û zazakî de wek *be* maye û di kurdiya başûrî de jî li gor devokan *be* yan *we* ye.

### 3) -o-, -û-

Di navbera çend peyvên dubarekirî de navbirka “o” yan “û” heye. Gelek caran di nivîsên kurdî de bêbiryarî heye ka peyvên wisa bi kîjan ji van herdu navbirkan bînin nivîsîn:

- seroser, serûser (bi lez, ji nişkê ve): *Seroser xwe avêt nav avê.*
- devodev, devûdev: *Devodev ket erdê.*

Ji van herdu awayên gelek caran forma bi “û” (serûser, devûdev) tê tercîhkirin ji ber ku texmînen ew ji peyva “û” (wek “ez û tu”) be. Hin caran peyv tenê bi awayê “û” tê nivîsîn û bi awayê “o” nayê dîtin:

- hetaûheta, heta û heta, heta-û-heta, heta-heta (lê ne \*hetaoheta)

Lê tarîxiyên ev navbirk di rastiyê de ne ji peyva “û” ya wek di gotina “ez û tu” de hatiye. Ji aliyê etîmolojî ve ew “o” ye û dîrkoiyên wiha peyda bûye:

- “-o-” ji “-ew-” ji “-we-” ji “we” ji “be” ya bi maneya “bi” wek di gotina “roj bi roj” de (*li jortir li beşa li ser -bi- binêrin*).

Lê formên bi “-û-” ya ji peyva “û” (wek “ez û tu”) di dubarekirina pişkî de heye, bi taybetî jî di dubarekirina bi M de (*li jêrtir binêrin*.)

### 4) -ê (nêr), -a (mê), -ên (pirhejmar)

Ev navbirk dikeve navbera peyva dubarekirî û wê xurt dike:

- dînê dîn (gelek dîn, bi temamî dîn û bêhiş)

<sup>108</sup> Nimûneyek ji bikaranîna peyva “giregir”: Hikûmeta Tirkiyeyê bi serokwezîrê xwe Erdogan û cihgirê wî Bulent Arınç û gelek giregirên xwe ve van salên dawiyê lêxebitî ko Şivan Perwer qane bike da vegere welatê xwe lê belê bi ser neket.

[http://www.nefel.com/articles/article\\_detail.asp?RubricNr=8&ArticleNr=7831#.VIH4wHbqiko](http://www.nefel.com/articles/article_detail.asp?RubricNr=8&ArticleNr=7831#.VIH4wHbqiko)

- kerê ker (pir ker, pir bêaqil)
- dêla dêl (jineke/keçeke pir xirab)
- bêaqilên bêaqil (kesên pir bêaqil)

### 5) -an-, -a-, -ta-, -tan-, -dan-

Ev navbirk çend peyvên dubarekirî pêk tîne:

- seranser, seraser, sertaser<sup>109</sup>, sertanser<sup>110</sup>, serdanser<sup>111</sup> (li her derê, li hemû deran, serekî/alîyekî heta sere/alîyê din, gişt, hemû, giştî)
- beraber, beramber

Di peyva “beramber” de N ji ber tesîra dengê li pey xwe anku B bi M guheriye.

Ji aliyê etîmolojî ve ev navbirk ji peyva “ta” bi maneya “heta” hatiye (wek di peyva “sertaser”). Di peyva “sertanser” de N li peyvê zêde bûye.<sup>112</sup> Lê T jê ketiye û di varyanta -an- de N lê zêde bûye.

### 6) -aw-, -a-

Ev navbirk di du-sê peyvên vê dawiyê ji soranî wergirtî de hene:

- corawcor (ji gelek coran, ji pir cûnan, çeşîd-çeşîd)
- rengawreng (rengîn, ji gelek rengan)

Ji aliyê etîmolojî ve ev peyv jî hevrehê “bi” ye û wiha pêk hatiye:

<sup>109</sup> Nimûneyeke ji bikaranîna forma “sertaser”: “Li Başûr banga xwepêşandana sertaserî hat kirin”.

<http://www.rojnews.net/ku/dreje-y-hewal.aspx?id=25614&LinkID=26&Li-Ba%C5%9F%C3%BB-r-banga-xwep%C3%AA%C5%9Fandana-sertaser%C3%AE-hat-kirin>

<sup>110</sup> Nimûneyek ji bikaranîna varyanta “sertanser”: “Li sertanserê Rojavayê Kurdistanê nerazîbûna li dijî valakirina deverên kurdî xwepêşandan têne lidarxistin.” <https://www.rojavanews.com/kurdish/index.php/kurdistan/item/3383-rojava-news>

<sup>111</sup> Nimûneyek ji bikaranîna forma “serdanser”: “ji bo bicîhanîna karûbarên girêdayî parastina aramî û ewlekariyê li serdanserê Iraqê, hate kirin.” <http://www.gov.krd/a/d.aspx?a=28963&l=16&r=240&s=010000>

<sup>112</sup> Bo zêdebûna N li peyvan, bidin ber tac > tanc, çok > çok, çawa > çawan, dîsa > dîsan, wisa > wisan, çito (ji “çi tov”) > çiton. Lê li aliyekî din, N dikare bikeve jî: çilon (ji “çi lewn” anku “çi reng, çawa”) > çilo (çawa, çito).

- -aw- ji -ew- ji -we- ji “we” ji “be” ku niha di kurmancî de bi awayê “bi” ye.

Carinan W ji A dikeve:

- rengawreng → rengareng

## 7) -î

Ev paşpirtik jî du-sê peyvên kurmancî yê dubare ava dike:

- çendî çend (pir, gelek): *çendî çend salan*
- hindî hind (pir, gelek)

## 8) di, der

Navbirka “di” bi kêmî dikeve navbera vê gotina dubarekirî ye:

- dest di dest (bi hev re, pêkve, li gel hev)

Navbirka “der” a hevrehê farisî ya “di” ya kurmancî ye. Ew di çend peyvên ji farisî wergirtî de heye:

- sed der sed, seddersed (sed ji sedê, 100 %, bêguman)
- pey der pey, peyderpey (li pey hev, yek li pey a din)

## 9) -in-, -în-

Ev paşpirtik ihtimalen tenê di vê peyvê de heye:

- şahinşah, şahînşah (şahê şahan, şahê mezin)

### 1.3. Dubarekirina temam a bidûvik

Di dubarekirina temam a bidûvik (*final full reduplication*) de peyva bingehîn tê dubarekirin û paşpirtikek dikeve dawiya peyvê. Berevajî navbirkê, dûvik herdem bi paşgir e anku bi peyvê ve girêdayî ye.

Di kurmancî de di dubarekirina temam de du-sê dûvikên serekî û du-sê dûvikên nadir hene:

#### 1) -î

Ev dûvik komeke navdêrên dubarekirî digire û wan dike rengdêr:

- gulgulî (tişta/ê ku wêneyên gelek gulan li ser heye): kirasekî gulgulî
- xetxetî: tişta/ê ku gelek xet li ser hatine nivîsîn yan nîgarkirin
- serserî: ehmeq, tûle, sûte

Hin peyvên dubarekirî yê bidûvik jî hene ku wek peyvên dubarenekirî peyda nabin:

- pinpinî (hem wek navdêr bi maneya “pelatînk, pelîtank, pîrpirîk” û hem jî wek rengdêr bi wateya “nuqte-nuqteyî, tişta/ê ku gelek nuqte li ser hene”, bi inglîzî *spotted*)
- çinçinî (tişta/ê ku nuqteyên ji rengekî li ser rengekî din hene, bi inglîzî *spotted*)

#### 2) -ok

Ev dûvik hem navdêran ji navdêrên dubarekirî çêdike û hem jî navdêr û rengdêran ji rehên dema niha yê lêkeran saz dike:

navdêr ji navdêran:

- xal (nuqte, spot) → xalxalok (kêzikek e, *lady beetle, ladybug, ladybird*)



- mar (*snake*) → marmarok (*margîsok, lizard*)

navdêr ji rehê lêkeran

- fir-în (*firr-în*) → firfirok (*bafirok, teyarok, kaxez yan pêlîstokên din yên ku bi benekî ve tên firrandin, kite*)
- mêj- (*mêtin, mêhtin*) → mêjmêjok (*mostik, mijmijik, êmzik, soother, comforter, pacifier, dummy*)

rengdêr ji rehê lêkeran

- liv-în → livlivok (*tişta/ê ku hêdîka yan piçekê dilive*)
- hej-în → hejhejok (*tişta/ê ku dihejheje, dilivlive, dilerize, shaky*)
- leq-în → leqleqok (*tişta/ê ne sabit, tişta/ê ku xwe baş li cihê xwe nagire, ne qayim e*)
- bad-an → badbadok (*tişta/ê ku li hev hatiye badan, twisted*)

### 3) -kî

Dûvika –kî dikeve dûv çend peyvên dubarekirî:

- paş → paşpaşkî<sup>113</sup> (*ber bi paşve, backwards*): *birêveçûna paşpaşkî*
- dev → devdevkî<sup>114</sup> (*dev li pêş, face down*): *devdevkî ket erdê* (*gava ku ket, devê wî bi erdê ket*)

### 4) -e

Dûvika -e di van peyvên dubarekirî de heye:

<sup>113</sup> Nimûneyek ji bikaranîna peyva "paşpaşkî": ji bo Kurdistan serbixwe û sînoren dewletên dagîrker parçe nebin, paşûpê û paşpaşkî li kerên xelkê siwar dibin. <http://www.lotixane.com/2015/01/07/ji-xelke-re-hekan-ji-kurdan-re-zelqan-dikin/>

<sup>114</sup> Nimûneyek ji bikaranîna peyva "devdevkî": mixabin Mam Heyder devdevkî dirêjî erdê bû. <http://www.ummetiz.biz/index.php?topic=25214.0;wap2>

- kenkene<sup>115</sup>, girgire<sup>116</sup> (herdu peyv bi maneya “mirovên mezin û xwedîgotin, giregir”, *magnificent, pompous*)
- debdebe, zepzepe (mirovên bi leşê xwe gir û zexm, *huge, giant*)
- zelzele (erdlerizîn, erdhejîn, *earthquake*)

Lê ti ji van peyvên – ji bilî girgire – wek peyvên dubarekirî peyda nabin loma ihtimalen ev ne dubare ne, tenê bi tesadîfî du kîteyên wek hev di van peyvên de hene. Herçi “giregir” ye jî, guman ji rastiye wê heye ji ber ku ew bi forma “giregir” pir berbelave û ihtimalen tenê ji nezanî wek “giregir” hatiye bikaranîn.

## 5) -k:

Dûvika –k di dubarekirinê de bo nimûne di vê peyvê de heye:

- got-in → gotgotk<sup>117</sup>

Heman peyv bi awayê “gotegot<sup>118</sup>” jî heye ku bi dubarekirina binavbirk hatiye çêkirin. Ew herwiha bi şêweyê “gotegotk” jî peyda dibe ku hem navbirk (-e-) û hem jî dûvik (-k) tê de hene. Lê ji ber ku me ev awa tenê di hin ferhengan de dîtiye, guman ji hebûna wê ya rast heye. Loma em nikarin bibêjin ku ew delîleke bêguman e ku di peyvsaziya kurdî ya bi dubarekirinê de di heman demê de dubarekirina temam li gel navbirkê û dûvikê peyda bibe.

<sup>115</sup> Nimûneyek ji bikaranîna peyva “kenkene”: “Erbîl û Mûsil û Kerkûk û Bexda têkvedan û giregir û kenkene neman neçû nik”: <http://www.kulturname.com/?p=56>

<sup>116</sup> Nimûneyek ji bikaranîna peyva “giregir”: “Binêrin; çend parlementer û giregireyên BDPê pêşwazîya Barzanî kirin ya rast jî ew bû, lê heman demê li alîyê din Serokê BDP yê Amedê ber derê avahîya BDPê dijî vê seredanê daxuyanî dida.” <http://www.yuksekovaguncel.com/kongereya-netew-amed-barzan-makale,600.html>. Lê forma serdest a vê peyvê “giregir” e anku bi dubarekirina bidûvik e (li jortir binêrin.)

<sup>117</sup> Nimûneyek ji bikaranîna peyva “gotgotk”: “Mirov dijminê wî tiştî ye yê ku nas neke, vêca eva hanê neyariyekê hindek caran li cem xelkê peyda dike, we kir ku hindek gotgotkên neweyî û nerast li ser êzidiyan bêne gotin.” <http://www.pen-kurd.org/kurdi/hejar-m/hevpeyvîn-mueyed-teyib.html>

<sup>118</sup> Nimûneyek ji bikaranîna peyva “gotegot”: “Divê keç xwe ji gotegotên civakê rizgar bikin”. <http://www.kurdistan24.net/ku/interview/23071560-aff5-4ddd-915f-16e1cd9327d8/Div%C3%AA-ke%C3%A7-xwe-ji-gotegot%C3%AA-civak%C3%AA-rizgar-bikin>

## 6) -îk: çinçinîk, pinpinîk

Dûvika –îk di dubarekirina temam de bi kêmî di van peyvan de peyda dibe:

- pinpinîk, çinçinîk

## 7) -an

Bi qasî ku haydar im, dûvika -an di peyvên dubarekirî de tenê di peyva “carcaran” de heye. Ew jî peyveke çemandî ye û “-an” nîşana pirhejmara çemandî ye. Loma guman jê heye ku mirov bi rastî vê wek dûvikeke dubarekirinê hesab bike yan jî tenê wek paşpirtikeke çemandinê bihejmêre.

## 2. Dubarekirina pişkî

Dubarekirina pişkî anku beşî (*partial reduplication*) ji wê diyardeyê re tê gotin ku tê de ne hemû peyv lê tenê pişkek anku beşek jê dubare dibe. Di kurdî de adeten peyva serekî li destpêkê ye û di beşa duyem de hinek ji wê peyvê tê dubarekirin:

- tişt → tiştûmişt (hin tiştên, tiştên cuda-cuda)
- mal → malûhal (mal û tiştên têkilî malê, bo nimûne xanî, malbat, jin, zarok...)
- zar(ok) → zarûzêç (zarok û tiştên din ên malê, jin û zarok)
- teq-în → teqereq
- gurm-în → gurmegurm
- nav → navnîşan
- bivê-nevê
- kir → kir û nekir

Hin caran herdu peyv bi nirxê xwe wek hev in, mirov nikare bibêje ka kîjan peyva bingehîn e û kîjan jî tenê dubarekirina wê ye:

- gul + giya → gulûgiya (bi mebesta hemû riwek, hemû nebat)
- dûr + dirêj → dûrûdirêj

Dubarekirina pişkî dikare xwerû yan jî binavbirk be. Du dubarekirina pişkî ya xwerû de ti peyvik an pirtik nakevin navbera peyva serekî û peyva bi pişkî dubarekirî:

- bivê-nevê, navnîşan
- teq-req, şeq-şeq, ding-ding

Lê adeten dubarekirina pişkî bi alîkariya navbirkekê peyda dibe. Navbirk di navbera peyvên onomatopoetîkî (zarvekirina dengan) de adeten -e- ye:

- teqereq, dingeding, gurmegurm...

Wek din bi piranî peyvika “û” dikeve navbera herdu beşan:

- tiştûmişt, dûrûdirêj, heysûbeys...

Heman û dikare cihê “-e-” ya navbera dengan jî bigire:

- teqereq, teqûreq

Ew herwiha dikare bikeve navbera dubarkirinên pişkî yê xwerû jî:

- navnîşan, navûnîşan

## 2.1. Di dubarekirinên pişkî de beşa duyem çî ye?

### 1) Pişka duyem ji peyveke serbixwe

Beşa duyem dikare ji peyveke serbixwe ya ji xwe heyî pêk bê. Dubarekirin di vî haletî de tenê bi hindê ye ku beşek ji peyva duyem bi dengê xwe wek beşa yekem e. Wekhevî dikare li destpêkê yan jî li dawiyê be:

Wekhevî li destpêkê:

- gul + giya → gulûgiya (bi maneya hemû riwek, nebat, şînkatî)
- mişk + mar → mişkûmar (mişk, mar û hemû heywanên wek wan)
- dûr + dirêj → dûr û dirêj
- nav + nîşan → navnîşan / navûnîşan

Wekhevî li dawiyê:

- mal + hal → malûhal
- kar + bar → karûbar

Hêjayî gotinê ye ku peyvrêziya van peyvan sabit û xweragir e, cihê wan nikare bi hev biguhere:

- gulûgiya lê ne \*giyaûgul
- mişkûmar lê ne \*marûmişk
- dûrûdirêj lê ne \*dirêjûdûr
- karûbar lê ne \*barûkar

## 2) Pişka duyem ji peyveke “neyî”

Di hinek ji peyvên bi pişkî dubarekirî de beşa yekem peyveke serbixwe ye lê beşa duyem ji “peyvekê” pêk tê ku li derveyî peyva dubarekirî bi serbixweyî peyda nabe:

- “nîvûnor” (nîvco, tamamnebûyî, tamamnekirî) ji peyva “nîv” a serbixwe û “nor” pêk hatiye lê “nor” bi ti maneyeke têkilî vê mijarê nayê nasîn û zanîn
- “zarûzêç” (jin û zarok, malbat, aîle) ji peyva “zar” (zarok) û “zêç” pêk hatiye lê “zêç” wek peyveke serbixwe peyda nabe.

Hin caran beşa duyem dişibe peyveke serbixwe lê gava ku mirov li maneya peyva dubare difikire, mirov pê dihesê ku ne mimkin e beşa duyem di rastiye de ji hevdenga xwe ya serbixwe be:

- “dengûdor”<sup>119</sup> (dengên pirr bilind û zêde, qerebalix) ji peyva serbixwe “deng” û wek prensîp ji peyva “dor” (dewr, gerr, nobet) a dîsa serbixwe pêk tê. Lê di rastiye de peyva serbixwe “dar” ti têkilî bi “dor”a di peyva “dengûdor” de nîne.

Eger em peyvên dubare “dengûdor” û “zarûzêç” binêrin, em ê texmîn bikin ku şiklê pişka duyem (-zêç, -dor) tiştekî nepayî û derî qeyd û bendan e. Mirov texmîne dike ku nizane ka ji bilî konsonanta yekem – ku li gor peyva serekî ye – beşên din ne li gor ti rênima û rêbazan in.

Lê gelo ti rê û rêbaz ji beşa duyem re bi rastî jî nînin?

Wek ku me got, beşa duyem yekem dengê xwe ji yekem dengê beşa yekem digire:

- zar → zêç

---

<sup>119</sup> Nimûneyek ji bikaranîna peyva “dengûdor”: “Di nav dengûdor û qerebalixê de gotina rastiye li eniya wan diyar e.”

[https://ku.wikiquote.org/wiki/Ronah%C3%AE\\_ji\\_dilek%C3%AE\\_bo\\_dilan](https://ku.wikiquote.org/wiki/Ronah%C3%AE_ji_dilek%C3%AE_bo_dilan)

- deng → dor

Lê beşên din jî ne bi tamamî li derveyî qeyd û bendan in an jî qeyd û bendên wan veşartî ne. Kerem bikin li van nimûneyan binêrin:

- dest → destûdar<sup>120</sup>
- nîv → nîvûnor
- çep → çepûçûr(r)
- xêr → xêrûbêr
- mêş → mêşûmor

Ji van nimûneyan ev qeydên aşkere dibin:

- Di beşa duyem de herdem 3 deng / herf hene
- Dengê yekem ê beşa duyem herdem wek dengê yekem ê beşa yekem e
- Dengê duyem herdem vokalek e lê ne heman vokal e
- Dengê sêyem ê beşa duyem herdem R ye.

Ev qeyd û bendên giştî ne û mirov dikare wan di hejmareke pir mezin a peyvên dubare yê beşa wan ya duyem ji peyveke neserbixwe pêkhatî de bîn dîtin.

Peyvên wek “zarûzêç”, ku dengê dawiyê yê beşa duyem ne R ye, bi rastî pir kêm in û mirov dikare bibêje peyda kirina nimûneyên din gelekî jî dijwar e. Ji xwe mimkin e – lê ne bêguman e – ku “zêç” di rastiye de ne peyveke “neyî” anku tineyî be lê formeke ji peyva “zewce” (jin, kabanî, bermalî) be ji ber ku “zarûzêç” tê maneya “jin û zarok” (herfiyen: zarok û jin) û peyva “zêç” pir dişibe “zewce”. Dibe ku ev etîmolojîya mihtemel sebebê awartetî û istisnaya wê ji qalibê li jor diyarkirî be.

### 3) Pişka duyem ji veguhastina bi M

Beşa duyem dikare dubarekirina pişka yekem be lê di beşa duyem de konsonanta pêşîn a peyvê bi M hatiye veguhastin:

- tiştûmişt, tişt-mişt

---

<sup>120</sup> Bo wate û bikaranîna peyva “destûdar” binêrin: <https://ku.wiktionary.org/wiki/dest%C3%BBdar>

- ders-mers, ders û mers

Wek ku tê dîtin, dubarekirin dikare xwerû be (ders-mers, tişt-mişt) yan jî bi alîkariya navbirka “û” be (tiştûmişt, ders û mers).

Hin peyvên wiha cihê xwe baş girtiye û pir li kar in, wek “tiştûmişt” û “hûrûmûr” lê gelek jî “serpê” û “ex tempore” ji hin qisekeran ve di dema axiftinê de tên çêkirin, wek “ders-mers”, “pirteqal-mirteqal”, “tirimpêl-mirimpêl”.

Eger li destpêka peyva serekî ti consonant tine bin, hingê dîsa M dikeve destpêka beşa duyem:

- agir-magir, evîn-mevîn, êvar-mêvar

Eger li destpêka peyvê komeke dukonsonantî hebe, hemû herdu konsonant cihê xwe didin M-yekê:

- şkeft → şkeft-meft

Lê eger zêdetir konsonant hebin, hingê tenê du dikevin, M cihê wan digire û i-yek li navbera M û konsonanta sêyem peyda dibe

- stran → stran-miran
- stratejî → stratejî-miratejî

Eger peyva serekî ji xwe bi M dest pê bike, hingê ew bi alîkariya veguhastina dubare nabe. Di rewşên wisa de hin rêyên din bo dubarekirinê hene:

- mal → malûhal (ne \*malûmal)
- mişk → mişkûmar (ne \*mişkûmişk)
- mêşûmor (ne \*mêşûmêş)

Ji bilî M, carinan veguhastin bi alîkariya B yan P jî peyda dibe:

- karûbar
- darûbar (daristan, dehlûdirr)
- şildim bildim<sup>121</sup> (zarîvekirina zimanê tirkî)

---

<sup>121</sup> Nimûneyek ji peyva “şildim-bildim”: parlamentera DTP a Amedê xaltîka me Aysel Tugluk, a ku ji şildim bildima tirkî pêve nizane û qet niyeta wê tune zimanê kurdî jî hîn bibe.” <http://www.lotikxane.com/arsiv/berivan%20al%20nu.htm>

- qilo-pilo (pûç, bêkêr, bêwec, hewante)<sup>122</sup>
- ? mêwe-pêwe (fêkî û tiştêk wek wan)
- ? têkil-pêkil (têkil û tevlihev)

Diyardeya guherandina konsonanta yekem bi M (an bi B, P) di beşa duyem a peyvên dubarekirî de ne tenê di kurdî de lê di çendîn zimanên cîran de jî li kar e. Bi kêmî di farisî, tirkî û ermenî de jî dubarekirina bi heman awayî çalak û berbelav e.

### 3. Dubarekirin bi şidandinê yan dirêjkirinê

Di kurdî de dubarekirin herwiha bi şidandina yan dirêjkirina dengê di nava peyvê de yan jî li dawiya peyvê jî mimkin e:

- gelek (pir, zehf, zor, mişe) → gellek (pir pir, gelek zehf, gelek gelek)
- tijî (dagirtî, ne vala, ne xalî) → tijjî (tam tijî, heta dawiyê tijî, bi temamî tijî)
- spas → spaaas! (gelek spas)
- hiş! (bêdeng be!) → hişşş! (bi temamî bêdeng be! qet deng neke!)

### 4. Dubarekirin di zimanê zarokan de

Mebest ji zimanê zarokan ew peyv in ku zarok di dema ku biçûk in û hê baş hînî zimanê xwe yê dayikî nebûne bi kar tînin. Gelek caran jî ne tenê zarok wan peyv dibêjin lê herwiha dêbab jî wan peyv di axiftina xwe ya li gel zarokan de bi kar tînin.

Di zimanê zarokan de peyv tîn kurtkirin. Adeten tenê du dengên destpêkê ji peyvê dimînin. Lê di heman demê de yek an herdu dengên destpêka peyvê jî tîn dubarekirin. Ev nimûne ji lîsteyeke Wîkîferhengê (<http://ku.wiktionary.org>) ya peyvên zimanê zarokan di kurdî de hatine wergirtin û analîzekirin:

---

Ji aliyê etîmolojî ve ihtimalen ji "şöyle böyle" (wisa wiha) ya tirkî ye lê mimkin e ku ji "söyledim bildim" (min got, min zanî) jî be.

<sup>122</sup> Nimûneyek ji bikaranîna peyva "qilo-pilo": "Siyaset bi qilo pilo nabe, divê bi Kurdperwerî bête meşandin cigerino."  
<http://www.lotikxane.com/2015/09/23/xale-qafsipi/>



- dest → tet / çeç (li gel guherandina D bi T an Ç)
- dayik (da, dê) → dadê (gazîkirina dayikê yan xwişkê)
- meme (şîr, av an her tişê vexwarinê), memik (bersîngên jinan ku zarok şîrî jê dixwin)
- kako, keko, kake (birayê mezin)
- bab, babo (paşî di hin devokan de bûye “bav, bavo”)
- mama (dayê, dadê, dayikê – peyveke navneteweyî ya zimanê zarokan e)
- pap (babo, bavo – peyveke navneteweyî ya zimanê zarokan e)
- cocê (şûştin, balavkirin, serşo – ji “şsûstinê” bi guherandina Ş bi C)
- çîçik (bersîngên jinan ku zarok şîrî jê dixwin)

Hin caran peyva bi xwe kurt jî di zimanê zarokan de ji ber dubarekirinê ji peyva bi zimanê mezinan dirêjtir dibe:

- pê (ling) → pepê

Ev heman diyarde di gelek zimanên din de jî di axiftina zarokan de bi eynî awayî ye. Loma peyvên wek “bab, kak, mama, papa” di pir zimanan de peyda dibin.

## 5. Dubarekirina bi vokalguhêziyê

Mebest ji dubarekirina bi vokalguhêziyê ew e ku peyv tê dubarekirin lê di peyva dubarekirî de vokala peyva serekî bi vokaleke din tê veguhastin. Peyva serekî dikare li destpêkê yan jî li dawiyê be

- naz → nazûnûz<sup>123</sup>
- qal (behs, gotin) → qîlûqal<sup>124</sup>

Di peyva navneteweyî “zigzag / zigzag” (çepûçûrr) de jî heman diyarde berçav e lê beşên vê peyvê “zig” an “zag” bi tenê ti maneyê nadin.

<sup>123</sup> Nimûneyek ji bikaranîna peyva “nazûnûz”: “Îsrâil piştî hin naz û nûz him uzrê xwe xwest û him jî dana tazmînatê qebûl kir.” <http://zinarexamo.blogspot.fi/2013/12/roboski-di-dile-milete-kurd-da-birinek.html>

<sup>124</sup> Nimûneyek ji bikaranîna peyva “qîlûqal”: “Qîl-û-qal pir in, lê agahiyên baş li ser diziya ku dibe, li cem kêman kesane hene.” <http://www.amude.net/nerin/sirwan-zerevan.html>

Dubarekirina bi vokalguhêziyê di kurdî de – bi kêmî di kurmancî de – diyardeyeke nadir û neçalak e. Çend peyvên heyî jî bi piranî – eger ne hemû – ji zimanên din hatine wergirtin.

## 6. Dubarekirina paşveyî

Me li jor diyar kiriye ku peyv dikarin an bi temamî an jî bi pişkî dubare bibin. Di peyvên bi pişkî dubare dibin de an herdu peyv serekî ne (bo nimûne “gulûgiya” ji “gul” û “giya”) yan jî beşa yekem ji peyva serekî pêk tê û beşa duyem jî li gor wê hatiye eyarkirin û wek peyveke serbixwe peyda nabe yan eger peyda bibe jî ne bi vê maneyê ye (bo nimûne “tişt → tiştûmişt” an “naz → nazûnûz”).

Lê piçekê li jortir me diyar kir ku peyva dubare “qîlûqal” bi vokalguhêziyê ji peyva “qal” (behs, gotin) pêk hatiye. Anku ne li gor rêbazên giştî beşa duyem li gor a yekem lê pişka yekem li gor beşa duyem hatiye eyarkirin.

Gelo ev peyveke tenê ye û qeydşkên e?

Kerem bikin li van peyvan binêrin:

- nipînû<sup>125</sup> (pirr nû, bi temamî nû, aniha derketî)
- tikîtenê<sup>126</sup> (bi temamî bi tenê)

Di peyva “nipînû” de “nû” peyveke serbixwe ya watedar e. Lê beşa yekem anku “nipî” bi tenê ti maneyê nade. Anku beşa yekem li gor beşa duyem hatiye çêkirin. “Tikîtenê” jî bi heman awayî ye lê ew dikare herwiha eyarkirina gotinên “tek û tenê” li gor vî qalibê “nipînû” jî be.

“Nipînû” bi xwe peyveke nû ye û van salan di zimanê nivîskî de hatiye çêkirin. Ew di rastiyê de wergera *yepyeni* ya tirkî ye ku dubarekirina pişkî ya peyva *yeni* (nû) ye. Di tirkî û zimanên lêzimî wî de dubarekirina pişkî ya paşveyî (beşa duyem li gor beşa yekem) diyardeyeke berbelav û çalak e:

- kara (reş) → kapkara (pir reş, bi temamî reş)
- beyaz (spî) → bembeyaz (sîs, bi temamî spî)

---

<sup>125</sup> Nimûneyek ji bikaranîna peyva “nipînû”: Ew li dû navbereke dirêj bi stranên xwe yên nipînû derket pêşberî muzîkhezan. <http://www.rizgari.com/modules.php?name=Content&pa=showpage&pid=1724>

<sup>126</sup> Nimûneyek ji bikaranîna peyva “tikîtenê”: “Ahmet nayê girtin lê tikîtenê dimîne, hemû hevalên wî, hema bibêje kê nas dike yan ketiye girtîgehê yan jî li cîne ku nayê zanîn e.” <http://www.ahmetkaya.com/Hakkinda.aspx?ver=krt>

- temiz (paqij) → tertemiz (bi tamamî paqij)

Wek ku tê dîtîn, peyva dubare li destpêkê ye, yekem dengê wê wek yê peyva serekî ye û vokal A ya E ye (li gor harmoniya vokalan). Herwiha di peyva dubare de sê deng hene (tam wek di kurdî de – li jortir binêrin – lê di kurdî de peyva dubare adeten dikeve pey peyva serekî, ne berî wê). Ji nimûneyan diyar dibe ku dengê sêyem ê peyva dubare ne herdem eynî ye (kap-, bem-, ter-). Lê di rastiyê de bi piranî ew deng P ye, M û R (û hin dengên din jî) nadir in.

“Nipînû” ne tenê li ber modela tirkî hatiye çêkirin ji ber wê yekê ku peyva serekî li dawiyê ye. Herwiha P jî wek dengê sêyem ê peyvên dubare yên tirkî ye. Lê dîsa jî “nipî-“ bo nimûne ji “kap-“ bi hindê jî cuda ye ku di “kap” de sê lê di “nipî” de çar deng hene. Ew bi heman awayî ji peyvên dubare yên kurdî bi xwe jî cuda ye ji ber ku di van rewşan de di kurdî de jî ew peyv sê-dengî ne.

Tevî ku “nipînû” li ber modela tirkî hatiye avakirin jî, ew ne bi her awayî wek wê ye. Heman peyvê “tek û tenê” ya ji du peyvên serbixwe jî nêzîkî xwe kiriye û şiklê “tikîtenê” daye wê. Wek prensîp ev awayê peyvsaziya dubarekirinê jî dikare di kurdî de belav bibe. Di rastiyê de ji niha ve hin ji peyvên din jî yên bi heman modelê di kurdî de hatine çêkirin (niha bi piranî di wergerên berhemên tirkî de):

- reş → ripîreş<sup>127</sup> (bide ber tirkî “kara → kapkara” = tam reş, bi tamamî reş)
- şîn → şipîşîn<sup>128</sup> (tirkî mavi → masmavi)
- zer → zipîzer<sup>129</sup> (sarî → sapsarî)

Lê wisa dixuye ku ne mimkin e ku mirov peyva “spî” bi heman awayî xurt bike û bike \*sipîspî.

Di kurdî de ji berê ve hin awayên din li cihê van hene, bo nimûne: reşê tarî, şîne esmanî, zerê zîq û hwd. Niha hê zû ye ku em pêşbînî bikin ka kîjan ji van herdu şeweyan dê serî ji yê din bistîne. Bi ihtimaleke mezin herdu awa dê heta demekê wek alternatîvên hev hebin.

<sup>127</sup> Bo nimûne: “Tariyeke ripîreş xwe li jiyana min pêçabû û ez di nav wê tariyê de difetisîm.” Di heman nivîsê de bi qasî deh caran peyva “ripîreş” hatiye bikaranîn. <http://www.kultumame.com/?p=3835>

<sup>128</sup> “Demsal bihar bû, giya şîn bibûn, ezman şipîşîn bû û stêrk birqok bûn.” <http://www.artuklu.edu.tr/Upload/tyde/Tezler/388896.pdf> r. 21.

<sup>129</sup> Bo nimûne: “Poyraz Mûsa, nezani bû wê çî bikira li Abdulwahap Bêg vegeziya. Ew jî, zipîzer bûbû, wek pelê payîzê, bûbû wek mişmişê, qey dileriziya.” <http://arsiv.niviskar.com/content/f%C4%B1rat-kan-ak%C4%B1yor-baksana>

## 7. Dubarekirina bi hevwateryan

Di kurdî û gelek zimanên din de jî hin tişt bi du peyvên hevwater (hevmane) anku sînonîm tên dubarekirin. Hin caran yek ji van peyvên (bi texmîna bikarînerên wan) xwemalî ye û ya din jî erebî yan ji tirkî hatiye wergirtin:

- îş û kar
- şert û merc
- vîn û îrade

Hin peyvên wiha êdî hind bi hev ve zeliqîne ku êdî kêr bi tena serê xwe tên bikaranîn:

- nav (navber) + beyn (navber) → navbeyn / navbên
- bar (rewş, hal) + dox (rewş, hal) → barûdox

Du sebebên bikaranîna wiha hene:

- Bikarîner dixwaze peyva xwemalî ya “kurdiya paqij” bi kar bîne lê li aliyekî din guman dike ku belkî xwandevan wê fehm nekin loma hevwatera wê ya bi eslê xwe biyanî jî li gel dinivîse.
- Bi dubarekirina heman tiştî bi du peyvên hevwaterê lê ji hev cuda dixwaze giraniyê bide ser meseleyê.

Lê ev ne tek awayê dubarekirina heman tiştî bi du peyvên ji hev cuda ye. Carinan herdu peyv ne bi tamamî hevwater ne û ji aliyê dengnasî ve jî ne dubarekirin in lê bi maneya xwe ya nêzîk heman tiştî dubare dikin û giraniyê didinê:

- navûdeng (meşhûriyet, navdarî)
- sal û zeman (demeke gelek dirêj)
- serûçav, devûlêv (bi maneya hemû “rû, dêm”)

Carinan peyv dikarin herdu jî xwemalî yan biyanî bin an jî rehê wan neyê nasîn:

- şeref û namûs
- govend û dîlan
- dawet û dîlan
- reş û tarî

Dubarekirin dikare herwiha bi bikaranîna formên yekhejmar û pirhejmar ên heman peyva bi eslê xwe ji erebî jî pêk were:

- hed û hidûd (“hidûd” di erebî de pirhejmariya peyva “hed” e)
- şert û şirût / şurût (“şurût” di erebî pirhejmariya peyva “şert” e)
- hal û ehwal (“ehwal” di erebî pirhejmariya peyva “hal” e)

Dubarekirina hin hevwateryan dikare bi peyvrêziya xwe azad be, bo nimûne “kitêb û pirtûk” an “pirtûk û kitêb”. Lê di dubarekiriyên qalibgirtî de peyvrêzî sabit e û cihê peyvan bi hev naguhere:

- şert û merc (lê ne \*merc û şert)
- navbeyn (lê ne \*beynav)
- reş û tarî (lê ne \*tarî û reş)
- şert û şirût (lê ne \* şirût û şert)

Ji van nimûneyan em dikarin van qeyd û bendên giştî yê peyvrêziya hevwateryên dubarekirî hîn bibin:

- Peyva yekem dikare xwemalî be û ya duyem biyanî / erebî be (bo nimûne “navbeyn”) yan jî peyva yekem biyanî û ya duyem xwemalî / îranî be (bo nimûne “şert û merc”).
- Eger dubarekirin bi forma yekhejmar û pirhejmar a heman peyvê be, hingê forma pirhejmar berî forma pirhejmar e (bo nimûne “şert û şirût” lê ne “\*şirût û şert”).

Lê em hewceyî hê vekolînan daku tê bigihin ka hê rê û rêbaz hene ku çawa û çima hin hevwater berî hinên din tên an na. Û eger hebin, ew çi ne.

## 8. Dubarekirina bi diwateryan

Ji bilî dubarekirina bi hevwateryan, di kurdî de peyvsazî herwiha dubarekirina bi diwateryan anku antonîman jî mimkin e. Dubarekirina diwateryan dikare ji du peyvên serbixwe yê dijî hev pêk hatibe (bo nimûne ji du rengdêran) yan jî ji forma erênî û forma neyînî ya heman lêkerê bin:

- reşûspî (ne rengîn): televizyoneke reşûspî
- biçûk û mezin, pîr û ciwan (kesên ji hemû jî û temenan)
- bi şev û roj (herdem, 24 saetan)

- kir û nekir (çi kir jî): Min kir û nekir, ew razî nebû (Min çi kir jî, ew razî nebû)
- bivê-nevê (illeh, çawa be jî, herhal)

Ji van nimûneyan em dikarin van qeyd û bendên giştî yê peyvsaziya bi dubarekirina di jwateyan diyar bikin:

- Peyvên dubarekirî dikarin rengdêr bin (bo nimûne “reşûspî”) navdêr bin (şev û roj) an lêker bin (dikim-nakim = çi dikim jî, dîsa nabe).
- Peyvrêziya peyvan ne azad e lê qalibgirtî ye: “reşûspî” lê ne “\*spîûreş”; “bi şev û roj” lê ne “\*bi roj û şev”; “kir û nekir” lê ne “\*nekir û kir”.

## 9. Peydabûna “dudu” û “sisê”

Di kurdî de – bi taybetî jî di kurmanciya navendî de – hejmarên 2 û 3 ji bilî navên “du” û “sê”, herwiha formên “dudu”<sup>130</sup> û “sisê” jî hene. Ew ne di devokên din ên kurmancî de, ne di zaravayên din ên kurdî de û ne jî di zimanên din ên îranî yan hindûewropî de peyda dibin tevî ku navên hejmarên 2 û 3 bi awayekî yan awayekî din di van ziman û zaravayan de jî hevrehên navên van hejmaran ên bi kurmancî ne. Ji vê jî diyar dibe ku “dudu, sisê” dubarekirinên formên “du, sê” ne, ne ku “du, sê” kurtkirinên “dudu, sisê” bin.

“Dudu” dubarekirineke temam e ya xwerû ye. Lê “sisê” hinekî ecêb û xerîb dixuye:

- Berevajî qeyda giştî, di “sisê” de peyva serekî “sê” ne li destpêkê lê li dawiyê ye.
- Tevî ku dubarekirina paşveyî (li jortir binêrin) wek di peyvên “nipînû” de niha di kurmancî de êdî mimkin e jî, ew bi piranî bi rengdêran ve – xaseten bi navên rengan ve – sinordar e lê “sê” ne rengdêr e.
- Di dubarekirina paşveyî de qalibê peyva yekem wiha ye: konsonanteke wek konsonanta destpêka peyva serekî (nipînû, tikîtenê, zipîzer) + i + konsonantek (bi piranî P) + î. Lê di peyva “sisê” de tenê “si-“ heye.
- Hemû peyvên bi dubarekirina paşveyî bi zelalî li ber modelên wan ên tirkî hatine çêkirin lê ti modeleke tirkî ji qalibê “sisê” re peyda nabe.<sup>131</sup>

<sup>130</sup> Ji bilî “dudu”, ev peyv bi çendîn formên din jî di nivîsan de tê dîtin: “dido, didu, dudo...”

<sup>131</sup> Di tirkî de navê hejmarê 3 “üç” e.

Di rastiyê “sisê” jî wek “dudu” divê carekê “\*sêsê” bûbe anku encama dubarekirina temama xwerû be lê paşî ê-ya kîteya yekem kurt bûbe û “sisê” jê peyda bûbe. Bi heman awayî “dudu” jî êdî bi piranî wek “didu” tê gotin û gelek caran nivîsîn jî.

## 10. Çi ne dubarekirine?

Carinan hin deng an kiteyên wek hev an nêzîkî hev dikevin pey hev lê dîsa jî ew ne dubarekirinên peyvsaz in:

- dan → didan
- ñebêjin → bibêjin
- nivîsî → nenivîsî
- ðnivin → nanivin
- dan → dadan

Pêşpirtikên wek “di-, bi-, na-, ne-” li vê derê pêşgirên giştî ne, dengê wan ne ji ber peyva li dûv wan e. Heman pêşpirtik dikevin berî gelek peyvên ne bi heman dengê dest pê dikin jî.

- di-kir, di-got, di-xwar...
- bi-kin, bi-rêjin, bi-çerînin...
- ne-girt, ne-livîn, ne-hatibû...
- da-ketiye, da-ûrand, da-girin...

## 11. Çi birr dubare dibin û dibin çî?

Di dubarekirina peyvsaz de hin peyvên nû ji peyvên heyî tên çêkirin. Hin caran birra peyvê wek xwe dimîne, bo nimûne ji navdêran navdêr an ji rengdêran rengdêr derdikevin. Lê gelek caran jî ji encama dubarekirinê birra peyvê diguhere, bo nimûne navdêr dibe rengdêr an berevajî.

Di vê beşê de em ê bi hin nimûneyan diyar bikin ka birrê peyva sade dikare bibe çî:

### **Navdêr → navdêr**

- mal → malûhal (dubarekirina pişkî bi guherandina li destpêkê)
- mişk → mişkûmar (dubarekirina pişkî bi guherandina li dawiyê)
- xal → xalxalok (dubarekirina temama bidûvik)

### **Navdêr → rengdêr**

- parçe → parçe-parçe (dubarekirina temama xwerû)
- der(î) → derbider (dubarekirina temama binavbirk)
- gul → gulgulî (dubarekirina temama bidûvik)

### **Navdêr → hoker**

- car → car-car (dubarekirina temama xwerû)
- ser → seroser (dubarekirina temama binavbirk)

### **Rengdêr → rengdêr**

- dûr → dûr û dirêj (dubarekirina pişkî li destpêkê)
- kûr → kûr û dûr (dubarekirina pişkî li dawiyê)
- tijî → tijjî (dubarekirina bi şidandinê)

### **Rengdêr → hoker**

- hêdî → hêdî-hêdî
- hûr → hûr-hûr

### **Rengdêr → navdêr**



- hûr → hûrûmûr (tiştên hûr, biçûk, ne giring...)

### Lêker → lêker

- liv-în → livliv-în (dubarekirina temam)
- hej-andin → hejhejandin (dubarekirina temam)

### Lêker → lêker

- nal-în → nalenal (dubarekirina temam a binavbirk)
- mêj- (mêtin, mihtin) → mêjmêjok (dubarekirina temam a bidûvik)

### Lêker → rengdêr

- liv-în → livlivok (dubarekirina temam a bidûvik)
- hej-în → hejhejok (dubarekirina temam a bidûvik)<sup>132</sup>

### Hoker → hoker

- heta → heta-heta (dubarekirina temam a xwerû)
- heta → hetawheta, hetaûheta (dubarekirina temam a binavbirk)
- paş → paşpaşkî (dubarekirina temam a bidûvik)

### Hejmar → hejmar

- du → dudu (dubarekirina temam a xwerû)
- sisê (bo awayê dubarekirinê li jortir li beşa *Peydabûna "dudu" û "sisê" binêrin.*)

---

<sup>132</sup> "Hejhevok, livlivok" wek prensîp dikarin rengdêr → rengdêr jî bin (hejok → hejhejok, livok → livlivok) lê ji ber ku dubarekirina paşveyî di kurdî de diyardeyê nêzîkê nêzîkê ye, bi dîtina min ew wiha çêbûne: liv-în → livlivok an jî liv-în → livliv-în → livlivok.

### Hejmar → hoker

- yek → yek-yek (dubarekirina temama xwerû)
- yek bi yek (dubarekirina temama binavbirk)

### Hejmar → rengdêr

- sed → sed-der-sed” bi maneya “bêguman, bêşik” (dubarekirina temama binavbirk)

### Diyarker → diyarker

- çend → çendî çend

### Bangeşan → bangeşan

- wey → wey-wey (dubarekirina temama xwerû)
- ax → ax û ax (dubarekirina temama binavbirk)
- ax → ax û ox (dubarekirina bi vokalguhêziyê)

## 12. Dubarekirin di asta hevokî de

Mijara me dubarekirin di peyvsaziyê de bûye. Me xwastiye diyar bikin ka çî û çawa peyvên nû bi dubarekirina peyvên heyî tîen sazkin. Dubarekirin li derveyî peyvsaziyê jî heye lê ew ne mijara me ya vê care ye. Lê dîsa jî em dixwazin bi çend nimûneyan berê xwandevevanên hêja bidin dubarekirinê li derveyî peyvan jî.

Lê dixwazim diyar bikin ku ev nimûne tenê bi armanca diyarkirina diyardeya dubarekirinê di asta hevokan (risteyan, cumleyan) de ye. Armanca ne ew e ku em kûr û dûr meseleyê li vê derê vekolin.

- **hem ... hem ...:** Peyva “hem” di kurmançî de bi tenê peyda nabe. Her cara ku em wê di hevokekê de bi kar bînin, divê ew careke din jî were dubarekirin:
  - o *hem em û hem jî ew*
  - o *hem dixwe û hem vedixwe*
- “Ez nakim, ez nakim” a xwe bihêle! Anku: De bes bibêje “ez nakim”.
- Dubarekirina xemsar
  - o Qiseker 1: *Ew nayên.*
  - o Qiseker 2: *Ê nayên nayên.* (Ne xem e ku nayên, bila neyên.)

### 13. Dubarekirina îdiyomatîk an totolojîk?

Wek ku li jor diyar bûye, dubarekirin carinan maneyên cuda û carinan jî tamên cuda didin peyvan. Gelek caran, di heman demê de maneyê û tamê jî piralî û berfirehkirin. Dubarekirinên wiha biwêjê anku îdyomatîk in û yek ji awayên zengîniya zimanî ne.

Lê dubarekirina carinan bêkêr û bêxêr e, tenê gotinê yan nivîsê dirêj dike bêyî ku ti maneyekê yan çêjekê lê zêde bike. Ji dubarekirinên wiha re di zimannasiyê de **totolojî** (bi inglîzî *tautology*) tê gotin. Gotinên wisa bêwec û bêkêr dubarekirî jî **totolojîk** (*tautological*) in. Li vê derê hemû diyardeya totolojîyê ne mijara me ye lê em ê tenê çend nimûneyan bidin daku mesele were fehmkirin û were zanîn ku herdem dubarekirin jî ne tiştekî erênî û hêvîkirî ye:

- **derketin derve:** Ev gotin di medyaya kurdî de pir tê dubarekirin. Lê ew totolojî ye anku dubarekirineke zêde ye ji ber ku di peyva “derketin” bi xwe de jî maneya “derve” heye. Lê ji ber ku di tirkî de ev gotin “dışarıya çıkmak” e, li ber peyva “dışarı” di kurdî de jî “derve” lê tê zêdekirin. Lê “derve” ti tiştî li “derketin”ê zêde nake û tenê bi xwe zêde ye.
- **serbest berdan:** Dîsa li gor mantiqa tirkî “serbest” jî li peyva “berdan” hatiye zêdekirin lê bi xwe ti maneyeke zêdetir an tameke din nade peyvê, tenê bi xwe zêde ye. Di kurdî girtî an tîn “berdan” an jî tîn “serbestkirin” lê nayên “serbestberdan”.
- **di derbarê ... de:** Peyva “derbarê” ji farisî hatiye û ji peyvên “der” (tê de) “bare” (rewş, hal) hatiye. Lê di kurdî de hin caran “di ... de” jî lê tê zêdekirin. Lê li cihê “di ... de” ya kurdî ji xwe “der” a farisî di peyvê de heye. Loma “di derbarê ... de” biwêjeke totolojîke. Çêtir e ku mirov tenê bibêje “derbarê filan tiştî”, ne “di derbarê filan tiştî de”.

- **“Pêkhevî”**<sup>133</sup> navê straneke nû ya Şivan Perwerî ye. Ew hewldaneke têkilkirina kurmanciya navendî û kurmanciya rojhilatî ye yan jî kurmanciya navendî û soranî ye: bi kurmanciya rojhilatî *pêkve* (soranî *pêkewe*) û kurmanciya navendî *bi hev re* (kurtkirî *pevre*) ye. Lê di peyva “pêkhevî” de “pêk” a kurmanciya rojhilatî heye ku beramberî “bi hev / pev” a kurmanciya navendî ye. Beşa duyem jî ji peyva “hev” pêk hatiye. Eger mirov peyva “pêkhevî” li kurmanciya navendî “wergerîne”, ew dê bibe “bi-hev-hev-î” (kurtkirî “pevhevî”). Eger li kurmanciya rojhilatî jî “wergerîne”, ew dê bibe “bi-yek-yek-î” (kurtkirî “pêkêkî”). Anku di peyvê de “bi êk / pêk” ya kurmanciya rojhilatî û hevbera wê “bi hev / pev” ya kurmanciya navendî li pey hev hatine dubarekirin û bûne totolojîk. Lê di heman demê de “ve” ya kurmanciya rojhilatî (pêk-ve) û “re” ya kurmanciya navendî (“bi hev re, pev re”) hatine jibîrkirin.

## 14. Wate û armancên dubarekirinê?

Wateya peyvên dubare ne herdem îkonîk e anku ne tenê maneya beşên dubarekirî didin. Bo nimûne, dema ku em dibêjin “gulûgiya”, mebesta me ne tenê “gul” û “giya” ne lê hemû riwek, nebat û şînkati ne. Dema ku em dibêjin “gulûgiya”, qesta me dar û devî û gelek tiştên din in jî ku şînkati dibin.

Em dikarin bi kêmî van armancên dubarekirinê destnîşan bikin:

### 1) Berfirehkirin (extension) an piralîkirin (diversification)

- zarûzêç (zarok û endamên din ên malê, bi taybetî jin)
- mêşûmor (mêş û hemû jînewerên biçûk ên wek wan: kêz, pêşû...)
- malûhal (mal, xanî, malbat û tiştên din ên têkilî wan)
- gulûgiya (hemû nebat, riwek)

### 2) Xurtkirin (intensification)

- dûr-dûr (pirr dûr)
- lez û bez (leza zêde)

<sup>133</sup> Strana “Pêkhevî” dikare li vê derê were bihîstin û dîtin.

- çendî çend (gelek, pirr)
- gellek (gelek gelek, pirr pirr)

### 3) **Berdewamî** (repetition)

- nalenal (nalîna berdewam)
- birdebird
- bi şev û roj

### 4) **Sistkirin** (attenuation)

- hêdî-hêdî
- piço-piço

### 5) **Şibandin**

- pêpik: piyên (lingên) maseyan yan textên xewê. Bi dubarekirinê ji peyva “pê” hatiye çêkirin ji ber ku ew hinekî dişibin piyên microvan.

### 6) **Tinazîkirin**

Bi armanca henek, tinazî, tirane, galte, laqirdî, qerf, mîzahî tên bikaranîn, bo nimûne:

- şildim-bildim: axiftina bi zimanê tirkî
- zaza: zimanê / zaravayê ku qaşo Z tê de pirr li kar e
- here-were: kurmancî (zimanê ku bi dîtina tirkan û zazayan ev gotin pit tê de tên bikaranîn)
- qiltû-miltû<sup>134</sup>: axiftina bi zimanê erebî
- laq (ling, pê) → lûlaq (lingên rût û bêteşe)

## 15. **Rastnivîsîna peyvên dubarekirî**

<sup>134</sup> [https://ku.wiktionary.org/wiki/qilt%C3%BB\\_milt%C3%BB](https://ku.wiktionary.org/wiki/qilt%C3%BB_milt%C3%BB)

Gelo peyvên dubarekirî çawa tên nivîsîn an em wan çawa binivîsin? Her beşek cuda, hemû bi hev e yan jî bi xetikên navberê:

- kar û bar, zar û zêç, roj bi roj, yek yek, hêdî hêdî, nav nîşan?
- karûbar, zarûzêç, rojbiroj, yekyek, hêdîhêdî, navnîşan?
- kar-û-bar, zar-û-zêç, roj-bi-roj, yek-yek, hêdî-hêdî, navnîşan?

Mixabin ti ji van her sê awayan herdem bikêrhatî ye. Hin ji peyvên dubarekirî bê navberr bi hev re, hin bi temamî ji hev cuda û hin jî bi xetikan bi hev ve girêdayî tên nivîsîn. Anku em nikarin bibêjin ku bila hemû li gor heman rêbazê bê nivîsîn lê em dikarin çend şîret û rênimayan bidin. Heta ji min hatiye, min hewl daye ku guh bidin rastnivîsîna heyî anku awayê ku piraniya nivîskar û rojnamevanan di nivîsên xwe de bi kar tînin – min hewl nedaye ku dijî wan rêç û rêbazên xwe ferz bikim:

### 1) Bi xetikên navbir

- hokerên ji dubarekirina xwerû:
  - o hêdî-hêdî, yek-yek, piço-piço
- dubarekirinên “demkî” (ex tempore) ên bi M yên bênavbirk: kitêb-mitêb, ders-mers

### 2) Bi hev re anku pêkve

- dubarekirinên temam ên îdyomatîk:
  - o karûbar, zarûzêç, malûhal
  - o seranser, beramber
- dubarekirinên pişkî yên cihê xwe girtî û îdyomatîk:
  - o navnîşan, hûrûmûr, tişt û mişt

### 3) Ji hev cuda

- dubarekirinên temam ên bi daçeka “bi”:
  - o roj bi roj, yek bi yek
  - o ji bilî çend peyvên îdyomatîk: derbider
- dubarekirinên “demkî” (ex tempore) ên bi M yên bi navbirka “û”: ders û mers, kitêb û mitêb.

# PEYVSAZÎ BI COTANDINÊ

## Cotpeyv anku dvandva

Di peyvsaziyê de mebest ji **cotpeyv**an (cêwiyên siyamî, bînomiyal, dvanvda, bi inglîzî *co-compound, Siamese twins, binomials, irreversible binomials, binomial pairs, bicolon, freezes, dvandva*) du peyvên li pey hev rêzkirî ne ku bi hev re peyveke nû yan maneyeke nû çêdikin.

Em li jêr çend nimûneyan pêşkêş dikin. Bo ku were fehmkirin ku maneya wan bi rastî ne tenê herdu beşên hêmanî ne, em ê wan di kevanokan de li inglîzî jî wergerînin û diyar bikin ku di inglîzî ew herdu peyv bi hev ve maneya peyveke inglîzî didin:

- deng (*voice*) + bas / behs (*topic*) → dengûbas (nûçe, xeber, *news*)
- av (*water*) + hewa (*air*) → avûhewa (klîma, *climate*)
- dê (*mother*) + bab/bav (*father*) → dêûbab, dêûbav (dayik û bab û/yan kesên din ên ku zarokan mezin dikin, *parents*)
- xwişk (*sister*) + bira (*brother*) → xwişkûbira (hemû kesên ji eynî dêbavan, *siblings*)
- ser (*head*) + çav (*eye*) → serûçav (rû, dêm, *face*)
- dest (*hand*) + pê (*foot*) → destûpê (*limbs*)
- jin (*wife*) + mêr (*husband*) → jinûmêr (kesên bi hev re zewicî, *spouses*)
- xal (maternal uncle) + xwarza (one's sister's children) → xalûxwarza (hemû mirovên/xizmên ji aliyê dayikê ve, *maternal relatives*)
- biçûk û mezin (hemû mirov, *people of all ages*)
- bi şev û roj (24 saetan, herdem, bi berdewamî, bê navber, *24 hours, non-stop*)
- ji dil û can (bi cidî, bi temamî, bi her tiştê xwe ve, *sincerely*)
- pîr û ciwan (kesên ji hemû temenan, *people of all ages*)
- bûk û zava (herdu kesên ku daweta wan tê kirin, *the wedding couple*)
- sor û zer (rengîn, *colourful*)
- reşûspî (ne rengîn, *black-and-white*)

- reşûşîn (şop û şûnên lêdanê/lêxistinê li ser leşî, *bruise, contusion*)<sup>135</sup>

Maneya cotpeyvê dikare ji herdu beşên xwe zêdetir an berfirehtir be:

- serûçav (hemû rû: ne tenê ser û çav lê herwiha enî, birû, gep/alek, dev, lêv, erzînk...)

Hin caran jî cotpeyv maneyeke bi temamî ji beşên xwe cuda bidin:

- dengûbas (nûçe, xeber, hewal)

Cotpeyvên kurdî (ne peyvên dubarekirî – li beşa li ser peyvsaziya bi dubarekirinê binêrin) adeten ji du peyvên serbixwe tên bikaranîn. Her yek ji wan peyvên dikare bi tenê jî di kurdî de were bikaranîn. Lê çend cotpeyv hene ku beşa wan a duyem adeten tenê li gel a yekem tê bikaranîn, bêyî wê di pratîkê de ne li kar e:

- heval û hogir

Peyva "heval" bêyî peyva "hogir" jî tê bikaranîn lê "hogir" adeten tenê wek beşek ji gotina "heval û hogir" li kar e.

## Cotpeyv di zimanên din de

Peyvên wiha di gelek zimanên din de jî hene. Bi taybetî ew di zimanên îranî û hindistanî de peyda dibin lê bo nimûne di çînî, japonî, yûnanî û fînlandî de jî hene. Bo nimûne:

- soranî: dengûbas (ji deng + bas)
- farisî: abûheva (avûhewa, klîma)
- tirkî: ana baba, anne baba (dêbab, dêbav)
- sanskrîtî: mātā-pitarau (dêûbab, peyv-bi-peyv: dê-bab)
- yûnanî: ανδρογυνο /androgino/ (jinûmêr, peyv-bi-peyv: mêtûjin)
- fînlandî: maa-ilma (dinya, peyv-bi-peyv: erd-hewa)

---

<sup>135</sup> Heman tişt di inglîzî de jî dikare bi gotina "black and blue" (reş û şîn) were behskirin. Di hin zimanên din de navên hin rengên din bi vê meremê tên bikaranîn. Bo nimûne bi almanî "grün und blau" (kesk û şîn) û swêdî "gul och blå" (zer û şîn)



## Cotpeyv ji çi pêk tên?

Ji aliyê rêzimanî ve cotpeyv adeten ji du navdêran (ism, substantîv, *noun*) an du rengdêran (sifet, hevalnav, *adjective*) pêk tên:

- **navdêr:** destûpê, avûhewa, şêr û piling<sup>136</sup>, dêbav...
- **rengdêr:** biçûk û mezin (kesên ji hemû temenan), reşûspî, sor û zer...

Di nav navdêran de bi taybetî endamên (beşên) leşî û endamên malbatê cotpeyvyan pêk tênin:

- **endamên leşî:** serûçav, destûpê, devûlêv, dil û ceger<sup>137</sup>...
- **endamên malbatê:** jinûmêr, xwişk û bira, bûk û zava, xal û xwarza...

Di nav rengdêran de xaseten navên rengan û peyvên jî-diyarker (temen-diyarker) cotpeyvyan çêdikin:

- **navên rengan:** reşûşîn, sor û zer, reşûspî...
- **"temenpîv":** biçûk û mezin, pîr û ciwan...

Hin cotpeyv jî ji du lêkeran pêk tên. Lêker dikarin gerguhêz bin an jî gerneguhêz:

- **nimûne ji lêkerên gerneguhêz:** hatinûçûn (bi maneya "trafik"ê, *circulation, traffic*), rabûn û rûniştin (irf û edet, reftar, *tevger, behavior, way of life*)...
- **nimûne ji lêkerên gerguhêz:** danûstandin (*negotiations*), kurrîn û firotin (*shopping*), xwarin û vexwarin (*alimentation*)...

## Hejmara rêzimanî ya cotpeyvyan

Cotpeyv ji du peyvyan pêk tên û adeten behsa bi kêmî du tiştan dikin. Loma adeten hejmara wan a rêzimanî jî pirhejmar (komî, plural) e:

- destûpiyên min
- serûçavên wê

---

<sup>136</sup> Bi maneya hemû heywanên wek şêr û pilingan – bo nimûne leopard, gepard, jagwar, lînk, pars – herwiha bi mecazî bi wateya "wêrek, bisteh, netirs, qehreman...".

<sup>137</sup> Bi mecazî bi maneya "hestên kûr".

- dêbabên wî

Lê hin peyvên yekhejmar (kitî, takî, *singular*) jî hene:

- Avûhewayê /Avûhewayaya Kurdistanê xweş e.

Sebebê yekhejmariya peyva "avûhewa" ew e ku "av" û "hewa" peyvên nehejmêrbar in (*uncountable*) anku nikarin bîn hejmartin. Peyvên wisa adeten nabin pirhejmar.

Me di nimûneya xwe de peyva "avûhewa" hem wek nêr (avûhewayê Kurdistanê) û hem jî wek mê (avûhewayaya Kurdistanê) bi kar aniye. Cotpeyvên rêzimanî yên pirhejmar bêcins in ji ber ku di kurmancî de di pirhejmariyê de cinsê rêzimanî peyda nabe. Cotpeyvên yekhejmar cinsê xwe yê rêzimanî ji peyva duyem werdigirin. Lê peyva "hewa" di kurdî de di hin devokan de nêr e (xaseten di kurmanciya rojhilatî de) û di hinan de jî mê ye (bi taybetî di kurmanciya navendî de) loma cinsê rêzimanî yê peyva "avûhewa" jî li gor devokan diguhere.<sup>138</sup>

Paşpirtika pirhejmar ji ber herdu beşên cotpeyvê heye heta eger her beşek ji wan tenê yek be jî. Bo nimûne, di gotina "dêbabên / dêûbabên wî" de paşpirtika "-ên" peyva "bab / bav" digire tevî ku her kesî helbet tenê babek / bavek heye.

Gotina "xwişk û birayên min" dikare çendîn wateyên ji hev cuda bide:

- min çend xwişk û çend bira hene
- min xwişkek û birayek hene
- min xwişkek lê çend bira hene
- min çend xwişk lê tenê yek bira heye

## Peyvrêziya cotpeyvan

Cotpeyv ji du peyvên serbixwe yên bi maneya xwe têkilî hev lê ne hev wate pêk tên. Cotpeyv di kurdî û zimanên din ên îranî de adeten bi navbirka "û" tên çêkirin:

- dê + bab → dêûbab

---

<sup>138</sup> Di hemû devokên kurmancî de peyva "av" mê ye lê di diyarkirina cinsê rêzimanî yê peyva "avûhewa" de peyva "av" ne biryarder e.

Lê "û" hin caran nayê bikaranîn:

- dê + bab → dêbab

Ji aliyê peyvrêziyê ve cotpeyv qalibgirtî ne. Peyvrêziya wan ne serbest e lê sabit e. Mirov nikare cihê herdu peyvan bi hev biguherîne û dîsa jî cotpeyvê biparêze. Bo nimûne, em bi merema hemû rûyê mirovan dikarin bibêjin "serûçav" lê em nikarin bi maneya "\*çavûser".

Gava ku em behsa du kesên ku daweta wan tê kirin, em wek cotpeyvekê destewajeya "bûk û zava" bi kar tînin lê adeten nabêjin "zava û bûk". Du kesên bi hev re zewicî yan hevser, "jinûmêr" in lê em adeten nabêjin "\*mêrûjin".

Bi armanca kesên ji hemû umir û temenan em dibêjin "biçûk û mezin" lê adeten em nabêjin "mezin û biçûk". Eger televizyonek ne rengîn be, em nabêjin ku ew "spî û reş" e lê "reşûspî" ye. Gava ku em şop û şûnên lêdanê yan ketinê li ser leşê kesekî bibînin, em dikarin bibêjin: rûyê wî reşûşîn bûye. Lê em nabêjin: rûyê wî \*şînûreş bûye.

Ev sabitiya peyvrêziyê li gel maneyên taybet an ji hêmanên herdu peyvan berfirehtir van gotinan dikin cotpeyv. Mirov dikare ji ber van xusûsiyetan wan wek peyvên pêkhatî (hevedudanî, *compound*) yê serbixwe bihejmêre.

Gelo çima di peyva "jinûmêr" de "jin" berî "mêr" e û di peyva "reşûspî" de "reş" berî "spî" ye?

Niha ti bersivê li ba min nîne li ser sebebên peyvrêziya cotpeyvan.

Lê dîsa jî mirov dikare hin qeydên giştî diyar bike. Di kurmancî de:<sup>139</sup>

- Peyva mê berî peyva nêr tê: dêûbab, jinûmêr, xwişk û bira, bûk û zava...
- Di nav beşên leşî de mirov ji jor dest pê dika û ber bi jêr ve tê: serûçav, destûpê...
- Di nav rengan de mirov adeten ji rengên tarîtir dest pê dika û ber bi rengên vekirî ve tê: reşûşîn, reşûspî, sorûzer, şev û roj...

Di zimanên din de jî peyvrêza cotpeyvan sabit e lê ne herdem wek ya kurmancî ye:

- kurdiya başûrî: bawg û dalig (dêbab)

---

<sup>139</sup> Di hemû zaravayên kurdî de rewş de. Bo nimûne, di kurdiya başûrî devoka kirmaşanî de di cotpeyvên "bawgdalig" (dêbab) û "biraxueyşk" de nêr berî mê ye lê di hin peyvên din de mê berî nêr e, bo nimûne "weû û zawa" (bûk û zava) û "jin û şû" (jinûmêr). Bo van nimûneyan ez spasdarî zimannasê hêja Rizgar Behadur im.

- farisî: pider û mader (dêbab, peyv bi peyv: bab û dayik)
- tirkî: ana baba (dêbab)
- hindî: mata-pita (dêbab)
- çînî: fu-mu (dêbab, peyv bi peyv: bab-dê)
- japonî: fu-bo (dêbab, peyv bi peyv: bab-dê)
- koreyî: bu-mo (dêbab, peyv bi peyv: bab-dê)

Hevbera "şev û roj" a kurdî di inglîzî "day and night" û di almanî de jî "Tag und Nacht" hene ku di herduyan de jî "roj" berî "şev"ê tê. "Reş û spî" di inglîzî de "black and white" e anku ji aliyê peyvrêziya xwe ve wek kurdî ye lê di spanî de heman gotin "blanco y negro" ye ku tê de "spî" berî "reş"î tê.

## Giraniya dengî ya cotpeyvan

Di cotpeyvan de tenê kîteya dawiyê ya beşa duyem giraniya serekî heye. Di nimûneyan de cihê giraniyê hatiye qelewkirin:

- **jin + mêr** → jinûmêr
- **dê + bab** → dêbab
- **reş + spî** → reşûspî
- **dan + standin** → danûstandin
- **hatin + çûn** → hatinûçûn

Peyva "hatinûçûn" herwiha bi awayê "hatûçûn" jî peyda dibe. Sebebê ketina –in ji lêkera "hat-in" di "hatinûçûn" (hatinûçûn → hatûçûn) de dikare ji ber negiranbûna (ketina giraniya) "-in" ya lêkera "hatin" di "hatinûçûn"ê de be.

Di peyvên ji beşên dukîteyî (yan zêdetir kîte heyî) pêkhatî de beşa yekem jî dikare xwedî giraniya duyem be. Di nimûneyên li jêr de em ê giraniya serekî **qelew** û giraniya **duyem** jî *xwehr* binivîsin:

- *kirîn* û **firotin**
- *biçûk* û **mezin**

## Çemandin û girêdana cotpeyvan

Pêşpirtik adeten tenê li destpêka hemû cotpeyvê û paşpirtik jî adeten tenê li dawiya hemû cotpeyvê bi cih dibin. Anku heman pirtik normal li destpêka yan dawiya herdu beşan dubare nabe:

- danûstandina li gel wan (ne "dana û standina li gel wan")
- heval û hogirên min (ne "hevalên û hogirên min" an "hevalên min û hogirên min")
- bêşerefûnamûs (adeten ne "bêşeref û bênamûs")
- dêûbabîtî (adeten ne "dêyîtî û babîtî")

## Cotnav

Di kurdî û gelek zimanên din de jî hin cotên navên mirovan jî hene ku bi hev re tên bikaranîn. Adeten ew ji navên keçekê û kurekî pêk hatine û bi hev re maneya "dastan"ekê didin:

- Leyl û Mecnûn
- Xecê û Siyabend
- Şîrîn û Ferhad
- Binefşa Narîn û Cembeliyê Hekarî

Di van cotnavan de beşek yekem ji navê keçê / jinê pêk tê. Ew jî li cotpeyvên wek "bûk û zava", "jinûmêr", "xwişk û bira" dikin. Anku hem di cotpeyvan û hem jî di cotnavan de mê berî nêr tê.

Lê hemû cotnav ne li gor vê qeyd û bendê ne:

- Mem û Zîn
- Derwêş û Edûlê

Di van cotnavan de nêr berî mê ye. Wek din jî nimûneyên pêştir jî ne bi temamî sabit in, lo ma mirov formên wiha jî dibîne:

- Ferhad û Şîrîn
- Siyabend û Xecê

Anku peyvrêziya hemû cotnavan ne wek ya cotpeyvan sabit e.

Ji bilî cotnavên ji navekî jinan û navekî mêran, herwiha cotnavên ji du navên jinan an du navên mêran jî hene:

- Hesên û Hisên
- Stî û Zîn

Sebebê peyvrêziya van cotnavan diyar e: Mebest ji "Hesên û Hisên" herdu kurên Îmam Elî û neviyên Mihemed pêxember in. Hesên birayê mezin e û Hisên jî birayê biçûk e loma wisa li pey hev hatine rêzkirin. Stî û Zîn jî xwişkên hev in: Stî xweha mezin e, Zîn xwişka biçûk e loma wisa li gor jiyê xwe li pey hev hatine rêzkirin.

Lê peyvrêziya cotnavan ne herdem li gor mezinahiya wan an giringiya wan e jî. Ji xwe di Mem û Zînê de li gor mijara dastanê Zîn ji Stiyê "giringtir" e lê dîsa jî Stî di cotnavî de berî Zînê ye. Ji aliyê dîrokiya dînî ve Mûsa pêxember berî Îsa pêxember hatiye lê dîsa jî cotnavê wan wiha ye:

- Îsa û Mûsa

Anku gava em behsa van pêxemberan an jî qala pêxemberan bi awayekî giştî dikin, em adeten dibêjin "Îsa û Mûsa", ne "Mûsa û Îsa". Sebebê vê peyvrêziyê bi esehî nayê zanîn lê ihtimalen ji dengê M yê li destpêka navê Mûsa ye. Bidin ber:

- agir û magir
- ders û mers
- tiştûmişt
- hûrûmûr...

## Sêpeyv?

Ji bilî cotpeyvyan, di kurdî û hin zimanên din de jî bi marjinalî herwiha sêpeyv an sênav (*trinomial*, *tricolon*) jî hene ku bi awayekî qalibgirtî li pey hev tên gotin û peyvrêziya wan herdem eynî ye û naguhere.

Di kurdî de nimûneyên sêpeyvî yan sênavî pir kêr in lê dîsa jî çend li peyda dibin:

- **kesk û sor û zer:** yek ji çendîn navên ala Kurdistanê ye. Gotina qalibgirtî ya rêzkirina navên rengên alaya Kurdistanê ye anku mirov herdem bi gotinê wisa dibêje tevî ku tê de rengê spî

jî heye û tevî ku zer ne li rexekî (li destpêkê yan dawiyê) lê li navê ye. Bernavê din ê meşhûr ê ala Kurdistanê "Ala Rengîn" e.

- **Îsa û Mûsa û Mihemed:** awayê qalibgirtî yê navên van her sê pêxemberan tevî ku tarîxiyên Mûsa berî Îsa bû. Herwiha ev her sê nav bi hev re maneyan pêxemberan bi awayekî giştî jî didin.

## Pirsgirêkên rastnivîsîna cotpeyvan

Gelo mirov cotpeyvan çawa dinivîse? Her beşek serbixwe, hemû beş bi hev ve, hin beş bi hev ve yan jî bo nimûne bi xetikên navber?

Çend awayên mimkin ên nivîsîna cotpeyvan:

her beş serbixwe	hemû beş bi hev ve	hin beş bi hev ve	xetik di navberê de
jîn û mêr	jînûmêr	-	jîn-û-mêr
reş û spî	reşûspî	-	reş-û-spî
dê bab	dêbab	-	dê-bab
bi nav û deng	binavûdeng	bi navûdeng binav û deng	bi-nav-û-deng

Mixabin hem di kurdî de û hem jî di gelek zimanên din yê baş standardkirî de jî bersiveke zelal û herdemî bo bijartina awayekî ji van peyda nabe. Bo nimûne:

- inglîzî: black-and-white, black and white (reşûspî)
- tirkî: ana baba, ana-baba, anababa (dêbab)

Di kurdî de nivîsîna bi xetikên di navberê de (bo nimûne *jîn-û-mêr*, *bi-nav-û-deng*) diyardeyeke nadir e û kêmtê bikaranîn. Mirov dikare bi hêsaniyê bibêje ku ew wisa kêmtê bikaranîn ku em wê tercîh û pêşniyaz nakin.

Nivîsîna hin beş bi hev ve û hin jî ji hev cuda (bo nimûne *bi navûdeng* yan *binav û deng*) ne awayekî serdest e. Nivîsîna wisa di rastiyê de bi piraniyê ji encama cudanivîsîna pêşpirtikên rengdêrsaz *bi- û bê-* ne ku ne awayekî rast e ji ber ku *bi-* û *bê-* di peyvên necot re tên nivîsîn:

- *bêxwê* (ne *sûr / şor*), *bênamûs* (*bêar*, *bêşeref*, *kesa/ê* ku ji *şeref* û *namûsê bêpar* e)

- biçek (çekdar), bişeref (şerefdar, kesa/ê ku şeref û namûs jê re giring in)

Ji her çar awayên mimkin, ev herdu awa bi berfirehî tên bikaranîn:

- her beş serbixwe
- hemû beş bi hev ve

Piraniya (eger ne hemû) cotpeyvên kurdî bi awayê her beş serbixwe nivîsandî peyda dibin. Lê hin cotpeyv zêdetir bi hev ve û hin jî her beşek serbixwe nivîsandî tên dîtin.

Di kurdî de çendîn tişt hene ku tesîrê li ser hindê dikin ka cotpeyv bi hev ve yan jî her beşeke wê serbixwe tê nivîsîn:

- 1) **dirêjahiya beşên cotpeyvê:** Eger beşên cotpeyvê bi xwe peyvên dukîteyî (yan dirêjtir) bin, ew kêman bi hev ve tên nivîsîn. Loma dijwar e mirov bibîne ku *kirîn û firotin* yan *xwarin û vexwarin* wek *kirînûfirotin* an *xwarinûvexwarin*<sup>140</sup> hatine nivîsîn. Eger herdu beşên cotpeyvê yan bi kêmanî beşeke cotpeyvê ji peyvên yekkîteyî bin, hingê ew bi rêjeyeke diyar zêdetir bi hev ve tên nivîsîn: *jinûmêr*, *reşûspî*, *danûstandin*, *hatinûçûn*.
- 2) **berbelaviya cotpeyvê:** Cotpeyvên ku pir tên bikaranîn, beşên wan bi ihtimaleke mezintir bi hev ve tên nivîsîn. Loma gotinên wek *dêbav*, *reşûspî*, *hatinûçûn* ji gotinên wek *xal û xwarza*, *sor û zer*, *xwarin û vexwarin* zêdetir bi hev ve tên nivîsîn ji ber ku gotinên desteya yekem pir li kar in, yê desteya duyem kêmtir.
- 3) **îdyomatîkiya cotpeyvê:** Gava ku cotpeyv ne tenê bi maneya xwe ya deng an pir nêzîkî wê lê zêdetir bi awayekî biwêjî û îdyomatîkî tê bikaranîn, hingê ihtimala nivîsîna beşên wê bi hev ve zêdetir e. Bo nimûne, cotpeyvên wek *dengûbas* (news), *danûstandin* (negotiation), *bavûkal* (ancestors) ji gotinên wek *şev û roj*, *bûk û zava*, *xwarin û vexwarin* zêdetir bi hev ve tên nivîsîn ji ber ku peyvên desteya yekem zêdetir ji maneya xwe ya peyv bi peyv dûr ketine û bûne îdyom lê maneya peyvên desteya duyem hema-hema wek beşên wê ye.

Wek prensîp mirov li gor van her sê rêbazan bike û pêşniyazeke wiha kurt bike:

- hemû beşên cotpeyvên kurt bi hev ve binivîsin, yê dirêj ji hev cuda
- cotpeyvên îdyomatîk bi hev ve binivîsin, yê maneya wan yekser ji beşên wan ji hev cuda

<sup>140</sup> Helbet ev awayên nivîsînê jî hene lê pir kêman in. Bo nimûne, di lêgerîneke roja 4.12.2015 Google tenê 7 *kirînûfirotin* beramberî 9 000 encamên awayê "*kirîn û firotin*" pêşkêşî min kirin. Lêgerîneke din a heman rojê tenê 6 *xwarinûvexwarin* hevberî 3 700 "*xwarin û vexwarin*" an diyar kirin.



- cotpeyvên pir li kar bi hev ve, yên kê li kar her beşek bi tenê

Lê gava ku em pêşpirtik an paşpirtikan bidin gel cotpeyvyan, hingê nivîsîna beşên cotpeyvê ji hev cuda pirsgirêkan peyda dike. Bo nimûne, "navûdeng" maneya "meşhûriyet"ê dide. Bo ku em bibêjin kesek "meşhûr, navdar" e, divê em pêşpirtika "bi-" lê zêde bikin:

- bi + navûdeng → binavûdeng

Lê eger me "navûdeng" wek "nav û deng" binivîsiya, hingê meşhûr dê bûbûya "binav û deng" ku awayekî xeletê nivîsînê ye ji ber ku hingê "bi" tenê "nav"î digire tevî ku "bi-" bo herdu peyvyan e.

Herwiha eger kesekî ji kesekî din zêdetir navûdeng hebe, hingê em dibêjin:

- A ji B binavûdengtir e.

Dîsa eger me "navûdeng" wek "nav û deng" binivîsiya, paşpirtika "-tir" dê tenê beşa "deng" bigirta û beşa "nav" jê bêpar bimaya.

Di gotina "navûdeng" de ev ne pirsgirêk e ji ber ku "navûdeng" adeten wek cotpeyveke îdyomatîk bi hev ve tê nivîsîn. Lê gelek peyvên din adeten ji hev cuda tên nivîsîn: Biramin ku kesekî ne navûdeng lê çek û rext hene. Li cihê ku em bibêjin ew "binavûdeng" e, em ê çî bibêjin – an jî rasttir, em ê çawa binivîsin:

- bi çek û rext?
- biçek û rext?
- biçekûrext?

Û eger çek û rextên A ji yên B zêdetir bin, em ê çawa binivîsin:

- bi çek û rexttir?
- biçek û rexttir?
- biçekûrexttir?

Tenê awayên bi hev ve nivîsandî (biçekûrext, biçekûrexttir, biçekûrexttirîn) herdu peyvên bingehînên cotpeyvê (çek + rext) bi hev ve girê didin. Mesele ne tenê "çek û rext" in. Bo nimûne:

- bêdêbav (sêwî, êtîm)
- danûstandinker
- qedirûqîmetzan

- xwişkûbiratî
- hatinûçûna [wan]

Loma nivîsîna cotpeyvan bi hev ve ne tenê tiştêkî fehmbar û qebûlbar e lê di gelek rewşan de heta giring û zerûrî ye jî.

## Peyvsazî bi paşvesaziyê

Mebest ji **paşvesazî** (*back-formation*) çêkirina peyveke nû bi kurtkirina peyveke heyî ye. Cudahiya navbera peyvsaziya bi paşvesaziyê û peyvsaziya bi qusandinê ew e ku bi qusandinê peyv tên kurtkirin lê maneya wan naguhere lê bi paşvesaziyê hem wateya peyvê diguhere û hem jî gelek caran birrê peyvê diguhere.

Di paşvesaziyê de paşpirtikek ji peyvê tê avêtin. Bo nimûne, bi paşvesaziyê peyva *nivîs* (bi inglîzî *article, writing*) ji peyva *nivîsîn* (*to write*) yan *hejmar* (*number*) ji *hejmartin*<sup>141</sup> (*to count, to calculate*) hatine çêkirin.

Sebebê wê ku em dibêjin “nivîs” ji “nivîsîn” hatiye çêkirin ew e ku “nivîsîn” ji mêj ve di zimanê kurdî de hebûye û di nav xelkê de li kar e. Lê “nivîs” vê dawiyê di zimanê nivîskî de hatiye saz kirin û di nav xelkê de peyda nabe.

Li cihê “mehkeme kirin, dan mehkemeyê” ev demek e ku di kurmanciya nivîskî de peyva “darizandin”<sup>142</sup> (*to indict, to accuse*) tê bikaranîn ku bi eslê xwe ji farisî ji peyvên “dad” (edalet) û “resanden” (gihandin) e anku “gihandin edaletê, birin mehkemeyê, mehkeme kirin, dan mehkemeyê”.

Di tirkî de bi heman maneyê peyva “yargılamak” li kar e. Tirkî bi paşvesaziyê ji wê, peyva “yargı” bi maneya “qezaî, dezgeha dadgêran, dezgeha hakiman” (bi inglîzî *judiciary*) çêkiriye. Îcar li ber modela tirkî, vê dawiyê mirov di nivîsên kurmancî de peyva “daraz” ya bi heman wateya “qezaî, dezgeha dadgêran, dezgeha hakiman” dibîne.<sup>143</sup>

Hêjayî gotinê ye ku “darizandin” nebûye “dariz” lê bûye “daraz”. Tevî ku “daraz, darizandin” ne ji rehên samî (erebî yan aramî) ne lê tam li gor heman rêkarê hatine çêkirin, wek van peyvên bi xwe eslê xwe samî:

- xebat / xebitandin
- şewat / şewitandin

<sup>141</sup> Herwiha varyanta wê ya din: *jimartin* → *jimar*.

<sup>142</sup> Nimûneyek ji bikaranîna peyva “darizandin” bi maneya “mehkeme kirin, dan mehkemeyê”: “Berpîrsa firotina keçên êzidî li Hewlêrê tê darizandin. <http://rudaw.net/kurmanci/kurdistan/1008201515>

<sup>143</sup> Mînakeke ji bikaranîna peyva “daraz”: “Ger em neheq bim, dê hingê dewlet bi daraz û dadgeha xwe tiştê pêwîst li dijî min pêk bîne.” <http://rudaw.net/kurmanci/kurdistan/191120142>

Çendîn peyvên din jî hene ku dişibin paşvesaziyê:

- revîn → rev
- dizîn → diz
- mîstin → mîz

Lê bi ihtimaleke mezin ev peyv ne ji encama paşvesaziyê ne. Bi ihtimaleke mezintir ew bi *guhastinê* (conversion) ji rehê dema niha ya van lêkeran hatine çêkirin.<sup>144</sup>

Wek din peyvsaziya bi paşvesaziyê hem di kurdî de û hem jî di gelek zimanên din de jî diyardeyeke nadir e.

Di kurdî de bi paşvesaziyê navdêr ji lêkeran tên çêkirin:

- nivîsîn → nivîs
- hejmartin → hejmar
- darizandin → daraz

Lê bo nimûne di inglîzî de adeten lêker ji navdêran tên çêkirin:

- television (televizyon) → televise (televîze kirin, bi televizyonê weşandin)

## TÊKILKIRIN

**Têkilkirin** (*blending*) tê maneya çêkirina peyvên nû ji hin beşên lê ne hemû beşên du yan çend peyvan. Di peyvsaziya kurdî û zimanên din de jî ev metod kêr li kar e yan qet peyda nabe. Lê vê

---

<sup>144</sup> Bo peyvsaziyê bi guhastinê, binêrin kovara Kanîzar, hejmar 1:  
<https://zimannas.wordpress.com/2015/08/04/kanizar-naveroka-hejmara-1-2015/>

dawiyê çend nimûneyên balkêş yê têkil di kurdî de hatine çêkirin. Ji wan yê herî navdar *tirkmancî* (têkilkirina *tirkî û kurmancî*) û *sormancî* (têkilkirina *soranî û kurmancî*). Bi heman metodê herwiha carinan mirov peyvên *erebmancî*<sup>145</sup> (têkilkirina *erebî û kurmancî/kurmancî yan erebî û kurdî*) û *farismancî*<sup>146</sup> (têkilkirina *farisî û kurmancî/kurdî*).

Carinan peyvên wek *tirkmanc* (nîvtirk-nîvkurd, kurdên *tirkbûyî*, kurdên *hevkarên tirkan* û *hwd.*) tê bihîstin. Bi heman awayî herwiha *farismanc* yan *erebmanc* jî hene.

Mirov dikare peyva inglîzî *brunch* (taşt dereng yan firavîna zû) wek nimûne bide ku ji têkilkirina *breakfast* (taşt) û *lunch* (firavîn) hatiye çêkirin. Belkî di kurdî de mirov bikare peyva *paşîv* wek têkilkirineke peyva *paş* û *şîv* hesab bike lê dikare wê wek sivikkirina du dengên *Ş* bi *Ş*-yekê jî rave bike. Herwiha peyva devokî *nîro* dikare wek têkilkirina *nîv+ro(j)* were hejmartin. Lê têkilkirin adeten wek peyvsaziyeke bi zanîn tê hesibandin loma hejmartina van peyvên kurdî wek nimûne ji têkilkirinê hinekî biguman e.

---

<sup>145</sup> Bo bikaranîna peyva *erebmancî* di nivîsekê de, binêrin bo nimûne: <http://www.lotixane.com/2014/02/07/cerixin/>

<sup>146</sup> Bo bikaranîna peyva *farismancî* di nivîsekê de, binêrin bo nimûne:

[http://www.nefel.com/articles/article\\_print.asp?ArticleNr=7617](http://www.nefel.com/articles/article_print.asp?ArticleNr=7617)

# PEYVSAZÎ BI WERGERANDINÊ

## MIJAR Û PEYVNASIYA WÊ

Mebest ji **peyvsazî bi wergerandinê** yan *wergerandina yekser* yan *wergerandina deynkirî* (bi inglîzî *loan translation* yan *calque, calquing*) çêkirina peyvan ji hêmanên xwemalî lê li ber modelên zimanekî din e. Bo nimûne, peyvên "malper, zanîngeh, parêzgeh, makezagon" ji peyvên di kurdî de ji berê ve heyî hatine çêkirin lê çêkirina wan hemûyan jî li ber modelên hin zimanên din e:

- "malper"<sup>147</sup> (koma hin rûpelên li ser Internetê, bi inglîzî *home page, webpage*) wergerandina yekser ji peyva inglîzî "home page" e ku ji peyvên "home" (mal) û "page" (per, pel, kaxez) hatiye çêkirin
- "xwendingeh"<sup>148</sup> (fêrgeh, dibistan, medrese, mekteb, inglîzî *school*) li ber modela erebî مدرسة (medrese[t]) hatiye çêkirin ku ji pêşgira "me-" (-geh) û rehê d-r-s- (xwendin, xwe hîn kirin) e ku wek "ders" jî ketiye kurdî
- "zanîngeh"<sup>149</sup> (zanko, unîversîte, cami'e, xwandingeha bilind, inglîzî *university*) ji peyvên xwemalî "zanîn" û "-geh" lê li ber modela farisî دانشگاه (danişgah) ye ku ji peyvên دانش (daniş: zanîn, zanist, ilm) û هگ- (-gah: -geh, cih) e
- "makezagon"<sup>150</sup> (qanûna bingehîn, destûr, inglîzî *constitution, constitutional law*) ji peyvên "mak" û "zagon" lê li ber modela tirkî "anayasa" ye ku ji peyvên "ana" (mak, dayik) û "yasa" (qanûn) pêk tê

Ev diyarde û fenomen ne tenê di kurdî de lê hemû zimanan de kêş yan zêde peyda dibe. Mirov dikare hin nimûneyên peyvsaziya bi wergerandinê di zimanên cuda-cuda de li vê derê bibîne lê divê

---

<sup>147</sup> Hin nimûne ji bikaranîna peyva "malper" di kurdî de: <https://www.google.fi/webhp?sourceid=chrome-instant&ion=1&espv=2&ie=UTF-8#q=malper%20xwe>

<sup>148</sup> Herwiha "xwendegeh, xwandingeh, xwandegeh". Çend nimûne ji bikaranîna peyva "xwendingeh": <https://www.google.fi/webhp?sourceid=chrome-instant&ion=1&espv=2&ie=UTF-8#q=xwendingeh+xwe>

<sup>149</sup> Çend nimûne ji bikaranîna peyva "zanîngeh" di nivîsên kurdî de: <https://www.google.fi/webhp?sourceid=chrome-instant&ion=1&espv=2&ie=UTF-8#q=zan%C3%AEngeh>

<sup>150</sup> Çend nimûne ji bikaranîna peyva "makezagon" di nivîsên kurdî de: <https://www.google.fi/webhp?sourceid=chrome-instant&ion=1&espv=2&ie=UTF-8#q=makezagon+xwe>

mirov ji bîr neke ku ew tenê nimûne ne, tê de ne hemû ziman hene û ne jî ji zimanên di lîsteyê de heyî hemû peyv hatine rêzkirin: [https://en.wikipedia.org/wiki/List\\_of\\_calques](https://en.wikipedia.org/wiki/List_of_calques)

Gelek ji peyvên li ber modelên zimanên din çêkirî peyvên teknîkî û kultûrî yên nû ne. Bo nimûne, ti ji van nimûneyên kurdî yên li jor rêzkirî berî sed salan (belkî heta berî pêncî salan jî) di kurdî de tine bûn. Anku peyvên wiha nû ne.

Lê hin peyvên gelek kevn jî bi rêya peyvsaziya bi wergerandinê peyda bûne. Bo nimûne, hevberî peyvên inglîzî "Sunday, Monday, Tuesday, Wednesday, Thursday" yên inglîzî di kurmancî de "yekşem(b), duşem(b), sêşem(b), çarşem(b), pêncşem(b)", di soranî de "yekşem, dûşem, sêşem, çwarşem, pêncşem" û di farisî de jî "yekşembê, dûşembê, sêşembê, çeharşembê, pêncşembê" hene. Di ziman û zaravayên din jî yên îranî de ev peyv bi piranî wiha ne. Ji wan bi zelalî diyar dibe ku ew ji navê hejmarên 1 – 5 hatine dariştin anku çêkirin.

Lê gava ku mirov wan dide ber hevwaterayên wan yên erebî û îbrî/îbranî, mirov wekhevîyeke ecêb dibîne: di van zimanan de jî navên rojên yekşemê heta pêncşemê ji navê hejmarên 1 – 5 pêk hatine. Ev wekhevî ne tesadîfî ye ji ber ku ev herdu komên zimanan (îranî û samî) cîran in, ji ber ku di van herdu komên zimanan de navên înanî (cume) û şemiyê ne ji hejmaran in û li aliyekî din di zimanên ji van dûrtir jî navên peyvên hefteyê wiha çênekirine.

Tarîxiyên navên rojên yekşemê heta pêncşemê di zimanên îranî de encama peyvsaziya bi wergerandinê ne: zimanên îranî navê van peyvan li ber modela hevwaterayên wan yên zimanên samî çêkirine (*li jêrtir binêrin*).

## EV VEKOLÎN Î YÊN BERÎ WÊ

Ev ne yekem car e ku di kurdî de behsa peyvsaziya bi wergerandinê tê kirin. Lê heta niha mijar tenê di çarçoveya teng ya "çêkirina şaş ya peyvan li gor mentîqa tirkî/erebî" maye.<sup>151</sup> Ew ji vekolîn û

---

<sup>151</sup> Ne vekolînên berfireh lê nivîsarên du-sê rûpelî yan kolumn li ser vê mijarê gelek in. Mirov dikare çend nimûneyan ji wan li vê derê bide: <http://candname.com/ji-kurdiya-tirki-ber-bi-kurdiya-kurdi-ve-abdulkadir-bingol/>, <http://cellikani.com/?p=47>. Ew ne tenê bi kurdî lê bi tirkî jî hatine nivîsîn, bo nimûne: <http://www.mardinlife.com/chan-hesn-talana-ugratilan-kurtce-ve-tirkmanc-yazisi-1035>

fehmkirina sebebzan zêdetir rexneyên tûj in û daxwaz dikin û demildest mirov dev ji van peyvnan berde.

Yek ji kêmb nivîsarên ku mirov dikare wek hewldaneke lêkolînî bihesibîne, kurtenivîseke vê dawiyê ya Michael Chyet ya bi navê *Xwedîtiya Hevbeş (Shared Ownership) û Zargotina Kurdî ye*<sup>152</sup>. Mixabin ev vekolîn jî pir kurt e û tenê behsa çend biwêjan (îdyoman) dike ku piraniya wan ji zimanê tirkî li zimanên derdor (kurdî, ermenî, yûnanî, albanî û hwd.) belav bûne. Ew nivîsar ne bersiva berfirehiya hemû mijara peyvsazî û biwêjsaziya bi wergerandinê dide û ne jî warên peyvsaziya wiha û awayên vê peyvsaziyê diyar dike.

Armanca vê nivîsara me nasandina mijara peyvsazî û biwêjsaziya bi wergerandinê ye, vekolîna berfirehiya vê diyardeyê di zimanê kurdî de ye û herwiha diyarkirina warên peyvsaziya bi wergerandinê û awayên li kar yê peyvsaziya bi wergerandinê ye. Herwiha em ê hewl bidin vekolin ka peyvsaziya bi wergerandinê di kurdî de ji kîjan zimanan tên. Li dawiyê em ê hewl bidin bersiva wê jî bidin ka peyvsaziya bi wergerandinê baş yan xirab e anku bifeyde yan jî biziyan e yan jî kengî û çawa dikare bi bisûd be û kengî jî zerermend be.

## AWAYÊN PEYVSAZIYA BI WERGERANDINÊ

Peyvsaziya bi wergerandina teşe bi teşe (*morpheme-by-morpheme*) be yan jî serbest be. Di peyvsaziya teşe bi teşe de her biçûktirîn beşa parvebar ya peyvê li pey hev ji zimanê jêder neqlî zimanê wergir tê kirin. Di peyvsaziya bi wergerandina serbest bo nimûne peyvrêziya teşeyan ji hev cuda be, hejmara teşeyan ji hev cuda be yan jî tenê yek yan hin teşe hatibin wergerandin û hin jî bi hin teşeyên din hatibin veguhastin.

Mirov dikare cûrên peyvsaziya bi wergerandina wiha parve bike:

- wergerandina teşe bi teşe
- wergerandin li gor peyvrêziya xwemalî
- wergerandin li gel zêdekirina yan kêmkirina hin teşeyan
- wergerandina peyvekê bi çend peyvnan yan çend peyvnan bi peyvekê

---

<sup>152</sup> Nivîsar sala 2015 di kovara Lêkolînên Kurdî ya Weşanxaneya Avestayê de hatiye belavkirin.



## Wergerandina teşe bi teşe

Mebest ji peyvsaziya bi wergerandina teşe bi bi teşe wergerandina her teşe yan pirtika peyva zimanê jêder li zimanê wergir e bêyî guherandina cihê teşeyan yan kêmkirina yan zêdekirina hejmeta teşeyan.

Bo nimûne, ji nimûneyên me yên li jor peyva “malper” teşe-bi-teşe yan peyv bi peyv ji inglîzî “home page” hatiye wergerandin. Herwiha dîsa ji nimûneyên me yên li jor peyva “zanîngeh” teşe bi teşe bi peyva farisî “danişgah” hatiye wergerandin.

Carinan peyvsazî û peyvrêziya du zimanan nêzîkî hev e û bi zerûrî peyvsaziya bi wergerandinê gelek caran dibe teşe bi teşe. Bo nimûne, hem di farisî “-gah” û hem jî di kurdî “-geh” paşgir e loma mirov dikare bibêje “danişgah, zanîngeh” lê di van zimanan de ne mimkin e ku mirov bibêje “\*gehzanîn / \*gahdaniş”.

Lê peyvrêziya zimanê jêder û zimanê wergir ne herdem wek hev e lê di peyvsaziya teşe bi teşe de dîsa jî zimanê wergir di peyvên bi wergerandinê saz dike de li gor peyvrêziya zimanê jêder peyvê teşe bi teşe werdigerîne.

Bo nimûne, di kurdî de adeten peyva raveber berî peyva peyva raveker e. Mebest ji vê ew e ku peyva yekem bi peyva duyem tê wesifkirin. Bo nimûne “mêrê baş” yan “kurê wî”. Di inglîzî de peyvrêziya giştî berevajî ya kurdî ye anku raveker berî raveberê tê. Bo nimûne “the good man” (teşe bi teşe: yê baş mêr) yan “his son” (“yê wî kur”).

Loma “home page” di inglîzî de di rastiyê de tê maneya “perê malê” (pelê malê, kaxeza malê). Di kurdî de adeten bi vê maneyê mirov dikare qalibê wek “perê malê” yan jî kurtkirî “permal” çêke. Lê darêjerên peyva “malper” ev peyv bi wergerandina teşe bi teşe li ber modela inglîzî pêk aniye.

Tevî ku “malper” ne li gor peyvrêziya kurdî yan “qalibê” kurdî ye jî lê dîsa jî vê peyvê êdî cihê xwe girtiye û ji aliyê piraniya medyaya kurdî ve tê bikaranîn û êdî bûye parek ji xezîneya peyvên kurdî.

## Wergerandin li gor peyvrêziya xwemalî

Peyvsaziya bi wergerandinê ne herdem teşe bi teşe ye lê hin xusûsiyetên zimanê wergir li ber çavan digire û li gor wan peyvan saz dike tevî ku raman û hêmanên peyvê wergerandina ji zimanekî din be jî.

Ji nimûneyên me li jor dayî, peyva “xwendingeh, xwendegeh” li ber modela erebî “medrese” hatiye çêkirin lê dîsa jî “xwendingeh, xwendegeh” ne peyvsaziya bi wergerandina teşe bi teşe ye. Erê “xwendin” hevberî rehê erebî “d-r-s-” ye û “-geh” jî beramberî “me-” ya erebî ye. Lê dîsa jî peyvrêziya “xwendingeh” a kurdî ji peyvrêziya “medrese” ya erebî cuda ye:

- di peyva kurdî de teşeya serekî ya ku maneya tiştê tê kirin (xwendin) li destpêkê ye lê hevwatera wê (d-r-s-) li dawiyê ye
- di peyva erebî de teşeya ku cihê diyar dike (me-) li destpêkê ye lê di kurdî de hevwatera wê (-geh) li dawiyê ye

Ji ber ku di erebî de peyvsazî zêdetir bi alîkariya pêşgiran û di kurdî de jî zêdetir bi paşgiran e, gelek caran di peyvsaziya bi wergerandinê de ji erebî li kurdî, peyvrêziya peyvan di herdu zimanan de ne wek hev e. Ji bilî navên cihan, herwiha bo nimûne navdêrên biker (*agent noun*) jî anku kesên ku tiştêkî dikin di kurdî de hin caran wergerandinên ji erebî ne lê di erebî de ew bi pêşgiran (adeten mu-) hatine dariştin lê wergerên wan di kurdî de bi paşgiran (bo nimûne -er, -ker, -van) in. Bo nimûne:

- erebî: محامي (muḥamî: avukat, parêzer) ji pêşgira bikersaz ”mu-” (-er, -van, -ker, -kar) + rehê ḥ-m-y- (parastin) → kurdî ”parêz-er”

### **Wergerandin li gel zêdekirina yan kêmkirina hin teşeyan**

Di peyvsaziya bi wergerandina serbest de hejmara teşeyên peyva jêder û peyva jê çêkirî ji hev cuda be. Hejmara teşeyan dikare ji “orijînalê” zêdetir an jî kêmtir be.

Bo nimûne, peyva tirkî “anayasa” ji du teşeyan “ana” (mak, dayik) û “yasa” (qanûn, yasa, zagon) pêk hatiye. Lê “makezagon” a kurdî ya li ber wê çêkirî ji sê teşeyan pêk tê “mak-e-zagon”. Anku navgira (navpirtika, *infix*) “-e-” di kurdî de li wergerê hatiye zêdekirin ji ber ku forma “makezagon” ji “makzagon” hêsantir tê gotin û bi awayekî “kurdîtir” e.

Hêjayî gotinê ye ku ti şik û guman jê nîne ku “makezagon” li ber modela tirkî hatiye avakirin. Sebebê vê ew e ku ji bilî tirkî zimanên din navê “mak” li qanûna bingehîn nakin. Bo nimûne, di erebî de navên wê “qanûn esasî, nîzam, dustûr” in, di farisî de navê wê “qanûn-i esasî”, rûsî “osnovnîy zakon” (qanûna bingehîn) û “konstîtuçiya”, fransî û inglîzî “constitution” ji latînî “constitutio” (bingeh, bicihkirin). Anku “ana” (mak) di peyva “anayasa” (makezagon) de taybetmendiyeke tirkî ye ku neqî kurdî hatiye kirin.

Wek ku li jor hatiye gotin, navên rojên hefteyê ji yekşemê heta pêncşemê di zimanên îranî de encamên peyvsaziya bi wergerandinê ji zimanên samî ne. Di zimanên samî de, navên van peyvan bi şiklê “roja yek, roja du, roja sê, roja çar, roja pênc” yan jî bi awayê kurtkirî “ya yek, ya du, ya sê, ya çar, ya pêncin”. Li cihê “roja” yan “ya”, di zimanên îranî de paşgira “-şem(b)” (kurmançî), “-şem(me)” (sorani) yan “-şenbê” (farisî) heye. Bi eslê xwe navê van peyvan kurtkirina “yek roj piştî şemiyê, du roj piştî şemiyê, sê roj piştî şemiyê...” tên ji ber ku di cihûtiyê de şemî (şebet) roja pîroz e û piştî wê hefteyeke nû dest pê dike. Şemî bi xwe jî bi rêya çendîn guherînan ji peyva “şebet” ya îbrî ye.

Lê di navên peyvên yekşem heta pêncşem de di zimanên samî de ti paşgir nînin. Anku tevî ku fikra hejmarên 1 – 5 di navên van rojan de ji zimanên samî hatiye girtin jî, dîsa zimanên îranî ev peyvên samî teşe bi teşe wernegerandine lê teşeyeke ku qet di van peyvên samî de nîne li navên van peyvan di zimanên îranî de zêde kiriye.

Nimûneyeke din, ku mirov dikare li vê derê bide, peyva inglîzî “computer” û hevwateriya wê ya tirkî “bilgisayar” in ku herdu maneya “kompûter” didin. Peyva “computer” bi eslê xwe di inglîzî de maneya “hejmêr, kesa/ê yan tişt/a/ê ku tiştan dihejmêre” dide lê paşî maneya xwe ya niha “kompûter” wergirtiye. Peyva tirkî “bilgisayar” bê şik encama peyvsaziya bi wergerandina peyva inglîzî “computer” e. Lê di tirkî de “bilgisayar” ji peyvên “bilgi” (agahî, zanîn) û “sayar” (hejmêr, kesa/ê yan tişt/a/ê ku tiştan dihejmêre”) tê anku “bilgisayar” bi wergerandina peyv bi peyv dibe “agahîhejmêr” yan “zanînhejmêr”. Wek ku tê dîtin, teşeya “bilgi” li peyva tirkî hatiye zêdekirin tevî ku ti teşeyeke hevwateriya wê di “computer” ya inglîzî de nîne.

**Wergerandina peyvekê bi çend peyvan yan çend peyvan bi peyvekê**

Hejmareke ne kê m ya navên werziş û sporan vê dawiyê ji inglîzî ketiye kurdî û piraniya zimanên dinyayê. Bo nimûne, “football, basketball, baseball, volleyball, handball” adeten di kurdî de jî wek “futbol, basketbol, beysbol, voleybol, handbol” tên gotin û nivîsîn. Lê hin caran mirov wergerên wan jî di kurdî de dibîne. Bo nimûne:

- football: goga piyan<sup>153</sup>, topa piyan<sup>154</sup>
- basketball: goga selikê<sup>155</sup>
- handball: goga destan<sup>156</sup>

Wek ku tê dîtîn, peyveke (pêkhatî ya) inglîzî li gor peyvsazî û qeyd û bendên din yên zimanê kurdî, du peyv pêk hatine. Peyvên inglîzî teşe bi teşe wiha ne:

- foot-ball: pê-gog, pê-top, pê-hol
- basket-ball: selik-gog, seped-gog, zembîl-gog
- hand-ball: dest-gog, dest-top, dest-hol

Wek prensîp, mirov dikare van peyvên inglîzî teşe bi teşe wiha jî bike kurdî û hin ceribandînan wisa di rastiyê de hebûne jî:

- football: pêgog<sup>157</sup>, pêtop<sup>158</sup>

---

<sup>153</sup> Bo nimûne “Di lîstikên goga destan ya mêran, tîma Amedê pileya yekemîn, Wan ya duyemîn, tîma Êlîhê jî pileya sêyemîn

bi dest xist.”  
[http://www.amidakurd.net/nuce/%C5%9Fampiyon%C3%AA\\_n\\_m%C3%AEhr%C3%AEcan%C3%AA\\_a%C5%9Fkere\\_b%C3%BBn](http://www.amidakurd.net/nuce/%C5%9Fampiyon%C3%AA_n_m%C3%AEhr%C3%AEcan%C3%AA_a%C5%9Fkere_b%C3%BBn)

<sup>154</sup> Bo nimûne “Xuleya Ferînaz Xusrewanî ya topa piyan bi dawî hat.” <https://www.pdk-s.com/k/vedio-1/565-kampa-fayde-xuleya-ferinaz-xusrewani-ya-topa-piyan-bi-dawi-hat>

<sup>155</sup> Bo nimûne “Belê piştê sazûna federasyonê, pêşbaziyan goga selik jî dom bû.”  
[www.geocities.ws/mehname2003/38/diyari2.doc](http://www.geocities.ws/mehname2003/38/diyari2.doc)

<sup>156</sup> Bo nimûne “Di lîstikên goga destan ya jinan de tîma Wan pileya yekemîn, Şirnex ya duyemîn tîma Amedê jî pileya sêyemîn

bi dest xist.”  
[http://www.amidakurd.net/nuce/%C5%9Fampiyon%C3%AA\\_n\\_m%C3%AEhr%C3%AEcan%C3%AA\\_a%C5%9Fkere\\_b%C3%BBn](http://www.amidakurd.net/nuce/%C5%9Fampiyon%C3%AA_n_m%C3%AEhr%C3%AEcan%C3%AA_a%C5%9Fkere_b%C3%BBn)

<sup>157</sup> Bo nimûne: <http://www.pen-kurd.org/kurdi/abuzer-bali/pegog.html>

<sup>158</sup> [http://file1.npage.de/002399/31/html/ferheng\\_fr-fz.htm](http://file1.npage.de/002399/31/html/ferheng_fr-fz.htm) beramberî “Fussball” ya almanî.

Lê hewldanên wiha bi ser neketine lê zêdetir wergerandinên li jortir yên peyvek bi çend peyvan û guherandina peyvrêziyê zêdetir li kar in.

Herwiha hêjayî gotinê ye ku peyvên inglîzî yên xwerû, bo nimûne “foot-ball” (pê-gog) di kurdî de jî di peyvên wek “goga piyan” de xwerû nemane lê hatine girêdan, çemandin û pirhejmarkirin:

- goga piyan (peyva “gog” bi alîkariya “a” bi peyva “piyan” ve hatiye girêdan)
- goga piyan (peyva “piyan” hatiye çemandin û pirhejmarkirin)

## WARÊN PEYVSAZIYA BI WERGERANDINÊ

Peyvsaziya bi wergerandinê dikare kultûrî be yan jî bingehîn be. Mebest ji peyvsaziya kultûrî ya bi wergerandinê çêkirina peyvan ji tiştên nû re ye ku berê di zimanê wergir de tine bûn. Bo nimûne, berê bi kêmî bi awayekî zanistî bi kurdî behsa “stêrnasiyê” nedihat kirin. Loma gava ku bi kurdî vê dawiyê behsa wê jî dibe û tê nivîsîn, ji vê zanistê ve navek pêwîst bû ku bi wergerandina vê peyvê li ber modela hin zimanên din peyva “stêrnasî” jê re hatiye çêkirin.

Mebest ji peyvsaziya bingehîn ya bi wergerandinê ew e ku ji berê ve peyvek yan biwêjek ji tiştêkî re he(bû)ye lê dîsa jî li ber modela zimanên din peyvek jê re tê çêkirin. Bo nimûne, berê jî gava ku kesek nexweş bû, kurdan jê re hêviya saxbûnê dikir, bo nimûne bi gotinên wek “silametî be”, “Xwedê şîfayê bike”. Lê vê dawiyê li ber modela tirkî, gelek kurd gotina “derbasbûyî be” bi kar tînin.

Wek prensîp, peyvsaziya bi wergerandinê di hemû warên jiyane de mimkin e. Lê bi taybetî peyvên zanistî, siyasî, medyayî, aborî, hiqûqî û hwd. bi wergerandinê tên saz kirin.

Li vê derê em ê ji çend waran hin nimûneyan pêşkêş bikin. Lê divê bi ti awayî wisa neyê têgihiştin ku peyvsaziya bi wergerandinê di kurdî de tenê bi van waran ve yan bi van çend nimûneyan ve girêdayî ye.

### Zanist

- “derûnnasî” ku wergera “psychology” ya inglîzî yan jî “psychologie” ya fransî ye ku herdu jî ji peyvên yûnanî ψυχή (psîxê: derûn, ruh, giyan) û –λογία (logîa: vekolîn, lêkolîn, behs)
- “erdnigarî” ku wergera “geography” ya inglîzî yan “géographie” ya fransî ye ku herdu ji yûnanî γεωγραφία (geōgraphía) ne ku ji γε (gê: erd, ax) û γραφία (graphía: nîgar kirin, nivîsîn) e ku ji berê ve
- “civaknasî” li ber modela “sociology” ya inglîzî yan “sociologie” ya fransî ku herdu jî ji peyva latînî “socio-” (civak) û peyva yûnanî –λογία (li jortir binêrin).

## Hiqûq

Li jor me di warê hiqûqê de peyva “parêzer” (avukat) ya li ber modela erebî û “makezagon” ya wergera ji tirkî dane.

## Aborî

- “bazara reş”<sup>159</sup> (kirîn û firotinên neqanûnîyên ku itaeta emrên li ser bihayên yan bacan nakin) li ber modela inglîzî “black market” ku li gelek zimanan hatiye wergerandin<sup>160</sup>
- “razemenî” (veberanîn, radestkirina pareyên xwe li bankekê yan di şirketekê de bi armanca ku bank yan şirket pê kar bike û feyde ji xwediyê pareyan re jî bike, bi inglîzî *investment*) li ber modela tirkî “yatırım” ji “yatır-mak” (razandin, nivandin) ji “yat-mak” (razan, raketin, nivistin)

## Medya

- “nûçe” (xeber, dengûbas) li ber modela zimanekî ewropî, bo nimûne inglîzî “news” ji “new” (nû) yan fransî “nouvelles” ji “nouvelle” (nû) yan ji rûsî новости (novostî) ji новы́й (noviy: nû)

<sup>159</sup> Bo nimûne “DAIŞ koleyên cinsî li bazara reş a Tirkîyê difiroşe”. <http://kurmanci.sahartv.ir/news/tirkiye-i201871-dai%C5%9E-koley%C3%AAAn-cins%C3%AE-li-bazara-re%C5%9F-a-tirkiy%C3%AA-difiro%C5%9Fe>

<sup>160</sup> Mirov dikare li vê derê li gotina inglîzî û wergerên wê yên bi zimanên din binêre:

- “rojname” li ber modela farisî “rûzname, rûzname” ji “rûz” (roj) û “name, namê” (name)<sup>161</sup>
- “rûzname” bi xwe jî wergerandina serbest ji “journal” ya fransî ye ku têkilî “jour” (roj) e.

## BIWÊJSAZIYA BI WERGERANDINÊ: KEVN Û NÛ

Me heta niha behsa peyvsaziyê anku çêkirina peyvan kiriye. Lê ne tenê peyv lê herwiha biwêj (îdyom, fraz) jî bi wergerandinê mimkin in û di rastiyê de diyardeyeke berbelav in jî. Em ê ji vê diyardeyê re bibêjin biwêjsazî bi wergerandinê (*idiom formation via translation*).

Li vê derê em ê peyva “biwêj” bi maneyeke berfireh bi kar bînin ku tê de gotinên pêşyan, awayên gişî yên silavkirinê û gotinên din yên ihtiram û rêzgiriyê û herwiha frazên bi lêkerên sivik di nav xwe de bihewîne.

Bo nimûne, gelek kes jê haydar in ku silavên wek “rojbaş, êvarbaş, şevbaş”<sup>162</sup> di kurdî de awayên nû ne û bi zelalî wergerên ji hin zimanên din, bi ihtimaleke mezin ji zimanên ewropî ne. Bo nimûne, heman tişt di çend zimanên ewropî de:

- inglîzî: good day, good evening, good night<sup>163</sup>
- fransî: bonjour, bonsoir, bonne nuit
- spanî: buenos días, buenas tardes, buenas noches

Di van zimanan de jî maneya van silavan “filan demê rojê baş” e. Tek cudahiyên wan li gel kurdî ew e ku ji ber peyvrêziya cuda ya van zimanan li gel kurdî, peyva “baş” di wan de li berî peyva “roj/êvar/şev” e û di spanî û fransî de rengdêra “baş” ya raveker jî li gor cinsê navdêra raveber “roj, êvar, şev” di wan zimanan de diguhere.

<sup>161</sup> Bêguman e ku “rojname” li ber modela farisî “rûzname, rûzname” hatiye çêkirin ji ber ku ya farisî ji berî ya kurdî hatiye bikaranîn. Herwiha wekheviya wan jî ne tesadîfî ye anku ne her yekê ji herdu zimanan bêyî haybûna ji zimanê din gihiştine vê netîceyê ji ber ku di zimanên din de hevwateriyên wê adeten ne ji van peyvan in, bo nimûne inglîzî “newspaper” (kaxeza nûçeyan).

<sup>162</sup> Hin caran jî ji hev cuda wek “roj baş, êvar baş, şev baş” tên nivîsîn.

<sup>163</sup> Ji van “good day” (rojbaş) di inglîzî de kêm tê bikaranîn, li cihê wê zêdetir danê sibê gotina “good morning” (spêdebaş, sibe bixêr) û danê êvarê jî gotina “good afternoon” (piştî nîvro baş) tên bikaranîn.

Niha, hin kes belkî bibêjin ku gotinên wek "rojbaş, êvarbaş, şevbaş" bi rastî "ne-kurdî" ne. Ew ê bibêjin ku mirov ji berê ve di kurdî de formên wek "roja/êvara te bixêr, şeva te xweş" yan formên nêzîkî wan bi kar bîne. Lê formên wiha jî ne "tenê" kurdî ne, bo nimûne gotinên ji heman peyvên bo nimûne di farisî û erebî de jî hene.

Li aliyekî din, di kurdî de gotinên rêzgirtin û ihtiramê yê wek "sax bî" bi merema spasîkirinê, "ser serê min" yan "ser çavan hatî" yê bi armanca bixêrhatinê yan jî "serê we sax be" bi armanca daxwaza xemrevandina kesûkarên miriyekî hene ku mirov nikare yekser li inglîzî wergerîne yan eger wergerîne jî, ti maneya bixêrhatinê yan serxweşiyê nadin. Anku ev biwêj wek xusûsiyetên zimanê kurdî dixuyin.

Lê eger em li zimanên cîran binêrin, em ê bibînin ku heman gotin yan jî hin gotinên pir nêzîkî wan di erebî, farisî û tirkî de jî hene. Bo nimûne, mirov dikare van gotinan hema-hema yekser li tirkî wek "sağ ol" (sax bî), "başım üstüne" (ser serê min), "gözüm üstüne" (ser çavê min), "başınız sağ olsun" (serê we sax be) wergerîne bêyî ku ti ji wateya gotinên kurdî winda bike. Mirov dikare kêm-zêde heman tiştan yekser li erebî û farisî jî wergerîne.

Ne tenê silav û rêzgirtin lê hejmareke gelek biwêjên din jî yê kurdî eger li zimanekî ewropî, bo nimûne, li inglîzî yekser werin wergerandin, dê bêmane bin lê piraniya heman biwêjan dikarin yekser yan teqrîben yekser li zimanên cîran bînin wergerandin. Bo nimûne, di kurdî de biwêja "ji destê min nayê" tê maneya "ez nikarim". Eger em wê yekser li inglîzî wek "it doesn't come from my hand" wergerînin, ti inglîzî dê wê bi maneya "ez nikarim" fehm nekin. Lê eger em wê yekser wek "elimden gelmez" li tirkî wergerînin, her tirkîzan jî dê wê bi merema "ez nikarim" tê bigihe.

Hêjayî gotinê ye ku ev hevpariya peyvên pêkhatî û biwêjan di navbera zimanên cîran de ne tenê taybetmendiyê zimanên Rojhilata Navîn e lê li her dera dinyayê diyardeyê berbelav e. Gava ku mirov li zimanên ewropî yê cîranên hev binêre, mirov dê bi hêsanî bibîne ku wergerandina biwêjên wan li hev pir hêsantir e ji wergerandina biwêjên wan bo nimûne li kurdî, tirkî yan erebî tam wek ku wergerandina biwêjên kurdî li tirkî yan tirkî li kurdî ji wergerandina wan li zimanên ewropî adeten hêsantir e û zêdetir dikare gelek caran bi wergerandina yekser jî were encamdan.

## ZIMANÊN JÊDER DI PEYVSAZIYA BI WERGERANDINÊ DE



## Dijwariya diyarkirina jêderên biwêjên kevnar

Di dîrokê de bi zerûrî hin zimanan ev gotin ji hev wergirtine anku ew di zimanekî ji wan de pêşî hatine çêkirin û paşî li zimanên din hatine wergerandin. Lê tam kîjan zimanî ev filan peyva pêkhatî yan bêvan biwêj ji yê din wergirtiye, êdî dikare zehmet be ku mirov bi esehî diyar bike. Heta eger mirov bikare peyda bike ka di kîjan zimanî de ev biwêj bi nivîskî kevntirîn e, dîsa jî mimkin e ku di zimanekî din de bi devkî kevntir be.

Lê texmînen heman zimanên ku pir peyv dane zimanên din, di heman demê de gelek biwêj jî dane wan. Loma mirov dikare wek prensîpeke giştî bibêje ku eger heman peyv di erebî, farisî, kurdî û tirkî de hebe, bi ihtimala ku zimanê jêder erebî be mezin e ji ber ku erebî zêdetir peyv dane farisî, kurdî û tirkî, ne kurdî, farisî yan tirkî peyv zêdetir dane erebî. Eger heman biwêj di farisî, kurdî û tirkî de hebe lê di erebî de tine be, hingê bi ihtimaleke mezin ew di farisî de hatiye çêkirin û paşî li tirkî û kurdî jî hatiye wergerandin ji ber ku farisî zêdetir peyv dane kurdî û tirkî, ne tirkî yan kurdî dane farisî.

Bo belavbûna peyvên pêkhatî yan biwêjan bi wergerandinê ji zimanekî bo nav zimanên din, bi awayekî giştî pêwîstî hem bi zimanekî xurt heye ku biwêjan çêke û hem jî bi zanîna vî zimanî ji aliyê qisekerên hin zimanên de hene daku van biwêjan bibin nav zimanê xwe yan jî li zimanê xwe wergerînin. Di dîrokê de gelek kurdan, farisan û tirkan erebî zaniye loma biwêjên bi eslê xwe erebî yan wergerandî yan jî wernegerandî ketine nav kurdî, farisî û tirkî. Lê bi rêjeyî di dîrokê de kêmtir ereban farisî, tirkî û bi taybetî jî kurdî zaniye loma ihtimala ku biwêjên van zimanan çûbin nav zimanê erebî kêmtir e.

Dîsa di dîrokê de gelek kurd û tirkan farisî zaniye loma gelek ihtimala ku biwêjên farisî ketibin tirkî û kurdî jî dîsa mezin e. Lê di tarîxê de bi rêjeyî kêmtir farisan tirkî zaniye û hê jî kêmtir kurdî zaniye loma ihtimala ku biwêjeke wek hev ji kurdî yan tirkî çûbe nav farisî kêmtir e ji wê ku ji farisî ketibe kurdî û tirkî.

Dîsa di dîrokê de û xaseten jî niha gelek kurdan tirkî zaniye loma ihtimala ku wan (belkî hin caran bi zanatî lê caran bêyî ku hay jê hebe) biwêjên tirkî bi rêya wergerandinê neqlî kurdî kirine. Li aliyekî

din, hejmara tirkên kurdîzan hem niha û hem jî berê pir kêr bû. Loma ihtimala ku biwêjên giştî yê tirkî wergerandinên ji kurdî bin pir biçûk e.<sup>164</sup>

Ev gotin tenê rêbaza ihtimaleke giştî dikan. Anku bi giştî di nav her çar zimanên mezin yê Rojhilata Navîn de jêdera biwêjan ya yekem erebî, jêdera duyem farisî, ya sêyem tirkî û ya çarem jî kurdî ye. Ev nayê wê maneyê ku jêdera yek yan hin biwêjan ne berevajî be anku bo nimûne erebî ew ji farisî wergirtin, farisî ji tirkî yan tirkî ji kurdî. Lê dîsa jî zehmet e mirov diyar bike ka kîjan biwêja kevnar li gor vê qeyda giştî ye û kîjan jî na.

### Jêderên peyv û biwêjên nû

Lê gelek peyv, fraz û biwêjên wisa jî hene ku mirov dikare bi esehî bibêje ka ji du zimanan kîjan ziman jêder û kîjan ziman jî wergir e. Li vê derê em ê çend nimûneyên ji kurmançî û tirkî bidin:

- **derbasbûyî be / geçmiş olsun:** Ev gotin niha di tirkî û kurmançî de li kar in, teqrîben teşe bi teşe wergerên hev in û mirov ji kesekî re dibêje ku nexweş e û dixwaze hêviya saxî û silametiye jê re bike. Bikaranîna vê gotinê di seranserê tirkî de li kar e lê di kurmançî de tenê li Bakurê Kurdistanê heye (ji bilî belkî di devê çend ne-bakurîyên ku ev gotin ji bakurîyan hîn bûbin de). Kurdên li deverên din û heta kurdên Bakur jî yê ji nifşê pîrtir ne gotina “derbasbûyî” be lê hin gotinên wek “silametî be”, “Xwedê şîfayê bide” bi heman meremê bi kar tînin. Şik û guman jê namîne ku “derbasbûyî be” biwêjsaziya bi wergerandinê ji “geçerli olsun” ya tirkî ye.
- **şehîd ketin / şehit düşmek:** di têkoşîna bo welatê xwe yan dîne xwe de hatin kuştin. Di tirkî de herdem wiha tê gotin û di kurmançiya Bakurê Kurdistanê de jî mirov adeten peyva “şehîd” li gel lêkera “ketin” dibihîze. Lê li parçeyên din yê Kurdistanê mirov hem di kurmançî de, hem di soranî de û hem jî di farisî de ne lêkera “ketin” (bi soranî “kewtin”, farisî “oftaden”) lê lêkera “bûn” (soranî “bûn”, farisî “bûden”) bi kar tîne anku dibêje “şehîd bûn”, ne “şehîd ketin”. Dîsa jî guman jê namîne ku “şehîd ketin” biwêjsaziya bi wergerandina “şehit düşmek” ya tirkî ye, ne ku ya tirkî ji kurdî hatiye wergerandin.

---

<sup>164</sup> Di vekolîneke taybet de me diyar kiriye ku herwiha hejmara peyvên ku tirkî ji kurdî wergirtin jî pir kêr e û piraniya mitelq ya peyvên îranî yê di tirkî de ne ji kurdî lê ji farisî hatine wergirtin:

<https://zimannas.wordpress.com/2015/11/29/gelo-tirki-peyv-ji-kurdi-wergirtine/>

- **gol avêtin / gol atmak:** di vê biwêja spor û werzişê de mirov di dev û nivîsên kurdên Bakur de li gel peyva “gol” lêkera sivik ya “avêtin” dibîne û dibihîze, bi heman awayî di tirkî de jî lêkera “atmak” (avêtin) li kar e. Lê li deverên din yê Kurdistanê mirov golan “na-avêje” lê “dike” anku biwêja “gol kirin” bi kar tîne.
- **wêne kişandin, kêşan / resim çekmek:** Dîsa li gel peyva “wêne, resim” lêkerên “kişandin, kêşan” û hevwateriya wan ya tirkî “çekmek” li Tirkîyê li kar in. Lê li deverên din yê Kurdistanê û di piraniya zimanên din yê dinyayê de jî mirov wêneyan “nakişîne”, mirov wêneyan “digire” anku gotinê bi awayê “wêne girtin” dibêje.

Ev tenê çend nimûne ne û tenê behsa peyvsazî û biwêjsaziya di kurmançî de li ber modela tirkî dikin. Bi heman awayî qalibên li gor erebî û farisî jî di kurdî de mişe û berbelav in.

Wek ku ji nimûneyên li beşên pêştir yê vê nivîsarê hatine dan diyar e, jêderên peyvsaziya (û biwêjsaziya) bi wergerandinê di kurdî de zimanên cîran erebî, farisî û tirkî ne. Jêder herwiha dikarin zimanên dûrtir bin, bo nimûne inglîzî û fransî jî bin – carinan yekser lê gelek caran jî dîsa bi rêya tirkî, erebî yan farisî. Herwiha jêdera peyvsaziya bi wergerandinê di kurdî de, xaseten di peyvên zanistî de (bo nimûne “derûnnasî, civaknasî, stêrnasî” û hwd.) de yûnaniya kevn yan latînî ne lê ew jî dîsa adeten ne yekser lê bi rêya zimanekî din yê ewropî yan jî bi rêya zimanekî cîran. Bo nimûne:

- latînî “socius” + yûnanî “-logîa” → fransî “sociologie” yan inglîzî “sociology” → farisî “camiêşinasî” yan tirkî “toplum bilimi” → kurmançî “civaknasî”, soranî “komelnasî”.

## GELO PEYSAZÎ BI WERGERANDINÊ BAŞ E YAN XIRAB E?

Guman jê nîne ku wergerandina berhemên edebî û zanistî roleke giring di pêşketin û pêşxistina zimanan de peyda dikin. Ti zimanê edebî yê pêşketî li vê dinyayê nîne ku bi rêya wergerandinê nehatibe xemilandin û werardan.

Li aliyekî din, gelek caran ji encama wergerandina ji zimanên din, hin tişt di zimanê wergir de bi awayên ecêb û heta eletewş jî tînin nivîsîn. Gelek caran rexneyên tûj û dijwar li nivîsîna yan axiftina li gor zimanên din di kurdî de tê kirin. Anku gazin tê kirin ku filan gotin li gor mentiq û qalibê erebî yan

tirkî yan zimanekî din e, bi peyvên xwe kurdî be jî, bi “ruhê” xwe ne kurdî ye, bo nimûne “derbasbûyî be” ya li jor behskirî.

Guman jê nîne ku niha jî û berê jî zimanan hem peyv û hem jî biwêj ji hev wergirtine yan wergerandine. Gelek caran heta petîperistên (xwerûperist, purîst, *purist*) zimanî jî wergerandina ji zimanên din ji wergirtina ji zimanên din baştir dibînin. Bo nimûne, gelek petîperist dê hevbîr bin ku bikaranîna peyvên “civaknasî, derûnnasî, derbasbûyî be” ji gotinên wergirtî “sosyolojî, psîkolojî, gêşmîş olsun” yên wergirtî çêtir in.

Jixwe di gelek haletan de ji bilî wergirtinê yan wergerandinê ti çareyeke din nîne jî eger em qet bi kurdî bixwazin ti nav ji van tiştan re hebin û kurdî jî zimanekî jîndar yê edeb û zanistê be. Bi gotineke din, peyvsaziya bi wergerandinê di xizmeta pêşxistin û peresandina zimanan de ne tenê bikêrhatî ne lê gelek caran yekser zerûrî ye jî.

Li aliyekî din, ew jî bêguman e ku wergerandina peyv û biwêjan ji zimanên din dikare ziyandar û zerermend jî be. Peyvsaziya bi wergirtinê ne herdem hingê tê bikaranîn gava ku di zimanê wergir de peyv bo hin tiştên nû tine ne yan biwêjên gunçayî bo hin rewşan peyda nabin. Gelek caran ji encama peyvsaziya bi wergirtinê, bêje û biwêjên wergerandî serî ji hev wateyên xwe yên xwemalî distînin. Bo nimûne, ji encama peyvsaziya bi wergerandinê, êdî li Bakurê Kurdistanê kêmkirî dinivîse gotinên xwemalî yên bo nimûne wek “şehîd bûn” yan “silametî be” bi kar tîne lê li cihê wan gotinên ji tirkî wergerandî yên wek “şehîd ketin” û “derbasbûyî” be cihê wan gotinên xwemalî digirin.

Mesele ne tenê hin bêje û biwêj in lê herwiha rêzimana zimanê jêder jî dikare tesîrê li zimanê wergir bike. Bo nimûne çemandina/tewardina li gor yekhejmarî yan pirhejmarî, li gor navdêr yan rengdêran tevlihev bibe.

Mirov dikare li vê derê çend mînakên bide. Gelek caran gotinên tirkî “Kürt sorunu” û “kadın devrimi” wek “pirsgirêka kurd” û “şoreşa jinê”<sup>165</sup> tînin wergerandin.

Lê eger mirov gotina “şoreşa jinê” dîsa li tirkî wergerîne, ew nabe “kadın devrimi” lê dibe “kadının devrimi” anku “şoreşa filan jinê, şoreşa wê jinê, şoreşa jinekê”. Di “kadın devrimi” de “kadın” di halê xwerû û neçemandî de ye lê di “şoreşa jinê” de “jin” di halê yekhejmar û çemandî de ye. Di “kadın

---

<sup>165</sup> Çend nimûne ji bikaranîna têgiha “şoreşa jinê”:

<https://www.google.fi/search?q=%C5%9Fore%C5%9Fa+jin%C3%AA&oq=%C5%9Fore%C5%9Fa+jin%C3%AA&aqs=chrome..69i57.638j0j4&sourceid=chrome&esqm=93&ie=UTF-8>

devrimi” ya tirkî de ne ji hatine hejmartin û ne jî hatiye diyarkirin ka kî jin beşdarî vê şoreşê ye. Anku ew bi her awayî giştî ye. Lê di “şoreşa jinê” de jinek bi tenê beşdar dibe!

Wisa Peyvsazên “şoreşa jinê” guh nedayiyê ku li cihê peyva neçemandî û bêhejmar ya tirkî divê di kurdî de li vê derê pirhejmariya çemandî “jinan” were bikaranîn anku gotin wek “şoreşa jinan” were gotin û nivîsîn daku şoreş tenê bi jinekê nemîne!

Gotina “pirsgirêka kurd” yan “pirsa kurd” jî hinekî lêzimî “şoreşa jinê” ye lê vê carê “kurd” qet nehate çemandin. Li vê derê jî ew yekser ji “Kürt sorunu” hatiye wergerandin û tê de “kurd” di kurdî de jî bêhejmar û neçemandî hatiye hiştin, tam wek “Kürt” di modela wê ya tirkî de.

Lê “pirsa kurd” yan “pirsgirêka kurd” wisa tê guhê mirovî heçku pirsê yan pirsgerêkek hebe û navê wê “kurd” be yan ew bi xwe kurd be, wek “Ehmedê kurd, Xezala kurd”. Lê meseleya “pirsa kurd” yan pirsgerêka kurd” ne ev e.

Pirsê yan pirsgerêkek heye ku ya hemû kurdan e loma mirov dikare jê re bibêje “pirsa/pirsgerêka kurdan”. Yan jî ew pirs û pirsgerêk girêdayî hemû kurdan yan kurdan eleqeya wê bi hemû kurdan ve heye loma mirov dikare bibêje “pirsa/pirsgerêka kurdî”. Lê dîsa jî ne “pirsa/pirsgerêka kurd”.

## DAWÎ

Peyvsaziya bi wergerandinê jî, wek peyvsaziya bi wergirtinê, yek ji giringtirîn awayên peyvsaziya kurdî û piraniya zimanên nivîskî ye. Peyvsaziya bi wergerandinê ne tenê bi zimanê nivîskî ve girêdayî ye lê bi pêşketina zimanê nivîskî re xurttir û berfirehtir dibe.

Peyvsaziya bi wergerandinê herdem beşek ji peyvsaziya zimanê kurdî bû û dê herdem wisa be jî. Ew dikare zimanê kurdî zengîn bike û bigihîne zimanên pêşketî yên cîhanê. Bêyî peyvsaziya bi wergerandinê ne mimkin e ku em behsa şaxên cuda-cuda yên zanist û kultûr û teknîkê bi kurdî bikin.

Lê di heman demê de, divê mirov di peyvsaziya bi wergerandinê de hişyar û bisexbêr be daku gotinên bêwate yan ne li gor qeyd û bendên zimanê kurdî li kurdî neke bela. Divê bêje û biwêjên bi peyvsaziyê çêkirî bi wateya xwe ron û zelal bin û kesên ku zimanê jêder nizane jî, ji wan gotinên kurdî fehm bike. Herwiha divê peyvsazî û biwêjsaziya bi wergerandinê hewl bide cihên vala di xezîneya peyvên kurdî de dagire (bo nimûne têrmên teknîkî, zanistî û edebî çêke), ne hin bêje û biwêjên bi wergerandinê saz kirî li cihê bêje û biwêjên kurdî yên heyî bisepine û ferz bike.

## PEYVSAZÎ BI WERGIRTINÊ<sup>166</sup>

Gava ku axiverên zimanekî tişteki nû yê li nav qisekerên zimanekî din heyî dibînin, ew dixwazin naveki ji tiştê nû re peyda bikin. Li vê derê mebesta me ji "tişt" berfireh e: ew "tişt" dikare tişteki konkret be, diyardeyek be, ramanek be, heywanek be, riwekek be û hwd.

Di binavkirina tiştê nû de çend rê û rêbaz li ber axiveran heye:

- ew dikarin navê wî tiştî ji zimanekî ku navê wî tiştî heye wergirin û bi kar bînin.

---

<sup>166</sup> Çavkaniya me ya zanistî *Loanwords in the World's Languages – A Comparative Handbook* (Peyvên wergirtî di zimanên dinyayê de: destnameyê berhevder) ya bi serperêştîya Martin Haspelmath û Uri Tadmor e: <http://www.degruyter.com/view/product/41172> Di vê kitêbê de behsa peyvên wergirtî di kurdî yan ti zimanekî din ê Rojhilata Navîn de nayê kirin lê dîsa jî awa û prensîpên wergirtinê bi nimûneyên bi dehan zimanên din baş tînan nasîna mirov dikare heman awa û prensîpan di kurdî û zimanên din ên Rojhilata Navîn de jî bibîne. Kevntirîn lêkolîna wergirtina peyvên di zimanê kurdî de ji sedsala 19an e: nivîsareke 10-rûpelî ya zimannasê alman a bi fransî *Note sur les mots étrangers en Kurde* (Têbînî li ser peyvên biyanî di kurdî de): <http://www.kurdipedia.org/?q=2014041615084775847&lng=21>. Berhemeke berfirehtir û nûtir (ji sala 1999) bawernameya doktorayê ya Cafer Hesênûr a bi inglîzî *A Study of European, Persian, and Arabic Loans in Standard Sorani* (Vekolînek li ser wergirtinên ewropî, farisî û erebî di soraniya standard de) ye: [https://www.academia.edu/6976730/A\\_Study\\_of\\_European\\_Persian\\_and\\_ArabicLoans\\_in\\_Standard\\_Sorani](https://www.academia.edu/6976730/A_Study_of_European_Persian_and_ArabicLoans_in_Standard_Sorani). Herwiha mirov nivîsareke Michael Chyet A Preliminary List of Aramaic Loanwords in Kurdish (Lîsteyeke destpêkî ya peyvên ji aramî wergirtî di kurdî de) bide. Chyet herwiha nivîsarek li ser rêzimana kurdî û aramî li hev jî nivîsiye: *Neo-Aramaic and Kurdish: an interdisciplinary consideration of their influence on each other* (Aramiya nû û kurdî: rengvedaneke pîrzanistî derbarê tesîrkirina wan li hev), kovara *Israel Oriental Studies* 15 (1995) rûpel 219-252. Herwiha dixwazim navê nivîsareke li ser lêanîna peyvên wergirtî di zazakî de ya bi inglîzî *Loan Adaptation in Zazaki* ya Mary Ann Walter bikim: <http://faculty.wcas.northwestern.edu/~maw962/docs/zazaki-mitwpl.pdf>. Herwiha çendîn ferhengên etîmolojî hene ku behsa jêderên peyvên kurdî dikin. Lê tevî van hemûyan jî, ez ne haydar im ku ti kurdî de ti lêkolîneke giştîgir (komprehensîv) li ser wergirtina peyvên ji zimanên din hatibe kirin. Her nivîseke behskirî beşekê vedikole. Ferhengên etîmolojî çavkaniyên peyvên kurdî didin lê ew tenê lîste ne, tê de behsa dîrok û rewş û sebebên wergirtinê bi zelalî nayê kirin. Herwiha kêma ji van berheman bi kurdî ne û bo xwandevanên kurdî berdest in. Ev vekolîna me hewl nade etîmolojîya her peyvê bide lê tê dikoşe ku awa û sebebên wergirtinê diyar bike û herwiha raxe ber çavan ku çawa peyvên wergirtî diguherin. Ji bilî peyvên, em ê hewl bidin herwiha pirtikên rêzimanî jî rave bikin. Di hin beşên din ên peyvsaziyê de em ê herwiha behsa peyvsaziya li ber modelên zimanên din (wergerandina yekser) û herwiha jî qala lihevanîna dengî-wateyî (*phono-semantic matching*) bikin.

- ew dikarin navê wî tiştî li zimanê xwe wergerînin
- ew dikarin navekî bi dilê xwe li wî tiştî bikin

Binavkirina tiştên di zimanên din de navheyî li gor dilê axiverên zimanê ku hê ti nav ji wî tiştî re nîne diyardeyeke nadir e anku kêman caran axiver navekî bi temamî bi dilê xwe li wî tiştî dikin. Herdu rê û rêbazên din gelek zêdetir li kar in: an navek yekser ji zimanekî din tê wergirtin an jî navê di zimanekî din de heyî li zimanê nû tê wergerandin.

Bo nimûne, Internet û malper du berî ku di nav kurdan de belav bibin û kurd navan ji wan re peyda bikin, ew di nav inglîzîzimanan de belav bûne û di vî zimanî de nav ji wan re hatine çêkirin. Inglîzîzimanan navên "Internet" (ji inter = navber û net = tor / torr) û "homepage" (ji home = mal û page = rûpel, rûper, per / perr) li van tiştan kir.

Gava ku ev tiştên têkilî hev di nav kurdan de jî belav bûn, hewcedariya kurdan jî bi navên wan hebû. Di nav kurdîzimanan de peyva "Internet" wek xwe belav bû anku kurdan ew ji zimanê inglîzî wergirt. Di piraniya zimanên din de jî qedera vê peyvê wek di kurdî de ye: ew yekser ji inglîzî hatiye *wergirtin* û wisa tê bikaranîn.<sup>167</sup>

Lê peyva têkilî Internetê anku "homepage" ya inglîzî ne di kurdî de û ne jî di piraniya zimanên din de yekser cih girtiye. Li cihê wergirtina yekser a vê peyvê, hem kurdî û hem jî gelek zimanên din ev peyv ji inglîzî li zimanê xwe wergerandiye. Di zimanê nivîskî yê kurmançî de beramberî "homepage" ya inglîzî niha bi piranî peyva "malper(r)" bi kar tê ku peyv bi peyv ji inglîzî hatiye *wergerandin*.<sup>168</sup>

**Wergirtin û wergerandin** zêdekirina peyvên zimanekî û berfirehkirina ferhenga wî de anku di peyvsaziya zimanî de roleke giring û bingehîn heye û di rastiyê de herdem hebûye. Di vê nivîsarê beşa li ser peyvsaziya kurdî em ê behsa wergirtinê anku neqilkirina peyvan ji zimanên din bo nav zimanê kurdî bikin. Peyvsazî bi wergerandinê anku çêkirina peyv û têrman di kurdî de li ber peyv û têrmên zimanên din dê mijara beşeke din a vekolîna me ya li ser peyvsaziyê be.

<sup>167</sup> Ji bilî awayê "Internet", herwiha ev peyv di kurdî de bi çendîn şeweyên din jî yê nivîsînê tê dîtin: "Înternet, Întêrnêt, Intêrnêt..." Hem di kurdî û hem jî di gelek zimanên din jî, ji bilî wergirtina peyva "Internet" ji inglîzî, herwiha çendîn hewlên wergerandina wê jî hatine dan. Di kurdî de bo nimûne peyvên "tor(r)" û "komtor(r)" hatine pêşniyazkirin û di hin nivîsan de hatine bikaranîn. Lê ne di kurdî de û ne jî di piraniya zimanên din de ti peyv dijberî peyva wergirtî "Internet" bi ser ketine.

<sup>168</sup> Di soranî de jî piştî çendîn ceribandinan (bo nimûne "wêbpeyc" ji inglîzî "webpage" yan "wêbsayt" ji inglîzî "website"), mal\_per\_ (ماليپر) vê dawiyê bûye peyva serekî ya bi vê maneyê. Tarîxiyên ew pêşî ji inglîzî li kurmançî hatiye wergerandin û paşî li ber modela kurmançî di soranî de jî hatiye çêkirin.

## Peyvnasiya mijarê

Di zimannasiyê de mebest ji **wergirtinê** yan *deynkirinê* (bi inglîzî *borrowing, loan*) neqilkirina hin tiştan ji zimanekî bo zimanekî din e. Bo nimûne, kurdî peyva "kitêb" ji erebî, "ode" ji tirkî û "kompûter" ji inglîzî wergirtine.

Di zimannasiyê de gelek caran li cihê peyva "wergirtin", gotina "deynkirin" tê bikaranîn. Lê em peyva "wergirtin" çêtir dibînin: "Deynkirin" tê maneya tiştê ku divê li xwediyê wê were vegerandin. Lê kurdî dê peyva "kitêb" li erebî, peyva "ode" li tirkî yan peyva "kompûter" li inglîzî venegerîne û ev ziman jî ji kurdî napên û daxwaz nakin ku kurdî van peyvan li wan vegerîne.

Loma em ê ji vê diyardeyê anku fenomenê re bibêjin "wergirtin" û tiştên wisa hatî jî bi **peyvên wergirtî** (*loanword*) bi nav bikin.

Di wergirtinê de bi kêmî du ziman hene:

- **zimanê wergir** (*recipient language*): zimanê ku peyva biyanî wergirtiye
- **zimanê jêder** (*donor language*): zimanê ku peyv jê hatiye wergirtin

Bo nimûne, di rewşa peyva "kitêb" de zimanê wergir kurdî ye û zimanê jêder jî erebî ye.

Ji bilî van, herwiha zimanê navber jî dikare di wergirtinê de hebe. Bo nimûne, peyvên "qanûn, qelem, xerîte, coxrafya" bi eslê xwe ji yûnanî ne.<sup>169</sup> Lê ew ne yekser ji yûnanî ketine kurdî lê bi rêya erebî hatine nav zimanê me. Loma di rewşa van peyvan de yûnanî zimanê jêder e, erebî **zimanê navber** e (*intermediate language*) û kurdî jî zimanê wergir e.

## Ma wergirtin jî peyvsazî ye?

---

<sup>169</sup> Li vê derê cih nîne ku em her peyva wek nimûne dayî bi kûrahî etîmolojiya wê diyar bikin. Etîmolojiya hemû nimûneyên kurdî dikare di Wîkîferhengê de hebe: <https://ku.wiktionary.org>. Etîmolojiya peyvên inglîzî dikare di gelek ferhengan werin dîtin, li ser Internetê bo nimûne: <http://etymonline.com/>. Etîmolojiya peyvên tirkî dikare bo mînak li vê derê bin: [www.nisanyansozluk.com](http://www.nisanyansozluk.com). Etîmolojiya peyvên farisî dikare bo nimûne li vê derê were dîtin: <http://www.parsi.wiki/>



Mebest ji peyvsaziyê çêkirina peyvên nû ji peyvên heyî ye. Loma eger mirov bi awayekî teng li meseleyê binêre, wergirtina peyvan ji zimanekî din ne peyvsazî ye ji ber ku mirov ti peyvan çênake.

Lê di zimannasiyê de wergirtina peyvan ji zimanekî din jî adeten wek yek ji awayên peyvsaziyê tê hesibandin. Sebebê vê ew e ku bi wergirtinê peyvên nû di zimanê wergir de peyda dibin. Bi awayekî berfireh, peyvsazî her şêweyê zêdekirina peyvên zimanekî ye loma wergirtina hin peyvên nû bo nav zimanekî bi heman awayî di wî zimanî de dibe peyvsazî. Loma li vê derê em jî wergirtinê wek beşeke ji peyvsaziyê dihejmêrin û behs dikin.

## **Peyvên wergirtî "kurdî" ne yan na?**

Gelek kurd hene ku di suhbet û nivîsên xwe de dibêjin ku peyvên – bo nimûne – wek *herf, edalet, behr, mekteb / medrese* "ne kurdî" ne ji ber ku ew bi eslê xwe ji erebî ne. Lê beramberên van peyvan di inglîzî de anku *letter, justice, maritime* (behrî), *school* jî hemû ji latînî ne lê ti inglîz idia nake ku ev peyv "ne inglîzî" ne. Li aliyekî din, gelek kurd dê idia bikin ku hevwaterên van peyvan di kurdî de anku *tîp / pît, dad, derya, dibistan / qutabxane* peyvên "kurdî" ne tevî ku di rastiyê de "tîp, pît" ji ji fransî ne, "dad, derya, dibistan" ji farisî ne û "qutab-" jî ji erebî ye.

Peyvên wergirtî û di kurdî de cihgirtî "kurdî" ne eger ew di kurdî de li kar bin û kurd wan di zimanê xwe de bi kar bînin tevî ku "eslê" wan peyvan ji zimanekî din be jî. Dema ku em behsa peyvên wergirtî yên di kurdî de dikin, mexseda me ew peyv in ku eslê wan ji zimanekî din e lê di axiftin û nivîsîna kurdî de tên bikaranîn.

Dema ku em bibêjin filan peyva wergirtî di kurdî de li kar e, mebesta me ne ew e ku ti hevwaterên wê yên din nînin. Bo nimûne, em behsa "otomobîl"ê ya ji zimanên ewropî wergirtî dikin tevî ku di kurdî de peyvên din jî hene: seyare (ji erebî), erebe (ji tirkî ji erebî ji îranî), maşîn (ji farisî ji rûsî ji fransî), tirimpêl (di kurdî de dengguherandina ji peyva "otomobîl")...

Helbet her kurd kurdî baş nizane. Piraniya kurdên xwande bi zimanekî din hîn bûne. Gelek kurd di jiyana xwe ya rojane de – ji neçarî yan ne – ji zimanê kurdî zêdetir zimanekî din bi kar tînin. Loma gava ku ew bi kurdî diaxivin jî, ew gelek peyvên biyanî dixin axiftina xwe. Bo nimûne, di kurdî de hejmara hene, lê gelek kurdên ji Bakurê Kurdistanê gava ku bi kurdî diaxivin jî, bo nimûne dibêjin "sala *iki bin onbeş*" anku "sala du hezar û pazdeh" (2015).

Gelo bi me ev jî peyvên wergirtî ne?

Diyardeyên wiha di zimannasiyê de bi navê **kodguhêzî** (*code-switching*) tên nasîn. Em ê paşî li ser vê meseleyê jî rawestîna lê li vê derê armanca me bi "wergirtin"ê ne ev e.

Mebesta me bi wergirtinê ew bêje û biwêj (*words and phrases*) in ku bi eslê xwe biyanî ne lê di zimanê me de cihê xwe girtiye, piraniya kurdan wan bi kar tînin an jî bi kêmi ji wan fehm dikin. Mirov dikare meseleyê hinekî sade bike û bibêje ku ew peyvên bi eslê xwe – bo nimûne – erebî ji aliyê zimanê kurdî ve hatine wergirtin, eger kurdên erebînezan jî wan fehm bikin û bi kar bînin. Loma em dikarin bibêjin ku peyvên wek "kitêb, ders, xêr" yê bi eslê xwe ji erebî, bê guman di kurdî de cihê xwe girtiye ji ber ku ev peyv bi berfirehî ji aliyê kurdên erebînezan ve jî tên fehmkirin û bikaranîn.

Gelek peyvên kurdî di axiftina gelek kurdên Bakur de hene, gelek peyvên farisî di axiftina kurdên Rojhilat de hene û pir peyvên erebî di axiftina kurdên Başûr û Rojava de jî hene. Gelo peyvên wisa ketine kurdî û mirov dikare ji wan re bibêje êdî ew kurdî ne?

Mirov dikare şertekî wisa deyne: eger peyva ji zimanê biyanî li beşên Kurdistanê yê derveyî deshîlata wî zimanê biyanî jî li kar bin, hingê wan peyvan bi rastî jî cihê xwe di zimanê kurdî de girtiye. Bo nimûne, peyvên wek "doşek, koçer, sax, top" bi eslê xwe ji tirkî ne lê ew ji aliyê piraniya kurdîaxivan ve (bi kêmi kurmançîaxivan ve) tên fehmkirin û bikaranîn loma em dikarin bê dudilî bibêjin ku wan peyvan êdî cihê xwe di zimanê me de girtiye û ew êdî "peyvên kurdî yê bi eslê xwe ji tirkî" ne.

Kurdên Bakur di zimanê xwe yê rojane de herwiha peyvên wek "oqul, oxrencî, ûçax" (xwandingeh, xwandekar, balafir / firoke) jî bi kar tînin. Gelo ev peyv jî êdî bûne "peyvên yê bi eslê xwe ji tirkî".

Nexêr, ew nebûne peyvên kurdî, wan cihê xwe di zimanê kurdî de negirtiye ji ber ku:

- Tenê kurdên tirkîzan wan fehm dikin û wan bi kar tînin. Kurdên ne ji Tirkiyê van peyvan fehm nakin û wan bi kar jî naînin.
- Heta kurdên ji Tirkiyê jî van peyvan di nivîsên xwe yê bi kurdî de bi kar naînin.

Bi heman awayî peyvên bi eslê xwe ji erebî, farisî, inglîzî û hwd. jî tenê hingê ketine kurdî û bûne "peyvên kurdî yê bi eslê xwe ji zimaneke din" gava ku:

- Kurdên ku zimanê jêder nizanin jî wan peyvan fehm dikin. Bo nimûne, kurdên inglîzînezan jî dizanin ka telefon an kompûter çi ye.
- Ew peyv di nivîsan de jî tên bikaranîn. Ne şert e ku ew tek peyva bi wê maneyê be. Bo nimûne, "kitêb" peyveke "kurdî y abi eslê xwe ji erebî" ye tevî ku di kurdî de "pirtûk, pertûk" jî wek hevwatera wê heye. Anku hebûna "pirtûk"ê peyva "kitêb" nake "ne-kurdî".

## Zimanên jêder û yên wergir

Têkiliya her zimanî bi hin zimanên din re heye, her ziman cîranê hin zimanên din e. Hin an hemû axiver her zimanî yek an çend zimanên din jî dizanin û pê diaxivin. Her zimanî hin peyv û gotin ji zimanên din wergirtine û dê her wergire jî. Ti ziman nînin ku peyvên bi eslê xwe "biyanî" tê de tine bin û ti ziman jî nînin ku ti peyvên wî neçûbin nav ti zimanên din.

Lê dîsa jî rewşa hemû zimanan ne wek hev e. Hin ziman xwedî kêr qisekeran in, hinan jî bi dehan an sedan milyon peyiver hene. Hin ziman hene ku niha yan jî demekê di dîroka xwe de zimanên civakên pêşketî û pêşrew in an pêşrew bûne. Di yek an çend warên teknîkî, kultûrî, dînî yan kar û sinetekê de li pêş cîranên xwe yan jî li pêşiya hemû dinyayê bûne.

Di zimanên wisa de bi sedan an hezaran peyv jî hatine çêkirin û paşî ew peyv li hemû dinyayê yan jî li deverê berfireh belav bûne û ketine gelek zimanan. Lê hin zimanên din ti caran di dîroka xwe de wisa ne pêşeng û pêşewa bûne loma hejmara peyvên ku ji van zimanan ketiye zimanên din pir bisinore.

Di nav zimanên dinyayê de mirov dikare bi qasî tiliyên yek yan du destan zimanan bide ku di dîroka xwe de tesîreke mezin li ser zimanên din kiriye û bi hezaran peyv dane zimanên din. Bo nimûne:

- yûnaniya kevn
- latînî
- erebî
- sanskrîtî
- çînî

Ji her yek ji van zimanan bi hezaran peyv ketine gelek zimanên din. Bo nimûne, hemû zimanên ewropî niha tijî peyvên ji yûnaniya kevn û latînî ne. Eger mirov peyvên ji yûnaniya kevn an ji latînî ji inglîzî biavêje û hewl bide bêyî wan peyvan zimanê inglîzî bi kar bîne, mirov dê wî zimanî bi temamî seqet bike û axiftina bi wî zimanî hema-hema êdî ji aliyê inglîzîzanan ve nayê fehmkirin.

Mirov dikare meseleya peyvên ji erebî yê di farisî, kurdî yan tirkî û çendîn zimanên din ên Rojhilata Navîn û zimanên din ên misilmanan jî wisa şirove bike. Ne tenê peyvên dînî yan îdarî (wek dewlet, hikûmet, welat) lê herwiha hejmareke ne kêma peyvên sade yê kurdî, farisî û tirkî jî ji erebî ne. Bifikire ku mirov peyvên wek "belê, dor, heta, mal, sibe" ji kurdî yan jî peyvên wek "adam, bina, hatta, hayî\_r, sabah" (mêr, avahî / xanî, heta, na / nexêr, sibe) ji tirkî biavêje?!

Tesîreke bi heman awayî kûr a sanskrîtî li ser zimanên Başûrê Asyayê û tesîreke çînî ya bi eynî şêweyî jî li ser zimanên Rojhilata Asyayê (bo nimûne japonî û koreyî) heye.

Hin zimanên din jî li devera xwe yan jî li demekî diyar tesîreke mezin li ser zimanên din hebûye û pir peyv dane zimanên din. Li serdema Vejînê anku Renesansê îtalî, paşî fransî û niha jî inglîzî gelek peyvan didin zimanên din. Lê îtalî û fransî ji xwe bermayî û paşhatiyên latînî ne anku peyvên ku ji wan zimanan belav dibin jî bi piranî reh û rîşên wan vedigerin latînî anku ji latînî ne. Inglîzî bi eslê xwe ne ji latînî yan yûnanî peyda bûye lê piraniya peyvên ku niha ji inglîzî li dinyayê belav dibin jî, di inglîzî de li ser bingehê peyvên ji latînî yan yûnaniya kevn hatine çêkirin. Bo nimûne: "telefon" ji "telephone" ya inglîzî hatiye hatiye lê "telephone" bi xwe di inglîzî de li du peyvên yûnaniya kevn "tele-" (dûr) û "phon-" (deng, axiftin) hatiye sazkirin.

Hin ziman jî di bêje û biwêjên warekî jiyane de xurt in û jêderên peyvên wî warî ne. Bo nimûne, hejmareke gelek mezin a peyvên dînî cihûtiyê, filetiyê û îslamê bi eslê xwe ji îbrî anku îbranî ne ku forma wî ya nûjen zimanê resmî yê Israîlê ye. Di heman demê de, hejmareke pir mezin a navên kesan jî ji wî zimanî hatine ji ber ku hem li Ewropayê û hem jî li Rojhilata Navîn, navên piraniya kesan bi eslê xwe navên dînî ne.<sup>170</sup>

Niha li Ewropayê ti "zimanpaqijkerek" cidî hewl nade ku zimanê xwe ji latînî yan yûnaniya kevn "paqij" bike. Di nav tirkan, farisan û kurdan de jî hin hewldanên wisa hebûne. Lê hê jî bi sedan peyvên pir sade jî di van zimanan de mane. Em ê di nivîseke din de bi dirêjahî behsa "petîperistiyê" (purîzmê, *purism*) bikin lê dixwazim li vê derê tenê wê bibêjim ku çawa zimanên ewropî nikarîne û

---

<sup>170</sup> Navnasî anku onosmatîk: <https://zimannas.wordpress.com/2015/12/12/navnasi-anku-onosmatik/>

ji niha ve jî dê nikaribin xwe ji latînî û yûnanî "bişon", wisa zimanên Rojhilata Navîn jî nikarin xwe erebî "pak" bikin. Ji xwe li Ewropayê ji mêj ve êdî ti hewleke wisa nayên dan, di farisî û tirkî de jî êdî dest ji hewldanên wiha hatiye berdan. Hêvîdar im ku kurd jî êdî xwe ji vê rêya şaş a "paqijkirina kurdî" berdin û qedir û qîmetî bidin zimanê xwe "wisa wek ku heye".

## Çi tê wergirtin?

Kesên ne-zimannas "wergirtin"ê wek wergirtina peyvekê yan hin peyvan ji zimanekî bo zimanekî din fehm dikin anku li gor têgihîştina wan wergirtin **peyvewergirtin** e. Bo nimûne, kurdî peyva "kitêb" ji erebî, "ode" ji tirkî û "kompûter" ji inglîzî wergirtiye.

Ev têgihîştina ne-pisporan ne şaş e. Di rastiyê de merema zimannasan jî bi wergirtinê bi piranî peyvewergirtin e. Lê wergirtin ji peyvewergirtinê berfirehtir e û bi kêmî van diyardeyên din jî dihewîne:

- **biwêjwergirtin**: Ziman ne tenê peyvan lê komikên peyvan jî werdigirin. Bo nimûne, gotinên *silameleykum*<sup>171</sup> ji erebî *es-selamu 'eleykum* (herfiyen: "silav li ser we" yan kurdîtir: "silav li we be"), *elhemdilla* ji erebî *el-hemdu lillahi* (hemd / pesn bo Xwedê), *bismila* ji erebî *b-ismi-llahi* (bi navê Xwedê), *fî sebîli-llah* (di rêya Xwedê de, bo xatirê Xwedê).
- **girewergirtin**: wergirtina pêşgir an paşgir. Bo nimûne, kurdî paşpirtika "-ewî, -awî" ji erebî wergirtiye û wê li gel hin peyvên kurdî bi kar tîne: *bêhnewî, xwînewî, jehrewî...*
- **dengwergirtin**: wergirtina hin dengan (foneman, herfan) ji zimanekî din. Bo nimûne, dengê "eyn" wek li destpêka navên "Elî, Emer, Arif" di piraniya zimanên hindûewropî de nîne. Bi ihtimaleke pir mezin kurdî ew ji zimanê erebî wergirtiye. Lê êdî ew di kurdî de ne tenê di peyvên erebî de tê bikaranîn lê derbazî hin peyvên bi eslê xwe ne-erebî jî bûye: *esman, ewr...*<sup>172</sup>
- **watewergirtin**: berfirehkirina maneya peyvên xwemalî ber modelên zimanekî din. Bo nimûne, di tirkî de ti peyveke xwerû ya tam bi maneya "kirîn" (kîrîn, bi inglîzî *to buy*) ya kurdî peyda nabe. Peyva li kar "almak" e ku maneya "kirîn"ê dide lê ew herwiha wateya "wergirtin, standin / stendin"ê (*to take, to hold, to seize*) dide. Di kurdî de "wergirtina /

<sup>171</sup> Ev gotin bi çendîn awayên ji hev cuda di devê kurdan de û di nivîsan de jî cih digirin: *selamueleykum, silameleykum, siramelêk...*

<sup>172</sup> Bo "eyn"ê binêrin: <https://zimannas.wordpress.com/2015/10/07/eyn-%D8%B9-di-kurdi-de/>

standina / stendina bi pare / pere” adeten bi peyva ”kirîn” tê ifadekirin. Lê di bin tesîra tirkî de, êdî gelek caran mirov li cihê ”kirîn”ê peyva ”standin / stendin” dibihîze û di nivîsan de dibîne.

Di hin nivîsên berê de min behsa hin ji van wergirtina kiriye (wegirtina dengên di nivîsarên xwe yên li ser dengnasiya kurdî de û wergirtina gireyan jî di nivîsara li ser peyvsaziya bi dariştinê de). Hin ji van wergirtinan jî (watewegirtin, biwêjwegirtin) dê paşî bîn behskirin.

Li vê derê em ê xwe tenê bi peywegirtinê ve sinordar bikin. Anku em ê tenê behsa peyvên wergirtî û çawaniya wan bikin.

Li aliyekî din, gelek caran wergirtina peyvan wek ”wegirtina navên tiştan” tê fehmkirin. Bo nimûne, gava ku tişteki nû tê çêkirin, hingê navê wî jî dikare pê re bê wergirtin. Bo nimûne: trê, faks, telefon, kompûter.

Ev ne texmîneke şaş e lê bisinor e. Bi rastî jî piraniya peyvên wergirtî navdêr (ism, noun) in lê birrên din jî yên peyvan tî wergirtin an dikarin bîn wergirtin.

Birrên peyvan di wergirtinê de wergirtinê:

- **navdêr:**
  - o **navên tiştên nû:** Internet, kompûter, telefon, televizyon...
  - o **navên tiştên biyanî<sup>173</sup>:** ananas, pirteqal, mûz, fîl, timsah, hût...
  - o **navên fikir û ramanên civakî:** dewlet, hikûmet, demokrasî, sosyalîzm...
- **rendgêr:** bo nimûne ”cahil, hêdî, miskîn” ji erebî, ”sax, genc” ji tirkî yan ”demokratîk, radîkal” ji zimanên ewropî
- **lêker:** bo nimûne ”sekinîn, şewitandin, helandin” ji erebî lê bi paşpirtikên kurdî-în yan –andin.
- **hoker û girêder:** bo nimûne ”belê, lê, ema, feqet” ji erebî yan ”tim” (herdem) ji tirkî
- **hejmar:** bo nimûne ”sifir” ji erebî, ”milyon, milyar, trilyon...” ji zimanên ewropî
- **daçek:** ”der” di hin gotinên wek ”derbarê, derhal, peyderdey...” de ji farisî

---

<sup>173</sup> Mebest ji ”tiştên biyanî” li vê derê bo nimûne ew heywan û nebat in ku ji dereke din tî an li devereke din hene, bo nimûne: ananas, pirteqal, mûz yan hût, timsah, jagwar û hwd. hemû di kurdî de peyvên wergirtî ji ber ku ew li Kurdistanê peyda nabin an berhemên ji derve hatî ne.

- **cînav:** “qet” ji erebî yan “hiç” (hîç, qet) ya tirkî ji zimanên îranî

## Awayên wergirtinan

Wergirtin dikarin li gor çawaniyên xwe wiha bîn rêzkerin:

- **wergirtinên kultûrî** (*cultural borrowing*): wergirtina peyvên bi wergirtina tiştên ji qisekerên zimanê werger re nû ne.
- **wergirtinên navxweyî** (*internal borrowing*): wergirtin ji zarava yan devokeke heman zimanî.
- **wergirtinên bingehîn** (*core borrowing*): wergirtina peyvên wisa ku hevwateriyên wan ji xwe di zimanê wergir de hene.
- **wergirtinên serpeyî** (*nonce borrowing*): bikaranîna peyvên biyanî yê ku di zimanê wergir de hê cihê xwe negirtine.
- **vewergirtin** (*reborrowing*): wergirtina peyvekê ku bi eslê xwe ji zimanê wergir e lê çûye zimanekî din û zimanê wergir dîsa wê peyvê werdigire (adeten bi şiklê hinekî guherandî).

## Wergirtinên kultûrî

Mebest ji wergirtinên kultûrî (*cultural borrowings*) wergirtina navên hin tiştan li gel wan tiştan e. Bo nimûne, gava ku radyo û televizyon li Kurdistanê belav bûne, navên wan ên biyanî jî li gel wan di zimanê kurdî de di nav kurdan de belav bûne.

Mebest ji “kultûrî” di gotina “wergirtinên kultûrî” de divê bi berfirehî were fehmkirin û bi kêmî van biwaran dihindirîne anku dihewîne:

- irf û edet
- huner û edebiyat
- cil û libas
- dîn û diyanet

- kar û jiyar (meîşet)
- xwarin û vexwarin
- cejn û pîrozî
- teknîk û zanist
- avaniya (struktura) civakî, hikûmet û birêveberî
- heywandarî û bikaranîna riwek û nebatan
- sîstema hînkirin û fêrbûnê
- xwarin û vexwarin
- mal û bicihbûn
- dinya û derdor

Armanca me ne ew e ku em lîsteyeke temam pêşkêş bikin lê tenê diyar bikin ku divê peyva "kultûrî" li vê derê teng neyê fehmkirin. Em ê li vê derê çend peyvan ji her yekê ji van tiştan bidin û diyar bikin ku bo nimûne kurdî çî wergirtinên kultûrî di van beşan de encam dane anku çî peyvên kultûrî wergirtine.

Bo ku em isbat kirin ku wergirtina peyvan di zimanan de diyardeyeke siriştî û tebîî ye, em ê li gel wergirtinên kurdî, behsa wergirtinan di heman waran de di hin zimanên din de jî bikin. Ji bilî kurdî, em ê bi berfirehî nimûneyan ji inglîzî û tirkî bidin.

Kurdî, tirkî û inglîzî bi çendîn awayan ji hev cuda ne:

- Kurdî zimanek e ku li çendîn dewletan tê axiftin lê li ti ji wan ne zimanê serdest e û tenê li Iraqê (Başûrê Kurdistanê) statuyeke resmî heye. Çendîn dezgehên zimanî hebin jî, ti ji wan ew qudret û şiyar nîne ku bikaranîna kurdî kontrol bike û biryarên mitleq li ser çawaniya bikaranîna kurdî bide. Kurdî bi çendîn zaravayên cuda û bi kêmî bi du alfabeyên cuda tê nivîsîn.
- Tirkiya standard ("stembolî") zimanê resmî yê dewleteke neteweyî ye, zimanê serekî û serdest ê Tirkiyê ye. Wek prensîp, tenê formeke tirkî ya standard heye û çawaniya bikaranîna wî wek prensîp ji aliyê dezgeheke zimannasî ya imtiyazî ve tê diyarkirin.
- Inglîzî zimanekî navneteweyî ye ku li zêdeyî 20 dewletan zimanê resmî yan jî zimanê serdest e. Wek prensîp inglîziya hemû deverên dinyayê eynî ziman e û ji inglîzîzanên hemû derê re fehmbare lê dîsa jî çendîn awayên cuda yê axiftin û nivîsîna inglîzî hene ku her yek jê li dereke dinyayê standard de (bo nimûne, peyvên bi maneya "reng, seferkirin,



berevanî/parastin” li Amerîkayê wek *color, traveling, defense* tên nivîsîn lê li Brîtanyayê awayê rast ê nivîsîna wan wiha ye: *colour, travelling, defence*). Bi sedan an bi hezaran dezgeh û zanîngehên li ser zimanê inglîzî dixebitin hene lê dîsa jî ti ji wan nikarin biryarên xwe li ser hemû bikaranîna inglîzî ferz bikin.

Li gel van cudahiyên mezin di navbera van her sê zimanan de jî, dîsa jî ti ji her sê zimanan ne bi-xwe-têr in. Wan her sêyan jî gelek peyv ji zimanên din wergirtine û niha jî hê jî bi berdewamî peyvan ji zimanên din werdigirin.

Gelek kurd ji hebûna peyvên bi eslê xwe biyanî di zimanê kurdî de ”şerm” dikin. Hin kes heta dixwazin kurdî ji peyvên biyanî ”paqij” jî bikin. Li vê derê, bi pêşkêşkirina hin nimûneyan ji peyvên biyanî di inglîzî û tirkî de jî, em dixwazin diyar bikin ku peyvên bi eslê xwe biyanî di her zimanî de hene û eger wan cihê xwe di zimanî de girtibe îu xelk wan bi kar bîne, hingê avêtina wan ji zimanî ne tenê ne hewce ye lê dikare ziyaneke mezin bigihîne zimanî jî.

### **Irf û edet**

Gelek caran tê gotin ku filan tişt li ba kurdan ”edet” e yan edetên kurdan an mîletekî din wiha ne yan ne wisa ne.

Di rastiye de kê m ji irf û edetan tenê aidî gel û mîletekî ne. Piraniya wan ti sinorên mîletan an welatan nas nakin. Piraniya edetên ku di nav kurdan de tên peyrewkirin, di nav mîletên din jî yê Rojhilata Navîn de û heta yê dûrtir jî hene.

Bo nimûne, di nav kurdan de zewac heye ku hema-hema di nav her mîletî heye. Piraniya welatên Rojhilata Navîn kê m-zêde bi heman awayî li meseleyê dinêrin û heta gelek ji wan wê diyardeyê bi heman navî dinasin ku ”zewac” e. Ev peyv ji erebî ketiye kurdî, farisî û tirkî lê eslê wê ne erebî ye jî. Ew bi rêya aramî ji yûnanî ketiye erebî. Maneya eslê peyvê ”cot” e anku jin û mêr.

Zewac bi merasimekê tê kirin û navê wê di kurdî û zimanên din ên Rojhilatî Navîn ”mehr” an mehrkirin e. Zewac dikare bi şahiyekê bê pîrozkirin ku di kurdî de bi piranî navê ”dawet” an ”de’wet, dehwet” lê tê kirin. Ev peyv bi eslê xwe ji erebî ”de’we” anku ”gazîkirin, vexwandin, mazûmkirin” e.

Eger di zewacê de zarokên nêr anku kur peyda bibin, hingê di nav misilman û cihûyan de ew tên "sinet" kirin (sunetkirin). Ev jî peyveke wergirtî ye, ji erebî ketiye kurdî, tirkî û hin zimanên din.

Zewac herdem bi xêr û xweşî nadome. Gava ku ew tê bidawîanîn, adeten kurd, ereb û gelek milletên din jî peyva "telaq" bi kar tînin. Ew jî peyveke wergirtî ye, ji erebî ketiye kurdî û gelek zimanên din.

Tê zanîn ku mal, malbat û xizm û meriv di civaka kurdî de giring in. Lê dîsa jî ji ber têkiliyê xurt û kûr, çendîn peyvên esil-erebî yê binavkirina kesûkaran ketine kurdî, farisî û tirkî jî. Bi kêmî ev peyv: mal, xal, xalet / xaltî, met, mam, afret, mindal, bi farisî ji bilî van herwiha 'emo- (mam, ap), tirkî "akraba" (xizm, mirovên kesekî)... Li aliyekî din tirkî peyva "kadın" (jin) ji îranî "xatûn" wergirtiye û farisî jî "daî" (xal) ji tirkî "dayı" wergirtiye. Herwiha tirkî jî peyva "hala" ya hevrehê "xalet" ji erebî wergirtiye lê maneya wê guherandiye û kiriye "met".

Inglîzî jî çendîn peyvên irf û edetên malbatî ji zimanên din, xaseten ji fransî wergirtine: family (malbat), parents (dêbab), ancestor (babûkal), aunt (xalet, met), uncle (mam, xal), madam (xanim), fiancée (bûk, dezgir), cousin (kuzen, zarokên mam, met, xal an xaletan), nephew (biraza, nêr), niece (biraza, mê) û bi dehan peyvên din. Herwiha marriage (zewac), divorce (telaq, cudabûn), heritage / inheritance (mîras) jî hin peyvên din ên têkilî jiyana malbatî ne ku di inglîzî de peyvên wergirtî ne, bi taybetî ji fransî hatine.

Herwiha tê gotin ku şeref, namûs, ihtiram, hurmet, marîfet û hwd. di filan civakê de giring in. Lê ev gotin jî ne tenê aidî miletekî ne. Kurdî ev peyv ji erebî wergirtine lê heman peyv ketine farisî, tirkî, urdûyî û di pratîkê de hemû zimanên misilmanan û hin zimanên derveyî wan jî. Çendî were gotin ku namûs li Rojhilatê heye û li Rojavayê (Ewropayê) peyda nabe jî, dîsa jî peyva "namûs" bi eslê xwe ji yûnaniya kevn ketiye zimanên Rojhilatê.

Hevwateya namûs û şerefê di piraniya zimanên ewropî de ne ji yûnanî lê ji latînî "honor" e. Bi inglîzî "honor, honour", bi fransî "honneur" ku jê wek "onur" ketiye tirkî û heta derbazî nav hin nivîsên kurdî jî bûye.

Helbet peyvên irf û edet bi xwe jî wergirtî ne, herdu ji erebî. Heman peyv ketine zimanên din jî yê misilmanan. Li hevberî wan di inglîzî de "habit" û "custom" hene ku ew jî herdu peyvên wergirtî ne, bi rêya fransî ji latînî.

## Huner û edebiyat

Gava ku em bèn peyva "kultûr" bi maneya "kultûra bilind" anku huner (senet) û edebiyatê (wêje), hin kes dê li "muzîka kurdî, stranên kurdî, berhemên bi zimanê kurdî" bifikirin û wan wek tiştêkî taybet û xusûsî yê kurdan bibînin. Rast e ku zimanê wan kurdî ye, mijarên wan têkilî jiyana kurdan in. Lê dîsa jî temayên wan cîhanî û gerdûnî ne: di nav her milletî de eşq û evîn, şahî û şînî, dostatî û dijminahî heye û mijarên huner û edebiyatê ne.

Ji aliyê şikil û amûrên xwe ve jî huner û edebiyat berhemên hemû dinyayê ne. Di piraniya zimanan de mirov li muzîkê guhdarî dike û navê wê jî her muzîk e (ev peyv bi eslê xwe ji yûnanî). Berhemên edebî (ev peyv ji erebî ye) dikarin bo nimûne "şiiir" (ji erebî), roman (bi rêya fransî ji latînî) yan novel (dîsa bi rêya fransî ji latînî) bin. Li gor awayê behskirinê ew dikarin komedî, drama yan trajedî bin (her sê peyv ji yûnanî ne). Ew dikarin wek şano (ji yûnanî) li tiyatroyan (ji yûnanî) bèn pêşkêşkirin an jî bibin film (ji inglîzî) û li sînemayan (bi rêya fransî ji yûnanî) an jî li ser televizyonan (tele- ji yûnanî, visio ji latînî) bèn temaşekirin an seyrkirin (temaşê û herdu ji erebî).

Berê mirovî berhemên edebî ji kitêban (ji erebî) dixwandin û berhemên hunerî jî li ser tabloyan (bi rêya fransî ji latînî) temaşê dikirin. Niha alet û hacetên zewqwergerîna ji wan piralî bûne: dikarin li ser radyoyê yan kompûtera xwe (herdu bi rêya inglîzî ji latînî) yan heta bi telefona (bi rêya inglîzî ji yûnanî) bèn dîtin an guhdarîkirin.

Hin zimanan çend peyvên taybet ji van berheman re çêkiribin jî (bo nimûne tirkî "bilgisayar = kompûter"), dîsa di wan zimanan de jî piraniya van peyvan her bi van navên navneteweyî tên nasîn. Hin zimanan çendîn hewl daye ku hin peyvên xwemalî ji wan çêkin jî (bo nimûne farisî "rayanê" û erebî "ḥasib" û "ḥasûb", hemû bi maneya "kompûter") lê dîsa jî xelk peyva navneteweyî bi kar tînin.

## Teknîk û zanist

Di beşa "huner û edebiyat" de me behsa çend amûr û alavên teknîkî kir ku mirov pê zewqê ji van berheman werdigire. Piraniya amûr û alavên nû yên bikêrhatî li piraniya dinyayê belav dibin. Berê carinan sed sal an hezar sal dem vedikêşa heta ku ew berhem ji deverêkê digihiştin deverên din, heta berî nîv sedsalê jî ghiştina berhemên teknîkî hêdîka çêdibû. Lê niha ku tiştêkî hêja yê teknîkî were îcadkirin, ew di salekê yan mehekê de dikare li hemû dinyayê belav bibe.

Ne tenê amûr lê navên wan jî bi leza bayî belav dibin. Li gel telefon, kompûter, radyo, televizyon ên li jor behskirî, herwiha elektrîk (ji yûnanî), faks (ji latînî), kamera (ji yûnanî), otomobîl<sup>174</sup> (oto- ji yûnanî, mobîl ji latînî) otobûs (yûnanî-latînî) û bi sedan amûrên din ên nû xwedî navên navneteweyî ne.

Taybetiyeke giştî ya peyvên teknîkî ew e ku ew vê dawiyê bi piranî di inglîzî, fransî yan zimanekî din ê ewropî de hatine çêkirin lê ew li ser bingehê hin peyvên yûnaniya kevn an latînî (kêm caran li ser bingehê peyvên ji hin zimanên din) hatine avakirin. Hin caran peyv ji du beşan pêk tê ku yek ji zimanekî ye, yê din ji zimanekî din. Bo nimûne, televizyon ji tele- ya ji yûnanî û -vizyon a ji latînî pêk hatiye. Hêjayî gotinê ye ku gava em dibêjin kamera ji yûnanî ye yan faks ji latînî ye, mebest ne ew e ku ev peyv di latînî yan yûnaniya kevn de bi heman maneya em niha bi kar tînin de dihatin xebitandin. Na, kamera yan faksên niha li Serdema Antîk nedihatî nasîn lê eslê van peyvên ji wan zimanan e.

Herdem hemû peyvên teknolojîk ne di her zimanî de li kar in. Di zimanên Rojhilata Navîn de jî çend navên xwemalî bo çend berhemên teknîkî yê nû hatine çêkirin. Otomobîl di erebî de bi navê "seyyare" tê nasîn ku wek "seyare, siyare" ketiye kurdî jî (xaseten li Iraq û Sûriyê). Ew ji rehê erebî s-y-r- (livîn) hatiye çêkirin. Di tirkî de otomobîl bi navê "araba" tê nasîn ku wek "erebe" di kurdî de jî belav bûye (bi taybetî li Tirkiyê). Eslê peyvê bi rêya erebî ji zimanên îranî ye. Berê "erebe, araba" ne bi maneya "otomobîl" lê bi wateya erebeyên dût heywanan bû lê zimanê tirkî (û di kurdî de jî li deverên li ber tesîra tirkî) maneya vê peyvên berfireh kiriye yan raguhastiye û daye tiştêkî nû.

Hewateya erebeyê di inglîzî de niha "car" e ku bi eslê xwe kurtkirina "automobile car" anku "erebeya otomobîl" e. Di farisî de heman tişt niha bi navê "maşîn" tê nasîn ku kurtkirina "avtomaşîn" ya rûsî ye ku hevrehê "oto-" û "makîne" ye. Di farisî de herwiha peyva "xodro" (bi-xwe-liv) jî hatiye çêkirin lê xelk wê bi kar naîne.

Piraniya zimanan navgîna li ser rêyên asinî / hesinî dimeşe bi navê "trên" dinasin ku bi rêya inglîzî "train" ji fransî "train" (rêk, rêçik, xetik) ji latînî tractus (kişandî, xîçandî) ye. Lê erebî navê "qîţar" lê kiriye û ev peyv derbazî farisî û kurdî jî (bi kêmî li Iraq, Îran û Sûriyeyê) bûye. Ew jî bi eslê xwe maneya "sira, rêz, tiştên li dût hev" tê hem di inglîzî de û hem jî di erebî de peyva kevn maneyeke

---

<sup>174</sup> Tirimpêl, turumbêl, tombêl jî bi eslê xwe formên "xirabkirî" yê ji peyva "otomobîl" in.

nû wergirtiye. Di kurdî de carinan navê "şemendefer" yê qaşo kurdî li vê navgînê tê kirin lê di rastiyê de ev peyv ji fransî "chemin de fer" (rêya asinî/hesinî) ye.

Erebeyên ku mirov dikare pê bigere û tê de binive / raze / rakeve di piraniya zimanan de bi navê "karavan" tên nasîn (di gelek zimanan de wek "van" kurtkirî jî li kar e). Ev nav di inglîzî de li van tirimpêlan hatiye kirin lê eslê peyvê ji Rojhilata Navîn ji peyva "karwan, kerwan" e ku ne tenê di kurdî de lê di zimanên din de jî li kar e: farisî karvan, tirkî kervan, ermenî karawan, erebî qeyrewan...

Navgîneke (amrazeke) din a nûjen a ku li Rojhilata Navîn bi navên xwemalî tê nasîn navgîna firînê ye ku di kurdiya nivîskî de niha navên wek "firoke, balafir" lê tên kirin. Di axiftina xelkê de bi kêmî li Başûr û Rojava ew bi navê "teyare" tê nasîn ku "taire" ya erebî ye ku ketiye gelek zimanên din jî yê Rojhilata Navîn û Navenda Asyayê. Ew ji rehê erebî t-y-r- (firîn) e. Di tirkîya osmanî de jî berê ev peyv bi navê "tayyare" dihat nasîn lê tirkîya niha derbazî bikaranîna peyva "uçak" (ji uç-mak = firîn) bûye ku wek "uçax" ketiye nav axiftina kurdên Bakur jî. Farisî jî ji "teyyarê" ya berê derbazî bikaranîna peyva "hevapeyma" ("hewapîv") bûye.

Ne tenê amûrên teknîkî lê herwiha beş û şaxên zanistî jî bi piranî bi navên xwe yê navneteweyî tên nasîn ku axlebe di inglîzî, fransî yan almanî de li ser peyvên yûnanî yan latînî (kêman jî li ser bingehê hin zimanên din) hatine avakirin: arkeolojî, biyolojî, cografya, fîlosofî, matematîk û bi sedan peyvên din jî.

Gelo çima em hin ji van makîneyên nû bi navên navneteweyî dinasin û li hinan jî navên xwemalî bar dikin? Çima kurd, ereb, farisî û tirkî radyo û televizyonê wek hev bi nav dikin lê her yek navekî yan çend navên cuda li firoke û balafiran dikin?

Hejmara navên amûrên teknîkî yê ku bi navên neteweyî (ne navneteweyî) tên nasîn bisinor in. Sebebê binavkirina bi navên neteweyî dikare kêman-zêde tesadîfî be. Lê gava ku zimanên serekî yê ewropî heman navî li tiştê bikin, bi ihtimaleke pir mezin zimanên din jî dê heman navî bi kar bînin. Bo nimûne, sebebê bikaranîna navên neteweyî di binavkirina "firoke, balafir" an de ew e ku di zimanên ewropî de jî navên neteweyî yê xweser ji vê navgînê re hene: inglîzî "airplane", fransî "avion", almanî "Flugzeug", rûsî "smolyot" û hwd.

## Cil û libas

Gelek caran tê gotin k uhin millet bi cil û libasên xwe tên nasîn. Ev rast e lê tenê bi awayekî berteng: cilûbergên cejn û şahiyên ên millet û deverên ji hev cuda dikarin ji hev cuda bin. Lê di jiyana rojane de niha piraniya cilan li seranserî dinyayê wek hev in. Eger li her derê ne wek hev bin jî (bo nimûne li hin deveran jin serê xwe diniximînin an dipoşin lê li hinan na), dîsa jî kêma caran cil û şiklên wan li sinorê welatekî disekin.

Hin ji navên cilan bi zelalî tê dîtin ku ji zimanên ewropî ketine kurdî, tirkî, farisî û gelek zimanên din jî yê dinyayê, bo nimûne: çakêt, pantolon, palto. Lê di rastiyê de bo nimûne ev peyvên ji mêj ve di kurdî de cih girtî jî bi eslê xwe ji zimanên ewropî (hin caran bi rêya erebî û carinan jî bi rêya rûsî) hatine nav kurdî: saqo, qapût, qemîs, sol, şekal (kurmançî) / kilaş, sapok. Heta kiras û fîstan jî ji zimanên ewropî hatine. Gumlek, cezme / cîzme û kepen ji tirkî ne. Joravên "cil, libas" bi xwe ji erebî ne.

Li gor vekolînên navneteweyî<sup>175</sup>, navên cil û libasan yek ji biwarên herî zêde ye ku peyvên biyanî pir wergirtine ji ber ku stîla cil û libasan li seranserî dinyayê dikeve ber heman pêl û sîpelan. Tê gotin ku berî sed-dused salan li deverên cuda yê dinyayê xelkê cilên ji hev cuda li xwe dikirin lê niha yekbûneke pir xurt peyda bûye.

## Dîn û diyanet

Herdu dînen serekî yê hemû dinyayê filetî (mesîhîti, îsawîti) û îslam in ku herdu jî li Rojhilata Navîn, di nav gelên samîaxiv (aramî û erebî) de peyda bûne. Van dînan hem gelek bawerî û raman û hem jî gelek kirdar û pratîk bi xwe re belav kirine.

Li gel wan bawerî û pratîkan, herwiha navên wan jî li dinyayê belav bûne. Ev rewş tê zanîn û em ê jî bi kurtî behsa wê bikin. Lê em ê herwiha diyardeyeke kêmbeskirî jî berçav bikin: çawa gelek ji bawerî û pratîkên îslamî ne bi peyvên ji erebî lê bi peyvên îranî hatine binavkirin.

Loma kurdan, farisan, tirkan û bi dehan milletên din ên misilman peyvên wek "helal, heram, şehde, zekat, xêr, sedeqe, mela, cehnem, feqe, medrese" û bi dehan peyvên din ên têkilî îslamê jî ji erebî wergirtine.

---

<sup>175</sup> Binêrin: *Loanwords in the World's Languages A Comparative Handbook* (Peyvên wergirtî di zimanên dinyayê de: destnameyeke berhevder) ya bi serperêştîya Martin Haspelmath û Uri Tadmor e: <http://www.degruyter.com/view/product/41172>

Lê ji ber ku îslam bi xwe jî li ser bingehê dînên berî xwe (filetî û cihûtiyê) peyda bûye, gelek ji peyvên dînî ne di erebî de hatine çêkirin lê ew pêşî ji aramî yan îbrî anku bi rêya filetiyê yan cihûtiyê ketine erebî û paşî jî bi rêya îslamê belav bûne nav miletên misilman ên ne-ereb wek kurd, tirk û farisan. Hin ji peyvên wisa ev in: amîn, decal, fitre, reb, şeytan, erş û bi dehan peyvên din jî.

Bi îslamê re zimanê erebî ne tenê peyv lê herwiha navên kesan jî dane miletên din ên misilman. Niha hin hewlên binavkirina zarokan bi navên xwemalî yan "neteweyî" (wek "navên kurdî") hebin jî, piraniya misilmanên hemû deverên dinyayê bi navên pêxemberan an kesên din ên di îslamê de pîroz hatine binavkirin: Mihemed, Elî, Hesên, Hisên, Ebdulla, Ehmed, Îbrahîm, Îsa, Îsmail, Mûsa, Yehya... yan navên jinan: Amîna, Fatma, Hacer, Eyşa, Zeyneb... Gava ku mirov li ferheng û lîsteyên navên kurdî dinêre, adeten mirov van navan di wan de nabîne tevî ku piraniya kurdan bi van navan tîrên nasîn. Lê ew hin navên "resen" (eslî) yê kurdî didin ku di rastiyê de hejmareke mezin ji wan formên kurtkirî ji navên erebî ne. Bo nimûne: Mem (ji Mihemed), Zîn (Zeyneb), Reşo (Reşîd)...<sup>176</sup>

Lê dîsa jî gelek ji tiştên bingehîn yê îslamê di kurdî û farisî de ne bi erebî lê bi peyvên îranî tîrên nasîn. "Xwedê, pêxember, nivêj/nimêj, rojî, guneh" hin têgeh û konseptên bingehîn yê îslamê ne lê dîsa jî ev peyv ne ji erebî hatine lê di zimanên îranî bi xwe de hatine çêkirin yan jî berî îslamê hebûn. Ev peyv hemû bi eslê xwe îranî ne û di kurdî û farisî de ev peyvên serekî ne, ne hevwateryên wan yê ji erebî "Ellah, resûl/nebî, selat, sewm, xetî" ku ji hevwateryên îranî kêmtir tîrên bikaranîn (bo nimûn "Ellah, resûl/nebî") yan jî hema qet di kurdî de nayên bikaranîn (wek mînak "sewm, xetî").

Ev peyvên îranî ne tenê di zimanên îranî de mane lê bi îslamê re derbazî gelek zimanên din jî bûne. Bo nimûne, hin ji van peyvên ketine tirkî, urdûyî, albanî, indonezî û gelek zimanên din jî yê ne-îranî lê yê ku qisekerên wan bûne misilman. Bo nimûne, hin ji van peyvên wiha di tirkî de cih girtiye: namaz (nimêj, nivêj), günah (guneh), peygamber (pêxember), oruç (rojî).

## **Kar û jiyar**

Karkirin û awayên peydakirina debara jiyane anku "jiyar" (meîşet, bi R, ne bi N anku "jiyar", ne "jiyan") li hin deveran ji deverên din cuda bin jî, awayên baş yê peydakirina debara jiyane zû li

---

<sup>176</sup> Bo vekolîneke li ser navên taybet di kurdî de binêrin: <https://zimannas.wordpress.com/2015/12/12/navnasi-anku-onosmatik/>

dinyayê belav dibin û dibin navneteweyî. Ji ber hindê, herwiha navên karan û pîşeyan (meslekan, mihneyan) jî zû ji zimanekî derbazî zimanên din dibin.

Loma hejmareke pir mezin ya navên pîşeyan jî di kurdî û piraniya zimanên din de jî peyvên wergirtî ne. Hin ji van peyvên vê dawiyê hatine, bo nimûne "doktor, profesor, akademîsyen, rektor..." Gelek wek peyvên ji erebî tên nasîn: "beqal, etar, beytar, hekîm, cerah, cebar, necar..."

Lê hin ji van xwe li erebî jî nagiririn. Bo nimûne, "beytar" (hekîmê heywanan) bi rêya erebî ketibe kurdî jî, bi eslê xwe ji yûnaniya kevn e. "Necar" (hosteyê daran û dartiraşînê) bi rêya erebî ketibe kurdî jî, rehên wî digihin zimanên akadî û sûmerî jî.

### **Xwarin û vexwarin**

Gelek millet û welat bi taybetmendiyên xwarin û vexwarinên xwe dixurin û pesnê wan didin yan bi wan pesnê xwe didin. Rast e ku li her derê hin xwarin û vexwarinên xas hene lê di rastiyê de xwarin bi piranî li her derê wek hev in. Hin xwarin yan vexwarin li her derê tine bin jî, dîsa xwarinên yan vexwarinên ku tenê di nav miletekî de yan tenê li welatekî hebin, bi rastî pir kêr in yan qet nînin jî.

Piraniya xwarinên dinyayê ji çend riwekan û berhemên çend heywanên xwedîkirî pêk tê. Di nav riwekan de, danê yekî di ser hemûyan re ye ku "birinc" e. Eger mirov hinekî li navê vê berhemê bi zimanên cuda vekole, dê bibîne ku di rastiyê de ew di piraniya zimanan de li seranserî dinyayê heman peyv e: kurdî û farisî "birinc", tirkî "pirinç", ermenî "brinc", erebî "eruzz", îbrî "orêz", yûnanî "oruza", portugalî û spanî "arroz", rûsî "rîs", almanî "Reis", fransî "riz", îtalî "riso", inglîzî "rice" ... Hemû bi eslê xwe ji eynî peyvê ne û ji zimanekî Hindistanê tên.

Berhemeke din ya sereke, ku li şûna birincê xwarin, di nav piraniya kurdan de bi navê "petat, patate, patates" tê nasîn. Lê ji ber ku ev peyv di erebî û tirkî de jî heye, gelek kes ji wan direvin û peyva "kurdî" "kartol" dinivîsin. Di rastiyê de ti ji van herdu peyvên ne bi eslê xwe kurdî, ne tirkî û ne jî erebî ne. Peyva "petat" bi formekê yan yeke din li piraniya dinyayê berbelav e. Bo nimûne: spanî û îtalî "patata", portugalî "batata", inglîzî "potato", holandî "patat", filipînî "patatas" ... Ev peyv ji zimanekî Amerîkaya Navîn bi rêya spanî li dinyayê belav bûye.

Hewateya wê "kartol" jî di piraniya zimanên Kafkasyayê, Navenda Asyayê û Rojhilata Ewropayê de peyda dibe: azerî "kartof", ermenî "kartofil", kazaxî "kartop", osetî "kartof", kirgîzî "kartöşkö", tirkmenistanî "kartoşka", ozbekî kartoshka, ukraynî "kartoplya", romanî "cartof", polonî "kartofel",



latviyayî "kartupelis", rûs "kartofeli" (bi devkî "kartoşka")... hemû ji almanî "Kartoffel". Ya almanî bi xwe jî ji îtalî "tartuficolo" ye.

Ne tenê ev xwarinên berbelav lê hin ên kêmtir peyda dibin jî ji zimanekî derbazî yên din bûne. Bo nimûne, "xox, mişmiş" ji erebî hatine nav kurdî lê "gûz" ya îranî wek "cewz" ketiye erebî û jê wek "ceviz" derbazî tirkî bûye. Tirkan "bulgur" a xwe ji zimanên îranî wergirtiye lê kurdan jî hevwatera wê "savar" ji ermenî aniye. Tirkan "horos" ji zimanên îranî wergirtiye lê ev peyv di kurdî de peyda nabe yan nemaye û peyva "dîk, dîkil" ya ji erebî li cihê wê di kurmancî de li kar e.

Nimûneyên me dayî bi rastî jî tenê nimûne ne û bi ti awayî peyvên wergirtî di vî warî de ne bi van sinordar in.

## Dem

Dem li her derê kê-m-zêde wek hev tê fehmkirin û pîvan. Em bi salan, bi mehan, bi rojan, bi saetan yan jî bi deqîqe û saniyeyan behsa wî dikin.

Hin ji peyvên têkilî demê xwemalî ne anku di kurdî de peyvên îranî yan jî heta hindûewropî ne. Bo nimûne, peyvên wek "roj, şev, havîn, zivistan" rehên xwe di zimanê me de digihînin proto-hindûewropî anku maka zimanên ewropî. Hin peyv tenê dema zimanên kevn yên îranî diçin, wek mînak "sal".

Hin peyv jî bi zelalî ji zimanên din hatine wergirtin, bo nimûne "saet, deqîqe, saniye" ji erebî.

Navên piraniya mehan bi rêya erebî ji îbrî, aramî yan akadî anku ji zimanên samî hatine wergirtin, bo nimûne "sibat, adar, nîsan, hezîran, tebax/ab, îlon/eylûl, çirî/ tişrîn, kanûn".

Peyva "hefte, heftî" bi zelalî ji peyva "heft" (7) hatiye dariştin. Ew ne tenê di kurdî û farisî de heye lê jê wek "hafta" ketiye tirkî jî. Destpêka piraniya navên hefteyê bi zelalî ji zimanên îranî ye, bo nimûne "yekşem, duşem, sêşem, çarşem, pêncşem" anku ji navên hejmarên 1 – 5 hatine dariştin.

Lê dawiya van peyvan "-şem" (di hin devokan de "şemb, şemî, şembî") ne ji îranî lê ji îbrî ye.

Herwiha di hin devokên kurdî de peyvên wek "sebt" (şemî) û "lehd" (yekşem) hene ku ji erebî ne û di rastiyê de di erebî de jî ji îbrî ne.

Li aliyekî din, çend ji navên rojên hefteyê ji zimanên îranî ketine tirkî: "çarşamba, perşembe".

Herwiha "Pazar" (yekşem) jî ji peyva îranî "bazar" hatiye wergirtin ji ber ku wê rojê bazar dihatin

danîn. Herwiha “Pazartesi” (duşem, roja piştî bazarê) bi destpêka xwe ji îranî û dawiya xwe ji tirkî ye. Navên rojên din yê hefteyê di tirkî de “Sali” (şêşem) û “Cuma” (în, cume) ji erebî ne. “Cumartesi” nîverebî-nîvtirkî ye.

### **Civak û birêvebirin**

Awayê birêkxistina civakê û birêvebirina wê li her dera dinyayê ne wek hev e lê gelek wekhevîyên bingehîn li seranserê dinyayê hene. Li piraniya cîhanê biçûktirîn yekîneya koma mirovan mal e, paşî tax (mehel) yan gund e, paşî nahî / qeza û bajaran in û taliyê jî welat û dewlet in. Mal bi piranî ji malbatekê (aîleyekê) pêk tî, rûniştvanên heman gundî ji yek yan çend êl û eşîran in yan jî çend gund bi hev re ji heman eşîrê ne, welat jî kêman ji gelekî û gelek caran jî ji çend gelan pêk tî. Mal ji aliyê malxwê û kabaniyê ve, gund ji hêla muxtarekî ve, eşîr ji layê axayekî ve, qeza ji aliyê qayimeqamekî ve, bajar ji aliyê şaredar yan waliyekî ve, û welat jî ji hêla serok û hin wezîrên wî ve tî birêvebirin.

Rewş ne tenê li Kurdistanê yan li Rojhilata Navîn lê li gelek deverên din jî yê dinyayê wiha ye yan wiha bû. Ev sîstem jî carekê li hin cihan peyda bûne û jê li deverên din jî belav bûne. Loma gava ku mirov li zimanan jî dinêre, dibîne ku di wan de piraniya peyvên têkilî vê pergala birêvebirinê jî wek hev in û ji heman çavkaniyê hatine wergirtin.

Peyvên vê mijarê di zimanên ewropî de bi piranî ji latînî ne. Bo nimûne, peyvên inglîzî “family” (malbat), “village” (gund), “city” (bajar), “state” (dewlet), “country” (welat), “government” (hikûmet), “president” (serok), “minister” (wezîr), “governor, mayor” (walî), “administration” (îdare, birêveberî)... hemû ji latînî (bi rêya fransî) hatine wergirtin.

Di zimanên Rojhilata Navîn de peyvên vê mijarê bi piranî ji erebî hatine wergirtin. Ew ne tenê di kurdî de lê herwiha di farisî, tirkî, urdûyî, peştûyî û piraniya zimanên din jî yê misilmanan de li kar in (di hin ji van zimanan de yek yan çend lib ji nimûneyên me ne li kar in lê piraniya wan di van hemû zimanan de cih digirin: aîle, muxtar, eşîr, qeza, nahîye, mehel, herêm / menteqe, dewlet, hikûmet, walî, welat/wilayet, îdare, hukim, ceza, siyaset...

Peyvên “civak, civat” bi xwe jî di rastiyê de ji peyva erebî “cema’e(t)” hatine ku di kurdî de jî wek “cemaet” li kar e lê di formên xwe yê “civat, civak” de zêdetir hatiye kurdîkirin.

Hin peyvên vê mijarê jî bi rêya erebî ketiye kurdî û zimanên din yê misilmanan lê erebî bi xwe ew ji zimanên din wergirtine, bo nimûne: “beledî / belediye, qanûn, namûs, iqlîm, lijne...” ji yûnaniya kevn yan bi rêya yûnanî ji latînî.

Lê hemû peyvên vê mijarê ne wergirtî ne yan jî hemû ne ji erebî ne. Bo nimûne, “gund, bajar” peyvên xwemalî ne. “Axa” ne ji erebî lê ji tirkî hatiye wergirtin. Li aliyekî din, tirkî “şehir” (bajar) ji îranî wergirtiye.

Di vê mijarê de peyva “wezîr” hêjayî binavkirineke taybet e. Ew niha bi forma xwe ya erebîkirî di kurdî û farisî de li kar e. Lê eslê peyvê bi xwe îranî ye. Ev nimûneyeke ji **vewergirtinê** ye ku dê li jêrtir were behskirin.

Fikirên civakî û dezgehên civakî yê nû êdî ne herêmî lê cîhanî ne. Loma gelek ji wan êdî ne ji erebî (zimanê serdest yê Rojhilata Navîn) lê yekser ji zimanên ewropî tî: parleman / parlemento, komîte, kongre, kongres, demokrasî, sosyalîzm, radîkalîzm, terorîsm, komunîzm, federal, federasyon...

### **Sîstema hînkirin û fêrbûnê**

Kêm caran sîstema hînkirin û fêrbûnê li du welatan bi temamî wek hev e. Lê tevî vê jî, li piraniya welatan mirov gelek ji beşên ku dixwîne wek hev yan nêzîkî hev in. Bo nimûne, miroc hînî xwandina û nivîsînê dibe, fêrî hejmartinê dibe, dielime dîrok û edebiyatê. Navê gelek dersan di piraniya zimanên dinyayê de eynî ne: matematîk, fîzîk, cografya, kîmya...

Navên dezgehên xwandinê jî li piraniya dinyayê wek hev in yan jî li her deverê berfireh navekî ji eynî rehî heye. Bo nimûne, cihê ku zarok diçin dersê lê bixwînin teqrîben di hemû zimanên ewropî de bi eslê xwe bi eynî navî tî nasîn lê li gor dengnasiya zimanan piçekê ji hev cuda bûye: inglîzî “school”, almanî “Schule”, holandî “school”, portugali “escola”, fransî “école”, spanî “escuela”, polonî “szkoła”, îtalî “scuola”, rûsî “школа” (şkola)... hemû ji latînî “scola”, ya latînî bi xwe ji yûnaniya kevn.

Di nav misilmanan de heta vê dawiyê yek ji herdu yan jî herdu peyvên “medrese, mekteb” dihatin bikaranîn. Bo nimûne, kurdî, farisî, urdûyî, “medrese”, kurdî, tirkî, kazaxî, kirgîzî, ozbekî, oyxurî, tacikî, tirkmenistanî, hindî û hejmareke mezin ya zimanên din jî “mekteb, mektep” bi kar dianî û piraniya wan niha jî vê peyvê dibêjin û dinivîsin.

Mixabin petîperistiya tirkî û di bin tesîra nijadperistiya tirkî de, petîperistiya kurdî jî xwast xwe ji van herdu peyvên di nav gel de li kar bişon. Tirkan peyva "okul" ya qaşo tirkî "oku-mak" (xwandin, xwendin) lê di rastiyê de ji têkilkirina "oku-mak" ya tirkî û "école" [êkol] ya fransî çêkir. Kurdan qaşo xwe ji peyva biyanî şûşt lê di rastiyê de xwe avêt himêza du peyvên biyanî:

- Qelemşorên kurmancî "dibistan" ya ji farisî û ji xelkê re nenas neqil kir cihê "mekteb, medrese" yên di kurdî de berbelav.
- Qelemşorên soranî peyva qaşo "kurdiya pak û petî" ya "qutabxane" darişt lê di rastiyê de "qutab" ne kurdî ye lê ji erebî ye.
- Di herdu lehceyan de jî çendîn peyvên din jî ceribandin, wek "fêrgeh, xwandingeh, xwendegeh, perwerdegeh..." lê ti ji wan jî cihê "mekteb, medrese" negirtiye.

Vê dawiyê piraniya peyvên vê mijarê ji zimanên ewropî tên. Hem navên dersan, wek "biyolojî, kîmya, fizîk, matematîk, cografya..." û hem jî hin peyvên din, wek "kurs, semînar, kolej, lîse" û hwd.

### **Avahî û bicihbûn**

Mal û tiştên nav malê wek prensîp ji destpêka mirovatiyê ve hebûne. Loma mirov dikare texmîn bike ku peyvên têkilî wan di zimanan de dê kevn û xwemalî bin.

Lê di rastiyê de modelên avahiyan, beşên wan û tiştên di wan de heyî bi piranî nûjen in. Berê di nav kurdan de xanî bi piranî ji beşeke tevahî pêk dihat, odayên rûniştinê, xewê, karkirinê ji hev ne cuda bûn. Cihên şûştinê, xwarinçêkirinê û destavxweşkirinê bi kêmî havînan (lê bi piranî her çar demsalan) li derve bû. Ev ne tenê rewşa kurdan bû: eger mirov çend dehsalan yan sedsalan paşve biçê, li piraniya dinyayê wisa bû.

Anku beşên xanî – bo nimûne medbex, hemam (herdu ji erebî) – yan tiştên tê ve – bo nimûne qenepe (ji fransî), mase / mêze (ji îtalî), sofa (ji inglîzî, ew bi xwe ji erebî) – peyvên wergirtî ne. Heta navê hin tiştên ku mirov texmîn dike her û her hebûne, peyvên wergirtî ne: lihêf û betenî ji erebî, doşek ji tirkî. Fikra parvekirina xanî li ser çend beşan jî bi navê giştî yê beşan ve jî di kurdî de ji tirkî ye ("ode" ji tirkî "oda") yan jî ji erebî ("mezel, menzel").

Di rastiyê de heta peyva "mal" bi xwe jî ji erebî ye û ketiye cihê "ke-" ya îranî. Lê ev êdî ne wergirtineke kultûrî lê wergirtineke bingehîn e û li jêrtir behsa wan tê kirin.

Li aliyekî din, tirkî peyva "duvar" (dîwar) ji zimanên îranî wergirtiye.

### **Jornav (hîpernîm)**

Di kurdî de hejmareke mezin ya gulan, giyayan û daran navên xwe yên xwemalî hene. Herwiha çendîn heywanan jî navên xwe yên xwemalî hene. Lê tevî vê jî (bi kêmî heta vê dawiyê) ti navekî hevbeş yê xwemalî ji van heywanan yan jî van gul û giya û daran re tine bû.

Hemû heywanên xwedî navên xwemalî û biyanî bi hev re bi peyva ji erebî wergirtî "heywan" tên/dihatin nasîn. Bi heman awayî hemû gul û giya û dar jî bi hev re bi peyva ji erebî "nebat" dihatin/tên nasîn. Yan hemû heywanên bi perr û baskên yên ku difirin bi navê "teyr" yê ji erebî tên/dihatin nasîn tevî ku gelek ji cûnên teyran navên xwe yên xwemalî hebûn jî.

Vê dawiyê çendîn hewlên afirandina peyvên xwemalî li cihê "heywan, teyr, nebat" hatine dan, bo nimûne:

- heywan: canewer, giyanewer, ajal ("ajel" di rastiyê de berfirehkirina peyvê ye ji ber ku ew li cihên heyî di nav xelkê de maneya "dewar, sewal" dide, ne maneya hemû heywanan)
- nebat: riwek, şînkati, hêşinahî
- teyr: balinde, firinde

Lê di rastiyê de ti kêmasiyek di kurdî de nîne em van peyvên esil-biyanî yên di nav gel de li kar bidomînin. Eger em li bihêztirîn zimanê dinyayê yê niha anku li inglîzî binêrin, em ê bibînin ku rewş di vê meseleyê de jî tam wek kurdî ye:

Di inglîzî de jî gelek heywan û nebatan navên xwe yên xwemalî hene. Lê di inglîzî de jî ti peyveke xwemalî bi maneya "heywan" yan "nebat" peyda nabe. Bi wê mebestê inglîzî jî "animal" (heywan) û "plant" (nebat) ji latînî wergirtine. Berevajî kurdînivîsan, inglîzînivîs bi van peyvên di zimanê wan de cihgirtî razî ne û serê hevzimanên xwe bi peyvokên çêkirî naêşînin.

Di rastiyê de rewş ne tenê di kurdî û inglîzî de lê di piraniya zimanên din de jî wisa ye. Peyvên xwemalî bi jêrnavan (hîponîman, bi inglîzî *hyponym*) anku bo tiştên yek bi yek hene lê bo jornavan (hîpernîman, *hypernym*) wek "heywan, nebat" kêm in û adeten ji çend zimanan (latînî, yûnanî, erebî, sanskrîtî) hatine wergirtin.

Bo nimûne, piraniya zimanên din jî yê ewropî bi maneya “heywan” û “nebat” heman peyva “animal” û “plant” yê ji latînî bi kar tînin:

- heywan: inglîzî, fransî, spanî, portugalî hemû “animal”, îtalî “animale” ... hemû ji latînî “animalis”.
- nebat: inglîzî û holandî plant, fransî plante, spanî û portugalî planta, îtalî pianta, almanî Pflanze...

Di zimanên misilmanan de jî:

- heywan: farisî hiyvan, tirkî hayvan, urdûyî heyvan, indonezî hewan, kazaxî xayvan, somalî xayawaano, ozbekî “hayvon”, azerî heyvan, oygurî “haywan”, peştûyî “heyvan”... hemû ji erebî “ḥeywan”.

## WERGIRTINÊN NAVXWEYÎ

**Mebest ji wergirtinên navxweyî** (*internal borrowing*) wergirtina ji zarava yan devokeke heman zimanê ye. Em ê pêşî li ser wergerandina navbera lehceyan bisekinin, paşî li ser wergirtina di navbera devokên kurmancî de.

Ji wergirtinên zaravayî em ê behsa wergirtinên ji soranî yan bi rêya soranî ketî kurmancî wek nimûne bikin. Ji wergirtinên devokî jî em ê bala xwe bidin wergirtinên navbera kurmanciya navendî û kurmanciya rojhilatî.

## WERGIRTINÊN ZARAVAYÎ: JI SORANÎ BO KURMANCÎ WEK NIMÛNE

Van salên dawiyê têkiliya navbera zarava û devokên kurmancî xurttir bûye. Bi rêya hevnasîna kesan, medyayê û xwandina berhemên bi zarava û devokên din, kurdên ji deverên cuda dest pê kiriye ku peyvên di devoka wan de tine bin jî fehm bikin û heta bi kar jî bînin.

Nivîsîna zimanê kurdî bi zaravaya kurmancî dest pê kiriye<sup>177</sup>. Lê salên 1900 ji ber qedexeya li ser zimanê kurdî li Bakurê Kurdistanê (warê piraniya kurmancîaxivan) û serbestiyeke rêjeyî li Başûrê Kurdistanê, soranî zêdetir derfet û delîvên pêşketinê hebûn. Ji ber ku di dawiya salên 1900 de gelek berhem li ser mijarên cuda bi soranî hatibûn nivîsîn, hin kurmancînivîsan jî xwe spartiyê xwandina wan û gelek peyv jî jê wergirtine û paşî ew di nivîsên xwe yên bi kurmancî de jî bi kar anîne. Bi vî awayî gelek peyv ji soranî derbazî kurmancî bûne.

Lê gelo ev peyv çi ne? Ew çawa ji soranî derbazî kurmancî bûne? Sebebên wergirtina wan çi ne? Di kurmancî de çawa tîk bikaranîn? Gelo eslê wan peyvên soranî ye yan jî gelo soranî tenê rêya wergirtina wan bûye? Anku gelo ew peyv di soranî bi xwe de hebûn yan hatine çêkirin yan jî soranî bi xwe jî ew ji zimanekê din wergirtine û bi rêya soranî ketine kurmancî jî? Gelo hejmara wan peyvên çend e? Heke heta niha hejmara wan peyvên nehatibe diyarkirin, gelo qet mimkin e ku mirov wan bihejmêre?

Di vê meseleyê de divê çend zelalkirinên pêdivî bînin kirin.

- 1) Gava ku em dibêjin "kurmancî peyv ji soranî wergirtine", gelo em behsa çi "kurmancî" dikin?
  - a. kurmanciya devkî ya giştî
  - b. kurmanciya devkî ya di bin tesîra soranî de
  - c. sormancî
  - d. kurmanciya nivîskî ya di bin tesîra soranî de
  - e. kurmanciya berhemên ji soranî wergerandî
  - f. kurmanciya nivîskî ya giştî
- 2) Gava ku em dibêjin "kurmancî peyv ji soranî wergirtine", gelo em behsa çi "soranî" dikin?
  - a. soraniya devkî
  - b. soraniya nivîskî
- 3) Gava ku em dibêjin "kurmancî peyv ji soranî wergirtine", gelo mebesta me
  - a. tenê ew peyv in ku bi eslê xwe soranî ne?
  - b. yan jî her peyv e ku bi rêya soranî ketiye kurmancî?

---

<sup>177</sup> Bi zaravaya lurî berî kurmancî hatiye nivîsîn. Lê berevajî ku hin kurd idia dikin, ji aliyê zimannasî ve lurî ne beşek ji zimanê kurdî ye. Ew ne farisî ye jî. Lê heke mirov ji aliyê zimannasî ve lê binêre, lurî û farisî ji lurî û kurdî zêdetir nêzîkî hev in.

Li vê derê mebesta me bi peyvên "kurmanciya devkî ya giştî" ew peyv in ku li hemû yan piraniya deverên kurmançî di nav xelkê "sade" de hebin. Di kurmanciya wiha de peyvên ji soranî wergirtî ihtimalen qet tine ne. Heke hebin jî, bi tiliyên destan mirov dikare bihejmêre. Bo nimûne, kurmançîaxivên sade yên diyarbekirî, dêrsimî, efrînî, êrîvanî yan xorasanî di mala xwe de, di nav zar û zêçên xwe de ihtimalen yek peyva ji soranî wergirtî jî bi kar naînin. Bi heman awayî di nav soranîaxivên "sade" yên sineyî, kerkûkî yan seqizî de ihtimalen ti peyvên ji kurmançî wergirtî di mal de nayên bikaranîn. Heke çend peyv hebin jî, hejmara wan pirr bisinor e.

Li deverên ku sinorên kurmançî û soranî digihin hev, tesîra herdu zaravayan li ser hev heye. Bo nimûne, li Başûrê Kurdistanê li parêzgeha Hewlêrê hin bajarok kurmançîaxiv û hin jî soranîaxiv in. Ji ber cîranî û têtikiliyên qisekerên herdu zaravayan, tesîra wan li ser heye: hem di kurmanciya wan deveran de şûn û şopên soranî diyar in û hem jî di soraniya wan deveran de tesîra kurmançî berçav e. Ew tesîr ne tenê di peyvnasanî (leksîkal) ye lê herwiha dengnasanî (fonolojîk) û pirtiknasanî (morfolojîk) e jî. Li hin deveran zehmet e mirov bibêje ka ew bi kurmançî yan jî soranî diaxivin. Bi taybetî devoka klasîk ya eşîra sûrçiyên wisa ye.

Mebest ji "sormancî" bi ber firehî têtikilirina kurmançî û soranî ye. Hin caran ev bi qest tê kirin: bo nimûne, gava ku kurmançek û soranek li gel hev biaxivin, herdu ji hev fehm bikin lê ti ji herduyan 100 % bi zaravaya yê din neaxive, hingê yek yan herdu dikarin ew bidin ku heta bikarin peyv û rêzimana li gor zaravaya din bi kar bînin daku ji hevberê wan re fehmkirin hêsan be.

"Sormancî" bi piranî demkî ye: kurmançek dikare wê li gel soranekî bi kar bîne lê gava ku bi kurmançekê re biaxive, vegere "kurmanciya xwe ya normal". Soranek jî dikare wisa bike.

Lê kurmançên ku li hin deverên soranîaxiv dijîn yan soranên ku li deverên kurmançîaxiv dijîn, dikarin piştî demekê bi rastî jî bibin sormancîaxiv anku hewl bidin bi zaravaya din biaxivin lê dîsa jî tesîra zaravaya wan bi xwe bi berfirehî li ser axiftina wan hebe. Anku dibe ku demekê ew êdî ne zaravaya xwe baş bizanin û ne jî bi temamî hînî zaravaya din bûbin. Yan jî belkî bi temamî hînî zaravaya din bûbin lê êdî zaravaya wan bi xwe bi giranî di bin tesîra zaravaya din de mabe. Bo nimûne, ev rewşa gelek kurmançîaxivên li Hewlêrê yan Silêmaniyê bi cih bûyî ye.

Kurmanciya nivîskî ya di bin tesîra soranî de bi çend awayên cuda berçav dibe. Gelek ji nivîskar û rojnamevanên kurmançiyên devera Behdînan li gel xwandina bi kurmançî (bi taybetî behdînî) û erebî, herwiha xwandevanên berhemên soranî û guhdarên bernameyên soranî ne. Têtikiliyên wan yên şexsî jî li gel nivîskar û rojnamevanên soran dikarin hebin. Bi dilxwazî yan jî ji nehişyarî tesîra



soranî li ser wan heye. Di haletê baş de ew kurmanciya xwe bi peyv û gotinên soranî berfireh û zengîn dikin. Di halê xirab de kurmanciya wan di bin tesîra soranî de belingaz û perîşan dibe.

Piraniya nûçe, nivîs û hevpeyvînên medyaya bi kurmançî ya Başûrê Kurdistanê wergerandina ji soranî ye anku ew ne yekser bi kurmançî hatine nivîsîn. Hin wergerên baş hene ku berheman wisa werdigerînin ku mirov qet bîra wê nake ku berhem wergerandî ye. Lê di gelek wergeran de şûn û şopa soranî bi awayekê bêserûber di wergerê de diyar e. Bo nimûne, vê dawiyê bûye edet ku di nûçeyên ji soranî wergerandî de mirov gotinên wek "[kesê mirî] bi xakê spart" bi maneya "[kesê mirî] bin-ax kir" dibîne.

Kurmanciya nivîskî ya giştî anku ne tenê ya yekser di bin tesîra soranî de jî van 20 - 30 salên dawiyê gelek gotin ji soranî wergirtine û niha ew bûne beşek normal ji kurmanciya nivîskî. Ew bi piranî peyvên kultûrê (bi taybetî medya û çapemeniyê) ne ku berê di kurmançî de tine bûn yan jî li cihê wan hin peyvên erebî yan tirkî yan ewropî dihatin bikaranîn.

Lê di rastiyê de serekaniya kêr peyvên ji wan soranî ye. Eslê wan ji belkî heta 90 % farisî ye. Soranî tenê demek kurt berî kurmançî ew ji farisî wergirtine û bi rêya soranî ew paşî ketine kurmançî jî:

"aheng, amade, araste, asayîş, çalak, daraz, derûn, derya, ferheng, mest, nirx, pesend, peyam, rewş, rexne, saz (kirin), şêwe, şoreş, werziş, umêd, zindî..." û bi dehan – heke ne bi sedan – peyvên din.<sup>178</sup>

Hin peyv jî bi rêya soranî ji hewramî / goranî ketine kurdî: "wate, wane".

Lê peyvên ku bi xwe di soranî de hatibin çêkirin û jê derbazî kurmançî bûbin, gelek bisinor in. Gelek ji wan jî wergerên yekser yên ji erebî ne. Bo nimûne "parêzgeh" ji soranî "parêzga, parêzge" li ber erebî "muhafeze" ("cihê parastinê/parastî").

Li aliyekî din, ne tenê kurmançî peyv ji soranî wergirtine lê herwiha soranî jî ji kurmançî yan bi rêya kurmançî ji zimanekî din wergirtine. Armanca me li vê derê ne vekolîna van peyvên e lê miro dikare serpe çend nimûneyan bide: "bakur, başûr, civet, evîn, heval, mirov, penceşêr / şêrpençe, rojev, govar (kovar)" û paşpirtika "-van" (wek di peyvên "nêçîrvan, şervan, rojnamevan") de tenê çend nimûne ne. Hêjayî gotinê ye ku ji bilî nûpeyvên anku neolojîzman (govar/kovar, rojev, rojnamevan), du peyvên bingehîn jî (mirov, evîn) di nav van çend nimûneyên me de peyda dibin.

---

<sup>178</sup> Binêre bo nimûne: Jafar Hasanpoor: *A Study of European, Persian, and Arabic Loans in Standard Sorani* (Lêkolînek li ser peyvên wergirtî ji zimanên ewropî, farisî û erebî di soraniya standard de). <http://www.scribd.com/doc/61598245>

## WERGIRTINÊN DEVOKÎ

Di hin devokên kurmancî de hin peyv hene ku di devokên din de maneya wan bi hin peyvên din tê îfadekirin. Bo nimûne, mirov dikare lîsteyeke kurt tenê wek nimûne ji kurmanciya rojhilatî (bo nimûne Dihok) û kurmanciya navendî (wek mînak Mêrdîn) bide:

Dihok	Mêrdîn
şiyar	karîn
li nik, li layê	li ba, li aliyê
bo	ji bo, ji ... re
wisa, wesa	wilo
vêca	îcar, îca

Lê nivîskarên kurmancînivîs yê ji Dihokê tenê bi devoka xwe namînin û yê mêrdînî jî xwe bi devoka xwe ve sinordar nakin. Ew peyvên wek van yê di devoka nivîskar de peyda nebin jî ji devokên din neqil dikin nivîsên xwe. Xaseten gava ku nivîskar naxwazin heman peyvê di nivîsa xwe de dubare bikin, ew dikarin peyvên hevware yê ji devokên cuda bi kar bînin. Bo nimûne, “li cem, li ba, li nik, li aliyê, li hêla, li rexê...”

Heta demekê ev wergirtin tenê bi nivîskî ye anku bi axiftinê ew kes van peyvên nabêjin, paşê ev peyvên ji devokên din hêdî-hêdî di axiftinên nîv-resmî de derdikevin û taliyê dikarin bibin beşek ji axiftina rojane yan van kesan jî.

## WERGIRTINÊN BINGEHÎN

Berî ku têkiliyên zimanê kurdî û erebî peyda bibin jî, “dinya” li derdora kurdan hebû, roj bi “sibê” dest pê dikir, dayikên gelek kesan xwişk û bira hebûn ku ji wan kesan re “xal” û “xalet/xaltî” bûn û babên gelek kesan jî xwişk û bira hebûn ku ji wan kesan re “mam” û “met” bûn. Berî heman têkiliya herdu zimanan, bi ihtimaleke mezin li Kurdistanê mirîşk dihatin xwedîkirin û bo cotbûn û zêdebûna wan mirîşkan, nêrên wan jî lazim bûn ku hin kurmanc jê re dibêjin “dîk” û hin jî “dîkil”.

Lê dîsa jî ev peyv hemû jî erebî hatine wergirtin: dinya, sibe, xal, xalet/xaltî, mam, met, dîk/dîkil...

Bi ihtimaleke mezin di nav kurdan de berî têkiliya zimanên kurdî û erebî, hin navên din li cihê van peyvên hebûn. Anku ev peyvên wergirtî ne wergirtinên kultûrî ne ji ber ku ev tişt ji xwe di kurdî de hebûn û bi ihtimaleke mezin hin peyvên jî li cihê wan hebûn.

Wergirtina peyvên wisa, ku hevwateriyên wan ji xwe di zimanê wergir de hene, di zimannasiyê de bi nave **wergirtinên bingehîn** (*core borrowing*) tên nasîn. Navekî din yê vê diyardeyê **vepeyvkirin** e (releksîkalisasyon, bi inglîzî *relexicalisation*) anku binavkirina bi peyveke din.

Ev diyarde ne tenê di kurdî de lê di gelek zimanên din de jî peyda dibe.

Helbet berî ku têkiliya zimanî di navbera farisî û erebî de dest pê bike yan têkiliya zimanî ya tirkî-erebî û tirkî-îranî dest pê bike jî, roja van miletan bi sibê dest pê dikiir, bi nîvro nîvî dibû û bi êvarê ber bi dawiyê diçû. Lê dîsa jî niha di farisî de jî roj bi “sobh”a (sibe, spêde) ji erebî dest pê dike û bi “zuhr” (nîvro) ya dîsa ji erebî nîvî dibe. Roja tirkî jî bi “sabah” ya ji erebî dest pê dike û bi “akşam” (êvar) ya ji îranî ber bi dawiyê diçe.

Berê jî “dinya” li dor farisî û tirkî jî hebû lê niha li dor tirkî jî “dünya” ya ji erebî û li dor farisan jî “donya” ya dîsa ji erebî heye. Farisî û tirkî jî wek kurdan gelek ji navên xizm û kesûkarên xwe ji erebî wergirtine tevî ku bêguman berî têkiliyên van zimanan li gel erebî jî ev kesûkar her hebûn:

- farisî: ‘emo (mam), xalû (xal), xalê (xalet, xaltî)
- tirkî: hala (met – hevrehê “xalet”), adam (zelam, mêr)

Van herdu zimanan ne tenê ji erebî lê ji hev jî peyvên malbatî wergirtine:

- farisî: daî (xal – ji tirkî “dayî”)
- tirkî: kadın (jin – ji îranî “xatûn”), koca (mêr – ji îranî “xoce”)

Li aliyekî din, helbet “hewa” li derdora tirkî û ereban jî hebûye berî ku têkiliyên wan li gel gelên îranî peyda bibin. Lê dîsa jî erebî peyva “hewa” ji zimanên îranî wergirtiye û bi şiklê erebîkirî ew daye tirkî, swahîlî û gelek zimanên din û heta bi forma erebîkirî li zimanên îranî jî vegehandiye.

Rewş ne tenê li Rojhilata Navîn wiha ye. Bo nimûne, inglîzî jî “uncle” (mam, xal), “aunt” (met, xalet), “cousin” (kuzen, pismam, dotmam, kurxal, keçxal...), “niece” (keça birayî yan xwişkê), nephew (kurê birayî yan xwişkê) û hejmareke mezin ji peyvên din yê malbatî bi rêya fransî ji latînî ne. Roja inglîzan jî bi “noon” (nîvro) ya ji latînî nîvî dibe. Hewayê inglîzan jî “air” dîsa bi rêya fransî ji latînî ye.

Hin ji wergirtinên bingehîn li gel hevwaterên xwemalî dijîn lê hin jî bi temamî hevwaterên xwe yên xwemalî winda dikin. Bo nimûne, li cihê "xal, xalet/xaltî, met/metik" yên erebî ti peyvên xwemalî di kurmançî de nemane tevî ku bi ihtimaleke mezin berî ku ev peyv ji erebî werin wergirtin, hin peyvên din hebûn. Lê ji ber ku ew di ti nivîsên kurdî de nemane, em nikarin bibêjin ka ew çi ne. Herwiha helbet em nikarin bibêjin ka ew peyvên xwemalî bûn yan ew jî ji zimanekî din hatibûn wergirtin.

Gava ku peyvên xwemalî mabin jî, ew adeten di tenê di hin devokan de mane û di hinan de jî bi temamî cih daye peyva wergirtî. Bo nimûne, di kurmançiya rojhilatî de peyvên xwemalî "sotin" û "spêde" (destpêka rojê) mane lê di kurmançiya navendî de wan bi temamî cih daye peyvên "şewitîn/şewitandin" û "sibe, serê sibê" yên ji erebî. Ji van peyva "şewitîn/şewitandin" qet cih di devokên kurmançiya rojhilatî de di nav xelkê de cih negirtiye. Peyva "sibe" (wek "siba, sibahî, suba, subahî") di devokên rojhilatî de cih girtiye lê tenê bi maneya "roja piştî îro" (bi inglîzî *tomorrow*) lê ne bi wateya "destpêka rojê" (*morning*). Di kurmançiya navendî de "sibe" yan varyanteke wê bi van herdu maneyan li kar e.

Vê dawiyê di zimanê kurdî yê nivîskî de **vepeyvkirineke** (releksîkalizasyon, *relexicalization*) bi awayekî din serdest e: peyvên ji erebî yên cihê xwe girtî bi peyvên bi texmînî xwemalî lê di rastî de wergirtinên ji hin zimanên din (xaseten ji farisî) tînen veguhastin. Kurtiya zimanê jêder li pey peyvê hatiye nivîsîn (E = erebî, F = farisî, FR = fransî, R = rûsî, T = tirkî)

- dinya → cîhan (F)
- behr → derya (F)
- mekteb, medrese → dibistan (F)
- qanûn (bi eslê xwe yûnanî ye) → zagon (R), yasa (T)
- zengîn (bi xwe peyveke îranî ye) → dewlemend (dewle- E, -mend F)
- heq → maf (E)
- xerîte (bi eslê xwe yûnanî ye) → nexşe (E-F)

Bi dehan nimûneyên din jî yên wiha hene ku em di nivîsareke din de behs dikin.

## VEWERGIRTIN

**Vewergirtin** (*reborrowing*) tê maneya wê ku peyvek ji zimanekî (yan ji malbateke zimanî) çûye zimanekî din lê paşî dîsa li zimanê jêder (yan li zimanekî ji malbata zimanên jêder) vegekiye.

Bo nimûne, bi berfirehî tê zanîn ku peyva “wezîr” ji erebî ketiye kurdî û farisî. Lê di rastiyê de erebî ew peyv ji zimanekî îranî (ihtimalen pehlewî) wergirtiye, lê paşî ew peyv bi şiklê xwe yê erebî li zimanên îranî (bo nimûne kurdî û farisî) vegekiye. Em dikarin tarîxa wergirtina vê peyvê wiha diyar bikin:

- zimanekî îranî (ihtimalen pehlewî) “viçîr, guzîr” → erebî “wezîr” → hin zimanên îranî (bo nimûne kurdî) “wezîr” (farisî “vezîr”)

Di rastiyê de hejmareke peyvên wisa di kurdî û farisî de hene ku pêşî ji zimanekî îranî (adeten ji pehlewî) ketine erebî û paşî ji erebî li kurdî û farisî vegekiye. Li vê derê em ê lîsteyeke netemam pêşkêş bikin:

îranî (pehlewî) →	erebî →	îranî (kurdî)
pisteq	fisteq	fisteq, fistiq
dên	dîn →	dîn (diyanet)
zendîk	zendîq	zendîq
xendek	xendek	xendeq, xendek
viçîr	wezîr	wezîr

Adeten peyva îranî ya çûyî nav erebî, bi şiklê xwe yê erebîkirî hem li kurdî û hem jî li farisî vegekiye. Lê carinan kurdî û carinan jî farisî forma îranî parastiye lê zimanê din forma erebîkirî wergirtiye. Bo nimûne, em dikarin navê du berhemên daran bidin:

- farisî eslê peyva îranî “pistê, piste” (pehlewî “pistek”) parastiye lê kurdî forma erebîkirî “fisteq, fistiq” li cihê wê vewergirtiye
- kurdî eslê peyva îranî “gûz” (pehlewî “gewz”) parastiye lê farisî forma erebîkirî “cewz” li cihê wê bi şiklê “cûz” vewergirtiye.

Vewergirtin ne tenê di navbera zimanên îranî û erebî de peyda dibe. Bo nimûne, inglîzî peyva îranî “karwan, kerwan” wergirtiye û peyva “caravan, van” (karavan, mala seyar, mala seferî, otomobîlên

ku mirov dikare tê de bijî û xew bike) jê çêkiriye. Paşî jî heman peyva di inglîzî de çêkiriye ketiye kurdî jî. Mirov dikare wiha vê vewergirtinê pêşkêş bike:

- zimanekî îranî “karwan, karvan” → inglîzî “caravan” → zimanekî îranî (kurdî) “karavan”

Hin caran heta zimanan peyvên xwe yên hev wate heçku bi hev veguhastibin. Bo nimûne, di piraniya zimanên Rojhilata Navîn de fêkiyek/mêweyek heye ku bi navê “pirteqal, purteqal” (kurdî), “porteqal” (farisî), “portakal” (tirkî), “burteqal”, “burtuqal” (erebî) tê nasîn. Ev peyv ji navê welatekî Ewropayê anku ji navê “Portugal” hatiye. Lê tiştê ecêb ew e ku di gelek zimanên ewropî de ev fêkî bi peyveke rojhilatî anku bi “narinc”ê tê nasîn: spanî “naranja”, portugali “laranja”, îtalî “arancia”, fransî û inglîzî “orange”...

## WERGIRTINÊN SERPÊ

Mebest ji wergirtinên serpê (bi inglîzî *nonce borrowing*): bikaranîna bêje yan biwêjên biyanî di nav zimanekî de ne bêyî ku wan peyvên biyanî di wî zimanî de cihê xwe girtibe anku “rûniştibe”. Peyva “serpê” li vê derê ji gotina “li ser pê” anku “ji piyan ve”, ne “rûniştî”, ne “cihê xwe girtî”.

Wergirtinên serpê ji aliyê kesên duziman (bilingual) ve tên bikaranîn. Şertê navbera “wergirtinên asayî” (normal) û “wergirtinên serpê” ew e ku “wergirtinên asayî” ji aliyê kesên yekziman ve jî tên bikaranîn lê “wergirtinên serpê” tenê ji aliyê kesên duziman ve tên bikaranîn.

Bo nimûne, peyvên “ode” û “son” herdu ji tirkî ne. Peyva “ode” di kurdî de “wergirtineke asayî” ye ji ber ku kurdên tirkînezan jî (li derveyê Bakurê Kurdistanê jî) vê peyvê bi kar tînin. Peyda “son” (dawî, dûmahî, xilasî) jî di axiftina gelek kurdan de li kar e lê dîsa jî ew wergirtineke serpê ye ji ber ku tenê ji aliyê kurdên tirkîzan ve tê bikaranîn.

Diyardeyeke din ya giştî di nav kurdan de li Bakurê Kurdistanê û Tirkîyê ew e ku di nav axiftina kurdî de gelek kes hejmaran bi tirkî dibêjin. Bo nimûne: “Em sala *iki bin onbeş* (2015) li wir bûn.”

Wergirtinên serpê ji ber çend sebebên tên kirin. Di rewşa kurdî de li gor giringiya xwe mirov dikare wan sebebên wiha rêz bike:

- qiseker zêdetir şarezayê zimanekî din e, rojane wî bi kar tîne û nizane ka filan peyv bi kurdî çî ye
- qiseker hevwatera peyva biyanî bi kurdî dizane lê ya biyanî hêsantir tê bîrê
- qiseker texmîn dike ku guhdar dê baştir peyva biyanî fehm bike
- ti peyveke hevwatera yan jî ti peyveke hevtesîr ya xwemalî nayê dîtî yan di wê gave de nayê bîra qisekerî
- qiseker dixwaze bi zanetî peyvên biyanî bi kar bîne yan daku atmosfereke biyanî biafirîne yan jî diyar bike ku zimanekî din jî dizane.

## ÇI BIRRÊN PEYVAN TÊN WERGIRTIN?

Heta niha me hema-hema tenê navdêr wek nimûne ji wergirtinan dane. Rast e ku navdêr di nav peyvên wergirtî de piranî ne lê bi ti awayî ne tenê ne.

Yek ji sebebên piraniya navdêran di nav peyvên wergirtî de ew e ku piraniya peyvan wek din jî ji xwe navdêr in. Lê di kurdî û gelek zimanên din de jî peyvên ji hemû birran dikarin bîr wergirtin.

Li jor me hejmareke pir mezin ji navdêrên wergirtî pêşkêş kiriye. Li jêr em ê ji her birra din ya peyvan hin nimûneyan bidin.

### Rengdêr

Hejmareke mezin ji rengdêrên kurdî û – bo nimûne – farisî, tirkî û inglîzî jî bi eslê xwe biyanî ne. Bo nimûne "cahil, hêdî, miskîn" ji erebî, "sax, genc" ji tirkî yan "demokratîk, radîkal" ji zimanên ewropî hatine wergirtin.

Rengdêrên wergirtî jî wek rengdêran bi giştî jî di kurdî de komeke vekirî ye anku rengdêrên nû – hem yên xwemalî û hem jî yên wergirtî – dikarin zêde bibin. Carinan hin peyv bi eslê xwe ne rengdêr in lê gava ku ketine kurdî, bûne rengdêr. Bo nimûne, peyva "xirab" di kurdî de maneya "nebaş" dide anku rengdêr e. Lê eslê wê yê erebî "xerab" di erebî de ne rengdêr lê navdêr e û maneya "kavil" dide.

## Lêker

Ti peyvên biyanî nikarin yekser wek lêker bêyî guherîn derbazî kurdî bibin. Lê ev nayê wê maneyê k uhin ji lêkerên kurdî ne bi eslê xwe biyanî bin.

Her lêkera kurmançî bi forma xwe ya ferhengî bi paşgira “-in” yan “-n” bi dawî dibe. Di di beşa lêkersaziya bi dariştinê de li ser çêkirina lêkeran ji rehên samî hatiye vekolîn. Lêkerên wergirtî di kurdî de bi zerûrî hewceyî paşpirtikên lêkersaz in (adeten –andin / -în). Bo nimûne:

- sekinîn, sekinandin (ji rehê “s-k-n-” yê erebî ku herwiha di peyvên wek “sakin, sekn, me-sken, mi-skîn” de jî heye)
- şewitîn, şewitandin (ji rehê “ş-w-t-” yê erebî ku herwiha di peyva “şewat” de jî heye)
- xebitîn, xebitandin (ji rehê “x-b-t-” yê aramî ku herwiha di peyva “xebat” de jî heye)

Lê awayekî din yê hê jî bibertir yê lêkerên bi eslê xwe biyanî di kurdî de bi rêyeke wisa çêdibe ku peyv wek navdêr yan rengdêr ji zimanekî din dikevin kurdî û bi alîkariya “lêkerên sivik” yên kurdî (adeten “kirin” yan “bûn”) dibin lêkerên biwêjî. Bo nimûne:

- “analîz” ji zimanekî ewropî → kurdî “analîz kirin”
- “çap” bi rêya farisî ji hindî → kurdî “çap kirin” (teb’ kirin, weşandin)

## Hoker û girêder

Hejmareke ne kêr ya hoker û girêderên kurdî jî bi eslê xwe biyanî û – bo nimûne – farisî, tirkî û inglîzî jî bi eslê xwe biyanî ne. Bo nimûne, hin peyvên sade yên wek “belê, feqet, lê(kin, lakin), ema, teqrîben, zêde” bi eslê xwe ji erebî ne. Piraniya wan û gelekên din ji erebî ketine farisî û tirkî jî.

Heta peyva tirkî “hayır” (na, ne) ya tirkî jî wergirtineke ihtiramî ji peyva erebî “xeyr” (xêr) e. Heman peyv bi maneya “xêr” wek navdêr jî ketiye tirkî. Di rastiyê de heman peyv ketiye kurdî jî û li gel peyva kurdî “ne-” peyveke durehî (hîbrîd, *hybrid*) “nexêr” çêkiriye ku formeke ihtiramî ya li cihê “na, ne” ye.

Tirkî peyva “eğer” (eger, heke) ji zimanên îranî wergirtiye. Lê hin devokên kurdî jî “-se” ya tirkî ya hev-erka (hevwezîfeya) “eger”ê îcar ji tirkî wergirtiye (*li jêrtir li beşa gireyên wergirtî binêrin*).



## ÇI PEYV KÊM TÊN WERGIRTIN?

Mirov dikare bi hêsanî bibêje ku ti birrên peyvan nînin ku nikaribin bîn wergirtin. Lê dîsa jî hin birrên peyvan pir kêmtên wergirtin. Lê dîsa jî hin birrên peyvan hene ku pirr kêmtên wergirtin. Ew adeten birrên girtî ne ku hema-hema qet peyvên nû lê zêde nabin û peyvên kevn jî kêmtên caran jê dikevin.

### Cînav

Mirov dikare reh û rîşên piraniya cînavên (zemîr, *pronoun*) kurdî bigihîne makezimanê proto-hindûewropî. Anku ji hingê ve ev peyv di kurdî de hebûne tevî ku helbet pir guherîne jî lê bi ti peyvên din nehatine veguhastin.

Anku hem di kurdî de û hem jî di piraniya zimanên din de cînav adeten peyvên xwemalî ne. Lê ev jî nayê wê maneyê ku cînav *qet* nikarin werin wergirtin yan cînavên wergirtî peyda nabin.

Di rastiyê de cînavê “qet” bi eslê xwe erebî hatiye wergirtin. Li aliyekî din, hevwateriya wî cînavî bi eslê xwe di zimanên îranî “hîç” e ku wek “hiç” ketiye tirkî jî. Anku ne tenê di kurdî de lê di zimanên din de jî wergirtina cînavan mimkin e tevî ku ne diyardeyeke berbelav e jî.

Hin cînavên hin zimanên ne lêzim jî wek hev in. Bo nimûne, kurdî “min”, azerî û gelek zimanên din yê tirkîkî/tûranî “men” (bi tirkîya resmî ya Tirkîyê “ben”), fînlândî “minä”. Ji ber ku kurdî, azerî û fînlândî her yek ji malbateke cuda ya zimanî ye, wisa dixuye heçku ev peyv hevreh anku ji eynî rehî bin û hin zimanan ev ji hev girtibe. Lê li gor zimannasiya dîrokî, ev tenê tesadîfî ye û mirov nikare isbat bike ku ev peyv ji zimanekî ketiye zimanên din.

### Daçek

Daçek jî kêmtên wergirtin. Lê dîsa di nav wan de jî istisna û awarte hene.

Bo nimûne, daçeka kurmancî “(li/ji) cem”<sup>179</sup> (li nik, li ba, li dev) ji erebî “cenb” e. Hevwateriya wê ya zazakî “het” ya zazakî ji ermenî hatiye wergirtin. Herwiha mimkin e ku “(le) merr” (bo, bo xatirê, ji

---

<sup>179</sup> “Cem” tenê di kurmanciya navendî, rojavayî û bakurî de heye, di kurmanciya rojhilatî de û di lehceyên din yê kurdî de peyda nabe.

ber) ya soranî jî ji ermenî “hamar” hatibe wergirtin lê ev bi esehî nayê zanîn û dikare hevrehê “(ji/li) ber” ya kurdî be lê bi ihtimaleke biçûk.

Daçeka kurdî “miqabilî” (beramberî, hevberî filan tiştî yan filan kesî) ji erebî hatiye wergirtin.

Daçeka “navbeyn, navbên” (navber) ji “nav” ya xwemalî û “beyn” ya erebî pêk tê.

Di zimanên îranî de bi piranî pêşdaçek (*preposition*) hene û di zimanên tirkî/tûranî de jî halên rêzimanî (*grammatical case*) ku dişibin paşdaçekên (*postposition*). Lê di kurdî de (xaseten di kurmancî de) hem pêşdaçek û hem jî paşdaçek peyda dibin. Paşdaçeka kurmancî “da, de” hevdeng û hevwatera tirkî “-da, -de” ye. Bo nimûne:

- kurdî: “di defterê **de**”
- tirkî: “defter**de**”

Bi esehî nayê zanîn lê mimkin e ku ji mêj ve ev paşpirtik ji tirkî ketibe kurdî. Lê ew ne tenê di kurmancî de li Bakurê Kurdistanê lê heta di soranî de jî wek “-da, -a” peyda dibe. Loma hê zêdetir vekolîne pêwîst in heta ku mirov bigihe qenaetê xurt li ser vê mijarê.

Hin çaran jî hin daçek bi tesadîfî wek hev in. Bo nimûne, ji aliyê etîmolojî ve mirov dikare bi esehî bibêje ku pêşdaçeka “bi” ya kurmancî û “bi” ya erebî ne hevreh in anku ne kurdî ew ji erebî wergirtiye û ne jî erebî ji kurdî wergirtiye tevî ku ew hevwatera û hev-erk in. Herwiha ji aliyê etîmolojî ve “bi” ya kurdî û “by” ya inglîzî jî ne hevreh in tevî ku ew jî hevwatera û heverk in.

## Hejmar

Hejmar di zimanan de hin peyvên bingehîn in loma adeten ew peyvên pir kevn yê zimanî ne û xwemalî ne. Lê ew jî ne bi temamî ji wergirtinê “rizgar” in.

Bo nimûne, bi berfirehî tê zanîn ku “sifir” ya kurdî û farisî û “sıfır” ya tirkî ji erebî ne. Di rastiyê de “sifir” ya erebî ketiye gelek zimanên ewropî jî û “zero” ya inglîzî jî bi rêyeke dûr ya di ser çend zimanan re dîsa ji heman peyva erebî ye. Sebebê vê ew e ku berê hejmara sifir û bi taybetî jî dehcarîkirina hejmaran bi zêdekirina 0-ekê li wan nedihat nasîn loma ti peyvên xwemalî jî jê re tine bûn.

Li aliyekî din, vê dawiyê hejmarên mezin ji zimanên ewropî ketine zimanên Rojhilata Navîn. Bo nimûn, peyvên “milyon, milyar, trilyon, katriyon...” ji zimanên ewropî êdî di kurdî, farisî, tirkî, erebî û gelek zimanên din jî yên dinyayê de cih girtine.

Heta li gel hejmarên sade yên 1 – 20, 30, 40, 50, 60, 70, 80, 90, 100 jî, eger mirov li kurmancî, soranî, zazakî û farisî binêre, mirov dê bibîne ku ev hejmar di kurmancî û soranî de pir ji zazakî zêdetir dişibin farisî tevî ku bi awayekî giştî bêguman e ku kurmancî û soranî wek din ji farisî zêdetir nêzîkî zazakî ne. Kerem bikin, em li van hejmaran di van ziman û zaravayan de binêrin:

kurmancî	soranî	farisî	zazakî
yek	yek	yek	yew
du	dû	dû	di
sê	sê	sê	hîrê
çar	çwar	çihar	çar
pênc	pênc	penc	panc
şeş	şeş	şeş, şîş	şeş
heft	hewt	heft	hewt
heşt, heyşt	heşt	heşt	heşt, heyşt
neh	no	noh	new
deh	de	des	deh
yazde(h)	yanze	yazdeh	yewendes
diwazde(h)	dwanze	devazdeh	diwês
sêzde(h)	syanze	sîzdeh	hîrês
çarde(h)	çwarde	çardeh	çarês
pazde(h)	panze	panzdeh, pûnzdeh	pancês
şazde(h)	şanze	şazdeh, şûnzeh	şiyês
hevde(h), hivde(h)	hevde	hivdeh	hewtês
hejde(h), hijde	hejde	hijdeh	heştês
nozde(h)	nozde	nozdeh	newês

bîst	bîst	bîst	yek
sî, sih	sî	sî	hîris
çil, çel	çil	çihl	çewres
pêncî	penca	penca	pancas
şêst	şest	şes	şestî
heftê	hefta	hefta	hewta
heştê	heşta	heşta	heştay
not, nod	not	neved	neway
sed	sed	sed	sey

Sebebê van cudahiyên giring di navbera kurmançî û zazakî de (û bi piranî wekheviya di navbera kurmançî, soranî û farisî de) bi taybetî di hejmarên 11 – 20 û herwiha di hejmarên 30, 40, 50, 100 de ew e ku di rastiyê de hemû hejmarên kurmançî, soranî û farisî ji pehlewî ne lê hejmarên zazakî bi piranî yan bi temamî xwemalî ne.

Wergirtina hin peyvên wiha bingehîn wek hejmaran û bicihkirina wan li şûna peyvên xwemalî belkî bi hin kesan xerîb be. Lê mirov dikare tenê li bikaranîna hejmarên tirkî di axiftina niha ya gelek kurdên Bakur de bifikire û dê tê bigihe ku wegirtina hejmarên sade jî ne tiştê nedîtî ye û loma idiaya me ya ku dibêje hemû hejmarên sade yê kurdî û farisî ji pehlewî ne, ne gotineke xerîb e. Herwiha mirov dikare li bikaranîna peyva “zero” ya inglîzî di axiftina kurdî, farisî, erebî de bifikire. Herwiha wegirtina hejmaran ne tiştê xerîb e ji ber ku hejmar di bazarê de tên bikaranîn û hemû bajarên Kurdistanê heta vê dawiyê jî pîrziman bûn.

### Endamên leşî

Endamên leşî (laşî) anku beşên ne birreke rêzimanî ya peyvan e (wek navdêr, rengdêr, hoker, daçek, hejmarnav...) lê komeke peyvên heman mijarê ye. Gelek caran tê gotin ku navên beşên leşî nayên wergirtin yan pir kêmtên wergirtin. Rast e ku di kurdî de jî, gelek ji navên endamên leşî peyvên xwemalî ne, bo nimûne “ser, çav, guh, ziman, dest, pê...”

Lê dîsa di nav endamên leşî de jî peyvên wergirtî hem di kurdî û hem jî di zimanên din de peyda dibin. Bo nimûne, peyva “til, tilî” (bi inglîzî *finger*) ne peyveke xwemalî/îranî ye lê ihtimalen ji aramî ye. Peyva “kef” (“kef”a destan, *palm*) û peyva “mêlak” (*liver*) ji erebî ne. Herwiha “qelb” jî ji erebî ye û ji bilî kurdî ketiye farisî û tirkî jî lê bi temamî peyva îranî “dil” yan hevwatera wê ya tirkî “yürek” ji rewacê nexistine.

Peyva “kezeb” (ceger, ceger) ji aramî yan ji erebî ketiye kurdî. Li aliyekî din, hevwatera wê di tirkî de “ciğer” ji zimanên îranî hatiye wergirtin.

Heta peyvên bi maneya hemû leşî yên wek “beden, cesed, cism, wicûd” bi xwe jî ji erebî ketine kurdî, farisî û tirkî.

## PEYVSAZÎ BI LIHEVANÎNA DENGÎ-WATEYÎ<sup>180</sup>

*Husein Muhammed*

Di zimannasiyê de **lihevanîna dengî-wateyî** (*phono-semantic matching*) tê maneya wergirtina hin peyvên biyanî û eyarkirina wan li ber peyvên xwemalî heçku ew peyvên xwemalî bin. Bo nimûne, peyva *bombebaran* û hevwatera wê *bombedûman*<sup>181</sup> di kurdî de tîr xebitandin heçku ew ji peyvên “bombe+baran” yan “bombe+dûman” bin. Lê di rastiyê de ev peyv ji fransî *bombardement* (bixwîne: bombardman) hatiye wergirtin lê li gor peyvên xwemalî hatiye eyarkirin. Ji vê diyarde û fenomenê re *lihevanîna dengî-wateyî* tê gotin.

Peyva *heyecan* ya bi eslê xwe ji erebî van salên dawiyê di nivîsên gelek kurdan de bûye *kelecan*<sup>182</sup> (kela/germiya canî/giyanî). Heta hin kes texmîn dikin ku *heyecan* ya “tirkî” forma “xirabkirî” ji peyva “kelecan” ya “kurdî” ye. Lê di rastiyê de “heyecan” ne ji tirkî lê ji erebî ye û “kelecan” vê dawiyê li ber wê hatiye çêkirin heçku maneya wê “kela canî” be.

Bi heman awayî peyva *Mezopotamya* ya ji yûnanî bi maneya “navbera du çeman” (Dicle û Firat) di gelek nivîsan de bi gotina *Mezrabotan* yan *Mezra Botan* hatiye guherandin û heta hin kes texmîn dikin yan jî hewl didin bidin bawerkirin ku forma rast “Mezrabotan” yan “Mezra Botan” ya “kurdî” hatiye wergirtin û xirab bûye.<sup>183</sup> Lê îcar hin kesan jî “Mezrabotan” bi maneya “Devera Botan” fehm kiriye û wê wisa bi kar tînin.<sup>184</sup>

Di rastiyê de hem “Mezrabotan, Mezra Botan” peyveke nû ya li ber “Mezopotamya” çêkirî ye û hem jî ne “Botan” û bi taybetî jî ne “mezra” (gundik, çandingeh, ziraetgeh, çewlik, cotgeh) nikare wateya

---

<sup>180</sup> Binêrin bo nimûne: [https://en.wikipedia.org/wiki/Phono-semantic\\_matching](https://en.wikipedia.org/wiki/Phono-semantic_matching)

<sup>181</sup> Bo bikaranîn peyvê bi forma *bombedûman*, binêrin bo nimûne: <http://ku.hawarnews.com/36778/>

<sup>182</sup> Nimûneyek ji bikaranîna peyva “kelecan”: “Serkeftina HDP’ê coş û kelecan li her derê belav kir.”  
<http://www.dihasisistem.com/news/content/view/461184?page=1&from=3890233896>

<sup>183</sup> Nimûneyek ji bikaranîna “Mezrabotan, Mezra Botan” bi maneya “Mezopotamya”: <http://www.kurdistan-aktuel.org/li-mezra-botan-ol-%C3%9B-bawer%C3%8E%E2%80%8F-makale,181.html>

<sup>184</sup> Nimûneyek ji bikaranîna “Mezrabotan, Mezra Botan” bi wateya “devera Botan”:  
<http://www.yeniozgurpolitika.org/index.php?rupel=nuce&id=33890>

devera berfireh ya "Mezopotamya" bide. Di ser re jî "mezra" ne bi eslê xwe kurdî ye lê bi rêya tirkî ji erebî مزرعة (mezre'e: çandingeh, zîraetgeh, cihê çandinê) ye û hevrehê peyva "zîraet" e.

Vê dawiyê di hin nivîsan de mirov li cihê peyva "komîser" (endamê polîsiyê yan endamê komisyonekê) û "komîserî" (dezgeha komîseran, komisyon) bi awayê "komser, komserî" dibîne.<sup>185</sup> Anku ew li gor peyvên "kom" (grûp, deste) û "ser" anku "serok" hatine lihevanîn. Lê eslê peyvê "komîser" ya ji fransî "commissaire" ku hevrehê "komisyon"ê ye. Lê di hin nivîsan de bi qest ew hatiye "kurdandin" û lihevanîneke dengî-wateyî ya "komser: serokê komê" lê hatiye barkirin. Lê di rastiyê de eger mebest "serokê komê" bûya, divê ew "serkom" yan "serokkom" bûya, wek "serokkomar" (serokê komarekê) yan "serkar" (serokê karekî).

Herwiha çendîn kesnavên biyanî jî ketine ber lihevanîneke dengî-wateyî. Bo nimûne, "Robîn" bi eslê xwe navekî ewropî ye lê hin kurdan jî ew li zarokê xwe kiriye û ev nav hatiye veşirovekirin heçku wateya "robîn, rojbîn" (yê ku rojê dibîne) bide. Heta li gor hin idiyên bêbingeh, lehengê navdar yê daristanên Inglîstana Navîn Robin Hood bi xwe jî kurd bû û navê wî yê "rast" Robîn Hût/Hûd (heywanê mezin yê behrî yan jî dêw)!<sup>186</sup>

Ji bilî Robîn, mirov dikare van navan jî bide ku bi kêmî hin ji wan bi lihevanîna dengî-wateyî hatine saz kirin:

- Jan<sup>187</sup> (bide ber navê ewropî Jean ku wek [jan] tê gotin lê heçku ji peyva "jan" anku "êş" ya kurdî be)
- Zozan (bide ber navê ewropî "Susan" lê herwiha peyva kurdî "zozan" anku deverên çiyayî)
- Robar (bidin ber navê ewropî "Robert" lê herwiha peyva kurdî "robar" anku "ro, çemê biçûk")

Lihevanîna dengî-wateyî bi ti awayî ne tenê di kurdî de heye. Ew di gelek zimanên din de jî peyda dibe. Bo nimûne, peyva tirkî "okul" (medrese, mekteb, xwandingeh, dibistan) di rastiyê de ji fransî "école" [êkol] e lê li ber peyva tirkî "oku-" (xwandin) hatiye eyarkirin. Peyva erebî "teqane" bi

---

<sup>185</sup> Nimûneyek ji bikaranîna peyva "komserî": "Komseriya Bilind a Serbixwe ya Hilbijartinan a Kantona Efrînê lîsteya navên namzetên endamên meclîsên şaredariyan hatine qebûl kirin eşkere kir. Komseriya diyar kir ku 448 namzet hatin qebûl kirin." <http://ku.hawarnews.com/naven-448-namzetan-ji-bo-meclisen-saredariye-hate-qebul-kirin/>

<sup>186</sup> <https://pdk-s.com/k/saqafa/1662-robin-hood-bu-kurdi>

<sup>187</sup> Bo nimûne navê nivîskarê kurd Jan Dost.

maneya “teknolojî, teknîk” di rastiyê de ji van peyvên bi eslê xwe ewropî ye lê li gor rehê erebî t-q-n- (jêhatî bûn).

Van dehsalên dawiyê li cihê peyva *resmî* bi berfirehî hem di nivîsên kurmançî û hem jî yên soranî de mirov peyva *fermî* dibîne. Ne gelek zehmet e mirov tê bigihe ku ew ji peyva “ferman” hatiye dariştin û ev texmîn ne tenê li şiklê nêzîkî hev yê van peyvên t-ê (ferman – fermi) lê herwiha li wateya wan jî t-ê: “fermî” anku tiştêkî fermankirî ji ber ku tiştên resmî ew in ku ji aliyê hêzekê ve hatine fermankirin û ferzkirin.

Lê di kurdî de mirov adeten “-an” ya peyva xwerû ya navdêr (ism, *noun*) jê na-avêje berî ku paşgira “-î” lê zêde bike daku rengdêrekê (sifet, *adjective*) jê çêke. Ne dijwar e mirov bibîne ku di rastiyê de peyva “fermî” li ber “resmî” ya erebî ji hêmanên an madeyên xwemalî yan îranî hatiye avakirin.

Kerem bikin em hinekê li wekhevîyên şiklî yên van herdu peyvên binêrin:

- di herdu peyvên de pênc herf hene: fermî, resmî
- di herduyan de du kîte (hece, *syllable*) hene: res-mî, fer-mî
- di herduyan de kîteya yekem ji sê û kîteya duyem ji du herfan/dengan pêk hatiye
- di herduyan de kîteya yekem “mî” ye
- di herduyan de di kîteya yekem de navika kîteyê (nucleus) vokala E ye
- di herduyan de di kîteya yekem de R heye lê cihê wê di peyvekê de li destpêka kîteyê û di peyva din de jî li dawiya kîteyê ye
- tek cudahiya wan herfa F di peyva “fermî” û herfa S di peyva “resmî” de ye

Medyaya kurdî bi vê jî nemaye. Heta li cihê forma navdêrkirî ya peyva “resmî” anku “resmîyet” jî ji peyva “fermî” bi heman paşpirtika “-yet” ya erebî peyva “fermîyet” jî hatiye çêkirin û tê bikaranîn.<sup>188</sup>

Ne tenê dengê peyvên dikare li gor wateyê were eyarkirin lê herwiha carinan wateya peyvê jî li gor peyvên biyanî tê eyarkirin. Bo nimûne, di kurdî de ji mêj ve peyva *kulîn* bi maneya “embara xwarinên malê” (bi inglîzî “pantry”, fransî “garde-manger”, tirkî “kiler”) hebûye. Di wan ve qût û erzaq dihat embarkirin û parastin lê ne xwarin lê dihat çêkirin û ne jî lê dihat xwarin.

Peyva “kulîn” bi şiklê xwe dişibe peyva “cuisine” (bixwîne “küizîn”) fransî û hin zimanên din yê ewropî ku maneya “medbex, odeya xwarinçêkirinê û xwarinê”. Bi maneyeke berfirehkirî, “cuisine”

---

<sup>188</sup> Nimûneyek ji bikaranîna peyva “fermîyet”: <http://www.azadiyawelat.info/?p=33242>



herwiha maneya hemû xwarinên welatekî yan deverekê dide. Bo nimûne, mirov bi inglîzî dibêje “Italian cuisine” anku “xwarinên îtalî”.

Li ber tesîra peyva “cuisine”, vê dawiyê di gelek nivîsên kurdî de ev wate li peyva “kulîn” hatiye barkirin. Anku maneya “kulîn”ê ji “embara qût û erzaqan” hatiye guherandin û wateya “medbex, xwarinên filan welatî yan bêvan deverê” lê hatiye siwarkirin. Bo nimûne, di gelek nivîsan de bi merema “xwarinên kurdî”, mirov gotinên wek “kulîna kurdî” dibîne.<sup>189</sup>

*Kulîn* bi ti awayî ne tek peyv e ku maneya wê li gor zimanekî din hatiye ve-eyarkirin. Bo nimûne, peyva *efser* niha di kurdî û farisî de maneya *fermande, fermandar, zabit, serleşker, seresker, subay* dide. Lê maneya wê ya berê *tac, kumên* paşayan bû. Sebebê guherandina maneya vê peyvê lihevanîna dengî-wateyî li ber peyva teqrîben hevdenga wê ya inglîzî *officer* (bixwîne: “ofiser”) e ku maneya “fermande, zabit” dide. Ev guherandina wateyê li ber peyva inglîzî, bi zanetî ji aliyê dezgeha ziman û edebiyata farisî *Ferhengistanê* ve hatiye kirin û paşî ev peyv ji farisî ketiye kurdî jî.<sup>190</sup>

Herwiha peyva *siza/seza* van salên dawiyê di medyaya kurdî de bi maneya “ceza” ya erebî tê bikaranîn. Lê eslê peyvê vê maneyê nade. Ew ji farisî ji lêkera *sez-îden* anku “hejî bûn, hêjayî tiştêkî bûn, bi kêrî tiştêkî hatin” e û dîsa wek “seçak” di pehlewî de jî bi wateya “hejî, hêjayî” li kar bû. Barkirina maneya “ceza, ciza” li peyva “seza, siza” tenê dikare bi lihevanîna dengî-wateyî were fehmkirin. Anku ji ber ku “seza, siza” bi dengê xwe pir nêzîkî “ceza, ciza” ye û ji ber ku hin bikarîneran (bi taybetî nivîskarên) nexwastiye peyva ji erebî bi kar bînin, wan peyva “siza, seza” xistiye cihê wê.

Guherandina wateya peyvên “efser, kulîn, siza” hema-hema bi temamî bi ser ketiye. Lê herdem hewldana lihevanînen dengî-wateyî bi ser neketine. Ce’fer Hesênûr di vekolîna xwe ya li ser peyvên wergirtî di soranî de behsa wê dike ku c\_awa hin kesan hewl daye maneya peyva xwemalî *pispor* (s\_areza, zana, karzan, karnas, xebîr) biguherînin û maneya peyva ewropî *professor* lê bar bikin ku ji aliyê dengê xwe ve nêzîkî hev in.

---

<sup>189</sup> Nimûneyek ji bikaranîna peyva “kulîn” bi maneya “medbex”: <http://www.saradistribution.com/xurakekurdi.htm>

<sup>190</sup> Binêrin bo nimûne: Jafar Hasanpoor: A Study of European, Persian, and Arabic Loans in Standard Sorani (Vekolînek li ser wergirtinên ewropî, farisî û erebî di soraniya standard de): [www.kurdipedia.info/books/75797.PDF](http://www.kurdipedia.info/books/75797.PDF), rûpel 106. Binêrin herwiha Ferhengî Dihxoda: <http://parsî.wiki/dehkhodasearchresult-fa.html?searchtype=0&word=2KfZgdiz2LE%3d>

## NIVÎSKARÊ VÊ BERHEMÊ BINASIN

Husein Muhammed dadnas (hiqûqnas), zimannas û wergêrekî kurd e. Ew sala 1980 li Zaxoyê hatiye dinyayê û ji sala 1994 ve li Fînlandayê dijî.

Husein Muhammed niha wek birêveberê fêrgeheke ziman û kultûrê li paytextê Fînlandayê re kar dike. Ew berî niha wek avukat û berî hingê jî wek memûr li Wezaretê Hindir ya Fînlandayê xebitiye.

Husein Muhammed ji sala 1995 ve bi berdewamî bi zimanê kurdî dinivîse û werdigerîne. Heta niha zêdeyî kitêbên bi wergera wî û sê jî bi nivîsîna wî hatine çapkirin. Kitêbên bi wergerandina wî ji weşanxaneyên wek Nûdem, Helwest, Han û Dîwan derketine. Di nav berhemên wî wergerandî de bo nimûne Hafiz, Mewlana, Shakespeare û Çexov hene. Herwiha nivîs û wergerên wî di piraniya kovarên kurmançî de hatine weşandin.

Husein Muhammed bi salan li ser zimannasiyê xebitiye. Bi edîtorîya wî her du mehan carekê kovara zimanê kurdî *Kanîzar* bi elektronîkî tê belavirin. Ew niha herwiha bi çendîn berhemên ve mijûl e ku yek wergerandina Qur'anê ye, yek ferhengeke soranî-kurmançî ye, yek kitêbeke dengnasiya kurdî ye û yek jî ferhengeke etîmolojî ya zimanê kurdî ye.

Husein Muhammed zewicî ye û du zarokên wî hene.

Mirov dikare nivîs û wergerên wî li ser bloga wî bixwîne:

<https://zimannas.wordpress.com>

